



**Hewramî
bo
Kurmancan**

**Civandin û
sererastkirin:
Birîndar**

welatî rê

bo welêt

bo wîtat

pey wetatî

eşa wîtat

وہلاتی ری

بۆ وہلیت

بۆ ولات

پہی وہلاتی

ئہرا ولات

NAVEROK

_ Pêşgotin	9
• Pêşekî	10
• Piçek ji Hewramî	10
• Piçek ji Hewramanê	12
• Taybetmendiyên pirtûkê	15
• Gotara dawî	16
_ Beşa yekem	20
• Alfabe û dengnasî	21
• Ferhengeke kurt	25
• Pirskirin	32
_ Beşa duyem	37
• Peyv	38
• Rader	86
• Cînav	89
• Ravek	151
• Navdêr	157
• Rengdêr	173
• Hoker	196
• Daçek	203
• Ginahek	211
• Qertaf	213
• Partîkel	221
• Hejmarnav	223
• Baneşan	229
_ Beşa sêyem	235
• Hevokên lêkerî	236

_ Beşa çarem 240

- Hin rênima 241
- Rader 242
- Lêker 245
- Dema borî ya diyar 248
- Dema borî ya nediya 274
- Çîrokîya dema borî 285
- Dema niha ya nediya 296
- Dema niha ya diyar 299
- Çîrokîya dema niha 303
- Dema bê 310
- Lêkera fermanî 311
- Lêkera fermanîya endîrekt 313
- Ferhengoka lêkeran 314
- Hin tişt 326

_ Beşa pêncem 335

- Hevokên şertî 336
- Peyvên pirsîyarî 357

_ Beşa şeşan 362

- Endamên malbatê 363
- Reng 365
- Mêwe û dar û sebze 367
- Aşxane 369
- Heywan 370
- Endamên bedenê 373
- Sal, meh, roj, saet 376
- Hewa 379
- Ziman 380

_ Beşa heftem	382
• Nivîs û sohbetên Hewramî	383
• Axaftina rojane	396
_ Beşa heştem	398
• Gotareka kurt	399
• Helbest	401
• Zazakî û Hewramî	411
_ Beşa nehan	418
• Ferhengok	419
• Ferhenga Hewramî-Kurmancî	420
• Ferhenga Kurmancî-Hewramî	481
_ Beşa dehem	501
• Axaftina dawî	502

نازاره کیم!
تۆ خۆ کوردستان نییینی،
سا په ی چی ئننه وه شه ویسه نی؟

*Xweşikê min!
Tu ku Kurdistan nîn î,
lê ji çî re evqas delal î ?*

Pêşgotin

Pêşekî:

Ez bi rastî nizanim çawa yan jî ji ku dest pê bikim. Çi bêjim û çi nebêjim? Lê tiştê ku ez dizanim ev e ku ev pirtûk berevajî pirtûkên din ne bi rêk û pêk û ne jî ji aliyê nivîskarekî jêhatî ve hatiye nivîsandin. Belkî ji aliyê kesekî ku di dema nivîsandina van peyvan de pir ciwan e û hêj temenê wî tune û tu dîroka wî ya nivîsandina pirtûkê yan jî analîza pirtûkan tune ye hatiye nivîsandin.

Ger naveroka pirtûkê pir bingeîn û bê bedewiya awarte bû, ji kerema xwe min biborin ji ber ku yekem, ez bi tenê bûm dema min ev pirtûk dinivîsand û rêheval û rêberekî min tunebû da ku ez jê alîkarîyê bixwazim. Ya diduyan mixabin ez ji zarokatiya xwe ve hînî Kurmancî nebûme û di van çend salên dawî de bi xwendina pirtûkan fêr bûme û di dema nivîsandina vê pirtûkê de jî hînî Kurmancî dibim.

Ez bi Hewramî jî têra xwe baş nizanim. Bi rastî, di van her du zaravayan de jî zanista min tune. Her yek ji van her du zaravayan okyanûsek e ku xwedî ferhengeke mezin û rengîn û rêzimana kûr e.

Naskirina her yek ji van her du okyanûsan karekî pir dijwar û demdirêj e û karê diwartir jî çêkirina girêdanan di navbera van her du okyanûsan de ye ku ev girêdan ji keşifgeran re werin fam kirin. Ev pirtûk hewldana herî zêde ya kesekî bû û min nekarî wekî ku hûn heq dikin binivîsim.

— Piçek ji Hewramî:

Wek hûn jî dizanin zimanê me kurdan, Kurdî, heştêmîn zimanê dewlemend ê cîhanê ye. Berfirehiya vî zimanî li derveyî xeyalê ye.

Zaravayê Hewramî şaxekî Goranî ye. Di kategoriyê de, Zazakî û Goranî di heman kategoriyê de cih digirin. Kesên ku berê Zazakî dîtine, dema ku Hewramî hîn dibin dê nêzîkbûna wan fam bikin. Di beşeke cuda de min hewl daye hin peyv û hevok ku di navbera Hewramî û Zazakî de hevpar in û dişibin hev binivîsim.

Kesên ku bi Goranî diaxivin ji rojavayê şaristana Sine heta derdora Kerkûkê belav bûne. Lêbelê piraniya wan li herêmeke bi navê “*Hewraman*” dijîn. Ev herêm li rojhilatê Îraqê û rojavayê Îranê ye. Hema hemiya Goraniyên vê herêmê bi zaravayê Hewramî diaxivin.

Berevajî zaravayên din ên Kurdî, devokên Hewramî kêmtir in. Ji ber vê yekê ji fêrbûna devokên wê xem nekin. Bi hînbûna naveroka vê pirtûkê, hûn dikarin ji Hewramî heta radeyeke mezin fam bikin û biaxivin. Devoka ku di vê pirtûkê de hatiye şirove kirin, bêtir Hewraman Textî ye lê di hin gotaran de behsa devokên din jî tê kirin. Zaravayê Hewramî sê devok hene:

1_ Hewraman Textî

2_ Lehonî

3_ Jaweroyî

Hema bêje hemû nivîsandina Hewramî bi alfabeya aramî-kurdî ye û eger hûn bixwazin piştî hînbûna Hewramî, bi yekî Hewramîaxêv re biaxivin bêguman hînbûna alfabeya aramî-kurdî pêwîst dibe. Her çend ku di warê hînbûna alfabeya kurdîya latînî de, di nav nifşên nû yên kurdên rojhilat de pêşketineke hindik tê dîtin. Lê di vê pirtûkê de ji bo rehetiya hînbûna we, Hewramî bi alfabeya latînî hatiye nivîsandin. Eynî alfabeya ku Kurmancî pê tê nivîsandin. Heman alfabeya ku Celaleddîn Bedirxan ji bo Kurdî hîlbijart.

Di serî de min xwest ku di vê pirtûkê de alfabeya aramî ji bo Hewramî bi kar bînim, lê min pê hesiya ku piraniya Kurmancan bi vê alfabeyê nizanin û ger ez di vê pirtûkê de bi kar bînim, hînbûna Hewramî dê demek dirêj bigire. Paşê min xwest ku ez hem bi aramî û hem jî bi latînî binivîsim, lê wê pirtûkê gelek rûpel zêde bikira û her rûpel jî pir qerebalix bibûya.

Her weha ji ber ku Hewramî zaravayek e ku deng û ava tê de rolek girîng dilîze, alfabeya aramî nikare dengan baş nîşan bide.

Ez bi xwe jî di vê baweriyê de me ku alfabeya latînî ji bo nivîsandina zimanê Kurdî gelek çêtir e. Ez hêvî dikim çawa ku di demên berê de alfabeya me ya xwe ser hebûye, zimanzanên Kurd ên dilsoj jî dîsa alfabeyek li gor zimanê me çêbikin.

Hewramî mîna Kurmancî xwedî taybetmendiyên nêr û mê ye. Em ê bixwînin ku zayenda peyvan di Hewramî de mîna Zazakî bi dengê peyvê ve girêdayî ye. Ji ber vê sedemê xuya ye ku baştirîn çavkaniya ji bo naskirina zayenda peyvan bihîstina wan peyvan ji Hewramî-axêvan e. Tevî ku ev pirtûk behsa çend awayên din jî dike bo naskirina zayenda peyvan.

Ev taybetmendî di berê de bi tevahî hebûye. Lê di van demên dawî de di nav nifşên nû de ev taybetmendî bi başî nayê dîtin. Helbet ne tenê ev taybetmendî, belkî Hewramî bi xwe jî ji bîr dikin.

Mixabin ji ber xemsariya mirovan û nebûna hînkirina Hewramî bi awayê akademîk, zayenda hin tiştan di hin cihên Hewramanê de sabit nîn e û her kes li derbarê zayenda tiştan xwedî nêrîneke cuda ye. Di vê pirtûkê de hewl hatiye dayîn heta ku ji dest tê rêz li zayenda nesne û mirovan û lihevhatina wan bi lêkerê re were girtin. Lê dibe ku min zayenda hin peyvan nenivîsandibe û ez ji ber wê aciz im ji ber ku çavkaniyên pêbawer tunebûn û tevî gelek hewldanan jî min nekarî zayenda hin peyvan diyar bikim.

Hewramî di xwendîngehên rojhilatê Kurdistanê de nayê xwendin û berevajî Kurmancî û Soranî, heta niha rêzimanek yekane û standard nehatiye pejirandin. Ji ber vê sedemê ev pirtûk ji aliyê rêzimanî ve ne temam e û hetmen pirsgirêk hene. Lê min nekarî li bendê bimînim û bibim şahidê windabûna zimanê xwe û ji ber vê yekê min dest bi xebatê kir û taybetmendiyên Hewramî bi awayê perwerdehiyê nivîsandin da ku windabûna Hewramî herî kêr çend salan were paşxistin.

— Piçek ji Hewramanê:

Hewraman navê navçeyeke çiyayî ye di navbera sê parêzgehên Sine, Kirmaşan û Helebçeyê de ku rûniştvanên wê ji eşîra Goran in û bi zaravayê Hewramî diaxivin.

Dîroka niştecihbûna li vê herêmê vedigere serdema beriya dîrokê û vedîtina kevalên (lewheyên) Hewramanê hebûna desthilatdariya Asûrî, Med, Axemenî û Yewnanî piştrast kiriye. Kevntirîn şopên niştecihbûna mirovan di lêkolîn û kolangîna şûnwaran de

li derdora gundê Hecîcê hatine dîtin û girêdayî serdema Paleolîtîk in ku li gorî lêkolînerên şûnwarnasan temenê wê ji 40 hezar salî heta nêzîkî 12 hezar salî ye. Mîmariya gavî ya Hewraman Text û xaniyên wê yên balkêş bajar kiriye şiklê pîramîdê û li serê vê pîramîdê kelehek kevnar heye.

Ev navçe zêdetir ji 700 gund û bajarokan dihevine. Ji wan Sewalava, beşek ji Sine û Kamiyaran û bajarê Paweyê li parêzgeha Kirmaşanê û beşek ji wê girêdayî parêzgeha Helebçeyê li Îraqê ye.

Piraniya gundên Hewramanê an li quntarên çîyayan, an li serê çîyayan an jî di kûrahiya geliyan de hatine avakirin. Çemê herî girîng ê vê herêmê, çemê Sîrvan e ku di dawiya rêya xwe de dikeve bendava Derbendîxanê li başûrê Kurdistanê. Bajarên ku nifûseke mezin a Hewramîxêv lê dijîn Sine, Merîwan, Pawe, Sewalava û Helebçe ne.

- Di rûpela din de nexşeya girîng a Hewramanê heye ku bi hewldana du kesên rêzdar, Moderris Seîdî û Ferhan Sobhanî hatiye çêkirin. Di vê nexşeyê de, dora gund û bajarên ku bi Hewramî diaxivin, hatiye diyarkirin.
- Divê bê gotin ku ev nexşe ji kanala Telegramê ya (Tarîxû Hewramanî) hatiye girtin.

Hewraman bûye sê beş:

- ***Hewramana Jawero***

Ev beş beşa rojhilatê Hewramanê ye ku di navbera sê bajarên Sewalava, Sine û Kamiyaran de ye. Li wir gelek gundên navdêr hene mîna Bêsar, Paygelan, Palingan û hwd.

- ***Hewramana Lehon***

Ev beş beşa başûrê Hewramanê ye ku navenda wê bajarê Paweyê ye. Du bajarên din ên girîngên vê herêmê Nodşe û Newsû ne. Hin kes dibêjin ku bajarên Biyare û Tewêle li başûrê Kurdistanê, beşên vê Hewramanê ne.

- ***Hewraman Text***

Hewraman Text hem navê beşeke Hewramanê ye û hem jî navê bajarekî wê ye. Ev beş bakurê Hewramanê ye. Gund û bajarên wê yên girîng, Hewraman Text, Sewalava, Bilber, Dizlî û hwd in.

Taybetmendiyên pirtûkê:

Pirtûk ji pêşgotinê, neh beşên perwerdehiyê û beşa dawî pêk tê. Di beşên perwerdehiyê de min hewl da ku xalên herî girîng ên Hewramî tê de cih bikim û perwerdeyeke baş bidim.

Di yek ji beşên hînkirinê de min ji hev cuda behsa helbestên Hewramî kiriye. Di heman beşê de min behsa helbestvanan û zimanê helbesta wan jî kiriye. Helbet min helbestên ku bi zaravayê nûyê Hewramî hatine nivîsandin jî nivîsandine.

Her weha ev pirtûk ji bo kesên ku zaravayê wan ê sereke Kurmancî nîn e, lê bi Kurmancî dizanin di fêrbûna Hewramî de dikare bikêrhatî be.

Yên ku Soranî jî dizanin pir hêsanîr dikarin Hewramî fêr bibin ji ber ku rêzimana Hewramî û Soranî di gelek waran de dişibe hev. Bi giştî Hewramî zaravayek e ku dikeve navbera Soranî, Kurmancî û Zazakî.

Di hin beşan de min hevwatera zimanên din ên wekî Îngilîzî, Soranî, Kelhûrî û hwd ji bo baştir fêmkirinê bi kar anîye.

_ Gotara dawî:

Beriya nivîsandina vê pirtûkê, min biryar dabû ku ez gelek tiştan li ser Hewraman û zimanê wê binivîsim. Lê ev li derveyî sebr û wextê we ye û min got ku divê pirtûk bi kurtî li ser Hewramanê rave bike û ez ê bêtir li ser zimanê wê bixebitim û hûn fêrî Hewramî dibin da ku werin Hewraman û li vir fêrî Hewramanê bibin.

Tiştêkî din jî divê bêjim ev e ku ev pirtûk bo fêrbûna zaravayê Hewramî, ne îdiaya standard û baştirîn jêder e û nabe ku tenê çavkaniya fêrbûna we Kurmancan be. Lê wek min got, di vê pirtûkê de jî bo hînbûna herî baş a we, hewla herî baş hatiye dayîn.

Gelek Soranîyên ku bi Hewramîyan re têkildar in, de demek pir kin de, bêtir perwerdehiya akademîk fêrî Hewramî bûne û wisa ku Hewramîaxêv dikarin bi Soranî bi axivin, piraniya Soranîyên ku li dora Hewramîyan in jî dikarin bi Hewramî bi axivin an jî fam bikin.

Dibe ku hûn ê di vê pirtûkê de li ser nêr û mê û hwd hinekî tevlihev bibin. Lê zêde meraq nekin ji ber ku hûn ê bê guman bi pratîkê fêr bibin. Bi ser de jî, xala girîng ew e ku piştî bi tevahî hînbûna vê pirtûkê jî hûn ê wan kesên ku bi awayekî ku dibe ji aliyê rêzimanê ve ne rast be diaxivin û dinivîsînin, bibînin. Dîsa meraq nekin ev ferq yekem ji ber nebûna rêzimanê yekane ye, ya duduyan jî gelek kes rêzê li zayenda kes û tiştan ji ber hin sedeman nagirin bo nimûne:

1_ Li helbestan ji ber wezna helbestî ya beytê.

2_ Hînnêkirina Hewramî bi awayekî akademîk.

3_ Jî nebûna taybetmendiya nêr û mê di hin deran de. (*Li her sê devokên sereke yên Hewramî, nêr û mê heye lê di hin gundan de, nêr û mê nayê dîtin.*)

Divê hûn bizanibin ku bi yek pirtûkê, hînnêkirina zimanekî, ne pêkan e û ji bo bi tevahî hînbûna wî divê hûn gelek pirtûkan bixwînin û bi axaftvanên wî zimanî re jî bi axivin. Ji ber vê yekê, ev pirtûk bi tena serê xwe nikare bi tevahî, Hewramî bi we bide nasîn.

Her weha, ji ber ku Hewramî hêj rêzimanek sabit tune, gelek ji mijarên pirtûkê gelek ravekirinê hene. Lê ez hêvî dikim ku pirtûka bê, êdî rêzimana standard a Hewramî fêr bike.

Ji ber sê sedemên sereke min biryar da ku platforma zaravayê Hewramî di qada virtual de berdewam bike. Yekem di vê pirtûkê de hin perwerdeyên Hewramî hene û hîn jî gelek perwerde jê mane. Hewramî wek zaravayên din ên Kurdî pir fireh e. Min di vê pirtûkê de tenê beşeke pir giştî jê nivîsand.

Jî hînbûna ziman pêvajoyek berdewam û bêdawî ye. Duyem dibe ku di dema xwendina çavkaniyên perwerdehiya Hewramî de pirsên we hebin û bixwazin ji kesek bersivan bipirsin. Ji ber vê yekê hûn dikarin serdana kanala me ya Telegramê bikin û ji perwerdehiya zêdetir sûd werbigirin û pirsên xwe bipirsin. Sêyem jî di vê pirtûkê de bihîstin an guhdarîkirin tune û ev jî cîhek elektronîkî hewce dike ku ev cîh li ser înternetê tê peyda kirin.

Kanala me ya Telegramê ji bo vê pirtûkê ev e: [@bo_welat](https://t.me/@bo_welat)

Eger berz a keş û kow Hewramanî
 Ziwanîş ce keş û koyçîş berzter a
 Gulistan, sûrezeřînê ya wilê
 Ziwanîş ce wehariş řengînter a
 Zulał en awew hanew Hewramanim
 Ziwanîş ce awekêş zulałter a
 Gerîç řîrîn en hengwînû řaxekaş
 Ziwanîş ce řekerîç řîrînter a . . .

ئە گەر بەرزا کەش و کوو هه ورامانی
 زوانش جه کەش و کوێچش بهرزته را
 گوڵستان، سووره زهړینی یا ولی
 زوانش جه وه هارش په نگینته را
 زولاله ن ئاوه و هانه و هه ورامانم
 زوانش جه ئاوه کیښ زولالته را
 گه ریچ شیرینه ن هه نگوینوو شاخه کاش
 زوانش جه شه که ریچ شیرینته را

**Bilind e ger çîyayê Hewramanê
Zimanê wê ji çîya bilindtir e
Gulistan be, kûlîlk yan jî keskesor
Zimanê wê ji buhar rengîntir e
Ger zelal e ava kanî û çeman
Zimanê wê ji avê zelaltir e
Ger şêrîn e hingivê nav çîyê wê
Zimanê wê ji şeker şêrîntir e . . .**

Beş a yekem

Beşa yekem: Alfabe û dengnasî

_ Alfabeya latînî ya Hewramî ji 37 tîpan pêk tê:

Aa Bb Cc Çç Dd Đđ Ee Êê Ëë Ff Gg Hh Ĥĥ Ii Îî Jj Kk Ll Łł Mm Nn Oo Pp Qq Rr Ŗŗ Ss Şş
Tt Uu Ūû Vv Ww Xx Ẃẃ Yy Zz

- *Bilêvkirina (telefuz) tîpên ku di navbera Hewramî û Kurmancî de hevpar in, wek hev in û ne hewce ye ku em bilêvkirina wan dîsa rave bikin. Ev tîp ku wisa ne, ev in:*

Aa Bb Cc Çç Dd Ee Êê Ff Gg Hh Ĥĥ Ii Îî Jj Kk Ll Mm Nn Oo Pp Qq Rr Ss Şş Tt Uu Ūû Vv Ww Xx Ẃẃ Yy Zz

_ Niha dibe ku sê tîpên (Êê, Ĥĥ, Ẃẃ) ji bo we nû bin. Lê ev her sê tîp di Kurmancî de jî hene lêbelê di tîpên latînî yên Kurmancî de nayêne diyarkirin. Lê em di vê pirtûkê de wan ji bo fêrbûna Hewramî diyar dikin û di nivîsên xwe de dinivîsin:

- Tîpa (Ĥĥ): Tîpa wê ya aramî wek (ح, ح) hatiye nivîsandin. Ger em tîpa (Hh)yê hinekî kûr bilêv bikin dibe (Ĥĥ). Mînak: heywan, heram
- Tîpa (Ẃẃ): Tîpa wê ya aramî wek (غ, غ) hatiye nivîsandin. Ger em tîpa (Xx)yê bi awayekî rûpî bilêv bikin, ew dibe (Ẃẃ). Mînak: Xerîb
- Tîpa (Êê): Tîpa wê ya aramî wek (ع, ع) hatiye nivîsandin. Mînak:
1_ êelî(على) = elî 2_ êal (عال) = xweşik, baş 3_ êecîb = ecêb

(Elbet ji ber ku herfa (ع, ع) di alfabeya latînî de tam hevwatera wê nîn e, min neçar mam ku di vê pirtûkê de ji bo perwerdeyek baştir tîpa (ê) bi kar bînim ku belkî xelet be û dibe ku di alfabeya latînî de dengê cuda be. Lê di vê pirtûkê de wek (ع, ع) (elî, ecêb) bihesibînin.)

_ Hin tîp jî ku tenê di Hewramî de hene û di Kurmancî de tune ne, ev in:

- **Bilêvkirina (Đđ):** Hema bêje wek (ض, ضـ)ya erebî ye. Hin kes dibêjin ev tîp wek (d)ya vala ye. Tîpeke di navbera (d) û (t)yê de.
- **Bilêvkirina (Łł):** Li dema bilêvkirina wê em zimanê xwe zêdetir li banê devê xwe dixin. Ji (Ll) stûrtir e. Mîna tîpa (l) di (yıl)a tirkî û (ل) di (الله, Allah)a erebî de ye. Ev tîp li Soranî jî heye.
- **Bilêvkirina tîpa (Řř):** Bilêvkirina wê dişibe bilêvkirina (Rr), lê jê stûrtir û girantir e û tilîya ziman zêdetir bi pidûya jorîn re dikeve têkiliyê. Li Soranî jî heye.

_ Dengdêr û bêdeng:

- Ji wan 37 tîpên Hewramî 29 tîp **bêdeng** in:
Bb Cc Çç Dd Đđ Èè Ff Gg Hh Ĥĥ Jj Kk Ll Łł Mm Nn Pp Qq Rr Řř Ss Şş Tt Vv Ww Xx Ĭĭ Yy Zz
- Tîpên **bideng** ên Hewramî:
Aa, Ee, Êê, Ii, Îî, Oo, Uu, Ûû
- Hin taybetmendiya tîpa(Yy) dişibe yê tîpên bêdeng û hin taybetmendiya wê jî dişibe yê tîpên bideng. Tîpeke ku nîvvokal(nîvbideng) e.
- Baş e ku zanibin pîran bi pîranî herfa (w) wekî (v) bilêv dikir, lê îro herfa (v) pir kêmtir tê bihîstin. Bi pîranî di wateyê de hema bêje ti guhertin çênake:

Tewerge = Teverge /// Watey = Vatey

- Jî bilêvkirina (Vv) di Hewramî de dikeve navbera (Vv) û (Ww)ya Kurmancî.

_ Niha em bixwînin ku cihê van tîpan di peyvên de çawa ye. Hin tîp di destpêka peyvê de nayên û hin jî di dawiya peyvê de nayên:

- Tîpên (Đđ, Łł, Rr) di destpêka peyvê de nayên.
- Tîpên (Ii, Uu) di dawiya peyvê de nayên.

Tîp	Destpêk	Navber	Dawî
Aa	Aro	Xas	La
Bb	Bere	Baba	Ciwab
Cc	Cejne	Mecnûn	Birc
Çç	Çenî	Çemçe	Qaç
Dd	Diî	Midray	Zerd
Đđ	-----	Eđa	Azađ
Ee	Eger	Werwe	Mange
Êê	Êêraq	Seêbê	Qanêê
Êê	Ême	Pêrê	Yerê
Ff	Fire	Tifeng	Of
Gg	Goş	Dega	Werg
Hh	Hermane	Wehar	Ah
Ĥĥ	Ĥez	Weşĥaĥ	Saliĥ
Ii	Işo	Mil	-----
Îî	Îse	Hîzî	Wezî
Jj	Jîr	Mejg	Mij
Kk	Kê	Ako	Bak
Ll	Lar	Lalo	Zil
Łł	-----	Walê	Diî
Mm	Mazî	Leme	Çem
Nn	Nima	Wanay	Hamin
Oo	Oxey	Soma	Aso
Pp	Pîr	Tope	Esp
Qq	Qel	Çeqel	Saq
Rr	-----	Bira	Kar
Řř	Řo	Biřyey	Kuř
Ss	Soĥ	Dastane	Des
Şş	Şîrîn	Kuştey	Weş
Tt	Tifi	Tate	Goşt
Uu	Utû	Guĥ	-----
Ūû	Ūne	Sûr	Mû
Vv	Ver	Verve	Ev
Ww	Werm	Awî	Yaw
Xx	Xêre	Řêxe	Bax
Ẃẃ	Ẃezeb	Daĥxe	Sablaĥ
Yy	Yo	Pîya	Liway
Zz	Ziwan	Arezû	Berz

Latîni (لاتینی) : Aramî (آرامی)

Aa	:	ا ، آ
Bb	:	ب ، ب
Cc	:	ج ، ج
Çç	:	چ ، چ
Dd	:	د
Ðđ	:	ذ
Ee	:	ه ، ه ، ه
Èè	:	ع ، ع ، ع
Êê	:	ئ ، ئ ، ئ
Ff	:	ف ، ف
Gg	:	گ ، گ
Hh	:	ه ، ه ، ه
Ĥĥ	:	ح ، ح
Ii	:	-----
Îî	:	ی ، ی ، ی
Jj	:	ژ
Kk	:	ک ، ک
Ll	:	ل ، ل
Łł	:	ل ، ل
Mm	:	م ، م
Nn	:	ن ، ن
Oo	:	و ، و
Pp	:	پ ، پ
Qq	:	ق ، ق
Rr	:	ر
Řř	:	ر
Ss	:	س ، س
Şş	:	ش ، ش
Tt	:	ت ، ت
Uu	:	و ، و
Ûû	:	و ، و
Vv	:	ف ، ف /// و
Ww	:	و
Xx	:	خ ، خ
Ẃẃ	:	غ ، غ ، غ ، غ
Yy	:	ی ، ی
Zz	:	ز

• Ferhengeke kurt

_ Aa

A: 1_Belê, Erê 2_Îfadeya heyirînê

Ama û liway: Hat û çû

Amay: 1_Tu hatî 2_ Hatin(*rader*)

Ane: ew(nêr) dût: mirov û nesne

Anê: 1_Ew(mê) dût 2_Ew(pirjimar) dût

Ardey: anîn

Aro: îro

Asin(Ahen): hesin

Aso: aso

Asyawçî: aşvan

Awî/Awe: av

Ayîr(Awîr): agir

_ Bb

Ba: 1_Ew dibin 2_ Ew bibin 3_ Bila

Baêzê: hin

Bak: tirs, xof

Baî: bask

Ban: ban, serban

Bar: bar

Barûre: bînim xwarê, dabînim

Bas: behs

Bax: bax

Baz: 1_Baz 2_Bez(Bazdan)

Bê: 1_ Bê 2_ Dibû 3_ (Ew) bê 4_ Bû

Bêcge(Cige): ji bilî

Belam: lê

Beq: nêrekew

Ber: derve

Berdey: birin

Bere: derî

Berz: bilind

Bêşkê: landik, mehdik

Bîdye: binêre

Bikere(Kere): bike

Bikyane(Kîyane): bişîne

Bilmê: (em) biçin

Biparêzne(Parêzne): biparêze

Bira: bira

Bîrê: 1_ Hin 2_ Wî/Wê dibirî

Bîryey: birrin

Bisane(Sane): bikire

_ Cc

Cacim: cacim

Camolke: kasika piçûk

Car car: carinan

Ce: ji

Cejne: cejn

Cewsawe: ji hingê ve

Ciber: derve

Ciwan: ciwan

Cîyayî: cudayî

_ Çç

Çage(Çane, Ça): li wir

Çenî: 1_ Çawa 2_ Derzî 3_ Li gel

***çenî tawî bey:** çawa dikarî werî

***çenî têje ne:** derzî tûj e

***çenî kê milî:** li gel kê diçî

Çêge(Çêne, Çê): li vir

Çêfî: mêkew

Çem: çav

Çeqay: daçûn (Soranî: çeçan)

Çeqel: wawik, çeçel

Çêr: jêr

Çêş: çî

Çêw(Çîw): tişt

Çil: çeçik, çeçok

Çin: çend

Çîryey: bang kirin, gazî kirin

_ Dd

Day: dan/dayîn

***dam:** min da

***dat:** te da

***daş:** wî/wê da

***dama:** me da

***data:** we da

***daşa:** wan da

Deêba: lawir

Dega: gund

Dele: dêle

Delaqe: pencere

Dem: dev

Des: dest

Des pene(pine) kerdey: dest pê kirin

Dese: kom, deste

Deskewt: destket

Dexîl: aman

Diî: dil

Dilê(Dil): nav(hûndir)

Dîm: 1_ Min dît 2_ Ode 3_ Rû

Dima: paşê

Dîmen: dîmen, menzere

Dişeyî: strî

Dirêj: dirêj

Dîsan: dîsa

Diwardî: meqes, qeyçî

Diwê: du

Dîyay: nêrîn

Dîyey: dîtin

Diz: diz

Do: dew

Dos: dost

Dûkel: dû, dûxan

_ Ee

Ecom(lcom): wisa difikirim, bi dîtina min, texmîn dikim

Eêa: dayik

Emcar: îcar

Ew: ew(nêr): mirov

Ewe: ew(mê)

Ewê: ew(pirjimar)

Ewsa: berê

_ Êè

Êal: bedew, baş

_ Êê

Ê: dihat

Êđ: ev(nêr): mirov

Êđe: ev(mê)

Êđê: ev(pirjimar)

Ême: em

Êş: êş

_ Ff

Fařay/Wařay: guhertin

Fař û goř: alegor, serbiserî

Fire: pir, gelek, zêde

Firezan: ferzane, yê ku pir dizane

Fiředay: firrandin

Fîsar(Fîlanî) : ewk, bêvan

Fêşter: zêdetir > li helbestan tê gotin

_ Gg

Ga: ga

Gawe: çêlek

Gêrtey: girtin

Gîlko: gorr, merqed, mezar

Gîrd: hemî, gişt

Girînay: kelandin

Giryay: kelîn

Goş: guh

Gul: gul

Gul: nerind, kotî

Gulale: biçûk

Gunañ: guneh

_ Hh

Hane: kanî

Helay: hîna, hela, hêj

Henar: hinar

Henase: henase, nefes

Hermanker: karker

Hersî(Helsî): hêsir

Hesare: stêrk

Hewal(Xeber): nûçe

Hewar: zozan, havîngeh

Hewr: ewr

Hewrêşe(Horêşe): kevroşk

Hîzî(Hêzî): doh

_ Hñ

Hesare: hesar

_ Jj

Jenî: jin

Jerejî: kew

Jinyey: bihîstin

Jîr: zekî, zîrek, jîr

Jîway: jîyan

_ Kk

Kabra: zilam

Kam: kîjan

Karêz: solîn

Kawiř: kavirr

Kebab: kebab

Keleşêr: dîk

Kerge: mirîşk

Keř: kerr

Key: kengê

Kuçê: kêmek {giranî dikeve ser ku}

_ Ll

La: cem, kêlek

Lalo: xal (birayê dayikê)

Lał: lal

Lar: xulp

Leterê: teşî

_ Mm

Manyay: westîn

Mamo: ap

Mange: heyv

Mama: dapîr

Masawî: masî

Mejg: mêjî

Mejge: mêjîyê gûzê

Metîye: met, xaltî

Meẋz: mêjî

Midray: rawestan

Mil: gerdên, ustî

Milega: gêdûk

Mişom(Mişo/Işo): divê, lazim e

Mijû: dîrok, mêjû

Mû: mû

_ Nn

Namê: nav

Nanpeç: nanpêj

Nemam: şiv, şitil

Nezan: nezan

Nima: nimêj

Nimazo: nahêle

Nirknay: nalîn

Niwîstey: nivîsandin

Nîştey: di cihekî de mayîn

Nîşteyre: rûniştin

_ Oo

Oqre gêrtey: aram girtin

Oẋir bo: oxir be

_ Pp

Pała: sol

Pejare: xem, kul, keder, keser

Perê: pêr

Peşêw: mat mayî, perîşan

Pêse: wilo, wek, wisa

Pijgîya: 1_ Belav 2_ Ew belav dibin 3_Belav bû

Pîr: pîr

Pîya: mêr

Pos: post

_ Qq

Qaç: ling

_ Řř

Řêk: rêk

Řas: rast

Řasî: rastî

Řenga: renga, belkî

Řêxe(Řîşe): kok

Řewt: rewşa meşînê

Řêzay: rizîn

Řiwase: rovî

Řîwawî: ribês

Řo: roj

Řocyar: tav, xor

Řoçê: rojî

_ Ss

Saq: sax

Sara: 1_ Çol, Sehra 2_ Navê keçikê

Sařêş: derman kirina/bûna birînê

Satê: demek

Sere: ser

Serberz: serbilind

Serinc day: baldar bûn

Sermes: sermest

Serweş: serxweş

Seway: sibê

Sewz: kesk

Sext(Sexlet): sext, dijar

Seye(Sêber): sî (mîna sîya darê)

Soçnay: şewitandin

Soçyay: şewitîn

Sûr: sor

_ Şş

Şanay: avêtin

Şar: bajar

Şareza: jêhatî

Şewe: şev

Şêt: dîn

Şime: hûn

Şonî: şûn

_ Tt

Tafî(Tavî): tavge, avrêj

Tař: tehl

Tam: çêj, tam

Tanê: îma, tehn

Taqîkerdeywe: cerribandin, taqîkirin

Tase: coş, meraq

Taşay: ferîşandin, teraşkirin

Tate: bav

Taway: karîn

Tem/Mij: mij

Tema: çikûsî

***be tema(temakar):** li bend

Tersay: tirsîn

Tewenî/Tewene: kevir

Teverge: zîpik, teyrok

Têkel: têkil, tevlihev

Tifi: tû

Tin/Tiñ: tund

Toryay: xeyîdîn

Toze: toz

Tûk: mû

_ Uu

Umêd/Omêd: hêvî

Utû: ûte

_ Ûû

Ûne: ew(n) dûr: mirov

Ûnê: 1_ Ew(m) dûr 2_ Ew(pj) dûr

_ Vv

Va: ba

Varan: baran

Vatey/Vatew velîna: gotina pêşîyan

Vatey: gotin

_ Ww

Wa: ba

Wamî: behîv

Wanay(Wenay): xwendin

War: xwar

Waran: baran

Waray: barîn

Wastey: xwestin

Wawey: dîsa

Waz ardey (Waz çene ardey):

dev berdan (dev jê berdan)

Wefrawe/Werwawe: berfav(ava berfê)

Wehar: buhar

Welîna: pêşîyan

Welîne: dîrikçe

Werbîyey: berbûn

Werdes: berdest

Were(Biwere): bixwe

Weretaw: tav

Werg: gur

Werm: xew

Werwe: berf

Werz(Fest): demsal

Wesê: bes

Weş: xweş

Weşle: xweşik

Wêrega: êvar

Wile: gul

Wîle: kun

Wird: hûr û mûr

Wistey: xistin

Wîr: bîr

Wîyerdey: borîn, buhurîn

Wîyernay: borandin

_ Xx

Xas: baş

Xelk: xelk

Xem: xem

Xemîn/Xemgîn: xemgîn

Xêre: xêr

Xirtolane(Xirtole): girrovera biçûk

Xiwa: 1_Xweda 2_Kenîya

Xiway: 1_Kenîn 2_ Tu kenîyay

Xonay: kenandin

Xuđa: Xweda

_ Xx

Xar: şikeft, xar

Xaret: talan

Xeyr: ji bilî

Xerez: qîn

_ Yy

Ya(Yam/ Yan): an

Yagê: cih

Yane: mal, xanî

Yaray: wêrîn

Yaway: 1_Gihîştin 2_Tu gihîştî

Yerê: sê

Yo: yek

_ Zz

Zana: zana, alim

Zanay: zanîn

Zam: birîn

Zexm: birîn

Zêl: dil

Ziwan: ziman

Perskerdêy

_ Siîam.

+ Siîam pey to.

_ To çenîn nî? Weş nî?

+ Erê weş na hemdû xudaywe. To çenîn nî? Weş nî?

_ Minîç weş na. Siîamet bî. Xeberatû eđa û tateyt? Weşê nê? Saqê nê?

+ Weş bî yexiwa. Siîametê nê. Siîamit yawna.

_ Her weşê ba. Bira û walekê çêş kera?

+ Wela hîç. Adêç îne yane, nîştênêre.

_ Amana waçû gahes êşew beymê pey yaneyta.

+ Xêr beydê serû çemî.

_ Îtir ba min bilû. Siîamû eđa û tateyt yawne. Xudâ hafêz.

+ Xêr amay serû çema. Xiwa(Xudâ) hafêzit bo.

- Her du axêverên jorîn nêr in û hemû lêker û rengdêr jî an nêr in an jî pirjimar in.

پەرس کەردەى

_ سَلام

+ سَلام پەى تۆ.

_ تۆ چەننننن؟ وەشنن؟

+ ئەرى وەشنا حەمدوو خوايوە. تۆ چەننننن؟ وەشنن؟

_ منننچ وەشنا. سَلامەت بى. خەبەر اتوو ئەدا و تاتەيت؟ وەشننن؟ ساقننن؟

+ وەش بى يەخوا. سَلامەتننن. سَلامت ياونا.

_ هەر وەشنن با. برا و والە کىت چىش کەرا؟

+ وەلا حىچ. ئادىچ ئىننن يانە، نىشتىنننرە.

_ ئامانا واچوو گاهەس ئىشەو بەىمى پەى يانەيتا.

+ خىر بەىدى سەروو چەمى.

_ ئىتر با من بلوو. سَلاموو ئەدا و تاتەيت ياونە. خودا حافىز.

+ خىر ئامای سەروو چەما. خودا حافىزت بۆ.

Pirskirin

_ Silav.

+ Silav bo te.

_ Tu çawa yî? Baş î?

+ Erê baş im hemdê xwedê. Tu çawa yî? Baş î?

_ Ez jî baş im. Silamet bî. Rewşa dê û bavê te çawa ye? Baş in? Sax in?

+ Tu xweş bî (înşAllah). Silamet in. Silavên wan hene.

_ Her baş bin. Bira û xwişka te çi dikin?

+ Welle ti tişt. Ew jî li malê ne, rûniştine.

_ Ez hatime bêjim belkî îşev (em) bên mala we.

+ Bi xêr werin bi ser çav.

_ Êdî bila ez herim. Silava dê û bavê xwe bike. Bi xatirê te.

+ Bi xêr hatî ser çavan. Bi xatirê te.

Weŭ to,
kê bêna min?
Dilê zimsanêwî bê dimayne,
yagêwey nejnasyê, peştew mijîne,
keprêwey çotkiryê û dirextêwî merde paîşne.
Ce jîway dûr.
Ta wextê
ke to
yaway wa ...

وه‌ئوو تۆ،
کى بىنا من؟
دلى زمسانىوى بى دماينه،
ياگىوهى نه ژناسى، په شته و مژينه،
که پرىوهى چۆل کرى و دره ختئوى مه‌رډه پالشنه.
جه ژيوای دوور.
تا وه‌ختى
که تۆ
ياواى وا ...

Berî te,

kî bûm ez?

Di nav zivistaneke bê dawî de,

cihekî nenas, li pişt mijê,

koşeke berdayî û dareke mirî li kêleka wê.

Ji jîyanê dûr.

Heya demek

ku tu

gihîştî wir ...

Beşüa duyem

Beşa duyem: Peyv

_ Ji deng yan jî koma dengan ku wek parçeyên bingehînên zimanî hatine ber hev û xwedî mana ne re dibêjin “peyv” yan jî bêje. Em dikarin grûpên peyvên wisa rêz bikin:

1_ Rader û lêker 2_ Cînav 3_ Navdêr 4_ Rengdêr 5_ Hoker 6_ Ginahek 7_ Partîkel 8_ Daçek
9_ Hejmarnav 10_ Baneşan û hwd

_ Di Hewramî de eynî wek Kurmancî ji aliyê avaniyê ve peyv li ser du grûpan parve dibin:

1_ Peyvên xwerû

2_ Peyvên hevedudanî

- ♦ Peyvên xwerû: Ew in ku pêşqertaf yan paşqertaf negirtine û bi peyveka din ve nebestîyane. Çend nimûne:

Hewramî	Kurmancî
pîya (n)	mêr
diðan (n)	diran
yane (n)	xanî
jenî (m)	jin
kerge (m)	mirîşk
walê (m)	xuşk

- ♦ Peyvên hevedudanî: Ew in ku pêşqertaf yan paşqertaf girtine yan jî bi peyveka din ve bestîyane û formeka nû çêkire. Çend nimûne:

Hewramî	Kurmancî
goranîwaç, -e	stranbêj
weşbext, -e	bextyar

_ Taybetmendiya peyvên Hewramî:

Di Hewramî de hemîya peyvên yan yekjimar in yan jî pirjimar in. Peyvên yekjimar jî di nav xwe de li ser *mêkîti û nêrîti* parve dibin. Peyvên Kurmancî jî wisa ne lê ferqa Hewramî û Kurmancî ew e ku di Hewramî de peyv di halê xwerû de jî taybetmendiya xwe nîşan dide, lewma di nivîsînê de ji bo peyvên *pirjimar* îşareta (pj), ji bo peyvên *nêr* îşareta (n) û ji bo peyvên *mê* jî îşareta (m) tê danîn da ku taybetiya peyvê di halê xwerû yê peyvê de rast were zanîn. Di Hewramî de zanîna taybetiya peyvê gelek girîng e. Ji ber ku taybetiya peyvê hem tesîrê li ser zayenda bireserê hem jî li ser kişandina lêkerê dike.

Em peyva “ **guł** ” wek nimûne bigirin û bala xwe bidin ser taybetîya halê xwerû yê peyvê. (Elbet guł di Hewramî de nêr e û di Kurmancî de jî mê ye lê ji bo hîn kirineke baş em wê hem di Hewramî de û hem jî di Kurmancî de, nêr û mê dihesibînin):

Heke yekjimar be û nêr be, dibêjin “ **guł (n)** ”.

Heke yekjimar be û mê be, dibêjin “ **gułe (m)** ”. (*Giranî dikeve ser kêteya pêşîn*)

Heke pirjimar be, dibêjin “ **gułê (pj)** ”. (*Giranî dikeve ser kêteya pêşîn*) > Di Hewramî de wek Kurmancî pirjimara nêr an pirjimara mê tune û tenê yek cure pirjimar heye.

Ango:

Hewramî	Kurmancî
guł (n)	gul
gułe (m)	gul
gułê (pj)	gul

Herwekî ku dixuye, di Kurmancî de her sê halên taybetîya navdêrê di halê xwerû de tenê bi awayekî ne. Lê di Hewramî de taybetîya her sê halên navdêrê, anga *nêrîtî*, *mêkîtî* û *pirjimariya* peyvê di halê xwerû de diyar e. Ev taybetî hema jî bo hemî peyvan wisa ye.

Em niha peyvê di ravekê de bi kar bînin. { Cînavê kesane yê veqetandî }

Hewramî	Kurmancî
gułû min (n)	gulê min
gułew min (m)	gula min
gułêw min (pj)	gulên min

Em îcar rengdêra (*sûr: sor*) ku bi tîpa bêdenq diqede bidin ber navdêra “guł” û nîşan bidin ku taybetîya navdêrê çawa şekil dide rengdêra xwe:

Hewramî	Kurmancî
gułî sûr (n)	gulê sor
<u>gułey</u> <u>sûre</u> (m)	gula sor
<u>gułê</u> <u>sûrê</u> (pj)	gulên sor

➤ Pêvek û wesfî bi hev re:

Hewramî	Kurmancî
gułî sûrû min (n)	gulê min ê sor
gułey sûrew min (m)	gula min a sor
gułê sûrêw min (pj)	gulên min ên sor

Em îcar rengdêra (çerme: *spî*) ku bi tîpa bideng diqede bidin ber navdêra “gul” û nîşan bidin ku taybetîya navdêrê çawa şekil dide rengdêra xwe:

Hewramî	Kurmancî
gulî çerme (n)	gulê spî
<u>gul</u> ey çermê (m)	gula spî
<u>gulê</u> çermê (pj)	gulên spî

➤ ...

Hewramî	Kurmancî
gulî çermew min (n)	gulê min ê spî
<u>gul</u> ey çermêw min (m)	gula min a spî
<u>gulê</u> çermêw min (pj)	gulên min ên spî

Mîna ku dixuye îcar rengdêr her sê halên navdêrê, angê halê nêr, mê û pirjimar ê peyvê nîşan dide. Lê di Kurmancî de rengdêr tim wek xwe angê di halê xwerû de maye, qertaf negirtiye. Di halê xwerû de ji alîyê girtina qertafa ravekê ve ferqa Hewramî û Kurmancî ev e.

Di halê tewandî de: Biwe(m) = Bêhn

Hewramî	Kurmancî
biwew gulî. (n)	bêhna gul/gulî
biwew <u>gulê</u> . (m)	bêhna <u>gulê</u>
biwew <u>gula</u> . (pj)	bêhna <u>gulan/gula</u>

➤ Di Hewramî de rengdêr jî tê tewandin:

Hewramî	Kurmancî
gulî sûr >>> biwew gulî sûrî (n)	bêhna gulê sor
<u>gul</u> ey sûre >>> biwew <u>gul</u> ey sûrê (m)	bêhna gula sor
<u>gulê</u> sûrê >>> biwew <u>gule</u> sûra (pj)	bêhna gulên sor

Lê niha em lêkerê deynin dawîya navdêr û rengdêrê (raveber û raveker) û hevoka xwe saz bikin û bibin ku di Hewramî de taybetîya navdêrê yan jî rengdêrê çawa tesîrê li kişandina lêkerê dike. Nimûne:

Hewramî	Kurmancî
gulî sûr wit (n)	gulê sor raket/raza
<u>gul</u> ey <u>sûre</u> <u>wite</u> (m)	gula sor raket/raza
<u>gulê</u> <u>sûrê</u> <u>witê</u> (pj)	gulên sor raketin/razan

Herwekî ku we dît, di Hewramî de zayend û hejmara navdêrê tesîrê li kişandina lêkerê kiriye. Lê di Kurmancî de tenê navdêra pirjimar tesîrê li kişandina lêkerê kiriye.

Mînakeke din: Amay = Hatin

- Giranî li ser kîte ya (ma/mê)ya lêkerê:

Hewramî	Kurmancî
min(n) <u>am</u> ana	ez hatime
min(m) <u>amê</u> na	ez hatime
to(n) <u>am</u> anî	tu hatîyî
to(m) <u>amên</u> î	tu hatîyî
ađ(n) <u>am</u> an	ew hatiye
ađe(m) <u>amê</u> ne	ew hatiye
ême <u>amên</u> mê	em hatine
şime <u>amê</u> ndê	hûn hatine
ađê <u>amên</u> ê	ew hatine

Ji lêkera gerguhêz di halê xwerû yê peyvê de nimûne:

Hewramî	Kurmancî
To guî sûrit berđ (biresera nêr)	Te gulê sor bir.
To guley sûret berđe (biresera mê)	Te gula sor bir.
To gulê sûrê berdê (biresera pirjimar)	Te gulên sor birin.

➤ ...

Hewramî	Kurmancî
ce guî hêz kerû.	Ji gul/gulî hez dikim.
ce gulê hêz kerû.	Ji gulê hez dikim.
ce gula hêz kerû.	Ji gulan/gula hez dikim.
ce guî sûrî hêz kerû.	Ji gulê sor hez dikim.
ce guley sûrê hêz kerû.	Ji gula sor hez dikim.
ce gule sûra hêz kerû.	Ji gulên sor hez dikim.

♦ Tewardina peyvane:

1_ Navdêrên nêr li gorî dem û cihê xuyabûna xwe di hevokê de, yan naguherin yan jî tîpa (î / y) li dawiya wan tê zêdekirin:

- (î) piştî bêdeng.
- (y) piştî bidengên { a, e, o, û }.
- Bi piranî ti tişt li navdêra nêr a qedandî bi { î / y } nayê zêdekirin, lê heke jî were, ew ê { î } bê lê zêdekirin.

- Di Hewramî de rewşa halê tewandî kêmek cuda ye. Bi vî rengî ku heke navdêrên nêr di ravekan de bin an jî piştî navdêrên wek daçekê werin, ew ê di halê xwe yê tewandî de bin. Lê heke bireser bin dikarin bi îşareta bireseriyê (î / y) yan jî hin car bê îşareta bireseriyê bên. Her çend ku ger di halê xwe yê tewandî de bin çêtir e. Her weha vê xala girîng bizanibin ku dema ku navdêrên nêr di halê xwe yê tewandî de bin giranî nakeve li ser tu beşekî peyvê û peyv bêyî giranî tê bilêvkirin.

Em bala xwe bidin ser halên navdêran di hevokên Hewramî de:

- Navdêra nêr di cihê kirdeya dema niha de: Di halê xwe yê xwerû de ye.

Hewramî

Ako nan/nanî wero.

Luqman mê.

Ađ ađî bero/wîno.

Reza milo.

Kurmancî

Ako nan/nên/nanî dixwe. > nan = nêr

Luqman tê.

Ew(n) wî dibe/dibîne.

Reza diçe.

- Navdêra nêr li cihê bireserê de: Di warê rêzimanê de çêtir e ku di halê xwe yê tewandî de be lê hûn ê bibînin ku hin car ne wisa ye. (Bi piranî di halê xwe yê tewandî de ye.)

Hewramî

Min Akoy marû.

To Luqmanî wîni.

To Rezayî arđ.

Min karîm/karim kerđ.

Kurmancî

Ez Ako tînim.

Tu Luqman dibîni.

Te Reza anî.

Min kar(n) kir.

- Navdêra nêr li cihê kirdeya lêkera gerguhêza dema borî de dema ku bireser nediya e: Di halê xwe yê tewandî de ye.

Hewramî

Akoy kerđ.

Luqmanî wat.

Adî arđ.

Wermî kor(n)/kore(m) kerđa.

Kurmancî

Ako kir.

Luqman got.

Wî anî. > bireser nêr e

Xewê kor(n/m) kirim. > Werm(n) = Xew(m)

- Navdêra nêr di cihê kirdeya lêkera gerguhêza dema borî de, dema ku bireser diya e: Di halê xwe yê xwerû de ye.

Hewramî

Ako karîş/kariş kerđ.

Luqman qisêş kerde.

Ad nanîş/nanîş arđ.

Zanko wezîş ardê.

Kurmancî

Ako kar kir > kar: nêr

Luqman qise kir > qisê: mê

Wî nan anî > nan: nêr

Zanko goz anîn > wezî : pirjimar

- Wisa ku dixuye du tîpên (î / y) dikarin hem nîşana bireser a nêr bin hem jî nîşana kirdeya(faila) nêr bin wek Kurmancî:

Adî kerđ = Wî kir > wî kirde ye

Min adî wînu = Ez wî dibînim > wî bireser e

- Lê heke hin navdêrên din wek daçek û hwd berî navdêrên nêr werin, navdêrên nêr di halê xwe yê tewandî de ne.

Hewramî

desû adî

lûtew Luqmanî

ce Mihemedî

pey tatey

Kurmancî

destê wî

pozê Luqmên

ji Mihemed

ji bo bav

- ♦ Dema ku navdêra nêr di halê xwe yê tewandî de be, giranî li ser tu kîteyeka peyvê nîn e û peyv bêyî giranî tê gotin.

2_ Navdêrên mê li gorî dem û cihê xuyabûna xwe di hevokê de tîpa (a /e /ê /yê) li dawiya wan tê zêdekirin.

- (e): Hin peyvên mê hene ku di zimanên din de bi tîpeke bêdeng diqedin wek Rojîn. Di Hewramî de peyvên wisa, nîşana (e) digirin > Rôjîne (*Giranî li ser kêteya { jî }*).
- (ê): Dema ku peyvên mê yên qedandî bi (a, e, ê, î) werin tewandin tîpa (ê) li şûna dengdêra li dawiya wan tê.
- (yê): Hin car dema peyvên mê yên qedandî bi (a) werin tewandin tîpa (yê) piştî (a)ya li dawiya wan tê.

Heke navdêrên mê di ravekan de bin an jî paş navdêrên din wek daçekê werin, ew ê di halê xwe yê tewandî de bin. Lê heke bireser bin dikarin bi îşareta bireseriyê (ê / yê) yan jî hin car bê îşareta bireseriyê bên.

♦ Navdêrên mê:

- Navdêra mê di cihê kirdeya dema niha de: Di halê xwe yê xwerû de ye.

Hewramî

Eđa nan/nanî peço.

Dilbere mê.

Xecê ama.

Winî sûre ne.

Kurmancî

Dayik nan/nên dipêje.

Dilber tê.

Xecê hat.

Xwîn sor e.

- Navdêra mê li cihê bireserê de: Ev jî di warê rêzimanê de çêtir e ku di halê xwe yê tewandî de be lê hûn ê bibînin ku hin car ne wisa ye.

Hewramî

To eđê winî.

Ême Dilberema dîye.

Şime Xecêta berde.

Ađ winî/winê wero.

Kurmancî

Tu dayikê dibînî.

Me Dilber dît.

We Xecê bir.

Ew xwînê dixwe.

- Navdêra mê li cihê kirdeya lêkera gerguhêza dema borî de dema ku bireser nediya e: Di halê xwe yê tewandî de ye.

Hewramî

Eđê ward.

Xecê arde.

Rojînê berde.

Kurmancî

Dayikê xwar > bireser nêr e

Xecê anî > bireser mê ye

Rojînê birin > bireser pirjimar e

- Navdêra mê li cihê kirdeya lêkera gerguhêza dema borî de dema ku bireser diyar e: Di halê xwe yê xwerû de ye.

Hewramî

Eđa Nasikêş arde.

Dilbere naniş/nanîş arđ.

Xecê qisê kerê.

Winî qisê nekerê.

Kurmancî

Dayikê Nazik anî. > Nasike: mê

Dilberê nan anî.

Xecê qise dikir.

Xwînê qise nedikir.

- Dîsa jî heke hin navdêrên din wek daçek û hwd berî navdêrên mê werin, navdêrên mê di halê xwe yê tewandî de ne:

Hewramî

desû adê

lûtew Dilberê

ce Kejelê

pey dinyê/dinyayê

Kurmancî

destê wê

pozê Dilberê

ji Kejelê

ji bo dinê/dinyayê

- ♦ Dema ku navdêra mê di halê xwe yê tewandî de be, cihê giranî di peyvê de sabît nîn e:

>>> *desû edê / ce Kejelê / dengû kinaçê / biraw jenê*

3_ Navdêrên pirjimar li gorî dem û cihê xuyabûna xwe di hevokê de tîpa (ê/ yê/ iwê/ î/ iwa/ a/ ya) li dawiya wan tê zêdekirin. Hemû qaîdeyên navborî ji bo nêr û mê, ji bo pirjimariyê jî têne diyarkirin.

♦ Navdêrên pirjimar:

- Navdêra pirjimar li cihê kirdeya dema niha de: Di halê xwe yê xwerû de ne.

Hewramî

adê mila

pîyayê mênê

kitêbê çêş maça

Kurmancî

ew diçin

mêr tîn

pirtûk çi dibêjin

- Navdêra pirjimar li cihê bireserê de: Di warê rêzimanê de çêtir e ku di halê xwe yê tewandî de bin da ku carinan di gel halê mê yê tewandî neyê tevlihevkirin lê hûn ê bibînin ku hin car ne wisa ye.

Hewramî

ađê ađîşa bera

pîyaya biwîne

kitêba/kitêbê biwane

Kurmancî

ew wan dibin > ađê: ew (pj)

mêran bibîne

pirtûkan bixwîne

- Navdêra pirjimar li cihê kirdeya lêkera gerguhêza dema borî de dema ku bireser nediya e: Di halê xwe yê tewandî de ne.

Hewramî

ađîşa berde

pîyaya wat

kitêba niwîstê

Kurmancî

wan bir > bireser mê ye

mêran got

pirtûkan nivîsandin > bireser pirjimar e

- Navdêra pirjimar li cihê kirdeya lêkera gerguhêza dema borî de dema ku bireser diyar e: Di halê xwe yê xwerû de ne.

Hewramî

ađê Nasikêşa arde.

pîyayê nanşa/nanîşa arđ.

kitêbê watêşa niwîstê.

Kurmancî

wan Nazik anî.

mêran nan anî.

pirtûkan peyv nivîsandin.

- Heke hin navdêrên din wek daçek û hwd berî navdêrên pirjimar werin, navdêrên pirjimar di halê xwe yê tewandî de ne:

Hewramî

yanew ađîşa

gicîw pîyaya

deqû kitêba

Kurmancî

mala wan

kirasê mêran

nivîsa pirtûkan

_ Peyvên nêr

#!!!# Berî dîtina mînakan, bila hin tiştan werin gotin:

1_ Di Hewramî de hemû peyvên mê bi dengdêrên (a, e, ê, î) ve diqedin.

2_ Peyveke nêr ku yekjimar be û bi tîpa (ê) biqede tune. Elbet hin peyv hene ku bi (ê) diqedin û em wan ji bo nêr, mê û pirjimar bi kar tînin wek:

(řoçê): bi rojî, rojî //// (kê): kî / kê

- **Min(n/m) řoçê na: Ez bi rojî me**
- **Şime řoçê ndê: Hûn bi rojî ne**
- **Ađ kê n?: Ew(n) kî ye?**
- **Ađe dosew kê ne?: Ew(m) yara kê ye?**

3_ Peyveke Hewramî ku bi tîpên (u) an (i) biqede tune (Tenê peyva ku bi (i) biqede (çi) ye ku ew jî carinan wekî çe tê nivîsandin.) > Mînak: Îne çi hêa? = Ev çi hal e?

- **Qayde yan formuleka sabît ku zayenda peyvan bi awayekî qethî diyar bike tune. Lê di Hewramî de çiqaş peyvên ku bi herfa bêdeng diqedin, hemî nêr in.**

Hewramî Kurmancî

ayîr/awîr (n)	agir (n)
beq (n)	nêrekew (n)
çem (n)	çav (n)
dem (n)	dev (n)
deng (n)	deng (n)
des (n)	dest (n)
dîl (n)	dil (n)
gîyan (n)	can/giyan (n)
goş (n)	guh (n)
guł (n)	gul (m)
hêa (n)	hal (n)
keş (n)	çîya (n)
kitêb (n)	pirtûk (m)
kuř (n)	kur (n)
mas (n)	mast (n)
şar (n)	bajar (n)
tam (n)	tam (m)

Di Hewramî de dibe ku peyv bi herfa bideng biqedin lê dîsa jî nêr bin. Di vê rewşê de tim giranî dikeve ser kîte ya dawîn }:

Hewramî Kurmancî

<u>baba</u> (n)	bapîr (n)
<u>bała</u> (n)	bejn (m)
<u>bera</u> (n)	derî (n)
<u>bername</u> (n)	bername (m)
<u>bira</u> (n)	bira (n)
<u>gicî</u> (n)	kiras (n)
<u>hane</u> (n)	kanî (m)
<u>hewa</u> (n)	hewa (n)
<u>jîway</u> (n)	jîn / jîyan (m)
<u>ko</u> (n)	çîya (n)
<u>lalo</u> (n)	xal (n): birayê dêya mirovî
<u>mamo</u> (n)	mam/ap (n)
<u>neqşe</u> (n)	nexşe (m)
<u>ro</u> (n)	roj (m)
<u>roxane</u> (n)	çem (n)
<u>tate</u> (n)	bav (n) > Di hin navçeyan de li şûna (tate), ‘ <i>babe</i> ’ jî dibêjin.
<u>va/wa</u> (n)	ba (n)
<u>wane</u> (n)	ders (m)
<u>wardey</u> (n)	xwarin (m)
<u>wêrega</u> (n)	êvar (m)
<u>yane</u> (n)	xanî (n) / mal (m)
<u>zerîfî</u> (n)	bedewî (m)

- Hevwateya (ê / a)ya Kurmancî di Hewramî de, di pêkhatayên pêvekê de, (û / w) ne ku (û) piştî tîpên qedandî bi bêdeng û (w) jî piştî tîpên qedandî bi bideng tê.

Jî paş tîpên qedandî bi (w) jî (u) tê.

Bikaranîna (û / w) berevajî Kurmancî û Zazakî, ne girêdayî zayend û hejmara peyvê ye.

Ango em (û / w) ji bo nêr, mê û pirjimar bikar tînin.

Her weha, hevwateya (ê / a)ya Kurmancî di Hewramî de, di pêkhatayên wesfî de (î / y) ne ku (î) piştî tîpên qedandî bi bêdeng û (y) jî piştî tîpên qedandî bi bideng tê.

(î / y) jî, ne girêdayî zayend û hejmara peyvê ne:

- Pêkhateya pêvekê:

Hewramî

des (n): desû min
 kuř (n): kuřû adî /adê /adîşa
 şar (n): şarû ême
 weretaw (n): weretawû asmanî

Kurmancî

dest (n): destê min
 kur (n): kurê wî /wê /wan
 bajar (n): bajarê me
 tav (m): tava ezmên

- Pêkhateya wesfî:

Hewramî

des (n): desî dirêj
 kuř (n): kuřî balaberz
 şar (n): şarî gewre
 weretaw (n): weretawî germ

Kurmancî

dest (n): destê dirêj
 kur (n): kurê bejnîlind
 bajar (n): bajarê mezin
 tav (m): tava germ

➤ Dema ku navdêreke nêr a qedandî bi tîpên bideng ên { a, e, î, o, û, y } paşqertafa pêvekê bigire, tîpa (w) li dawîya navdêrê tê zêdekirin:

- Pêkhateya pêvekê:

Hewramî

bira (n): biraw min
 tate (n): tatew to
 gicî (n): gicîw kê
 ko (n): kow Sîpanî
 şû (n): şûw metîyê
 jîway (n): jîwayw min

Kurmancî

bira (n): birayê min
 bav (n): bavê te
 kiras (n): kirasê kê
 çîya (n): çîyayê Sîpanê
 mêr (n): mêrê xaltiyê/metê
 jîn (m): jîna min

➤ Jî dema ku navdêreke nêr a qedandî bi tîpên bideng ên { a, e, î, o, û } paşqertafa wesfî bigire, tîpa (y) li dawîya navdêrê tê zêdekirin û rengdêr dê wekî forma xwe ya eslî bimîne. { Me berê gotibû ku di Hewramî de tu peyv(nêr/mê/pirjimar) bi tîpên (i , u) naqedin }

Hewramî

biray weşewîs
 tatey gewre
 gicîy kewe
 koy berz
 şûy nazdar(nazar)

Kurmancî

birayê delal
 bavê mezin
 kirasê şîn
 çîyayê bilind
 mêrê nazdar

- Rewşa tîpên yekjimarên ku bi tîpên bêdeng û tîpên bidengên { a, e, ê, î, o, û } diqedin hêsan û diyar e. Lê divê em hinekî din behsa peyvên nêr ên ku bi (y) û (î) diqedin bikin:

♦ **Tîpa(î):**

1_ Dema navdêreke nêr a qedandî bi tîpa (î) were wesfkirin, em dikarin bi awayekî din jî binivîsin û bibêjin. Bi vî awayî ku em tîpa (y) li dawiya wê zêde nekin, lê giranî dikeve ser tîpa (î)ya li dawiya peyvê. Wek:

gicî(n): kiras > 1_ gicîy sûr 2_ gicî sûr: kirasê sor

gonî(n): telîs > 1_ gonîy çerme 2_ gonî çerme: telîsê spî

2_ Dema navdêreke nêr a qedandî bi tîpa (î) paşqertafa pêvekê bigire, dikare bi awayekî din jî were nivîsandin û gotin. Bi vî awayî ku em tîpa (w) li dawiya wê zêde nekin, lê giranî dikeve ser tîpa (î)ya li dawiya peyvê. Wek:

gicî: kiras > 1_ gicîw min 2_ gicî min: kirasê min

gonî: telîs > 1_ gonîw to 2_ gonî to: telîsê te

♦ **Tîpa(y):**

1_ Dema navdêreke nêr a qedandî bi tîpa (y) were wesfkirin, em dikarin bi awayekî din jî binivîsin û bibêjin. Bi vî awayî ku em tîpa (î) li dawiya wê zêde nekin, lê giranî dikeve ser tîpa (y)ya li dawiya peyvê. Wek:

jîway(n): jîyan > 1_ jîwayî weş 2_ jîway weş: jîyana xweş

2_ Dema navdêreke nêr a qedandî bi tîpa (y) paşqertafa pêvekê bigire, dişê bi sê awayan were nivîsandin û gotin. Wek:

jîway: jîyan > 1_ jîwayw min 2_ jîwaw min 3_ jîway min: jîyana min

- **Jî lazim e ku berî dîtina mînakan du xalên girîng dîsa werin gotin ku me berê dîtibûn:**

1_ Ger navdêreke nêr paşê navdêrekê were yanî di ravekên navdêran de be, tîpa (î / y) li dawiya navdêra nêr ku paşê navdêrekê hatiye, tê zêdekirin:

Ango peyv di halê xwe yê tewandî de ye

- des + û + Zanko = desû Zankoy: destê Zanko
- eđa + w + Zanko + Zanyar = eđaw Zanko û Zanyarî: dêya Zanko û Zanyar
- tam + û + wardey = tamû wardey/wardeyî: tama xwarinê
- leme (m) + w + ađ = lemew ađî: zikê wî

2_ Ger navdêreke mê paşê navdêreke (nêr/mê/pirjimar) were, tîpa (ê / yê) li dawîya navdêra mê ku paşê navdêreke (nêr/mê/pirjimar) hatiye, tê zêdekirin:

Ango peyv di halê xwe yê tewandî de ye

- des + û + eđa = desû eďê: destê dayikê
- eđa + w + Kejele = eďaw Kejelê: dêya Kejelê
- tam + û + kêlanê = tamû kêlanê: tama kelaneyê (kelane xwarineke kurdî ye)
- şû + w + jenî = şûw jenê: şûyê jinê

➤ Hin car Hewramî piştî peyvên mê yên qedandî bi (a) , (y) bi kar tînin, wek (nima: nimê) û (řa: rê) ku (y) li dawîya wan tê zêdekirin:

> dimaw nimay : piştî nimêjê

> serû řay : serê rêyê

- ♦ Hema bêje hemiya taybetmendiyên jorîn di Kurmancî de jî hene û bi awayekî balkêş eynî ne. Ango di her du zaravayan de nîşana tewandîya nêr (î) ye, nîşana tewandîya mê(ê/yê) ye û nîşana tewandîya pirjimar (a) ye. Wek:

- Di nava zimanî de: Dilû ziwanîne
- Çavê Bêrîvanê: Çemû Bêrîvanê (Elbet di Hewramî de giranî dikeve ser kîte ya (va) û di Kurmancî de dikeve ser kîte ya (nê))
- Wilatê kurda: Welatû kurda

_Mînak:

** aď: ew(n) / aďe: ew(m) / aďê: ew(pj)

** aďî: wî / aďê: wê / aďîşa: wan

➤ Pêkhateya pêvekê:

Hewramî

ayîr/awîr (n): ayîrû/awîrû diî

baba (n): babaw to

bała (n): baław yarê

beq (n): beqû koy

bere (n): berew yaney

bername (n): bernamew şime

bira (n): biraw aďî /aďê

çem (n): çemû Diłberê

Kurmancî

agirê dil

bapîrê te

bejna yarê

nêrekewê çiyê

derîyê malê

bernameya we

birayê wî /wê

çavê Dilberê

Hewramî

deng (n): dengû kinaçê
dîl (n): dîlû dîldarî /dîldarê /dîldara
gicî (n): gicîw edêm a
gîyan (n): gîyanû edêm
gul (n): gulû keşî
hâl (n): hâlû Zîlanê
hane (n): hanew degê
hewa (n): hewaw weharî
jîway (n): jîwaw ême
keş (n): keşû Hewramanî
kitêb (n): kitêbû adî /adê /adîşa
ko (n): kow Şahoy
lalo (n): lalow Zankoy
mamo (n): mamow edaw min a
mas (n): masû to
neqşe (n): neqşew dinyê
peyam (n): peyamû azadî(azadîî)
rô (n): rôw jenê/pîyay
roxane (n): roxanew Sîrwanî
şar (n): şarû Siney
tam (n): tamû jîway/jîwayî
tate (n): tatew yaney
va/wa (n): vaw/waw payîzî
wane/ders (n): wanew/dersû êeşqî
wardêy (n): wardew ciberî
welat (n): welatû Kurdistanî
wêrega (n): wêregaw Hewramanî
werm (n): wermû şewê
xak (n): xakû baxî
zeř (n): zeřû Řezay
zerîfî (n): zerîfîw Kurdistanî
ziwan (n): ziwanû demî

Kurmancî

dengê keçê
dilê dildar /dildarê /dildaran
kirasê dayika min e
canê/giyanê dayika`m
kûlîlka çîyê
halê Zîlanê
kanîya gund
hewayê buharê
jîna /jîyana me
çîyayê Hewramanê
pirtûka wî /wê /wan
çîyayê Şaho
xalê Zanko
mamê/apê dêya min e
mastê te
nexşeya dinê
peyama azadiyê
roja jinê/mêr
cemê Sîrwan
bajarê Sine
tama jînê
bavê malê
bayê payizê
dersa evînê
xwarina derve
wilatê Kurdistanê
êvara Hewramanê
xewa şewê
axa bax
pereyê Reza
bedewiya Kurdistanê
zimanê dev

➤ **Pêkhateya wesfî:**

Hewramî

Kurmancî

ayîr/awîr (n): ayîrî /awîrî germ

agirê germ

- dilû ayîrî /awîrî germî: nava agirê germ

baba (n): babay pîr

bapîrê pîr

bała (n): bałay berz

bejna bilind

beq (n): beqî dengweş

nêrekewê dengxweş

bere (n): berey asinî

derîyê hesinî

bername (n): bernamey kurdî

bernameya kurdî

bira (n): biray gewre

birayê mezin

çem (n): çemî sîyaw

çavê reş

dem (n): demî sûr

devê sor

deng (n): dengî nasik

dengê nazik

des (n): desî kuł

destê kurt

dił (n): diłî êaşıq

dilê evîndar

gicî (n): gicî/gicîî sewz

kirasê kesk

gyan (n): gyanî weşewîs

canê/gyanê delal

goş (n): goşî têj

guhê tûj

guł (n): gułî zerîf

kûlîlka bedew

hâl (n): hâlî naweş

halê nexweş

hane (n): haney fênik

kaniya honik

hewa (n): heway serd

hewayê sar

jîway (n): jîway kurdî

jîna /jîyana kurdî

keş (n): keşî berz

çîyayê bilind

kitêb (n): kitêbî êal

pirtûka baş

ko (n): koy nizîk

çîyayê nêzîk

kuř (n): kuřî jîr

kurê jîr

lalo (n): laloy miçkileter

xalê biçûktir

Hewramî

mamo (n): pey mamoy gewreterî

mas (n): tamû masî çermey

neqşe (n): neqşey gewre

řo (n): řoy waranî

řoxane (n): řoxaney qûl

şar (n): şarî gewre

tam (n): tamî weş

tate (n): tatey fîdakar

va/wa (n): way/vay tin

wane (n): waney sext/sexlet

warđey (n): warđey/warđeyî weş

welat (n): welatî dagîrkirya

wêrega (n): wêregay xemgîn

werin (n): werinî şîrîn

xak (n): xakî pak/poxte

yane (n): yaney gulale(gulane)

zeř (n): zeřî kem/fire

zerîfî (n): zerîfî fire

ziwan (n): ziwanî Hewramî

Kurmancî

bo mamê/apê mezintir

tama mastê spî

nexşeya mezin

roja baranî

çemê kûr

bajarê mezin

tama xweş

bavê fedakar

bayê tund

dersa sext(zor)

xwarina xweş

wilatê dagirkirî

êvara xemgîn

xewa şêrîn

axa paqij

xanîyê/mala piçûk

pereyê kêr/zêde

bedewiya zêde

zimanê Hewramî

_ Telefuz û bilêvkirina peyvan:

Di her zimanî de bilêvkirina peyvan gelek girîng e. Ji avaniya peyvê û bilêvkirina wê, zayenda peyvê û hin car rola wê diyar dibe. Peyvine hene ku forma wan yek e lê wateya wan cuda ne. Ev cudayî dikare li navbera zayend, wate an jî rol be. Her çend kêrî diqewime ku di Hewramî de bilêvkirina peyvê zayenda peyvê biguherîne. Bilêvkirina peyvên ku forma wan yek e bêtir wate û rola peyvê diguherîne.

Hewramî	Kurmancî
berê (navdêra nêr)	derî
berê (lêkera fermanî)	bibe (birin)
wanê (navdêra nêr)	ders
wanê (lêkera fermanî)	bixwîne
kerî (lêker)	dikî
kerî (lêker)	bikî
çenî (navdêra mê)	derzî
çenî (daçek)	çawa/li gel
ađ kero (lêker)	ew bike
ađ kero (lêker)	ew dike

- Em ê paşê bixwînin ku lêkera fermanî di Hewramî de bi piranî bê pêşgira (bi/b) tê. Lê di vê rewşê de, divê giranî bikeve ser kîte ya pêşîn a peyvê. Mînak:

Hewramî	Kurmancî
bikere = kere	bike / ke
biwane = wane	bixwîne
biwaçe = waçe	bibêje/bêje
biwere = were	bixwe
bisane = sane	bikire / bistîne
bizane = zane	bizane

- Hebûna pêşgira (bi/b) ji bo hin lêkerên fermanî pêwîst e. Heke hin car neyê gotin, an wateya peyvê tune ye an dê bibe xwediyê wateyeke din.

Hewramî	Kurmancî
bare	bîne
are	----
baro	(ew) bîne
aro	îro

- ◆ Di bilêvkirina peyvên nêr ên qedandî bi bideng de hertim giranî li ser kîteya dawîn e. Lê ev ji bo peyvên mê sabît nîn e:

Hewramî	Kurmancî
<u>bira</u> (n)	bira (n)
<u>hane</u> (n)	kanî (m)
<u>yane</u> (n)	xanî (n) / mal (m)
<u>mamo</u> (n)	mam/ap (n)
<u>lalo</u> (n)	xal (n): birayê dêya mirovî
<u>jîway</u> (n)	jîn/jîyan (m)
<u>gicî</u> (n)	kiras (n)
<u>wardêy</u> (n)	xwarin (m)
<u>zerîfî</u> (n)	bedewî (m)
<u>mazî</u> (n)	pişt (m)
<u>mizqî</u> (n)	mizgeft (m)

Bilêvkirina peyvên mê:

Hewramî	Kurmancî
<u>dega</u> (m)	gund
<u>kerge</u> (m)	mirîşk
<u>hermane</u> (m)	kar
<u>kinaçê</u> (m)	keç
<u>winî</u> (m)	xwîn
<u>goranîye</u> (m)	stran

- Di peyvên mê yên qedandî bi (e) û (î) de, heke peyv dukîteyî be giranî dikeve ser kîte ya pêşîn û heke sê an çendkîteyî be dikeve ser kîte ya navîn lê ti car nakeve ser kîte ya dawîn. Jî di peyvên mê yên qedandî bi (ê) û (a) de giranî dikeve ser kîte ya dawîn.

- Di bilêvkirina peyvên pirjimar de jî giranî li ser kîteyan sabît nîn e.

Hewramî	Kurmancî
<u>çemê</u>	çav (pj)
<u>yanê</u>	mal (pj)
<u>jenî</u>	jîn (pj)
<u>kinaçê</u> (pj)	keç (pj)

Di rûpela pêş de, em ê peyvên mê bixwînin. Niha hûn dizanin ku meriv çawa peyvên mê bilêv bike. Her çend min bi xwe jî beşa ku giranî dikeve ser wê nîşan kiriye da ku hûn bi tevahî fêr bibin.

_ Peyvên mê

Di Hewramî de hemîya peyvên mê di halê xwerû de bi tîpên (a, e, ê, î) diqedin:

Hewramî	Kurmancî
<u>awe</u> / <u>awî</u> (m)	av (m)
<u>bi</u> we (m)	bêhn (m)
<u>çale</u> / <u>çalî</u> (m)	çal (m)
<u>çê</u> lî (m)	mêkew (m)
de <u>ga</u> (m)	gund (n)
de <u>de</u> (m)	derd (n)
din <u>ya</u> (m)	dinya (m)
e <u>da</u> (m)	dayik (m)
<u>ga</u> we (m)	çêlek (m)
<u>gil</u> ke (m)	pêçî / til (m)
goran <u>î</u> ye (m)	stran (m)
her <u>ma</u> ne (m)	kar (n)
<u>he</u> sî (m)	hêsir (m)
<u>he</u> şe (m)	hirç (n m)
<u>je</u> nî (m)	jin (m)
<u>ke</u> rge (m)	mirîşk (m)
<u>le</u> me (m)	zik (n)
le <u>te</u> rê (m)	teşî (m)
<u>lû</u> te (m)	poz (n)
<u>ma</u> nge (m)	heyv/meh (m)
mas <u>a</u> wî (m)	masî (n)
me <u>tî</u> ye (m)	met / xaltî (m)
qa <u>lî</u> ye (m)	xalîçe (m)
<u>re</u> nge (m)	reng (n)
<u>ri</u> wase (m)	rovî (n m)
<u>ri</u> we (m)	rû (n)
<u>sa</u> wî (m)	sêv (m)
<u>se</u> êre (m)	helbest (m)
<u>se</u> tle (m)	setil (m)
<u>se</u> we (m)	şev (m)
te <u>wene</u> /te <u>wenî</u>	kevir (n)
<u>we</u> zî (m)	goz / gûz (m)
<u>vi</u> le (m)	gul (m)
xet <u>a</u> (m)	xeta (m)
yag <u>ê</u> (m)	cîh (n)

- Dema ku navdêreke mê ya qedandî bi (a , e , ê , î), paşqertafa pêvekê bigire, ev tîp (a , e , ê , î) dê bimînin û tîpa (w) li dawiya peyvê tê zêdekirin. Jî dema ku navdêreke mê ya qedandî bi (a , e , ê , î), paşqertafa wesfî bigire, tîpa (y) li dawiya peyvê tê zêdekirin (bi piranî li peyvên qedandî bi {î} nayê zêdekirin.)

• Pêkhateya pêvekê:

Hewramî

dega (m): degaw ême

kerge (m): kergew yaney

kinaçê (m): kinaçêw to

wezî (m): wezîw darî

Kurmancî

gund (n): gundê me

mirîşk (m): mirîşka malê

keç (m): keça te

gûz (m): gûza darê

• Pêkhateya wesfî:

Hewramî

dega (m): degay dûre

kerge (m): kergey çermê

kinaçê (m): kinaçêy zerîfe

wezî (m): wezî{wezîy} êale

Kurmancî

gund (n): gundê dût

mirîşk (m): mirîşka spî

keç (m): keça bedew

gûz (m): gûza baş

- Em ê paşê bêtir bixwînin ku di pêkhateyên wesfî de, rengdêr bi navdêrê re li hev dike. Ji bo nimûne çar rengdêrên (çerme, zerîf, dût, êal):

- çerme: rengdêra nêr / çermê: rengdêra mê / çermê: rengdêra pirjimar
- zerîf: rengdêra nêr / zerîfe: rengdêra mê / zerîfê: rengdêra pirjimar
- dût: rengdêra nêr / dûre: rengdêra mê / dûtê: rengdêra pirjimar
- êal: rengdêra nêr / êale: rengdêra mê / êalê: rengdêra pirjimar

→ Xala giştî ev e ku heke rengdêr di rewşa xwe ya eslî de bi herfa bêdeng biqede, heman rewş ji bo navdêra nêr tê bikaranîn û ji bo ku bo navdêra mê were bikaranîn, divê em herfa (e) li dawiya rengdêrê bi kar bînin û ji bo pirjimar, em herfa (ê) li dawiya rengdêrê bi kar tînin. Mînak:

weş > weş: rengdêra nêr / weşe: rengdêra mê / weşê: rengdêra pirjimar

→ Heke rengdêr di rewşa xwe ya eslî de bi herfa bideng biqede, heman rewş ji bo navdêra nêr tê bikaranîn û ji bo ku bo navdêra mê were bikaranîn divê em herfa dengdêr li dawiya rengdêrê rabikin û li şûna wê, herfa (ê) bînin. Jî ji bo pirjimar, em herfa dengdêr li dawiya rengdêrê radikin û li şûna wê, herfa (ê) bînin:

fire > fire: rengdêra nêr / firê: rengdêra mê / firê: rengdêra pirjimar

➤ Lê heke rengdêr bi (î) biqede mîna (Hewramî):

Hewramî: rengdêra nêr / Hewramîye: rengdêra mê / Hewramîyê: rengdêra pirjimar

- Pêkhateya pêvekê:

Hewramî

to (n): to Hewramî nî

to (m): to Hewramîye nî

ême: ême Hewramîyê nmê

Kurmancî

tu: tu Hewramî yî

tu: tu Hewramî yî

em: em Hewramî ne

➤ **weş /xas >> baş**

- nêr → weş, xas: baş >>> min weş/xas na = ez baş im (nêr)
- mê → weşe, xase: baş >>> min weşe/xase na = ez baş im (mê)
- pirjimar → weşê, xasê: baş >>> ême weşê/xasê nmê = em baş in (pj)

➤ **kewe >> şîn**

- nêr → kewe: şîn >>> asman kewe n = ezman şîn e(nêr)
- mê → kewê: şîn >>> awe kewê ne = av şîn e(mê)
- pirjimar → kewê: şîn >>> asman û derya kewê nê = ezman û derya şîn in(pj)

+ Pêkhate(nêr):

Nêr yekjimar	nîşana pêvekê	nîşana wesfî
qedandî bi bêdeng	û	î
qedandî bi { w }	u	î
qedandî bi { a,e,o,û }	w	y
qedandî bi { î }	1_ Standard: (w) li dawîya peyvê tê. 2_ Hin car tiştek nayê lê zêdekirin.	1_ Hin car (y/î) li dawîya peyvê tê. 2_ Hin car tiştek nayê lê zêdekirin.
qedandî bi { y }	1_ Bêtir (w) li şûna (y)ya li dawîya peyvê tê. 2_ Hin car (y)ya li dawîya peyvê dimîne û (w) jî li peyvê zêde dîkin. 3_ Hin car (y)ya li dawîya peyvê dimîne û (u) jî li peyvê zêde dîkin. 4_ Hin car tiştek lê zêde nakin.	1_ Bêtir tiştek nayê lê zêdekirin tenê giranî dikeve ser (y)ya li dawîya peyvê. 2_ Hin kes tîpa (î) li dawîya peyvê, piştî tîpa(y) zêde dîkin.

+ Pêkhate(mê):

Mê yekjimar	nîşana pêvekê	nîşana wesfî
qedandî bi {a}	w	y
qedandî bi {e}	Tîpa (w), piştî (e)ya li dawîya peyvê tê.	Tîpa (y) li dawîya peyvê tê zêdekirin.
qedandî bi {ê}	1_ Standard: (w) li dawîya peyvê tê. 2_ Hin car tiştek nayê lê zêdekirin.	1_ Standard: tîpa (y) li dawîya peyvê tê zêdekirin. 2_ Hin car tiştek nayê lê zêdekirin.
qedandî bi {î}	1_ Hin car (w) , piştî (î)ya li dawîya peyvê tê. 2_ Bêtir (ew) li şûna (î)ya li dawîya peyvê tê.	1_ Bi gelemperî tiştek nayê lê zêdekirin. 2_ Hin car (î) li dawîya peyvê tê.

- Berî dîtina mînakên divê xaleke girîng bê gotin:

Hewramî

Kurdistana weş û rengîn a.(n)

Mange dûr û zerîfe ne.(m)

Qijêt sîyaw û dirêjê nê.(pj)

Kurmancî

Kurdistan xweş û rengîn e.

Heyv dûr û bedew e.

Porên te reş û dirêj in.

- Xala girîng ew e ku heke çend rengdêr li pey hev bên, taybetiyên nêr û mê û pirjimarîyê bi rengdêra dawîn ve tê girêdan.

Jî:

Hewramî

desû eđa û tatey

dilsoziw tate û edê

Kurmancî

destê dayik û bav

dilsoziya bav û dayikê

- Li vir jî mîna Kurmancî tenê peyva dawî di halê tewandî de ye.

Mînak:

Hewramî

Amed paytextû Kurdistanî n

asmanî kewe (n)

away/awî poxtê (m)

away/awî serde (m)

azîza! yarmetîw feqîra bidehydê(deydê)

➤ yarmetî (n): alîkarî (m)

banû yaney (n)

barî giran /qurs (n)

basû çêşî kerî? (bas: n)

baxçew hewşew yaney, gewre n (n)

baxçew hewşew yaney gewrey (n)

berey sûr (n)

beydê temaşaw fûtbalî bikermê(kermê)

biwew to, biwew gula ne (m)

ce pîyay zehmetkêşî

cejneta mibareke bo

cejnew newrozî (m)

➤ cejne mê ye lê newroz nêr e.

cejnew newrozî mibareke bo

dastanew şewew min (m)

dastanew şewê (m)

degay konê(qedîmîye) (m)

demî sûr (n)

dengî weş (n)

dengû to weş a

Kurmancî

Amed paytexta Kurdistanê ye

ezmanê şîn

ava paqij

ava sar

delalino! alîkariya belengazan bikin

banê malê

barê giran

behsa çi dikî?

baxçeyê hewşeya xanî, mezin e

baxçeyê hewşeya xaniyê mezin

derîyê sor

werin (em) li futbolê temaşe bikin

bêhna te, bêhna gula ye.

ji mêrê kedkar

cejna we pîroz be

cejna newrozê

cejna newrozê pîroz be

çîroka şeva min

çîroka şevê

gundê kevn

devê sor

dengê xweş

dengê te xweş e

Hewramî

derdew dilî /dîla girane ne (m)
diđanî çermew babaw min (n)
diđanî çermew babaym (n)
dîwarî çerme (n)
eđaw Şermînê /Ajwanî kê ne?
eđay xemgîne
hersêw eđay xemgînê
gawey sîyawê (m)
şotû gawey sîyawê (n)
gay sîyaw (n)
gilkeşw desa (m)
gulî narincî (n)
hewrî sîyaw (n)
hewşew yanew Akoy/Kejanê gewrê ne (m)
jenî pîre
kardî, têje ne (m)
kinaçê jîrê
kinaçêy Hewramîye
kinaçêy Hewramîyê
kinaçêy jîre
kinaçêy qijzerde
kinaçêy weşlê (m)
kitêbî pîroz(mibarek)
koy /keşî çerme (n)
kuřî Hewramî
laloy beřêz
lemey hařîye/peře (m)
liçî sûrû to (n)

Kurmancî

derdê dil /dilan giran e
diranê/didanê spî yê bapîrê min
diranê/didanê spî yê bapîrê min
dîwarê spî
dêya Şermînê /Ajwan kî ye?
dayika xemgîn
hêsirên dayika xemgîn
çêleka reş
şîrê çêleka reş
gayê reş
tiliya destan
gula narincî
ewrê reş
hewşa mala Ako/Kejanê mezin e
jina pîr
kêr, tûj e
keçên jîr
keça Hewramî
keçên Hewramî
keça jîr
keça porzer
keça xweşik
pirtûka pîroz
çîyayê spî
kurê Hewramî
xalê hêja
zikê vala/tijî
lêva te ya sor

Hewramî

lûtey dirêje (m)
mangey zerîfe (m)
masî tiş (n)
mekew/mekîw mekdanî
mekî, sole ne
min kitêbî sanû
namêw kinaçe jîra
namêw kitêbî, Hewramî pey Kirmanca n
namêw pîya zehmetkêşa
pey kinaçêy jîrê
pîyay dewletmend(dewlemend)
pîyay zehmetkêş
pîyayê zehmetkêşê
qelemû kahezî (n)
qesrew hâkimû şarî (m)
řengew asmanî kewê ne (m)
řo weş (n)
řoy taze (n)
řow heftey (n)
sawî sewze (m)
şewe weşe (m)
şewey tarîke (m)
tarîxû kurda (n)
tatew to /adî /adê kê n?
tewenî/teweney sîyawê (m)
tewergey firê (m)
tîşkew werî (m)

Kurmancî

pozê dirêj
heyva bedew
mastê tirş
xwêya xwêdank
xwê, şor e
ez pirtûkê dikirim
navê keçên jîr
navê pirtûkê, Hewramî bo Kurmanca ye
navê mêrên kedkar
bo keça jîr
mêrê dewlemend
mêrê kedkar
mêrên kedkar
qelema kaxeze
qesra mîrê bajêr
rengê ezmên şîn e
roj baş
roja nû
roja hefteyê
sêva kesk
şev baş
şeva tarî
dîroka kurdan
bavê te /wî /wê kî ye?
kevîrê reş
zîpika zêde
tîrêja tavê

Hewramî	Kurmancî
waranî weş (n)	barana xweş
way serd (n)	bayê sar
wêjenû demî (n)	benîştê dev
wêrega weş (n)	êvar baş
werî har (n)	gurê har
werî/weretawî germ (n)	tava germ
werî sûk (n)	xewa sivik
werwey çermê (m)	berfa spî
winî sûre	xwîna sor
winîw/winew diî (m)	xwîna dil
yaney berz (n)	xanîyê bilind
yaney kone(qedîmî)	mala kevn
yarey/dosey zerîfe	yara bedew
zemînî tejne (n)	erda tî
ziwanî edayî (n)	ziwanê dayikî/zikmakî

➤ winî (m): xwîn (m) /// mekî (m): xwê (m) /// kardî (m): kêr (m)

- Xaleke pir girîng:

Hewramî	Kuermancî
guî sûr	gulê sor
guîey sûre	gula sor
guîe sûrê	gulên sor

Lê:

Hewramî	Kuermancî
ce guî sûrî	ji gulê sor
ce guîey sûrê	ji gula sor
ce guîe sûrê	ji gulên sor

♦ We dît ku heke daçek û hwd berî pêkhatayên wesfî were, pêkhatayên wesfî tên tewandin.

_Peyvên pirjimar

- Di Hewramî de peyvên pirjimar, di halê xwe yê xwerû de bi tîpên jêrîn ve diqedin:

1_ê 2_yê 3_î 4_iwê

- Jî di Hewramî de peyvên pirjimar, di halê xwe yê tewandî de bi tîpên jêrîn ve diqedin:

1_a 2_ya 3_iwa

➤ **Halê xwerû:**

1_ (ê): Piraniya navdêrên yekjimarên nêr û mê dikarin pê re bibin pirjimar:

- Peyvên qedandî bi bêdeng: *Ji bo ku ev peyvên yekjimar bibin pirjimar, tenê li dawiya van peyvan (ê) tê zêdekirin û tiştek nayê guhertin an rakirin. Jî di vê rewşê de giranî li ser kîte ya pêşîn an navîn e.*

- çem(yj) > nîşana pirjimariya (ê) > çemê (pj)
- kuř(yj) > nîşana pirjimariya (ê) > kuřê (pj)
- şar(yj) > nîşana pirjimariya (ê) > şarê (pj)
- guł(yj) > nîşana pirjimariya (ê) > gułê (pj).
- des(yj) > nîşana pirjimariya (ê) > desê (pj)
- goş(yj) > nîşana pirjimariya (ê) > goşê (pj)
- kurd(yj) > nîşana pirjimariya (ê) > kurdê (pj)
- ders(yj) > nîşana pirjimariya (ê) > dersê (pj)
- Kurmanc (yj) > nîşana pirjimariya (ê) > Kurmancê (pj)

- Peyvên qedandî bi (e): Li dawiya peyvê û li şûna (e)ya li dawiya peyvê tê:

- ♦ Nêr ên qedandî bi (e): Di vê rewşê de giranî li ser kîte ya dawîn e:

- hane(yj) > nîşana pirjimariya (ê) > hanê (pj)
- yane(yj) > nîşana pirjimariya (ê) > yanê (pj)
- bere(yj) > nîşana pirjimariya (ê) > berê (pj)
- tate(yj) > nîşana pirjimariya (ê) > tatê (pj)
- řoxane (yj) > nîşana pirjimariya (ê) > řoxanê (pj)
- bername(yj) > nîşana pirjimariya (ê) > bernamê (pj)
- neqşe(yj) > nîşana pirjimariya (ê) > neqşê (pj)

♦ Mê yên qedandî bi (e): Di vê rewşê de giranî li ser kîteya pêşîn/navîn e.

- awe(yj) > nîşana pirjimariya (ê) > awê (pj)
- kerge (yj) > nîşana pirjimariya (ê) > kerge (pj)
- şêere (yj) > nîşana pirjimariya (ê) > şêêre (pj)
- mange(yj) > nîşana pirjimariya (ê) > mangê (pj)
- gawe (yj) > nîşana pirjimariya (ê) > gawê (pj)
- riwe (yj) > nîşana pirjimariya (ê) > riwê (pj)
- şewe (yj) > nîşana pirjimariya (ê) > şewê (pj)
- hermane (yj) > nîşana pirjimariya (ê) > hermanê (pj)

➤ Peyvên ku jixwe bi tîpa (ê) diqedin di halê xwe yê xwerû de hem mêya yekjimar in hem jî pirjimar in:

Yekjimar:

- yagê (yj) > min yagêm nîyê ne <> min cîh tune/nîn e.
- leterê (yj) > şime leterêta hene? <> we teşî heye?
- kinaçê (yj) > ême kinaçêma hene <> me keç heye.
- walê (yj) > to(m) pêsew walêm enî <> tu mîna xuşka min î.

Pirjimar:

- yagê (pj) > yagê nîyê nê <> cîh tune ne.
- leterê (pj) > min leterêm henê <> min teşî hene.
- kinaçê (pj) > îne kinaçê nê <> ev keç in.
- walê (pj) > ême walê nmê <> em xuşk in.

➤ Peyvên qedandî bi (y):

- jîway (yj) > nîşana pirjimariya (ê) > jîwayê (pj)

2_ (yê): Peyvên ku bi (a) diqedin dikarin pê re bibin pirjimar. Jî peyvên nêr ên ku bi (î) diqedin jî dikarin bi (yê) re bibin pirjimar. Giranî dikeve ser kîteya navîn.

Wek :

- bira (yj) > nîşana pirjimariya (yê) > birayê (pj)
- eđa (yj) > nîşana pirjimariya (yê) > eđayê (pj)
- gicî (yj:n) > nîşana pirjimariya (yê) > gicîyê (pj)
- Hewramî (n) > nîşana pirjimariya (yê) > Hewramîyê (pj)

3_ (î): Peyvên ku şixwe bi tîpa (î) diqedin, ger mê bin, hem yekjimar in hem jî pirjimar in. Lê ger nêr bin divê ku em nîşana (yê) li dawîya wan zêde bikin da ku bibin pirjimar. Wek:

jenî(m) > jenî ne: jin e >>> jenî nê: jin in

wezî(m) > wezî ne: goz e >>> wezî nê: goz in

awî(m) > awî ne: av e >>> awî nê: av in

gicî(n) > gicî n: kiras e /// gicîyê nê: kiras in.

gonî(n) > gonî n: telîs e /// gonîyê nê: telîs in.

4_ (iwê): Peyvên ku bi (o an û) qediya ne, dikarin pê re bibin pirjimar. { o, û } diguherin bi (iwê). Giranî dikeve ser kîteya pêşîn.

Wek:

ko (yj) > nîşana pirjimariya (iwê) > kiwê (pj)

mû (yj) > nîşana pirjimariya (iwê) > miwê (pj)

➤ Peyvên ku di halê xwe yê xwerû de bi tîpên (o, û, y) diqedin, di Hewramî de nêr in.

➤ Halê tewandî:

1_ (a):

➤ Peyvên qedandî bi bêdeng: Li dawîya peyvê tê zêdekirin. Giranî dikeve ser kîteya dawîn.

- çem(yj) > nîşana pirjimariya (a) > serû çema: ser çavan
- kuř(yj) > nîşana pirjimariya (a) > karû kuřa: karê kuran
- şar(yj) > nîşana pirjimariya (a) > kolanêw şara: kolanên bajaran
- guł(yj) > nîşana pirjimariya (a) > biwew guła: bêhna guła
- des(yj) > nîşana pirjimariya (a) > hêzû desa: hêza destan
- goş(yj) > nîşana pirjimariya (a) > perdêw goşa: perdeyên guhan
- kurd(yj) > nîşana pirjimariya (a) > welatû kurda: welatê kurda
- ders(yj) > nîşana pirjimariya (a) > sextetîw dersa: zehmetiya dersan
- keş(yj) > nîşana pirjimariya (a) > werwew keşa: berfa çiyayan

- Peyvên qedandî bi (e): Li dawîya peyvê û li şûna (e)ya li dawîya peyvê tê.
Giranî dikeve ser kêteya dawîn.

Nêr ên qedandî bi (e):

- hane (yj) > nîşana pirjimariya (a) > awew hana: ava kaniyan
- yane (yj) > nîşana pirjimariya (a) > berêw yana: deriyên malan
- wane (yj) > nîşana pirjimariya (a) > mamosaw wana: mamosteyê dersan
- bere (yj) > nîşana pirjimariya (a) > rengew bera: rengê deriyan
- tate (yj) > nîşana pirjimariya (a) > karû tata: karê bavan
- řoxane (yj) > nîşana pirjimariya (a) > awew řoxana: ava çeman
- bername (yj) > nîşana pirjimariya (a) > weşîw berna: şahiya bernameyan
- neqşe (yj) > nîşana pirjimariya (a) > dilû neqşane: di nava nexşeyan de

Mê yên qedandî bi (e):

- awe (yj) > nîşana pirjimariya (a) > fênîkîw awa: honikiya avan
- kerge (yj) > nîşana pirjimariya (a) > hêlew kerga: hêka mirîşkan
- şêere (yj) > nîşana pirjimariya (a) > niwîserû şêera: niwîskarê helbestan
- mange (yj) > nîşana pirjimariya (a) > dilû diwê mangane: di nava du mehan de
- gawe (yj) > nîşana pirjimariya (a) > şotû gawa: şîrê çêlekan
- řiwe (yj) > nîşana pirjimariya (a) > awew řiwa: ava rûyan
- şewe (yj) > nîşana pirjimariya (a) > sîyawîw şewa: reşiya şevan

- Peyvên mê yên ku bi (ê) diqedin: Li dawîya peyvê û li şûna (ê)ya li dawîya peyvê tê:

- yagê (yj) > nîşana pirjimariya (a) > ce her yagane: ji her cihan de
- leterê (yj) > nîşana pirjimariya (a) > darû letera: dara teşîyan
- kinaçê (yj) > nîşana pirjimariya (a) > baław kinaça: bejna keçan
- walê (yj) > nîşana pirjimariya (a) > biraw wala: birayê xuşkan

- Peyvên mê yên ku bi (î) diqedin: Li dawîya peyvê û li şûna (î)ya li dawîya peyvê tê:

- jenî (yj) > nîşana pirjimariya (a) > be qisêw jena: li gor gotina jinan
- çêlî (yj) > nîşana pirjimariya (a) > dengû çêla: dengê mêkewan
- sawî (yj) > nîşana pirjimariya (a) > posû sawa: postê sêvan
- masawî (yj) > nîşana pirjimariya (a) > jîwaw masawa: jîna masiyan
- wezî (yj) > nîşana pirjimariya (a) > dirextû weza: dara gozan

2_ (ya): Peyvên ku bi (a) diqedin û peyvên nêr ên ku bi (î) diqedin:

- Peyvên ku bi (a) diqedin:
 - bira (yj) > nîşana pirjimariya (ya) > walêw biraya: xuşka birayan
 - eđa (yj) > nîşana pirjimariya (ya) > desû eđaya: destê dayikan
- Peyvên nêr ên ku bi (î) diqedin:
 - gicî (yj) > nîşana pirjimariya (ya) > řengew gicîya: rengê kirasan
 - gonî (yj) > nîşana pirjimariya (ya) > dilû gonîya: nava telîsan
 - mazi (yj) > nîşana pirjimariya (ya) > barû mazîya: barê piştan
 - Hewramî (yj) > nîşana pirjimariya (ya) > degaw Hewramîya: gundê Hewramiyan

3_ (iwa):

- Peyvên ku bi (o, û) diqedin:
 - ko (yj) > nîşana pirjimariya (iwa) > werwew kiwa: berfa çîyayan
 - mû (yj) > nîşana pirjimariya (iwa) > sîyawîw miwa: reşiya mûyan
 - mamo (yj) > nîşana pirjimariya (iwa) > yanew mamiwa: mala apan
 - lalo (yj) > nîşana pirjimariya (iwa) > maşînû laliwa: erebeya xalan

desû pîyay: destê mêr

desû pîyaya: destê mêran

desêw pîyay: destên mêr

desêw pîyaya: destên mêran

çemû jenê: çavê jinê

çemû jena: çavê jinan

çemêw jenê: çavên jinê

çemêw jena: çavên jinan

yanew şarî: mala bajêr

yanew şara: mala bajaran

yanêw şarî: malên bajêr

yanêw şara: malên bajaran

kergew kinaçê: mirîşka keçê

kergew kinaça: mirîşka keçan

kergêw kinaçê: mirîşkên keçê

kergêw kinaça: mirîşkên keçan

Mînakên peyvên pirjimar(halê xwerû):

Hewramî

awî/awê (pj)
berê (pj)
birayê (pj)
biwê (pj)
çalî/çalê (pj)
çêlî/çêlê (pj)
çemê (pj)
degayê (pj)
dengê (pj)
desê (pj)
dilê (pj)
dinyayê (pj)
eđayê (pj)
gawê (pj)
gicîyê (pj)
goranîyê (pj)
goşê (pj)
gulê (pj)
hanê (pj)
hermanê (pj)
hesarê (pj)
heşê (pj)
jenî/jenê (pj)
kergê/kerî (pj)
keşê (pj)
kesê (pj)
kitêbê (pj)
kiwê (pj)
kuřê (pj)
laliwê (pj)
leterê (pj)
lûtê (pj)
mamiwê (pj)
mangê (pj)
masawî/masawê (pj)
miwê (pj)
payê (pj)
řiwasê (pj)

Kurmancî

av
derî
bira
bêhn
çal
mêkew
çav
gund
deng
dest
dil
dinya
dayik
çêlek
kiras
stran
guh
kûlîlk
kanî
kar
stêrk
hirc
jin
mirîşk
çîya
kes
pirtûk
çîya
kur
xal
teşî
poz
mam/ap
heyv/meh
masî
mû
pê
rovî

Hewramî

řiwê (pj)
 řiwê (pj)
 řoxanê (pj)
 řarê (pj)
 sawî/sawê (pj)
 řêêrê (pj)
 řewê (pj)
 tatê (pj)
 wezî/wezê (pj)
 yagê (pj)
 yanê (pj)
 ziwane (pj)

Kurmancî

roj
 rû
 çem
 bajar
 sêv
 helbest
 řev
 bav
 goz/gûz
 cîh
 xanî/mal
 ziman

- **Pêkhateya pêvekê:**

Hewramî

çemê (pj): çemêw Mizeferî
 hesarê (pj): hesarêw asmanî
 kitêbê (pj): kitêbêw to
 yanê (pj): yanêw degê
 řewê (pj): řewêw zimsanî
 heşê (pj): heşêw keşa
 çalê (pj): çalêw degê
 kinaçê (pj): kinaçêw řarî
 yagê (pj): yagêw to

Kurmancî

çavên Muzaffar
 stêrkên ezmên
 pirtûkên te
 xanîyên/malên gund
 řevên zivistanê
 hirçên çîyayan
 çalên gund
 keçên bajar
 cihên te

- **Pêkhateya wesfî:**

Hewramî

çemê (pj): çemê sîyawê
 hesarê (pj): hesarê zerîfê
 kitêbê (pj): kitêbê bayexdarê
 yanê (pj): yanê gulalê
 tatê (pj): tatê fîdakarê
 řewê (pj): řewê tarîkê
 heşê (pj): heşê gewrê

Kurmancî

çavên reş
 stêrkên bedew
 pirtûkên giranbiha
 xanîyên/malên biçûk
 bavên fedakar
 řevên tarî
 hirçên mezin

Em ê di beşên pêş de bêtir fêr bibin (navdêr, rengdêr, rola pêvekê û wesfî û hwd)

_ Hevok:

Hewramî

De desê wezê berde pey adî.

Diwê nemamê wezê.

Min ce Dersîmî hez kerû.

➤ Min Dersîmîm weş misyo.

Awew haney, serde ne.

• Zazakî: Awa hênîyî, serdin a.

>>> Awew haney serdî.

>>> Awew serdew haney.

Ayşew ême weşlê ne.

Kinaçew lalow min. **

Kinaçew laloyim. **

Mangew êşewî zerîfe ne.

Kurdê amê.

Zemaw min /to /adî /adê ama.

Waw weharî mê.

Way weharî mê.

Germaw weretawî.

Edaw Arîne /Sojîne /Ehmedî.

Zemay balaberz ama dilê.

Biray gewre kê n?

Way serd wenew ême gino.

Germay fire.

Tatew min qisê kero.

Yanew ka/kak Berzanî.

Hanew degaw min.

Kurmancî

Min deh deste gûz birin ji wî re.

Du şitlên gûzan.

Ez ji Dêrsimê hez dikim.

Ez ji Dêrsimê hez dikim.

Ava kaniyê, sar e.

Ava kaniya sar.

Ava sara kaniyê.

Eyşa me xweşik e.

Keça xalê min.

Keça xalê min.

Heyva îşev bedew e.

Kurd hatin.

Zavayê min /te /wî /wê hat.

Bayê biharê tê.

Bayê biharî tê.

Germa tavê.

Dêya Arînayê /Sojîne /Ehmed.

Zavayê bejnîlind hat hundir.

Birayê mezin kê ye?

Bayê sar li me dikeve.

Germahiya zêde.

Bavê min diaxive. (xeber dide /qise dike)

Mala kak Berzan.

Kaniya gundê min.

Hewramî

Kurmancî

Namêw Xiway.

Navê Xwedê.

- *(Namê) jixwe di Hewramî de mê ye lê heke em bixwazin navê xwe û kesan bibêjin, wisa dibêjin:*
Nêr > Namêw min(n) /to(n) /adî Zanyar a.
Mê > Namêw min(m) /to(m) /adê Zilane ne.

Tatew Şêrkoy.

Bavê Şêrko.

Yerê neferê /kesê liwê.

Sê kes çûn.

Hîzî(Hêzî) ad qisê firêş kerdê.

Duh wî gelek axivî.

Awî çîyê newerîwe. Xirabe ne.

Ava sar venexwî. Xirab e.

Helûçey yawa, şîrîn a. (n)

Alûçeya/Helûjeya gihîştî, şêrîn e.

Koy/Keşî berz.

Çîyayê bilind.

Kiwê/Keşê berzê.

Çîyayên bilind.

Ko/Keş berz a.

Çîya bilind e.

Kiwê/Keşê, berzê nê.

Çîya bilind in.

Kinaçêy zerîfe.

Keça bedew.

Kinaçê zerîfê.

Keçên bedew.

- Ane: Ew(n) / Anê: Ew (m)an(pj) // // // // Îne: Ew(n) / Înê: Ev(m)an(pj)
- Zaŕowe /Zaŕote /Zawte ... : Zarok

Ane /Îne kê n? – Kuŕû min a.

Ew /Ev kê ye? _ Kurê min e.

Anê /Înê kê ne? _ Kinaçêw min ene.

Ew /Ev kê ye? _ Keça min e.

Anê /Înê kê nê? _ Zaŕolêw min enê.

Ew /Ev kê ne? _ Zarokên min in.

Yagêw ême tengê ne.

Cihê me teng e.

Yagêw ême tengê nê.

Cihên me teng in.

Anê walê ne, aneyç bira n.

Ew xwişk e, ew jî bira ye.

(Du şêweyên lêkera bûnê bo kesê sêyem yekjimar(nêr) hene, {a / n} ku n paş tîpên bideng tê)

Hewramî

Řow çîwaromî zîyare ama.

- Řoy çîwarom zîyare ama.

Desît bare.

Êşû gilkew desa.

- Ce êşî : Ji êşê
- Ce êşû dilî : Ji êşa dil
- Řengew gilkê : Rengê tilîyê
- Řengew gilkew adê : Rengê tilîya wê
- Pey çema : Bo çavan
- Pey çemaw to : Ji çavên te re.

Min mamom hen.

Min diwê mamiwêm henê.

To walêt hene.

To yerê walêt henê.

Mangew newrozî.

Diwê mangê.

Zanko kuřêw/kuřêv a.

Nergise kinaçêwe/kinaçêve ne.

Çemêm peřê nê hersî.

Ême çin neferê nmê?

Şime çin neferê ndê?

Adê çin neferê nê?

Şewe weşe.

Řo weş.

Şewey weşe.

Řoy weş.

Şewê weşê.

Kurmancî

Roja çaran derket hat.

Roja çaran derket hat.

Destê xwe bîne.

Êşa tiliya destan.

Min ap heyê.

Min du ap hene.

Te xwişk heyê.

Te sê xwişk hene.

Meha newrozê.

Du meh.

Zanko kurek e.

Nêrgiz keçek e.

Çavên min tijî hêsir in.

Em çend kes in?

Hûn çend kes in?

Ew çend kes in?

Şev baş.

Roj baş.

Şeva xweş.

Roja xweş.

Şevên xweş.

Hewramî

Řiwê weşê.

Dengû waranî.

Awew waranî.

Dengî nasik.

Awî/Awey germe.

Dengî weşû waranî.

Dengû waranî weşî.

Min wîs kitêbê sanê.

Şime sî kergêta ardê.

Dersî wenû.

- Ders (n): Ders (m)

Kejalê çêş maço?

Celalî wat.

- Celal watiş.

Řojanê wat.

- Řojane watiş.

Yaney sanû

Yana/Yanê sanû

Mangê wînû.

Mangem wîna.

Dinyaw zařoľa, dinyayêwey weşe ne.

Matilû(n) to bêna ke bey û bilmê.

Hewa germ bê û minîç ewra bêna.

Kurmancî

Rojên xweş.

Dengê baranê.

Ava baranê.

Dengê nazik.

Ava germ.

Dengê xweş ê baranê.

Dengê barana xweş.

Min bîst pirtûk kirrîn.

We sî mirîşk anîn.

Dersê dixwînim.

Kejal çi dibêje?

Celal got.

Celal got.

Rojanê got.

Rojanê got.

Malê dikirrim.

Malan dikirrim.

Heyvê dibînim.

Min heyv dît.

Dinyaya zarokan, dinyayeke xweş e.

Ez li benda te bûm ku werî û (em) herin.

Hewa germ bû û ez jî birçî bûm.

Hewramî

Kolaneş yanew ême ne.
Xelatû payîzî, zerďrengî n.
Tom weş misyey.(to: nêr)
Tom weşe misyey.(to: mê)
Řam(Řaw min) dûre ne.
Hewalû aroy waçe.
Tewenîm/Tewenem wiste.
Min hîzî şêêrem niwîste.
Min hîzî şêêrêm niwîstê.
Řenga pase bo.
Desû wêt biďe desû min.
Biďye peym(pey min).
Min kitêbêwî weşim dî. (n)
Min şêêrêwey weşem dîye. (m)
Min goranîyê weşêm dîyê. (pj)
Fermawe binîşere.
Fermawdê binîşdêre.
Kuřî kurd{kurd}.
Kinaçêy kurďe{kurde}.
Kuřê kurďê{kurdê}.
Kinaçê kurďê{kurdê}.
Pîyaw yaney to nî.
Xatûnew yaney to nî.
Yanew Nermînê.
Zerîfî(Żerîfîw to) bê dima n.
Biwet (Biwew to) weşe ne.
Biraw Heřalê /Ėelî /eďê.

Kurmancî

Kolana mala me ye.
Xelata payîzê, zerrengî ye.
Ji te(n) hez dikim.
Ji te(m) hez dikim
Rêya min dûr e.
Nûçeya îro bêje.
Min kevir avêt.
Min duh helbest nivîsand.
Min duh helbest nivîsandin.
Renge wisa be.
Destê xwe bide destê min.
Li min binêre.
Min pirtûkek xweş dît.
Min helbestek xweş dît.
Min stranên xweş dîtin.
Kerem ke rûne.
Kerem kin rûnin.
Kurê kurd.
Keça kurd.
Kurên kurd.
Keçên kurd.
Zilamê malê tu yî.
Xatûna malê tu yî.
Mala Nermînê.
Bedewiya te bê dawî ye
Bêhna te xweş e.
Birayê Heralê /Elî /dayikê.

Hewramî

Darêw kolanê nê.

Darêw kolana nê.

Dîwarêw yaney.

Şewew newrozî.

Hewramî pey Kurmanca.

Zalim zołm/zołmî kero.

Min gulim sana peyt.

Min kergem sana peyt.

Min yanêw sanê peyt.

Esmer namêw to şîrîne ne.

Bê to jîwaym(jîwayw/jîwaw min) gireway n.

Min kinaçê na, kinaçêw kurda na.

To be ciwanî pîrit(n)/pîret(m) kerda.

➤ pîrit(n): biresera nê / pîret(m): biresera mê

Min diłû wêw pey to kerdwe.

Weşterîn goranîyey kurdiye, kamê ne?

Nanî firem ward îtir lemew peşe bîye.

Bê to mebo /metawu.

Xiwew to çin/çinne şîrîn a.

➤ Xiwe : Heke giranî li ser kêteya dawîn be yanî (ken).

➤ Xiwe : Heke giranî li ser kêteya pêşîn be yanî (bikene).

➤ Girewe : Heke giranî li ser kêteya dawîn be yanî (girîn).

➤ Girewe : Heke giranî li ser kêteya pêşîn be yanî (bigirî).

Kurmancî

Darên kolanê ne.

Darên kolanan in.

Dîwarên malê.

Şeva newrozê.

Hewramî bo Kurmancan.

Zalim zulum dike.

Min kûlîlk kirrî ji te re.

Min mirîşk kirrî ji te re.

Min mal kirrîn ji te re.

Esmer navê te şêrîn e.

Bê te jîyana`m girîn e.

Ez keçim, keça kurdan im.

Te ez kal kirim bi ciwanî.

Min dilê xwe ji te re vekir.

Strana herî xweş a kurdî, kîjan e?

Min gelek nan xwar êdî zikê min tijî bû.

Bê te nabe /nikarim.

Kena te çend şêrîn e.

Hewramî

Xuđa/Xiwa gewre n.

Nazê şûş kerď.

Sîrwan jenîş arďe.

Nehew min.

➤ **Nehe (n): Navik (n)**

Çêşit kerď?

Çêş kerî, çêş mekerî?

Desû adîşa.

Grupe diruse kirya.

Grupe diruse kiryêne.

Aď/Aďe çê{çêne} bê û îse liwa.

Aď ver bî.

Aďe vere bîye.

Aďê verê bîyê.

Kiwê berzê çiko nê ?

Řiwasew koy/keşî.

Wergêw koy/keşî.

Berzayîw koy/keşî.

Berzayîw kiwa/keşa.

Wergêw kiwa/keşa.

Min dimaw to, weşîm nedî.

Pam mêşo.

Payêm mêşa.

Yerê birayêm henê.

Min yerê birayêm henê.

Çalew werû berey, qûle ne.

Kuřêw /Kinaçêwe ama.

Kurmancî

Xweda mezin e.

Nazê zewicî /şû kir.

Sîrwan zewicî.

Navikê min.

Te çi kir?

Çi dikî, çi nakî?

Destê wan.

Kom hat çêkirin.

Kom hatiye çêkirin.

Ew li vir bû û niha çû.

Ew(n) ber bû.

Ew(m) ber bû.

Ew(pj) ber bûn.

Çîyayên bilind li ku ne?

Rovîya çîya.

Gurên çîya.

Bilindiya çîya.

Bilindiya çîyayan.

Gurên çîyayan.

Min piştî te, xweşî nedît.

Pêyê min diêşe.

Pêyên min diêşin.

Min sê bira hene.

Min sê bira hene.

Çala li ber derî, kûr e.

Kurek /Keçek hat.

Hewramî

To(n) mangew asmanû min nî.

To(m) mangew asmanû min enî.

Kitêbê firêma henê.

Řiwet (Řiwew to) mangê mişo.

Miñhemed kitêbî weno.

Nermîne wezî/wezê wero.

Xecê kinaçêw laloym ene.

➤ Xecê kinaçêw lalow min ene.

Eñmed kuřû mamoym a.

➤ Eñmed kuřû mamow min a.

Min henarim ward.

➤ Henar (n): Hinar (m)

Ađ moêelim bê.

Ađ bî be moêelim.

Ađe moêelime bê.

Ađe bîye be moêelime.

Dengû azadî weş a.

Çemû Aramî fire weşle n.

Balaw yarew min berz a.(bala: nêr)

Î /A ziwane çêş a?

Î /A ziwane weşe çêş a?

Î /A ziwane Hewramî n.

Î /A ziwane weşe Hewramî n.

Î /A ziwani fêr/fêre be.

Î /A ziwane weşey fêr/fêre be.

➤ fêrû / fêrew î ziwani be.

➤ fêrû / fêrew î ziwane weşey be.

Kurmancî

Tu(n) heyva ezmanê min î.

Tu(m) heyva ezmanê min î.

Me gelek pirtûk hene.

Rûyê te dişibe heyvê.

Mihemed pirtûkê dixwîne.

Nermîn gozê dixwe.

Xecê keça xalê min e.

Xecê keça xalê min e.

Ehmed kurê apê min e.

Ehmed kurê apê min e.

Min hinar xwar.

Ew mamoste bû.

Ew bû mamoste.

Ew mamosta bû.

Ew bû mamosta.

Dengê azadiyê xweş e.

Çavê Aram pir xweşik e.

Bejna yara min bilind e.

Ev /Ew ziman çi ye?

Ev /Ew zimanê xweş çi ye?

Ev /Ew ziman Hewramî ye.

Ev /Ew zimanê xweş Hewramî ye.

Vî /Wî zimanî fêr bibe.

Vî /Wî zimanê xweş fêr bibe.

fêrî vî zimanî bibe.

fêrî vî zimanê xweş bibe.

Hewramî

Awe çîyê ne.

Î /A awê çîyê ne?

Pîsîw î/a awê.

Î /A çema, sîyawê nê.

Î /A çeme sîyawa zerîfê nê.

Aşiqû î/a çeme sîyawa na.

Kurmancî

Av honik e.

Ev /Ew av honik e?

Qirêjiya vê/wê avê.

Ev /Ew çav, reş in.

Ev /Ew çavên reş bedew in.

Evîndarê van/wan çavên reş im.

**_ Nîşaneke din a pirjimariyê di Hewramî de heye ku ji farisî hatiye. Elbet kêr tê bikaranîn.
Ev nîşan (ha) ye:**

Řoha = Řiwê : Roj (pj)

_ Taybetmendiyên din ên peyvên mê:

1_ Dema navdêrên mê bi raderê re werin, dê dengdêra li dawiya wan biguhere:

- Peyvên mê yên ku bi (a) diqedin: Ev peyv nayên guhertin an dengdêra li dawiya wan jî nayê rakirin:
 - eđa + maçkerdey = eđa maçkerdey: dayik ramîsan
 - dinya + wînay = dinya wînay: dinya dîtin
- Peyvên mê yên ku bi (e) an (î) diqedin: Divê ku em hinek bêtir di derbarê peyvên mê yên ku bi (e) an (î) diqedin de bizanibin:
 - ♦ Di Hewramî de hin peyvên mê yên ku bi (e) diqedin dikarin bi (î) jî biqedin. Her weha, hin peyvên mê yên ku bi (î) diqedin dikarin bi (e) jî biqedin. Jî di her du awayan de giranî li ser kîte ya pêşîn an navîn e. Mînak:

kerge = kergî /// werwe = werwî /// tewene = tewenî /// çirawe = çirawî (çira: m)

- ♦ Ji ber vê yekê ye ku peyvên mê yên ku şixwe bi (î) diqedin wek (winî = xwîn) dema ku di ravekên navdêran de werin, dişên paşqertafa (ew) bigirin. Nimûne:

winî = wine >> winew difî: xwîna dil

wezî = weze >> wezew baxa: goza baxan

jenî = jene >> jenew yaney: jina malê

awî = awe >> awew haney: ava kaniyê

- ♦ Ev peyv dema ku bi raderê re werin, dengdêra li dawiya wan tê rakirin:

- kerge + wardey = kerg wardey: mirîşk xwarin
- cejne + mobarek kerdey = cejn mobarek kerdey: cejn pîroz kirin
- şêere + niwîstey = şêêr niwîstey: helbest nivîsandin
- werwe + waray = werw waray: berf barîn
- mange + wînay = mang wînay: heyv dîtin
- wezî + wardey = wez wardey: goz xwarin
- jenî + wastey = jen wastey: jin xwestin
- winî + amay = win amay: xwîn hatin
- tewenî + wistey = tewen wistey: kevir avêtin

- Hin peyvên mê hene ku bi (ye) û (yî) diqedin. Hejmara van peyvan ne zêde ye lê zanîna taybetmendiya van lazim e:
 - Ji peyvên mê yên qedandî bi (yî) nimûne:
 - >>> diřeyî: *strî*
 - >>> neweyî: *nok*
 - Ji peyvên mê yên qedandî bi (ye) nimûne:
 - >>> metîye: *met / xaltî*
 - >>> goranîye: *stran*
- ♦ Dema ku peyvên mê yên qedandî bi (yî) bi raderê re werin tenê (î)ya li dawiya wan tê rakirin:
 - diřeyî: *strî* >> diřey kenney: *strî* kolandin
 - neweyî: *nok* >> newey girînay: *strî* kelandin
- ♦ Jî dema ku peyvên mê yên qedandî bi (ye) bi raderê re werin (ye)ya li dawiya wan tê rakirin:
 - metîye + wînay >> metî wînay: *met/xaltî* dîtin
 - goranîye + watey >> goranî watey: *stran* gotin
- Peyvên mê yên ku bi (ê) diqedin: Di van peyvan de (ê)ya li dawiyê dibe (e):
 - kinaçê + day şû = kinaçe day şû: keç zewicandin
 - şîşê + mařay = şîşe mařay: şîşe şikandin
 - leterê + řêstey = letere řêstey: teřî ristin
 - qisê + kerđey = qise kerđey: qise kirin
 - gozê + peřkerđey = goze peřkerđey: kûzik tijîkirin

2_ Dema (û = û) were: hemîya guhertinan wek jimara yekê ye.

- Peyvên ku bi (a) diqedin: Ev peyv nayên guhertin an dengdêra li dawiya wan jî nayê rakirin:
 - dega + û + şar = dega û şar: gund û bajar
 - eđa + û + tate = eđa û tate: dê û bav
 - dinya + û + axîret = dinya û axîret

- **Peyvên ku bi (e) an (î) diqedin: Ev peyv tên guhertin bi vî rengî ku dengdêra li dawiya wan tê rakirin:**

- kerge + û + keleşêr = kerg û keleşêr: mirîşk û dîk
- cejne + û + weşî = cejn û weşî: cenj û şahî
- şêere + û + kitêb = şêêr û kitêb: helbest û pirtûk
- werwe + û + waran = werw û waran: berf û baran
- mange + û + řocyar = mang û řocyar: heyv û tav
- wezî + û + dar = wez û dar: goz û dar
- jenî + û + pîya = jen û pîya: jin û mêr
- winî + û + pos = win û pos: xwîn û post
- tewenî + û + dar = tewen û dar: kevir û dar

- **Peyvên ku bi (ye) diqedin: Ev peyv tên guhertin bi vî rengî ku (e)ya li dawiya wan tê rakirin:**

- diřeyî + û + gela = diřey û gela = strî û pel

- **Peyvên ku bi (ye) diqedin: Ev peyv tên guhertin bi vî rengî ku (ye)ya li dawiya wan tê rakirin:**

- metîye + û + lalo = metî û lalo = xaltî û xal

- **Peyvên ku bi (ê) diqedin: Di van peyvan de (ê)ya ku li dawiyê ye dibe (e):**

- Kinaçe + û + kuř = Kinaçe û kuř: keç û kur
- Şîşe + û + delaqe = Şîşe û delaqe: şîşe û pencere
- Leterê + û + ben = Leterê û ben: teşî û bend
- Qisê + û + bas = Qise û bas: gotar û nîqaş

3_ Dema navdêrên mê bi rengdêreka din re werin û rengdêreke nû çêbikin:

Eđa + merde/merdê = Eđamerde/merdê > yê/ya ku dayika wî/wê mirîye.

Şêere + waç/waçe = Şêerwaç/waçe > yê/ya ku helbest dibêje.

Winî + mij/mije = winmij/mije > yê/ya ku xwînmij e.

Qisê + weş/weşe = Qiseweş/weşe > yê/ya ku gotinên wî/wê xweş in.

Leterê + řês/řêse = Letererês/řêse > yê/ya ku teşî dirêse.

Goranîye + waç/waçe = Goranîwaç/waçe > yê/ya ku stranê dibêje.

- Taybetmendiyên jorîn di peyvên nêr ên qedandî bi bideng de nayên dîtin:

- **va/wa + ginay = va/wa ginay: ba werzîn**
- **yane + sanay = yane sanay: mal kirîn**
- **gicî + wirastey = gicî wirastey: kiras dirûtin**
- **do + û + mas = do û mas: dew û mast**
- **şû + kerdey = şû kerdey: mêr kirin / şû kirin**
- **mey wardeywe = mey wardeywe: bade/mey vexwarin**

- **Berî ku em raderê bixwînin dixwazim di derbarê du peyvan de şiroveyekê bidim. Ew du peyvên mê yên (biwe) û (řiwe) ye dema ku bi raderê re werin:**

- ***biwe : bêhn >> bo kerdey : bêhn kirin***
- ***řiwe : rû >> řû kerdey : rû kirin***

Ême beşû watêma temamna. Ême çî beşîne taybetmendîyekaw
zarawey Hewramîma wanê û tawama ta řadêw çenîw řaziwanekeyş
aşnê bîmê. Her çin ke heşay babetê firê menênê ta xaster fêrê bîmê.
Ême wazmê ke be wanaw î kitêbî wêma fêrêw Hewramî bikermê.
Hewramî fire şîrîn a û zanmê ke dimaw fêrbîyeyş metawmê waziş
çine barmê. Ba bilmê û beşêwî terî ce kitêbekey biwanmê.

ئیمه به‌شو واتیما ته‌مامنا. ئیمه چی به‌شینه تایه‌تمه‌ندییه‌ کاو زاراوه‌ی هه‌ورامیما وانی
و تاواما تا رادیو چه‌نیو رازوانه‌ که‌یش ئاشنی بیمی. هه‌ر چن که‌ هه‌لای بابه‌تی فری
مه‌نینی تا خاسته‌ر فی‌ری بیمی. ئیمه‌ وازمی که‌ به‌ واناو ئی کتییی ویمای فی‌ریو هه‌ورامی
بکه‌رمی. هه‌ورامی فره‌ شیرینا و زانمی که‌ دماو فی‌رییه‌یش مه‌تاومی وازش چنه‌ بارمی. با
بلمی و به‌شیوی ته‌ری جه‌ کتیه‌ که‌ی بوانمی.

Me beşa peyvê qedand. Me di vê beşê de taybetmendiyeên zaravayê
Hewramî xwendin û karî heta radeyekê rêzimana wê nas bikin. Tevî
ku gelek babet mane da ku em baştir fêr bibin. Em dixwazin bi
xwendina vê pirtûkê xwe fêrî Hewramî bikin. Hewramî gelek şêrîn e
û em dizanin ku piştî fêrbûna wê, em nikarin dev jê berdin. Bila em
herin û beşeka din ji pirtûkê bixwînin.

Beşa duyem: Rader (Mesder)

_ Di vê beşê de dê beşeke biçûk ji raderên Hewramî were ravekirin û di beşa çarem a pirtûkê de ravekirina bêtir û awayê avakirina raderê dê were ravekirin.

_ Dema ku koka lêkerê û paşqertafek werin ber hev, bêyî ku rewşa lêkerê bi demê ve girêdayî be, hingê lêker di forma “rader” de ye.

_ Di Hewramî de jî wek Kurmancî, dema ku koka dema borî ya lêkerê û paşqertafek bi hev re werin, rader çêdibe. Mînak:

Hewramî	Kurmancî
kerd + ey = kerdey	kir + in = kirin
zana + y = zanay	zanî + n = zanîn
bî + yey = bîyey	bû + yîn = bûyîn

- Her weha bizanibin ku di Hewramî de zayenda raderê nêr e lê ya Kurmancî mê ye. Ev jî ji ber avaniya raderê ye. Ango giranî li ser kîte ya dawîn e.

Hewramî	Kurmancî
Jîway be kurdî weş a.	Jîyan bi kurdî xweş e.
Wardew nîmeroy çêş a?	Xwarina nîvro çi ye?

_ Di Hewramî de sê cureyên raderan hene:

1_ Yê ku bi paşqertafa (y) diqedin. Koka dema borî ya wan bi tîpa (a) ve diqede. Mînak:

ama → amay	liwa → liway	zana → zanay
(hat) → hatin	(çû) → çûn	(zanî) → zanîn

2_ Yê ku bi paşqertafa (ey) diqedin. Koka dema borî ya wan bi tîpa bêdeng ve diqede. Mînak:

kerd → kerdey	wit → witey	ward → wardey
(kir) → kirin	(raket) → raketin	(xwar) → xwarin

3_ Yê ku bi paşqertafa (yey) diqedin. Koka dema borî ya wan bi tîpa (î) ve diqede. Jimara raderên bi vî rengî pir kêmtir e. Mînak:

bî → bîyey	dizî → dizyey	çinî → çinyey
(bû) → bûn	(dizî) → dizîn	(çinî) → çinîn

- Çend xal:

- Dibe ku hin ji van raderan (ey, y, yey) pêşgir û paşgirên din bigirin ku wateyeke nû biafirîne û em ê di beşa sêyemîn a pirtûkê de vebêjin. Mînak:

Hewramî

kewtey → kewteyre
yaway → yawayne
wardey → wardeywe

Kurmancî

ketin → daketin
gihîştin → têgihîştin
xwarin → vexwarin

- Em ê bixwînin ku nasnavê kesê duyem ê yekjimar ê lêkera pêwîst, (y) ye û dibe ku ev bi nîşana raderîyê re were tevlihevkin. Mînak:

→ Amay : 1_ (tu) Hatî 2_ Hatin (rader)
Liway: 1_ (tu) Çûyî 2_ Çûyîn (rader)

Ev taybetmendî di Kurmancî de jî tê dîtin> Hatin :1_Hatin(rader) 2_Em/Hûn/Ew hatin.

- Nîşanên raderiyên Hewramî û Kurmancî:

Hewramî	Kurmancî
y, ey, yey	n, in, yîn

- Nîşana raderiyên (y, ey, yey), ne nîşanek ji bo pêwîst an gerguhêz bûna lêkerê ye:

Astey (hiştin): gerguhêz
Wînay (dîtin): gerguhêz
Dizyey (dizîn): gerguhêz

Bîyey (bûyîn): pêwîst
Kewtey (ketin): pêwîst
Waray (barîn): pêwîst

- **Hin raderên Hewramî:**

Hewramî Kurmancî

amay	hatin
astey	hêlan
berdey	birin
bîyey	bûn, bûyîn, hebûn
kerdey	kirin
kêştey	kişandin
kewtey	ketin
liway	çûyîn
maʔay	şikandin
niwîstey	nivîsandin
persay	pirsîn
sanay	kirrîn/standin
taway	karîn
tersay	tirsîn
wanay	xwendin
wardey	xwarin
wardeywe	vexwarin
watey	gotin
wînay	dîtin
wisnay	razandin
wistey	xistin
witey	razan
yaway	gihîştin
zanay	zanîn

Beşa duyem: Cînav

_ Peyveke ku cihê navdêrê digire û rê li ber dubarekirina di nivê hevokê de digire û cureyên wê hene:

- 1- Cînavên kesan
- 2- Cînavên îşaretê
- 3- Cînavê hevpar
- 4- Cînavê xwedanî

1- Cînavên kesan:

- Dema ku meriv kesekî yan kesan (şexsan) îşaret dike yan jî nîşan dide, ji peyvên ku di cihê navê wan de tên bikaranîn re dibêjin “*cînav*”.
- Di Hewramî de jî du cure cînavên kesan hene(ji alîyê halê xwerû an tewandî bûnê ve):
 - 1_ Cureyê halê xwerû yê cînavan
 - 2_ Cureyê halê tewandî yê cînavan
- ♦ Jî ji alîyê din ve sê cure cînavên kesan hene ku em ê bixwînin.

>>> Cureyê halê xwerû yê cînavan:

Hewramî	Kurmancî
min (n/m)	ez
to (n/m)	tu
ađ (n)	ew (n)
ađe (m)	ew (m)
ême (pj)	em
şime (pj)	hûn
ađe (pj)	ew

>>> Cureyê halê tewandî yê cînavan:

Hewramî	Kurmancî
min (n/m)	min
to (n/m)	te
ađî (n)	wî (n)
ađê (m)	wê (m)
ême (pj)	me
şime (pj)	we
ađîşa (pj)	wan

- Hin xal:

1_ Şêweyekî din ê cînavê min, (emin) e ku li helbestan tê bikaranîn û di sohbetan de tune. Jî di hin navçeyan de wek bajarê Paweyê li şûna (min), (em) tê gotin:

{ *Em xelkû Pawey na: Ez xelkê Paweyê me.* }

2_ Berê, li şûna cînavê min, cînavê (ez) û li şûna cînavê to cînavê (te) jî hatiye bikaranîn:

- *Du mînakên helbestên Seydî (helbestvan):*

→ Ez Oromon mekanim bê welatim / Serû pîrî Xiway gêrtên xelatim

→ Te ferz a dey zekatû nazenînît / Ezîç derwêşû te, sa de zekatim

- Em ê di beşa helbestan de behsa helbestên Hewramî û wateyên wan bikin.

3_ Lêker di Hewramî de, berevajî Îngilîzî, Zazakî û Kurmancî hema bêje ji bo hemîya lêkeran bi taybet ji bo pirjimar dikare bêtî cînavê kirdeyî(failî) were gotin û nivîsîn. Elbet di Îngilîzî, Zazakî û Kurmancî de hin lêker dikarin bêtî cînavê kirdeyî(failî) were gotin û nivîsîn:

Hewramî	Kurmancî	Îngilîzî	Zazakî
min werû = werû	ez dixwim = dixwim	I eat	ez wena
to(n) amanî = amanî	tu hatîyî = hatîyî	you`ve came	ti ameyî
to(m) amênî = amênî	tu hatîyî = hatîyî	you`ve came	ti ameya
ađ/ađe mê = mê	ew tê = tê	he/she comes=comes	o yeno _ a yena
ême sanama= sanama	me kirrî	we bought	ma herîna
şime meydê = meydê	hûn tên	you come	şima yenê
ađe amê = amê	ew hatin	they came	ê ameyê

Wisa ku dibînin di Kurmancî de jî dibe ku ji bo hin lêkeran cînavê kirdeyî neyê bi kar anîn.
Xala din ev e ku hemîya lêkerên Hewramî ne wisa ne. Mînak:

Liwê : >> Ađ /Ađe liwê: Ew diçû

>> Ađe liwê: Ew çûn

Kuşyay : >> Ađ /Ađe kuşya: Ew hat kuştin

>> Ađe kuşya: Ew tên kuştin

4_ Divê bê gotin ku cînavên (min, to, ême, şime) hem di halê xwerû de hem jî di halê tewandî de tim eynî ne. Lê yên Kurmancî ne wisa ne.

Hin mînak:

Hewramî

Min amanê. To min wînî?

To kitêbit sana, welê to mewaniş.

Eger ađ ama, min maçû be ađî.

Ađe amêne welê min ađe mewînû.

Ême amaymê. Ađ ême wîno.

Şime liwaydê. Şime kerdta?

Ađe kê nê? Ađîşa bijnasne be min.

Kurmancî

Ez hatim. Tu min dibînî?

Te pirtûk kirrî, lê tu wê naxwînî.

Eger ew hat, ez dibêjim wî.

Ew hatiye lê ez wê nabînim.

Em hatin. Ew me dibîne.

Hûn çûn. We kir?

Ew kê ne? Wan bi min bide nasîn.

- Bi dîtina min, fêrbûna lêkera bûnê/nîvco ji bo têgihîştin û famkirina naveroka mayî pir bikêr be, lewma em ê hîn bikin. Helbet di Hewramî de du cure lêkera bûnê hene. Ya yekem ji bo ravekirina tiştan e û ya duyem jî ji bo ravekirina cihê wan e (ango ew li ku derê ne/ bi me re ye, li vir e an li ku ye):

1_ Ravekirina tiştan: Formên wê yên erênî û neyînî piştî navdêrê tên. Di hemû cînavan de, giranî di forma neyînî ya lêkera bûnê de, dikeve ser kîte ya pêşîn. Jî di guhertoyên destpêkê yên pirtûkê de min lêkerên bûnê bi navdêran re girêdabûn ji ber ku di alfabeya kurdî-aramî de wiha ye. Lê di guhertoyên dawîn de min biryara xwe guhert û biryar da ku wek Zazakî û Kurmancî ji navdêrê (rengdêr, ...) cuda binivîsim. Ji ber ku pirsgerêk derdiketin û hînbûna Hewramî zehmet dibû. Mînak:

Hewramî(kurdî-aramî)	Hewramî(guhertoyên destpêkê yên pirtûkê)	Hewramî(guhertoyên dawî)
منا / مننا	minna/minena	min na/min ena

- Lê bizanin ku ev veqetandina nivîskî nayê wateya veqetandina bilêvkirina wan ji hev. Bilêvkirina wan wek Kurmancî û Zazakî ye.

Min (nêr) = Ez

- Lêkera ravekirina vî cînavî (na) ye ku paşê hemî tîp (bideng û bêdeng) tê:

- min (nêr): ez > lêkera bûnê: ji bo nêr > na (Hewramî) = im, me (Kurmancî):

Hewramî	Kurmancî
min kuř <u>na</u>	ez kur <u>im</u>
min tate <u>na</u>	ez bav <u>im</u>
min tûre <u>na</u>	ez bi hêrs <u>im</u>
min <u>na</u>	ez <u>im</u> (n)

- Forma neyînî ya vê lêkerê ji bo nêr(kesê yekem: nêr) > nîye(n) + na: nîn + im

Hewramî	Kurmancî
min tate <u>nîye na</u>	ez bav <u>nîn im</u> (ez ne bav im)
tûre <u>nîye na</u>	bi hêrs <u>nîn im</u> (ne bi hêrs im)
min <u>nîye na</u>	ez (n) <u>nîn im</u> (ne ez im)

nîye: nêr / nîyê: mê / nîyê: pirjimar (giranî dikeve ser kîte ya pêşîn)

___Min (mê) = Ez

- Lêkera ravekirina vî cînavî:

1_ (na): Paş tîpên bideng.

2_ (ena): Paş tîpên bêdeng.

- ♦ (na):

Hewramî	Kurmancî
min kinaçê <u>na</u>	ez keç <u>im</u>
min tûrê <u>na</u>	ez bi hêrs <u>im</u>
min eđa <u>na</u>	ez dayik <u>im</u>

- Forma neyînî ya vê lêkerê ji bo mê(kesê yekem) > nîyê(m) + na: nîn + im

Hewramî	Kurmancî
min tûrê <u>nîyê na</u>	bi hêrs <u>nîn im</u> (ne bi hêrs im)
min eđa <u>nîyê na</u>	ez dayik <u>nîn im</u> (ez ne dayik im)

- ♦ (ena):

Hewramî	Kurmancî
min eđat <u>ena</u>	ez dayika te <u>me</u> <lê> min eđaw to <u>na</u> : ez dayika te <u>me</u>
wêm <u>ena</u>	ez(m) bi xwe <u>me</u> (Soranî: Xom im)
min <u>ena</u>	ez <u>im</u> (m)

- Forma neyînî:

Hewramî	Kurmancî
min eđat <u>nîyê na</u>	ez dayika te <u>nîn im</u> (ne dayika te me)
wêm <u>nîyê na</u>	ez(m) bi xwe <u>nîn im</u> (Soranî: Xom nîm)
min <u>nîyê na</u>	ez (m) <u>nîn im</u> (ne ez im)

___To (nêr) = Tu

- Lêkera ravekirina vî cînavî (nî) ye ku paşê hemî tîp(bideng û bêdeng) tê:
Lêkera bûnê: ji bo nêr > nî (Hewramî) = î , yî (Kurmancî):

Hewramî	Kurmancî
to kuř <u>nî</u>	tu kur <u>î</u>
to zema <u>nî</u>	tu zava <u>yî</u>
to <u>nî</u>	tu <u>yî</u>

- Forma neyînî > *nîye(n) + nî: nîn + î*

Hewramî	Kurmancî
to zema <i>nîye</i> <u>nî</u>	tu zava <i>nîn</i> <u>î</u>
to <i>nîye</i> <u>nî</u>	tu(n) <i>nîn</i> <u>î</u>

__To (mê) = Tu

- Lêkera ravekirina vî cînavî:

1_ (nî) : Paş tîpên bideng.

2_ (enî) : Paş tîpên bêdeng.

- ♦ (nî):

Hewramî	Kurmancî
to(m) kinaçê <u>nî</u>	tu keç <u>î</u>
to(m) tûrê <u>nî</u>	tu bi hêrs <u>î</u>
to(m) eđa <u>nî</u>	tu dayik <u>î</u>
to(m) <u>nî</u>	tu <u>yî</u>

- Forma neyînî > *nîyê(m) + nî: nîn + î*

Hewramî	Kurmanc
to(m) <i>nîyê</i> <u>nî</u>	tu <i>nîn</i> <u>î</u>

- ♦ (enî):

Hewramî	Kurmancî
to eđam <u>enî</u> (to eđaw min <u>enî</u>)	tu dayika min <u>î</u>
to walêmin <u>enî</u> (to walêw min <u>enî</u>)	tu xuşka min <u>î</u>
wêt <u>enî</u>	tu(m) bi xwe <u>yî</u>

- Forma neyînî :

Hewramî	Kurmancî
to eđam <i>nîyê</i> <u>nî</u>	tu dayika min <i>nîn</i> <u>î</u>
to(m) jîre <i>nîyê</i> <u>nî</u>	tu jîr <i>nîn</i> <u>î</u>
wêt <i>nîyê</i> <u>nî</u>	tu(m) bi xwe <i>nîn</i> <u>î</u>

Ad (nêr) = Ew

➤ Lêkera bûnê : ji bo nêr

1_ (n): Paş tîpên bideng: e , ye (Kurmancî)

2_ (a): Paş tîpên bêdeng: e , ye (Kurmancî)

♦ (n) paş tîpên: a , e , ê , î , o , û , ı

Hewramî

Kurmancî

ađ bira n

ew bira ye

ađ tûrê n

ew bi hêrs e

Şaho kê n?

Şaho kî ye

Řehman Hewramî n

Rehman Hewramî ye

řefêqû min Zanko n

hevalê min Zanko ye

îne mû n

ev mû ye

wextû nanwarđey n

wextê nanxwarinê ye

• Forma neyînî > nîya: nîn e

Hewramî

Kurmancî

ađ bira nîya

ew bira nîn e

ađ tûrê nîya

ew bi hêrs nîn e

ađ Şaho nîya

ew Şaho nîn e

Řehman Hewramî nîya

Rehman Hewramî nîn e

řefêqû min Zanko nîya

hevalê min Zanko nîn e

îne mû nîya

ev mû nîn e

wextû nanwarđey nîya

wextê nanxwarinê nîn e

_ Di hin navçeyan de nîyen jî ji bo nêr û mê bi kar tînin.

(a) paş tîpên bêdeng û di hin deran de paş tîpa(y):

Hewramî

Kurmancî

řefêqû min Azad a

hevalê min Azad e

îne weş a

ev xweş e

biraw min a (biram a)

birayê min e

ađ a

ew e(n)

wextû nan warđey a

wextê nanxwarinê ye

• Forma neyînî :

Hewramî

Kurmancî

ađ nîya

ew nîn e

řefêqû min Azad nîya

hevalê min Azad nîn e

- Di hin navçeyan de nîyen jî bi kar tînin:

Řefêqû min Azad nîyen.

Ađ nîyen.

- ♦ *Şêweyekî din ê (a) > (arê/arî) ye ku wek (nê) di (kanê)ya Kurmancî de ye. Di nivîsînê de bi gelemperî nîn e lê tê gotin:*

Ađ arê/arî = ew e(n)

Ađ nîyarê/nîyarî = ew nîn e(n)

Ađe(mê) = Ew

- Lêkera bûnê : ji bo mê

1_ (ne): Paş bideng: e , ye (Kurmancî)

2_ (ene): Paş bêdeng: e , ye (Kurmancî)

- Dibe ku hûn bipirsin ka navên keçan ên wek Dilber, Şermîn, Sojîn û hwd ku bi peyvên bêdeng diqedin dê çawa bin? Navên qedandî bi bêdeng ên weha di Hewramî de dê nîşana mê (e) bigirin jî giranî dikeve ser kîte yên pêşîn an navîn. > Dil**ber**e, Şer**mî**ne, Soj**î**ne

Hewramî

anê Şermîne ne

anê kê ne? Şermîne ne?

Dilbere kê ne?

řefêqew min Sara ne

řefêqew min Dilbere ne

Kurmancî

ew Şermîn e

ew kî ye? Şermîn e (gelo)?

Dilber kî ye?

hevala min Sara ye

hevala min Dilber e

Eđa: dayik >> Eđam ene (eđaw min ene): dayika min e: di vê nimûnê de peyva eđam bi tîpa (m) diqede ku bêdeng e.

- Forma neyînî > *nîyê(m) + ne: nîn + e*

Hewramî

anê Şermîne nîyê ne

anê kê ne? Şermîne nîyê ne?

Dilbere nîyê ne?

řefêqew min Sara nîyê ne

řefêqew min Dilbere nîyê ne

Kurmancî

ew Şermîn nîn e

ew kî ye? Şermîn nîn e (gelo)?

Dilber nîn e?

hevala min Sara nîn e

hevala min Dilber nîn e

- řefêq: heval(n) / řefêqe: heval(m) / řefêqê: heval(pj)

Ême = Em

➤ Lêkera ravekirina cînavê (ême: em)

1_ (nmê) : Paş tîpên bideng: in , ne (Kurmancî)

2_ (enmê) : Paş tîpên bêdeng: in , ne (Kurmancî)

♦ (nmê):

Hewramî	Kurmancî
---------	----------

ême <u>nmê</u>	em <u>in</u>
----------------	--------------

ême kurdê <u>nmê</u>	em kurd <u>in</u>
----------------------	-------------------

kurd: kurd(n) /// kurde: kurd(m) /// kurde: kurd(pj)

♦ (enmê):

Hewramî	Kurmancî
---------	----------

ême eđa û tatet <u>enmê</u> .	
-------------------------------	--

	em dê û bavê te <u>ne</u>
--	---------------------------

- Forma neyînî > *nîyê(pj)* + nmê: *nîn + in*

Hewramî	Kurmancî
---------	----------

ême miçkilê nîyê <u>nmê</u>	em piçûk nîn <u>in</u>
-----------------------------	------------------------

ême wanyarê nîyê <u>nmê</u>	em xwendekar nîn <u>in</u>
-----------------------------	----------------------------

Şime = Hûn

➤ Lêkera ravekirina cînavê (şime: hûn):

1_ (ndê) : Paş tîpên bideng: (Hewramî) : in , ne (Kurmancî)

2_ (endê) : Paş tîpên bêdeng: (Hewramî) : in , ne (Kurmancî)

♦ (ndê):

Hewramî	Kurmancî
---------	----------

şime <u>ndê</u>	hûn <u>in</u>
-----------------	---------------

şime kurdê <u>ndê</u>	hûn kurd <u>in</u>
-----------------------	--------------------

♦ (endê):

Hewramî	Kurmancî
---------	----------

şime weşewîsêw diû min <u>endê</u>	
------------------------------------	--

	hûn delalên dilê min <u>in</u>
--	--------------------------------

- Forma neyînî > *nîyê(pj)* + ndê: *nîn + in*

Hewramî	Kurmancî
---------	----------

Şime kinaçê/kuřê nîyê <u>ndê</u>	
----------------------------------	--

	Hûn keç/kur nîn <u>in</u>
--	---------------------------

Şime neweşê nîyê <u>ndê</u>	
-----------------------------	--

	Hûn nexweş nîn <u>in</u>
--	--------------------------

Adê = Ew

- Lêkera ravekirina cînavê(adê: ew)

1_ (nê): Paş tîpên bideng: (Hewramî) : in , ne (Kurmancî)

2_ (enê): Paş tîpên bêdeng: (Hewramî) : in , ne (Kurmancî)

- ♦ (nê):

Hewramî	Kurmancî
adê <u>nê</u>	ew <u>in</u>
adê kurdê <u>nê</u>	ew kurd <u>in</u>

- ♦ (enê):

Hewramî	Kurmancî
adê eđa û tatew min <u>enê</u>	ew dê û bavê min <u>in</u>
adê walêt <u>enê</u>	ew xuşkên te <u>ne</u>
înê çemêw min <u>enê</u>	ev çavên min <u>in</u>

- Forma neyînî > nîyê(pj) + nê: nîn + in

Hewramî	Kurmancî
Adê wanyarê <u>nîyê nê</u>	Ew xwendekar <u>nîn in</u>
Adê jenî <u>nîyê nê</u>	Ew jin <u>nîn in</u>

- Dibe ku hin car li şûna (enmê, endê, enê), (ênmê, êndê, ênê) jî were gotin.
înê çemêw min nê = îne çemêw min enê = îne çemêw min ênê. Lê ev tişt ji bo hemî tîpan sabît nîn e.
- Jî hin kes (ne) paş tîpên bêdeng tînin: Walêw ene = Walêw ne: Xuşka min e

--- nîye / nîyê = nîn ---

Hewramî	Kurmancî
----------------	-----------------

min (n) nîye na	ez nîn im
-----------------	-----------

min (m) nîyê na	ez nîn im
-----------------	-----------

to (n) nîye nî	tu nîn î
----------------	----------

to (m) nîyê nî	tu nîn î
----------------	----------

ađ (n) nîya	ew nîn e
-------------	----------

ađe nîyê ne	ew nîn e
-------------	----------

ême nîyê nmê	em nîn in
--------------	-----------

şime nîyê ndê	hûn nîn in
---------------	------------

ađe nîyê nê	ew nîn in
-------------	-----------

Mînak > kê: kî

Hewramî	Kurmancî
----------------	-----------------

min(m/n) kê na	ez kî me
----------------	----------

to(m/n) kê nî	tu kî yî
---------------	----------

ađ kê n	ew kî ye
---------	----------

ađe kê ne	ew kî ye
-----------	----------

ême kê nmê	em kî ne
------------	----------

şime kê ndê	hûn kî ne
-------------	-----------

ađe kê nê	ew kî ne
-----------	----------

2_ Lêkera bûnê ji bo ravekirina cihê tiştan:

_ Di Hewramî de ji bo danasîna cihê nesne û mirovan du peyvên tîn bikaranîn û her du peyv jî beriya navdêra cihan tîn gotin. Peyva yekem (îna) ye û peyva duyem jî (he) ye. (îna) bêtir li Hewraman Text û Lehonê tîn gotin û (he) bêtir li Jaweroyê tîn gotin. Jî dema ku em van lêkeran bikêr tînin, carinan em dikarin paşdaçekên wek (ne: di ... de) bikêr neynin. Forma neyînî ya wan du peyvan(îna/he) eynî ne:

Min (n/m) ⇔ îna + na = înana

Min (n/m) ⇔ he + na = hena

Ême ⇔ îna + ymê = înaymê

Ême ⇔ he + nmê = henmê

To (n/m) ⇔ îna + y = înay

To (n/m) ⇔ he + nî = henî

Şime ⇔ îna + ydê = înaydê

Şime ⇔ he + ndê = hendê

Ađ/Ađe ⇔ îna + ___ = îna

Ađ ⇔ hen + ___ = hen

Ađe ⇔ îna ==> îne

Ađe ⇔ hen + e = hene

Ađe ⇔ he + nê = henê

- Berevajî lêkera berê, ev du berî navdêra cihî tîn gotin.
- Mîna lêkera berê, ji bo forma neyînî (nîye / nîyê) tîn bikaranîn lê berî navdêra cihî.

Min (nêr/mê) = Ez

(înana / hena): Lêkera ravekirina cihê cînavê (min: ez) Mînak:

Hewramî

Kurmancî

min înana/hena yane

ez li malê me

min înana/hena yanene

ez li malê me

- Gotina înanê û înanî ji bo cînavê (min: n/m) jî bi gelemperî ne.

Forma neyînî > nîye(n) + na: nîn + im ,, nîyê (m) + na: nîn + im

Hewramî

Kurmancî

Min(n) nîye na yane/yanene

Ez ne li malê me

Min(m) nîyê na yane/yanene

Ez ne li malê me

___**To (nêr/mê) = Tu**

(*înay /henî*): Lêkera ravekirina cihê cînavê (to: tu) Mînak:

Hewramî

Kurmancî

To înay/henî dilimne Tu di dilê min da yî

- (ne) li dawiya (dilimne): Paşdaçeka (di ... da) ye, lêkera bûnê nîn e. Jî me xwend ku lêkera bûnê ji navdêrê cuda ye lê hûn dibînin ku daçeka (ne) bi navdêrê ve bestiyaye.

- Lê:

to(n) dilim nî : tu dilê min î

to(m) dilim enî : tu dilê min î

Forma neyînî > *nîye(n) + nî: nîn + î* ,,, *nîyê(m) + nî: nîn + î*

Hewramî

Kurmancî

to (n) nîye nî dilimne tu di dilê min de nîn î

to (m) nîyê nî dilimne tu di dilê min de nîn î

___**Ađ /Ađe = Ew**

(*îna*): Lêkera ravekirina cihê cînavê (ađ/ađe: ew)

- Sê wateyên (ko) hene: 1_ çiya 2_ li ku 3_ kom
- Lê tenê yek wateya (çiko) heye: li ku

Hewramî

Kurmancî

Mihemmed îna ko(çiko)?

Mihemed li ku ye ?

Şino îna yanew ême

Şino di mala me da ye

Êşqit îna dilimne

Evîna te di dilê`m da ye

Forma neyînî > *nîya(n): nîn + e* ,,, *nîyê(m) + ne: nîn + e*

Hewramî

Kurmancî

Ađ nîya ça/çane

Ew(n) ne li wir e

Ađe nîyê ne ça/çane

Ew(m) ne li wir e

___**Ađ = Ew(n)**

(**hen**): Lêkera ravekirina cihê cînavê (ađ: ew{n}) Mînak:

Hewramî

Kurmancî

Ađ **hen** ça

Ew li wir **e**

Ađ **hen** yane

Ew li malê **ye**

___**Ađe = Ew(m)**

(**hene**): Lêkera ravekirina cihê cînavê (ađe: ew{m}) Mînak:

Hewramî

Kurmancî

Ađe **hene** ça

Ew li wir **e**

Ađe **hene** yane

Ew li malê **ye**

___**Ême = Em**

(**înaymê /henmê**): Lêkera ravekirina cihê cînavê (ême: em)

Mînak:

Hewramî

Kurmancî

Ême **înaymê/henmê** řane Em ***dî*** rê ***da*** **ne** > řa: rê

Forma neyînî > ***nîyê(pj)*** + nmê: ***nîn*** + in

Hewramî

Kurmancî

Ême **nîyê nmê** ça

Em **ne** li wir **in**

___**Şime = Hûn**

(**înaydê /hendê**): Lêkera ravekirina cihê cînavê (şime: hûn)

Mînak:

Hewramî

Kurmancî

Şime **înaydê/hendê** çiko Hûn li ku **ne**

Forma neyînî > ***nîyê(pj)*** + ndê: ***nîn*** + in

Hewramî

Kurmancî

Şime **nîyê ndê** ciber

Hûn li derve **nîn in**

Adê = Ew(pj)

(*îne /henê*): Lêkera ravekirina cihê cînavê (*adê: ew*)

Mînak:

Hewramî

Kurmancî

Adê îne/henê çê

Ew li vir in

Forma neyînî > *nîyê(pj)* + *nê: nîn* + *in*

Hewramî

Kurmancî

Adê nîyê nê dilê

Ew li hundir nîn in

➤ Hin xal :

1_ Di dema axaftin an xwendina helbestên Hewramî de hûn ê vê cureyê lêkera bûnê ji bo kesê sêyem yekjimar bibînin ku pir tê axaftin>>> (n) û (en) ji bo nêr û mê. Ango bi vî awayî lihevhatina lêker bi nêr û mê nayê dîtîn: { *(n) paş dengdêr, (en) paş bêdeng, (yen) paş î* } :

***Vê xalê baş fêr bibin ji ber ku gelek kes wê bikar tînin.**

- *weş en* : *xweş e* (nêr û mê)
- *Azad en* : *Azad e*
- *kerge n* : *mirîşk e*
- *berew yaney waz en* : *derîyê malê vekirî ye*
- > *berz en Kosalan, Kosalan berz en / Kosalan wêney balay yar berz en*
: *Kosalan bilind e, Kosalan mîna bejna yar bilind e*
- *çêş en* : *çi ye*
- *nîyê n* : *nîn e / tune (n/m)*
- *hamin germ en* : *havîn germ e*
- *çêşit gerek en* : *te çi divê*
- *Şîrîn en* : *Şîrîn e*
- *wehar weş en* : *buhar xweş e*

2_ Bala xwe bidin hevokên jêrîn. Şêweyekî din ê lêkera bûnê (hebûn) :

Hewramî = Kurmancî >> he : he

Hewramî	Kurmancî
min(n) hena / nîye na	ez heme / tune me
min (m) hena / nîyê na	ez heme / tune me
to(n) henî / nîye nî	tu heyî / tune yî
to (m) henî / nîyê nî	tu heyî / tune yî
ađ hen / nîya	ew heye / tune ye
ađe hene / nîyê ne	ew heye / tune ye
ême henmê / nîyê nmê	em hene / tune ne
şime hendê / nîyê ndê	hûn hene / tune ne
ađe henê / nîyê nê	ew hene / tune ne

→ Ez dixwazim bibêjim ku ev cure lêker(he : he), li hin dever û navçeyan, ji bilî wateyên jorîn, dikare lêkera danasîna cîhê jî bide ku me xwend:

- min hena yane = min îana yane >>> ez li malê me
- to henî çiko = to înay çiko >>> tu li ku yî
- ađ hen çê = ađ îna çê >>> ew li vir e
- ađe hene yanema = ađe îna yanema >>> ew li mala me da ye
- ême henmê medrese = ême înaymê medrese >>> em li dibistanê ne
- şime hendê diłmane = şime înaydê diłmane >>> hûn di dilê me da ne
- ađe henê degane = ađe îne degane >>> ew di gund da ne

* Forma neyînî ya wê jî nîye na, nîye nî, nîyê nî, nîya û hwd e.

3_ Di Hewramî de em dikarin peyva çiko(ko:di wateya ku derê de) bi du awayan bi kar bînin:

Hewramî	Kurmancî
Min <i>çiko na</i> (ko na) = Min hena <i>çiko</i> (ko) = Min îana <i>çiko</i>	Ez li ku me
To <i>çiko nî</i> (ko nî) = To henî <i>çiko</i> (ko) = To înay <i>çiko</i>	Tu li ku yî
Ađ <i>çiko n</i> (ko n) = Ađ hen <i>çiko</i> (ko) = Ađ îna <i>çiko</i>	Ew li ku ye
Ađe <i>çiko ne</i> (ko ne) = Ađe hene <i>çiko</i> (ko) = Ađe îna <i>çiko</i>	Ew li ku ye
Ême <i>çiko nmê</i> (ko nmê) = Ême henmê <i>çiko</i> (ko) = Ême înaymê <i>çiko</i>	Em li ku ne
Şime <i>çiko ndê</i> (ko ndê) = Şime hendê <i>çiko</i> (ko) = Şime înaydê <i>çiko</i>	Hûn li ku ne
Ađe <i>çiko nê</i> (ko nê) = Ađe henê <i>çiko</i> (ko) = Ađe îne <i>çiko</i>	Ew li ku ne

4_ Divê ku em li ser forma neyînî ya lêkera bûnê bêtir şiroveyan bidin. Hewramî di nivîsên xwe de ku bi alfabeya kurdî-aramî ye, şiklê neyînî ya lêkera bûnê bi vî rengî bi kar tînin (نیه /نیین) ku ger em wê bi latînî binivîsin, wisa ye (niye/nîê). Lê dema ku em bala xwe bidin axaftin û bilêv-kirina wan, em (nîye/nîyê) dibihîzin. Ji aliyê rêzimanî ve jî (nîye/nîyê) rast e.

Ew van her du lêkeran bi vî awayî dinivîsin:

niye/nîê = nîn

Hewramî	Kurmancî
min (n) niye na	ez nîn im
min (m) nîê na	ez nîn im
to (n) niye nî	tu nîn î
to (m) niyê nî	tu nîn î
ađ (n) niya	ew nîn e
ađe niye ne	ew nîn e
ême niye nmê	em nîn in
şime niye ndê	hûn nîn in
ađe niye nê	ew nîn in

Hûn dibînin ku lêker ji yên ku me xwend kêmek cuda ne. Ev cudahî ji ber rehetiya nivîsandina peyvane û heke hûn nivîsên fermiya Hewramî bixwînin hûn ê bibînin ku (نیه /نیین) an (nîye/nîyê) hatine nivîsandin:

Hewramîya standard Hewramîya aramîya satandard Hewramîya aramîya xelkan

Min(n) niye na	من نیهنا	من نیهنا
Min(m) nîyê na	من نیینا	من نیینا

5_ Piraniya Hewramîyan hin lêkerên din wek (bîyey , dîyey û hwd) wisa dinivîsin: (biyey , diyey û hwd) = (دیهی، بییهی) ku awayê rast nivîsandina wê (دیهی، بییهی) ye.

Hewramî	Kurmancî
Ane/Îne kê bê? Ane/Îne Zanko bê.	Ew/Ev kê bû? Ew/Ev Zanko bû.
Anê/Înê kê bê? Anê/Înê Ayşê bê.	Ew/Ev kê bû? Ew/Ev Eyşe bû.
Anê/Înê kê bènê? Anê/Înê řefêqê bènê.	Ew/Ev kê bûn? Ew/Ev heval bûn.

Lê:

Hewramî	Kurmancî
Ane/Îne bî be moêelim.	Ew/Ev bû mamoste.
Anê/Înê bîye be moêelime.	Ew/Ev bû mamosta.
Anê/Înê bîyê be moêelimê.	Ew/Ev bûn mamoste.

Hewramî

Ziwanû min kurďî n.

Tatew to kê n?

Namêw adî çêş a?

Namêw adê çêşe ne?

Namêw adîşa çêşê nê?

Welatû ême.

Kinaçêw şime amêne?

Eďaw adîşa ne.

Min kerďim.

To key mey?

Aď/Aďe mê.

Ême kermê.

Şime kerdê.

Aďê kera.

Min(n) gewre na.

Min (m) gewrê na.

Min (n) fars nîye na.

Min (m) farse nîyê na.

To (n) pîya nî.

To (m) jenî nî.

To (n) jîr nîye nî.

To (m) jîre nîyê nî.

Aď Arman a.

Aďe Xecê ne.

Aď Selîm nîya.

Aďe Amînê nîyê ne.

Kurmancî

Zimanê min kurďî ye.

Bavê te kê ye?

Navê wî çi ye?

Navê wê çi ye?

Navên wan çi ne?

Wilatê me.

Keça we hatiye?

Dêya wan e.

Min kir.

Tu kengê tê?

Ew(n/m) tê.

Em dîkin.

Hûn dîkin.

Ew dîkin.

Ez mezin im.

Ez mezin im.

Ez fars nîn im.

Ez fars nîn im.

Tu mêr î.

Tu jin î.

Tu jîr nîn î.

Tu jîr nîn î.

Ew Arman e.

Ew Xecê ye.

Ew Selîm nîn e.

Ew Amîna nîn e.

Hewramî

Ême Hewramîyê nmê.

Şime hamsê ndê.

Ađê liwênê.

Ême xembarê nîyê nmê.

Şime dijminê nîyê ndê.

Ađê mênê.

Min (n) éaşiqû to na.

Min (m) éaşiqew to na.

To (n) éaşiq nî.

To (m) éaşiqe nî.

Ađ biraw min a /to n /Fatmê n.

Ađe walêw şime ne /ême ne /ađîşa ne.

Ađê zařolê nê.

Hêmin hamsaw Sîrwanî n.

Amed îna/hen sernîştû welatî.

Werwe îna/hene serû Şahoyne.

Werwe serû Şahoyne hene.

Ême înaymê welatû Kurdistanîne.

Ađê îne çiko <> Ađê çiko nê/ko nê?

Îne dewlemenîw ziwani Kurdî n.

Ziwan welat a.

Welatû ême bîyew ême n.

Welatû wêt biparêzne.

Kurmancî

Em Hewramî ne.

Hûn cîran in.

Ew çûne.

Em xembar nîn in.

Hûn dijmin nîn in.

Ew tên.

Ez evîndarê te me.

Ez evîndara te me.

Tu evîndar î.

Tu evîndar î.

Ew birayê min e /te ye /Fatimê ye.

Ew xwişka we ye /me ye /wan e.

Ew zarok in.

Hêmin cîranê Sîrwan e.

Amed di bakurê welêt da ye.

Berf li ser Şaho ye.

Berf li ser Şaho heye.

Em di wilatê Kurdistanê da ne.

Ew li ku ne?

Ev dewlemendiya zimanê Kurdî ye.

Ziman wilat e.

Wilatê me hebûna me ye.

Wilatê xwe biparêze.

_ Cînavê kesane yê girêdayî: Sê celeb hene.

- Cureyê yekem:

Cînavên kesan	<u>Cînavê girêdayî</u>	Cînavên kesan	<u>Cînavê girêdayî</u>
Min	im / m	Ême	ma
To	it / t	Şime	ta
Ađ	iş / ş	Adê	şa
Ađe	iş / ş		

1_ Ev cînav nasnavên hemû lêkerên gerguhêz ên dema borî ne.

➤ *cînavê kirdeyî(failî) + koka dema borî ya lêkera gerguhêz + cînavê cureyê yekem:*

watey : gutin : gotin

Hewramî

Min watim = watim

To watit = watit

Ađ/Ađe watis = watis

Ême watma = watma

Şime watta = watta

Adê watşa = watşa

Soranî

Min gutim = gutim

To gutit = gutit

Ew gutî = gutî

Ême gutman = gutman

Êwe guttan = guttan

Ewan gutyan = gutyan

Kurmancî

Min got

Te got

Wî/Wê got

Me got

We got

Wan got

!!!! : Dibe ku hûn bipirsin lêkera (watey) gerguhêz e, lê çima cînav di halê xwe yê tewandî de nîn in? Divê bê gotin ku di Hewramî de cînav ji yên Kurmancî û Zazakî kêmek cuda ne. Bo nimûne em dikarin bi du awayan lêkerên gerguhêz ên dema borî bi kar bînin.

Hewramî

min watim = min wat

to watit = to wat

ađ/ađe watis = ađî/ađe wat

ême watma = ême wat

şime watta = şime wat

ađe watşa = ađîşa wat

Kurmancî

min got

te got

wî/wê got

me got

we got

wan got

Elbet bizanibin ku ev taybetmendî tenê dema ku bireser di hevokê de nebe an cînavê cureyê yekem jî nebe, tê bikaranîn. Ev cînav dema ku lêker, lêkera gerguhêz a dema borî be û bireser di hevokê de bê gotin, bi bireserê re tên girêdan.

➤ *Cînavê xwerû yê kirdeyî(failî) + bireser + cînavê cureyê yekem + koka lêkera gerguhêz a dema borî:*

wanay : xwêndin : xwendin

Hewramî

min kitêbim wana.

to kitêbit wana.

ad/ađe kitêbiş wana.

ême kitêbma wana.

şime kitêbta wana.

adê kitêbşa wana.

Soranî

min kitêbim xwênd.

to kitêbit xwênd.

ew kitêbî xwênd.

ême kitêbman xwênd.

êwe kitêbtan xwênd.

ewan kitêbyan xwênd.

Kurmancî

min pirtûk xwend.

te pirtûk xwend.

wî/wê pirtûk xwend.

me pirtûk xwend.

we pirtûk xwend.

wan pirtûk xwend.

Hewramî

Kê kitêbiş wana ?

Luqmanî wana.

Luqman wanaş.

Luqman kitêbiş wana.

Kurmancî

Kê pirtûk xwend?

Luqman xwend.

Luqman xwend.

Luqman pirtûk xwend.

2_ Ger bireser pêkhatyeke pêvekê an wesfî be, ev cînav li beşa dawiya pêkhatyê tê zêdekirin.
(Lêker: gerguhêza dema borî)

- pêkhatya pêvekê

wanay : xwêndin : xwendin

Hewramî

Min kitêbû tom wana.

To kitêbû minit wana.

Ad/Ađe kitêbû toş wana.

Ême kitêbû toma wana.

Şime kitêbû êmeta wana.

Adê kitêbû toşa wana.

Soranî

Min kitêbî tom xwênd.

To kitêbî minit xwênd.

Ew kitêbî toy xwênd.

Ême kitêbî toman xwênd.

Êwe kitêbî êmeta xwênd.

Ewan kitêbî toyan xwênd.

Kurmancî

Min pirtûka te xwend.

Te pirtûka min xwend.

Wî/Wê pirtûka te xwend.

Me pirtûka te xwend.

We pirtûka me xwend.

Wan pirtûka te xwend.

- pêkhateya wesfî

wanay : xwêndin : xwendin

Hewramî

Min kitêbî éalim wana.

To kitêbî éalit wana.

Ad/Ade kitêbî éalış wana.

Ême kitêbî éalma wana.

Şime kitêbî éalta wana.

Adê kitêbî éalşa wana.

Soranî

Min kitêbî başim xwênd.

To kitêbî başit xwênd.

Ew kitêbî başî xwênd.

Ême kitêbî başman xwênd.

Êwe kitêbî baştan xwênd.

Ewan kitêbî başyan xwênd.

Kurmancî

Min pirtûka baş xwend.

Te pirtûka baş xwend.

Wî/Wê pirtûka baş xwend.

Me pirtûka baş xwend.

We pirtûka baş xwend.

Wan pirtûka baş xwend.

3_ Ji bo xwedî tiştekî bûn û hewcedariya tiştekî ye ku bi tiştekî ku me heye an me hewce dike re tê girêdan.

- Xwedî tiştekî bûn(tiştek ku me heye di hevokê de hatibe gotin)

Hewramî

min biram hen.

to maşînî nîya.

ad/ade kinaçêş hene.

ême derdêma firê nê.

şime kergeta nîyê ne?

adê kitêbê firêşa nîyê nê.

Soranî

min biram heye.

to otombêlî nîye.

ew kiçî heye.

ême derdanman zor in.

êwe mirîşkta nîye?

ewan kitêbanî zoryan nîye.

Kurmancî

min bira heye.

te otombîl tune.

wî/wê keç heye.

derdên me gelek in.

we mirîşk tune?

wan pir pirtûk tune ne.

- Xwedî tiştekî nêr bûn: (tiştek ku me heye di hevokê de nehatibe gotin)

Hewramî

min henim

to henit.

ad/ade heniş.

ême henma.

şime henta.

adê henşa.

Soranî

min heme.

to heşe.

ew heyetî.

ême hemane.

êwe hetane.

ewan heyane.

Kurmancî

min heye.

te heye.

wî/wê heye.

me heye.

we heye.

wan heye.

- Xwedî tişteki mê bûn: (tişteki ku me heye di hevokê de nehatibe gotin)

Hewramî	Soranî	Kurmancî
min henem.	min heme.	min heye.
to henet.	to hete.	te heye.
ađ/ađe heneş.	ew heyetî.	wî/wê heye.
ême henema.	ême hemanê.	me heye.
şime heneta.	êwe hetane.	we heye.
ađe heneşa.	ewan heyane.	wan heye.

- Xwedî tişteki pirjimar bûn: (tişteki ku me heye di hevokê de nehatibe gotin)

Hewramî	Soranî	Kurmancî
min henê.	?	min hene.
to henê.	?	te hene.
ađ/ađe henêş.	?	wî/wê hene.
ême henêma.	?	me hene.
şime henêta.	?	we hene.
ađe henêşa.	?	wan hene.

- Xwedî tişteki nêr nebûn:

Hewramî	Soranî	Kurmancî
min nîyam.	min nîme.	min tune.
to nîya.	to nîte.	te tune.
ađ/ađe nîyaş.	ew nîyetî.	wî/wê tune.
ême nîyama.	ême nîmanê.	me tune.
şime nîyata.	êwe nîtane.	we tune.
ađe nîyaşa.	ewan nîyane.	wan tune.

- Xwedî tişteki mê nebûn:

Hewramî

min nîyênem.

to nîyênê.

ađ/ađe nîyênêş.

ême nîyênema.

şime nîyêneta.

ađe nîyênêşa.

Soranî

min nîme.

to nîte.

ew nîyetî.

ême nîmane.

êwe nîtane.

ewan nîyane.

Kurmancî

min tune.

te tune.

wî/wê tune.

me tune.

we tune.

wan tune.

- Xwedî tişteki pirjimar nebûn:

Hewramî

min nîyênêm.

to nîyênê.

ađ/ađe nîyênêş.

ême nîyênêma.

şime nîyênêta.

ađe nîyênêşa.

Soranî

?

?

?

?

?

?

Kurmancî

min tune ne.

te tune ne.

wî/wê tune ne.

me tune ne.

we tune ne.

wan tune ne.

- Hewcedariya tişteki nêr bûn:

Hewramî

min aneym gerek a.

to aneyt gerek a.

ađ/ađe aneyş gerek a.

ême aneyma gerek a.

şime aneyta gerek a.

ađe aneyşa gerek a.

Soranî

min ewem dewê/gerek e.

to ewet dewê/gerek e.

ew ewey dewê/gerek e.

ême eweman dewê/gerek e.

êwe ewetan dewê/gerek e.

ewan eweyan dewê/gerek e.

Kurmancî

min ew divê.

te ew divê.

wî/wê ew divê.

me ew divê.

we ew divê.

wan ew divê.

- Hewcedariya tişteki mê bûn:

Hewramî	Soranî	Kurmancî
min anê <u>m</u> gereke <u>ne</u> .	min ewe <u>m</u> dewê/gerek e.	min ew divê.
to anê <u>t</u> gereke <u>ne</u> .	to ewe <u>t</u> dewê/gerek e.	te ew divê.
ađ/ađe anê <u>s</u> gereke <u>ne</u> .	ew ewe <u>y</u> dewê/gerek e.	wî/wê ew divê.
ême anê <u>ma</u> gereke <u>ne</u> .	ême ewe <u>man</u> dewê/gerek e.	me ew divê.
şime anê <u>ta</u> gereke <u>ne</u> .	êwe ewe <u>tan</u> dewê/gerek e.	we ew divê.
ađê anê <u>sa</u> gereke <u>ne</u> .	ewan ewe <u>yan</u> dewê/gerek e.	wan ew divê.

- Hewcedariya tiştên pirjimar bûn:

Hewramî	Soranî	Kurmancî
min anîş <u>a</u> m gereke <u>nê</u> .	min ewane <u>m</u> dewên/gerek in.	min ew divên.
to anîş <u>a</u> t gereke <u>nê</u> .	to ewane <u>t</u> dewên/gerek in.	te ew divên.
ađ/ađe anîş <u>a</u> s gereke <u>nê</u> .	ew ewane <u>y</u> dewên/gerek in.	wî/wê ew divên.
ême anîş <u>a</u> ma gereke <u>nê</u> .	ême ewane <u>man</u> dewên/gerek in.	me ew divên.
şime anîş <u>a</u> ta gereke <u>nê</u> .	êwe ewane <u>tan</u> dewên/gerek in.	we ew divên.
ađê anîş <u>a</u> sa gereke <u>nê</u> .	ewan ewane <u>yan</u> dewên/gerek in.	wan ew divên.

4_ Bi piranî (ne her tim) cînavên { im, it , is } piştî tîpên bêdeng tên û cînavên { m, t, ş } piştî tîpên bideng tên. (ma, ta, şa) jî paş hemî tîp tên.

5_ Ev cînav bi navdêr an rengdêran ve jî tên girêdan:

Des: Dest

- desim : destê min / desit : destê te / desis : destê wî/wê
 - desma : destê me / desta : destê we / desşa : destê wan
- desim : desû min / desit : desû to / desis : desû ađî/ađe
desma : desû ême / desta : desû şime / desşa : desû ađîşa
- desêm : destên min / desêt : destên te / desês : destên wî/wê
 - desêma : destên me / desêta : destên we / desêşa : destên wan
- desî dirêjim : destê min ê dirêj
desî dirêjma : destê me yê dirêj

6_ Ev cînav bi rayeka lêkera gerguhêza dema niha re jî tên lê ne wek cînavê kirdeyê lê wek bireserê. Ango ev cînav, kirdeyên lêkerên gerguhêz dema borî ne lê cînavên bireseriyên dema niha ne.

Mînak:

wînay : bînîn/dîtin : dîtin > wîn : bîn : bîn
Hewramî Soranî Kurmancî
To wînî To debînî Tu dibînî

Lê niha bala xwe bidin ser van hevokên jêrîn:

Hewramî	Soranî	Kurmancî
To wînî > To <u>min</u> wînî = To wînî <u>m</u>	To debînî > To <u>min</u> debînî = To dem <u>b</u> înî	Tu dibînî > Tu <u>min</u> dibînî
To wînî > To <u>adî/adê</u> wînî = To wînî <u>s</u>	To debînî > To <u>ew</u> debînî = To dey <u>b</u> înî	Tu dibînî > Tu <u>wî/wê</u> dibînî
To wînî > To <u>ême</u> wînî = To wînî <u>ma</u>	To debînî > To <u>ême</u> debînî = To dem <u>an</u> bînî	Tu dibînî > Tu <u>me</u> dibînî
To wînî > To <u>adîşa</u> wînî = To wînî <u>sa</u>	To debînî > To <u>ewan</u> debînî = To deyan <u>b</u> înî	Tu dibînî > Tu <u>wan</u> dibînî

7_ Ev cînav di lêkerên pêşgirî û lêkerên hevedudanî de wisa ne:

- Horgêrtey: Hilgirtin → Horim gêrt: Min ew(n) hilgirt
- Horgêrtey: Hilgirtin → Horis gêrtû: Ez wî/wê hildigirim

➤ Heke lêker hevedudanî be û dema wê jî niha be, { m(im), t(it), ş(iş), ma, ta, şa} cînavên bireserî ne.

Mînak: Zerîfkerdey = Xweşikkirin

Hewramî	Kurmancî
Min zerîfî <u>t</u> /zerîfê <u>t</u> kerû	Ez <u>te</u> xweşik dikim
To zerîfî <u>m</u> /zerîfê <u>m</u> kerî	Tu <u>min</u> xweşik dikî
Ađ/Ađe zerîfê <u>ma</u> kero	Ew <u>me</u> xweşik dike
Ême zerîfê <u>ta</u> kermê	Em <u>we</u> xweşik dikin
Şime zerîfê <u>şa</u> kerdê	Hûn <u>wan</u> xweşik dikin
Ađê zerîfî <u>ş</u> /zerîfê <u>ş</u> kera	Ew(pj) <u>wî/wê</u> xweşik dikin

- Heke lêker hevedudanî be û dema wê jî borî be, { m(im), t(it), ş(iş), ma, ta, şa} cînavên kirdeyî ne.

Mînak: Zerîfkerdey = Xweşikkirin

Hewramî	Kurmancî
Min zerîf <u>im</u> kerđ	<u>Min</u> xweşik kir > Bireser: nêr
Min zerîf <u>em</u> kerde	<u>Min</u> xweşik kir > Bireser: mê
Min zerîf <u>êm</u> kerdê	<u>Min</u> xweşik kirin > Bireser: pirjimar
To zerîf <u>it</u> kerđ	<u>Te</u> xweşik kir > Bireser: nêr
To zerîf <u>et</u> kerde	<u>Te</u> xweşik kir > Bireser: mê
To zerîf <u>êt</u> kerdê	<u>Te</u> xweşik kirin > Bireser: pirjimar
Ađ/Ađe zerîf <u>iş</u> kerđ	<u>Wî/Wê</u> xweşik kir > Bireser: nêr
Ađ/Ađe zerîf <u>eş</u> kerde	<u>Min</u> xweşik kir > Bireser: mê
Ađ/Ađe zerîf <u>êş</u> kerdê	<u>Min</u> xweşik kirin > Bireser: pirjimar
Ême zerîf <u>ma</u> kerđ	<u>Me</u> xweşik kir > Bireser: nêr
Ême zerîf <u>ema</u> kerde	<u>Me</u> xweşik kir > Bireser: mê
Ême zerîf <u>êma</u> kerdê	<u>Me</u> xweşik kirin > Bireser: pirjimar
Şime zerîf <u>ta</u> kerđ	<u>We</u> xweşik kir > Bireser: nêr
Şime zerîf <u>eta</u> kerde	<u>We</u> xweşik kir > Bireser: mê
Şime zerîf <u>êta</u> kerdê	<u>We</u> xweşik kirin > Bireser: pirjimar
Ađe zerîf <u>şa</u> kerđ	<u>Wan</u> xweşik kir > Bireser: nêr
Ađe zerîf <u>eşa</u> kerde	<u>Wan</u> xweşik kir > Bireser: mê
Ađe zerîf <u>êşa</u> kerdê	<u>Wan</u> xweşik kirin > Bireser: pirjimar

8_ Ger ev cînav paş daçekê bên rola wan a temamker heye:

- Bile çenîş : li gel wî/wê here > **bile:** here
- Bile çenî(çenîw) ađî/ađe: li gel wî/wê here

9_ Du awayên din ên cînavê (t , it) hene ku devkî ne û nivîskî nîn in, ev in: (đ , iđ) û (o , w).

Hin mînak:

- Desiđ(Deso) weş bo: destê te sax be
- To çêşiđ(çêşo) wat: te çi got
- Çemêđ /Çemêw zerîfê nê: çavên te bedew in

Bê guman hûn ê van cînavan (đ , iđ / o , w) pir bibînin û bibihîzin bi taybetî (đ , iđ).

11_ Xaleke din a girîng jî ew e ku ji bo nivîsandina xweş û têgihîştî, xwedî bûn an nebûna tiştan di vê pirtûkê de bi vî rengî hatine nivîsandin:

Hewramî

Min biram hen/nîya.

Min henim/nîyam.

Min walêh hene/nîyê ne.

Min henem/nîyênem.

Kurmancî

Min bira heye/tune.

Min heye/tune.

Min xwişk heye/tune.

Min heye/tune.

Hewramî

+ Min kerdim /kerdem /kerdêm.

+ To ma'rat /ma'rêt.

+ Ađ (Ade) zanaş / tawaş / persaş.

+ Ađî (Ađê) zana / tawa / persa.

+ Ême sanama / kêştma / kîyastma.

+ Şime berđta / bi'rita / astta.

+ Ađê wirastşa / soçnaşa / fa'raşa.

+ Min tom wîna.

+ To minit wîna.

+ Ađ/Ađê kariş kerđ.

+ Ême nanma ward.

+ Şime çêştta wat?

+ Ađê gicîşa wirast.

+ Pam/Desim hen.

+ Çêşit hen?

+ Kinaçêşa hene/henê.{*kinaçê : yj/pj}

+ Ême kurma nîya.

+ Şime hamsêma ndê.

+ Ađê eđa û tatêma nîyê nê.

+ Min řefêqê firêh hene.

Kurmancî

Min (ew:n)kir /(ew:m)kir /(ew:pj)kirin .

Te (ew:n/m) şikand / (ew:pj) şikandin.

Wî{Wê} zanî / karî / pirsî.

Wî{Wê} zanî / karî / pirsî.

Me kirrî / (ew:n) kişand / (ew:n) şand.

We bir / birrî / hêla.

Wan dirût / şewitand / guhert.

Min tu dîtî.

Te ez dîtîm.

Wî/Wê kar kir.

Me nan xwar.

We çi got?

Wan kiras dirût.

Min pê/dest heye.

Te çi heye?

Wan keç heye/hene

Me kur tune.

Hûn cîranên me ne.

Ew dê û bavên me nîn in.

Min gelek heval hene.

Hewramî

- + To gicî sewzit hen.
- + To birat hen? _ Erê biram hen.
- + To tatet hen? _ Erê henim.
- + To yanet hen? _ Na, yanem nîya.
- + To babat hen? _ Na, nîyam.
- + Aď/Aďe wezîş hene? _ Na nîyêneş.
- + Şeweta weşe.
- + Aď/Aďe walêş hene? _ Erê walêş hene.
- + Aď/Aďe eďaş hene? _ Erê heneş.
- + Aď/Aďe kinaçêş hene? _ Na, kinaçêş nîyê ne.
- + Ême diwê zařolêma henê.
- + Şime çêşta hen?(çêş: nêr)
- + Aďê gaweşa hene.
- + Min dimaw to weşîm neďî.
- + Çemî sîyawit min kuşo.
- + Wermim nimê.
- + Çemû/Dilû min nî.
- + Çemû/Dilû min enî(to:m).
- + Yanet/Yaneta awa bo.
- + To (n) çenîn nî? Weş nî?
- + To (m) çenîne nî? Weşe nî?
- + Şime çenînê ndê? Weşê ndê?
- + Min ce merďey/merďeyî metersû.
- + Min(m/n) înana yane(yanene).
- + Biwet (Biwew to) fire weşe ne.
- + Biwew şotî weşe nîyê ne.
- + Yanema sana(Ême yanema sana).

Kurmancî

- Te kirasê kesk heyê.
- Te bira heyê? _ Erê min bira heyê.
- Te bav heyê? _ Erê min heyê.
- Te mal heyê? _ Na, min mal tune.
- Te bapîr heyê? _ Na, min tune.
- Wî/Wê gûz heyê? Na, wî/wê tune
- Şeva we baş.
- Wî/Wê xuşk heyê? _ Erê wî/wê xuşk heyê.
- Wî/Wê dayik heyê? _ Erê wî/wê heyê
- Wî/Wê keç heyê? Na, keça wî/wê tune.
- Du zarokên me hene.{Me du zarok hene}
- We çi heyê?
- Wan çêlek heyê.
- Min pişî te xweşî nedît.
- Çavê tê yê reş min dikuje.
- Xewa`m nayê.
- Dilê min î.
- Dilê min î.
- Mala te/we awa be.
- Tu çawa yî? Baş î?
- Tu çawa yî? Baş î?
- Hûn çawa ne? Baş in?
- Ez ji mirinê natirsim.
- Ez li malê me.
- Bêhna te gelek xweş e.
- Bêhna şîr xweş nîn e.
- Me mal kirrî.

Hewramî

+ Yaneşa wîret. (Adê yaneşa wîret).

+ Min maşînim/maşînim gerek a.

+ Min tom gerek a. (to :n)

➤ Min tom gerek nî: Min tu(n) divê.

+ Min tom gereke ne.(to: m)

➤ Min tom gereke nî: Min tu(m) divê.

Kurmancî

Wan mal firot.

Min erebe divê.

Min tu(n) divê.

Min tu(m) divê.

Hewramî

+ Şêtim mekere. (Min: n)

+ Şêtem mekere. (Min: m)

+ Min şêt mekere. (Min: n)

+ Min şête mekere. (Min: m)

+ Biwînem. (Min: n/m)

+ Min biwîne. (Min: n/m)

+ Dît = To dît.

+ Dîyet = To dîyet.

+ Dîyêt = To dîyêt.

+ Berdîm = Min berdîm.

+ Berdêm = Min berdêm.

+ Berdêm = Min berdêm.

+ Wînûta = Min wînûta = Şime wînû

+ Wîndêma = Şime wîndêma = Ême wîndê

Kurmancî

Min dîn neke.

Min dîn neke

Min dîn neke.

Min dîn neke

Min bibîne.

Min bibîne.

Te (ew:n) dît.

Te (ew:m) dît.

Te (ew:pj) dîtin.

Min (ew:n) bir.

Min (ew:m) bir.

Min (ew:pj) birin.

Ez we dibînim = We dibînim

Hûn me dibînin.

- Berî ku em cînavê cureyê duyem bixwînin, du xalên girîng dubare dikim. Yek ji wan:

Hewramî

biwînem = min biwîne

weşhalêma kerdê =(şime) ême weşhalê kerdê

Kurmancî

min bibîne

hûn me kêfxweş dîkin

Yek ji wan jî:

Hewramî

Xuđay gewre

be namêw Xuđay gewrey

Kurmancî

Xwedayê mezin

bi navê Xwedayê mezin

- Di bajarê Paweyê de li şûna cînavên (ma,ta,şa), cînavên (man , tan , şan) jî bikar tînin.
- Di bajarê Paweyê de li şûna cînavê (na), cînavê (nan) bikar tînin:

Em(n) Hewramî nan

Em(m) weşhalê nîyê nan

• Cureyê duyem:

Min	û , u , w , ew	Ême	mê,ymê, eymê, îmê
To	î , y, ey	Şime	dê , ydê, eydê, îdê
Ađ / Ađe	o , ê	Ađê	a , ya , nê

1_ Ev cînav, nasnavên lêkerên gerguhêz û pêwîst ên bi nîşanên raderiyên (ey, y, vey) yên dema niha ne:

• sanay: kîrrîn/standin

Hewramî	Kurmancî
(min) san <u>û</u>	(ez) dikirrim
(to) san <u>î</u>	(tu) dikirrî
(ađ/ađe) san <u>o</u>	(ew) dikirre
(ême) san <u>mê</u>	(em) dikirrin
(şime) sand <u>ê</u>	(hûn) dikirrin
(ađê) sana	(ew) dikirrin

• kerdey: kirin

Hewramî	Kurmancî
(min) ker <u>û</u>	(ez) dikim
(to) ker <u>î</u>	(tu) dikî
(ađ/ađe) kero	(ew) dike
(ême) kerm <u>ê</u>	(em) dikin
(şime) kerd <u>ê</u>	(hûn) dikin
(ađê) kera	(ew) dikin

• taway: karîn

Hewramî	Kurmancî
(min) taw <u>u</u>	(ez) dikarim
(to) taw <u>î</u>	(tu) dikarî
(ađ/ađe) taw <u>o</u>	(ew) dikare
(ême) taw <u>mê</u>	(em) dikarin
(şime) tawd <u>ê</u>	(hûn) dikarin
(ađê) tawa	(ew) dikarin

• amay: hatin

Hewramî	Kurmancî
(min) mew	(ez) tēm
(to) mey	(tu) tēy
(ađ/ađe) mē/mey	(ew)tē
(ême) meym <u>ê</u>	(em) tēn
(şime) meyd <u>ê</u>	(hûn) tēn
(ađê) mēn <u>ê</u> /meya	(ew) tēn

➤ Lêkera (amay) belkî tenê lêker be ku ji bo tewandina lêkerê ji bo dema niha, cînavê (ê) ji bo kesê sêyem yekjimar û cînavên (nê) ji bo kesê sêyem pirjimar tê bikaranîn. Cînavên lêkerên mayî (o) ji bo kesê sêyem yekjimar û (a) ji bo kesê sêyem pirjimar in. Elbet di helbestan de (meyo : tē) jî heye. Balkêş e ku di Kurmancî de jî lêkera (hatin) wisa ye.

>> (dike), (diçe), (dibêje) û hwd, lê ji bo (hatin)ê, ne wisa ye û em (ê) bo kesê sêyem yekjimar bi kar tînin> Tê

2_ Ev cînav tenê ji bo dema niha têne bikaranîn û rola wana kirdeyê heye.

3_ Ger:

- koka dema niha + cînavê cureyê duyem + cînavê cureyê yekem: Mînak

→ Wînay:

wîn + û (cureyê duyem) + t (cureyê yekem) => wînût : te dibînim

Di vê rewşê de, cînavê tîpa yekem dê bibe cînavê pasîf û cînavê tîpa duyemîn dê bibe cînavê çalak(kirde,fail):

Hewramî	Kurmancî
wînom	<u>min</u> dibîne
wînot	<u>te</u> dibîne
wînoş	<u>wî/wê</u> dibîne
wînoma	<u>me</u> dibîne
wînota	<u>we</u> dibîne
wînoşa	<u>wan</u> dibîne

***Baş e ku bizanin mînaka jorîn bi awayekî din jî tê gotin:

Hewramî	Kurmancî
<u>min</u> wîno	(ew) <u>min</u> dibîne
<u>to</u> wîno	(ew) <u>te</u> dibîne
<u>ađî/ađê</u> wîno	(ew) <u>wî/wê</u> dibîne
<u>ême</u> wîno	(ew) <u>me</u> dibîne
<u>şime</u> wîno	(ew) <u>we</u> dibîne
<u>ađîşa</u> wîno	(ew) <u>wan</u> dibîne

- Wisa ku dibînin di vê rewşê de heke cînavê veqetandî were, êdî cînavê girêdayî nayê.

4_ Niha bibînin ku em her yek ji wan cînavan kengê bi kar tînin:

➤ Min > û, u, w, ew

- 1- Cînavê (û): Ji bo wan lêkeran bi kar tê ku koka dema niha ya wan bi tîpa bêdeng diqede.

Nimûne:

Hewramî

Kerdey > Koka dema niha > kerû > kerû

Kurmancî

dikim

- 2- Cînavê (u): Ji bo wan lêkeran bi kar tê ku koka dema niha ya wan bi tîpa (w) diqede.

Nimûne:

Hewramî

Xiway > Koka dema niha > xiw > xiwu

Kurmancî

dikenim

- 3- Cînavê (w): Ji bo wan lêkeran bi kar tê ku koka dema niha ya wan bi tîpa (e) diqede.

Nimûne:

Hewramî

Amay > Koka dema niha > e > mew

Kurmancî

têm

- 4- Cînavê (ew): Ji bo wan lêkeran bi kar tê ku koka dema niha ya wan bi tîpa (y/ê) diqede.

Nimûne:

Hewramî

Dîyay > Koka dema niha > êy > mi^êyew

Day > Koka dema niha > ê > mi^êdew

Kurmancî

dinêrim

didim

➤ To > î, y, ey

- 1- Cînavê (î): Ji bo wan lêkeran bi kar tê ku koka dema niha ya wan bi tîpa bêdeng diqede.

Nimûne:

Hewramî

Kerdey > Koka dema niha > kerî > kerî

Kurmancî

dikî

- 2- Cînavê (y): Ji bo wan lêkeran bi kar tê ku koka dema niha ya wan bi tîpa (e) diqede.

Nimûne:

Hewramî

Amay > Koka dema niha > e > mey

Kurmancî

Têy

- 3- Cînavê (ey): Ji bo wan lêkeran bi kar tê ku koka dema niha ya wan bi tîpa (y/ê) diqede.

Nimûne:

Hewramî

Kuşyay > Koka dema niha > kuşy > kuşyey

Kurmancî

têy kuştin

➤ **Ađ/Ađw > o, y, ê**

- 1- Cînavê (o): Ji bo wan lêkeran bi kar tê ku koka dema niha ya wan bi tîpa bêdeng û tîpa (y) diqede.

Nimûne:

Hewramî

Kerđey > Koka dema niha > ker > kero

Kuşyay > Koka dema niha > kuşy > kuşyo

Kurmancî

dike

tê kuştin

- 2- Cînavê (y): Ev yek pir kêmtê bikaranîn û ji bo wan lêkeran bi kar tê ku koka dema niha ya wan bi tîpa (e) diqede.

Nimûne:

Hewramî

Amay > Koka dema niha > e > mey

Kurmancî

Tê

- 3- Cînavê (ê): Ev yek jî pir kêmtê bikaranîn û ji bo lêkera (amay) bi kar tê. Li şûna (e) tê ku koka dema niha ya (amay) e.

Nimûne:

Hewramî

Amay > Koka dema niha > e > mê

Kurmancî

Tê

➤ **Ême > mê, ymê, eymê, îmê**

- 1- Cînavê (mê): Ji bo wan lêkeran bi kar tê ku koka dema niha ya wan bi tîpa bêdeng diqede ji bilî lêkera (bîyey).

Nimûne:

Hewramî

Kerđey > Koka dema niha > ker > kermê

Kurmancî

em di kin

- 2- Cînavê (ymê): Ji bo wan lêkeran bi kar tê ku koka dema niha ya wan bi tîpa (e) diqede.

Nimûne:

Hewramî

Amay > Koka dema niha > e > meymê

Kurmancî

em tên

- 3- Cînavê (eymê): Ji bo wan lêkeran bi kar tê ku koka dema niha ya wan bi tîpa (y/đ) diqede.

Nimûne:

Hewramî

Kuşyay > Koka dema niha > kuşy > kuşyeymê

Day > Koka dema niha > đ > miđeymê

Kurmancî

em tên kuştin

em didin

4- Cînavê (îmê): Ji bo lêkera (bîyey).

Nimûne:

Hewramî

Bîyey > Koka dema niha > b > bîmê

Kurmancî

em dibin

➤ Şime > dê, ydê, eydê, îdê

1- Cînavê (dê): Ji bo wan lêkeran bi kar tê ku koka dema niha ya wan bi tîpa bêdeng diqede ji bilî lêkera (bîyey).

Nimûne:

Hewramî

Kerdey > Koka dema niha > ke > kerdê

Kurmancî

hûn dikin

2- Cînavê (ydê): Ji bo wan lêkeran bi kar tê ku koka dema niha ya wan bi tîpa (e) diqede.

Nimûne:

Hewramî

Amay > Koka dema niha > e > mezdê

Kurmancî

hûn tên

3- Cînavê (eydê): Ji bo wan lêkeran bi kar tê ku koka dema niha ya wan bi tîpa (y/ ð) diqede.

Nimûne:

Hewramî

Kuşyay > Koka dema niha > kuşy > kuşyeydê
Day > Koka dema niha > ð > miðeydê

Kurmancî

hûn tên kuştin
hûn didin

4- Cînavê (îmê): Ji bo lêkera (bîyey).

Nimûne:

Hewramî

Bîyey > Koka dema niha > b > bîdê

Kurmancî

hûn dibin

➤ Aê > a, ya, nê

1- Cînavê (a): Ji bo wan lêkeran bi kar tê ku koka dema niha ya wan bi tîpa bêdend û tîpa (y) diqede.

Nimûne:

Hewramî

Kerdey > Koka dema niha > ke > kera
Kuşyay > Koka dema niha > kuşy > kuşya

Kurmancî

ew dikin
ew tên kuştin

2- Cînavê (ya): Ev yek pir kêr tî bikaranîn û ji bo wan lêkeran bi kar tî ku koka dema niha ya wan bi tîpa (e) diqede.

Nimûne:

Hewramî

Amay > Koka dema niha > e > meya

Kurmancî

ew tîn

3- Cînavê (nê): Ev yek jî pir kêr tî bikaranîn û ji bo lêkera (amay) bi kar tî. Li şûna (e) tî ku koka dema niha ya (amay) e.

Nimûne:

Hewramî

Amay > Koka dema niha > e > mênê

Kurmancî

ew tîn

5_ Berî ku em mînakan bibînin divê du xalên girîng werin gotin:

1- Di Hewramî de eynî wek Kurmancî hin lêker hene ku koka wan a niha ji radera sereke cuda ye. Bo nimûne di Kurmancî de, (gotin) heye lê koka wê ya niha (-bêj-) e ku di warê nivîsandin û axaftinê de ti peywendiya wê bi radera sereke ku (gotin) e re nîn e.

2- Di Hewramî de (devoka Hewraman Textê), lêkerên dema niha bi du awayan tîne nivîsandin. Rêbaza yekem bêtî karanîna pêşgir e û rêbaza duyem jî karanîna pêşgirên (m) an (mî) ye.

➤ Raderên jêrîn bi kokên wan ên dema niha û yên borî bixwînin da ku wan di hevokê de bi kar bînin:

Hewramî	koka dema niha	koka dema borî	Kurmancî
amay ***	-e-	ama	hatin
astey ***	-az-	ast	hêştin/hêlan
arđey ***	-ar-	arđ	anîn
berđey	-ber-	berđ	birin
bîyey	-b-	bî/bê	Bûn/Hebûn
çîryey	-çîr-	çîrî	bang/gazî kirin
dîyay ***	-dîy-	dîya	nêrîn
êsteywe ***	-êz...we-	êst...we	peydakirin
fařay	-fař-	fařa	guhartin
gêlay	-gêl-	gêla	geriyan
horêstey ***	-horêz-	horêst	rabûn
kerđey	-ker-	kerđ	kirin
kêştay/kêşay	-kêş-	kêşt	kişandin
kîyanay	-kîyan-	kîyana	şandin
liway ***	-l-	liwa	çûn
mařay	-mař-	mařa	şikandin
meřyay	-meřy/mařy-	meřya	şikestin
midirnay	-midirn-	midirna	sekinandin
midray	-midr-	midra	sekinîn
nîştayre	-nîş...re-	nîşt...re	rûniştin
niwîstey ***	-nwîs-	niwîst	nivîsandin
parêznay	-parêzn-	parêzna	parastin
persay	-pers-	persa	pirsîn
řemay	-řem-	řema	revîn
řemnay	-řemn-	řemna	revandin
sanay	-san-	sana	kirrîn
soçnay	-soçn-	soçna	şewitandin
soçyay	-soçy-	soçya	şewitîn
şitey	-şor-	şit	şuştin
taway	-taw-	tawa	karîn
tersay	-ters-	tersa	tirsiyan
wanay/wenay	-wan/wen-	wana/wena	xwendin
waray	-war-	wara	barîn
warđey	-wer-	ward	xwarin
watey ***	-waç-	wať	gotin
wînay	-wîn-	wîna	dîtîn
witey ***	-ûs-	wit	razan/raketin
xiway	-xiw/xo-	xiwa	kenîn
yaway	-yaw-	yawa	gihîştin
zanay	-zan-	zana	zanîn

➤ Raderên ku bi stêrkê hatine nîşankirin pêşgira(m/mi) hene.

Lê tewandina du lêkerên (*watey*) û (*xiway*) bibînin:

- **Watey:** Di Herêmen cudayên Hewramê de bi çend awayan tê tewandin, lê di devoka Textî de wisa ye:

Hewramî	Kurmancî
Koka dema niha > waç	bêj
Maçû	dibêjim
Maçî	dibêjî
Maço	dibêje
Maçmê	em dibêjin
Maçdê	hûn dibêjin
Maça	ew dibêjin

- **Xiway:**

Hewramî	Kurmancî
Koka dema niha > xiw/xo	ken
Xiwu	dikenim
Xiwî	dikenî
Xiwo	dikene
Xomê	em dikenin
Xodê	hûn dikenin
Xiwa	ew dikenin

6_ Me got ku di Hewramî de wek Kurmancî, daçek dikarin li dawiya hin lêkeran zêde bibin û lêkereke nû çêbikin. Lê xala girîng ev e ku cînav dikevin di navbera lêkera sereke û daçekê de. Mînak:

Hewramî	Kurmancî
Nîşteyre	Rûniştin
Nîşûre	Rûdinê
Nîştare/Nîştanêre	Rûniştin

- ♦ Du xal berî mînakan:

1- Cînavên lêkerên pêwîst ên dema borî ji yê gerguhêz ên dema borî cuda ne.

Bo nimûne:

Min watim: Min got /// Min amanê: Ez hatim

- Em ê cînavên lêkerên pêwîst di beşa paşê de bixwînin.

2- Di devoka Hewraman Textî de hin lêker ji bo dema niha bê pêşgîrekên (m) û (mi) bikêr tên.

Bo nimûne: *To kerî: Tu dikî /// To minwîsî: Tu dinivîsî*

Mînak:

- Bireserên lêkerên gerguhêz ên jêrîn nêr in û bireserên mê û pirjimar di beşa çarem a pirtûkê de tê şirovekirin.

Hewramî

- + Min mazû / mew.
- + Min astim / amanê.
- + To marî / berî.
- + To ardît / berdît
- + Ađ bo / çîrô.
- + Ađ bî / çîrîş
- + Ađe bo / çîrô.
- + Ađe bîye / çîrîş
- + Ême miđyeymê / mêzmêwe.
- + Ême dîma / êstmawe.
- + Şime gêldê / fařdê.
- + Şime gêlaydê / fařata.
- + Ađe hormêza / kera.
- + Ađe horê êstê / kerďşa.
- + Min girewu / gêlû.
- + Min girewanê / gêlanê.
- + To aney /anê /anîşa kêşî.

- To aneyt kêşt = Te ew(n) kişand
- To anêt kêşte = Te ew(m) kişand
- To anîşat kêştê = Te ew(pj) kişandin

+ Ađ/Ađe çîwî kîyano.

+ Ađ/Ađe çîwiş kîyana.

- Şêweyekî din ê lêkera kîyanay, (kîyastey) ye:

ađ/ađe peyamiş kîyast.
ađ/ađe kergeş kîyaste.
ađ/ađe kitêbêş kîyastê.

Kurmancî

- Ez dihêlim / têm.
- Min hêla / Ez hatim.
- Tu tînî / dibî.
- Te anî / bir.
- Ew dibe / gazî dike.
- Ew bû. Wî gazî kir.
- Ew(m) dibe / gazî dike.
- Ew bû. Wê gazî kir.
- Em dinêrin / peyda dikin.
- Me dît / peyda kir.
- Hûn digerin / diguherînin.
- Hûn geriyan. We guhert.
- Ew radibin / dikin.
- Ew rabûn. Wan kir.
- Ez digirîm / digirim.
- Ez giriyam / geriyam.
- Tu wî /wê /wan dikşînî.

Ew tiştî dişîne.

Wî/Wê tişt şand.

wî/wê peyam şand.
wî/wê mirîşk şand.
wî/wê pirtûk şandin.

Hewramî

- + Ême milmê pey Amedî.
- + Ême şîşê marmê.
- + Şime mazîw êmeta maşa.
- + Gird řiwê ce dûrît dilim meşyo.
- + Hêzî desim meşya.
- + Midrnaw herî.
- + Çêge/Çîge midrû /midrmê ta bey.
- + Nîşûre/Nîşîre/Nîşore.
- + Ađ nîştire.
- + Ađe nîştire.
- + Min kitêbî minwîsû.
- + Min kitêbim/kitêbîm niwîst.
- + Min namêmin niwîste.
- + Esra ziwanû wêş parêzno.
- + Eger mezanî, bile ce ađî biperse(perse).
- + Bîdye pey a espî çenî řemo.
- + Çî řema?
- + Weyw řemnay.

➤ Weywe (m): Bûk

- + Weywe çenîw zemay řema.
- + Amênmê pey bazařî û çîw/çîwî sanmê.
- + Ađe çêşsa sana?
- + Ađe sanaşa.
- + Ađîşa sana.
- + Mamam dar soçno.
- + Babam çêşiş soçna?
- + Yeherim soçya.

Kurmancî

- Em diçin Amedê.
- Em şûşê dişkînin.
- We piştî me şikand.
- Her roj ji dûriya te dilê`m dişkê.
- Duh destê min şikest.
- Sekinandina kerê.
- Li vir disekinim /(em)disekinin da ku bêy.
- Rûdinê / Rûdinê / Rûdinê.
- Ew rûnişt.
- Ew rûnişt.
- Ez pirtûkê dinivîsim.
- Min pirtûk nivîsand.
- Min nav nivîsand.
- Esra zimanê xwe diparêze.
- Ger tu nizanî here ji wî bipirse.
- Li wî hespî binêre çawa direve.
- Çima reviya?
- Bûk revandin.

- Bûk li gel zava reviya.
- (Em) hatine bazarê û tişt/tiştî dikirin.
- Wan çi kirrî?
- Wan kirrî.
- Wan kirrî.
- Dapîra min dar dişewitîne.
- Bapîrê min çi şewitand?
- Kezeba min şewitî.

Hewramî

+ Ane çêş a soçyo?

+ Eđam cilê şoro.

+ Milo desîş şoro(giranî dikeve ser kîteya şo)

➤ bişoro: şoro = ew bişo

+ Ađ wêş şit.

+ Ađe wêş şite.

+ Ađê wêşa şitê.

+ Ême metawmê bê welat bijîwmê.

+ Şime netawata beydê.

+ Ađê ce to tersa /metersa.

+ Ađ/Ađe ce çêşî terso /meterso?

+ To tersay ke bilî?

+ Min Hewramî wanû ta fêr/fêre bû.

+ Min Hewramî fêr/fêre bû.

➤ Du wateyên bû heye: 1_ Dibim 2_ Heke giranî li ser (b) be > bibim.

+ Min dersim wana.

+ Maça aro werwe waro.

+ Hêzî tewerge/waran wara.

+ Ađ/Ađe nan wero.

+ Berzan çêşîş ward?

+ Berzan keleşêriş ward.

+ Berzan kergeş wardê.

+ Berzan anîşaş wardê.

+ Ême kurdî zanmê.

+ Min henar werû.

Kurmancî

Ew çî ye dişewite?

Dêya min cilan dişo.

Diçe destê xwe bişo.

Wî xwe şuşt.

Wê xwe şuşt.

Wan xwe şuştin.

Em nikarin bê welat bijîn.

We nekarî bên.

Ew ji te ditirsîn /natirsîn.

Ew ji çî ditirse /natirse?

Tu tirsîyay ku herî?

Ez Hewramî dixwînim da ku fêr bibim.

Ez Hewramî fêr dibim.

Min ders xwend.

Dibêjin îro berf dibare.

Duh zîpik/baran barî.

Ew nan dixwe.

Berzan çî xwar?

Berzan dîk xwar.

Berzan mirîşk xwar.

Berzan ew(pj) xwarin.

Em kurdî dizanin.

Ez hinarê dixwim.

➤ Lêkera (watey) heke (çêş) di hevokê de be, bo dema borî dikare bi du awayan were gotin:

1- Ađê watşa çêş? <> Wan çî got?

2- Ađê çêşşa wat? <> Wan çî got?

Hewramî

- + Adê aneyşa wat.
- + Adê watşa.
- + Adîşa wat.
- + Min tateyt /edêt wînu.
- + Zîlane miniş wîna.
- + Min mûsû /To mûsî /Ad(Ade) mûso.
- + Ême witîmê /Şime witîdê /Adê witê.
- + Min xiwu /To xiwî /Ad(Ade) xiwo.
- + Ême xomê /Şime xodê.
- + Adê be çêşî xiwa? – Be to xiwa.
- + Ba bizanmê yawmê be çêşî.
- + Yawaydê ko?
- + To çêş zanî?
- + Min nezanam ke to bêwefa/bêwefê nî.
- + Min êz kerû Hewramî fêr/fêre bû.
- + Min weşhal/weşhalê bû.
- + To weş/weşe nî? _Erê spas. To weş/weşe bî.
- + To bî be goranîwaç/goranîwaçe.
- + Ad/Ade jîr/jîre bo.
- + Ad/Ade gerekş a bo be çêş?
- + Ême fêrêw Hewramî bîmê.
- + Şanazîma n ke ziwanparêzê bîmê.
- + Şime be yogêrtay azadê bîdê.
- + Şime mişo îtir gewrê bîdê.
- + Adê be wîlaw to weşhalê ba.
- + Beş a kesa ke mênê eđa û tatem ba.
- + Şime çêş kerdê?

Kurmancî

- Wan ew(n) got.
- Wan got.
- Wan got.
- Ez bavê te /dêya te dibînim.
- Zîlanê ez dîtîm.
- Ez radizêm /Tu radizêy /Ew radizê.
- Em /Hûn /Ew razan(raketin)
- Ez dikenim /Tu dikenî /Ew dikene.
- Em dikenin /Hûn dikenin.
- Ew bi çi dikenin? _ Bi te dikenin.
- Bila (em) bizanin (em) digihîjin çi.
- (Hûn) gihîştin ku derê?
- Tu çi dizanî?
- Min nezanî ku tu bêwefa yî.
- Ez hez dikim Hewramî fêr bibim/bim.
- Ez kêfxweş dibim.
- Tu baş î? _ Erê spas. Tu baş/xweş bî.
- Tu dibî stranbêj.
- Ew jîr dibe.
- Wî/Wê divê bibe çi?
- Em fêrî Hewramî dibin.
- Serbilindiya me ye ku (em) zimanparêz bin.
- Hûn bi hev girtin azad dibin.
- Hûn divê êdî mezin bibin.
- Ew bi dîtina te kêfxweş dibin.
- Xwezî ev kesên ku tên dê û bavê min bin.
- Hûn çi dikin?

Hewramî

- + Aďê mênê pey yaneyma.
- + Min temaşew fîlmî kerû.
- + Pey çêşî midyey?
- + Aď/Aďe wezî maŕo.
- + Ême pey to girewmê.
- + Şime qisê kerdê.
- + Aďê kar kera.
- + A kuŕe çi (pey çêşî) girewo?
- + A kinaçê bo be duktire. (bo: dibe)
- + To midrî.

Kurmancî

- Ew tên mala me.
- Ez fîlmî temaşe dikim.
- Li çi dinêrî?
- Ew gûzê dişkîne.
- Em bo te digirîn.
- Hûn diaxivin(qise dikin).
- Ew kar dikin.
- Ew kur çima(bo çi) digirî?
- Ew keç dibe doxtor.
- Tu disekinî.

- **Cureyê sêyem:**

Min	a, anê, nê , ya/yanê	Ême	îmê , ymê , yêymê
To	î , y , yey(m:yêy)	Şime	îdê , ydê , yêydê
Ađ	_____	Ađê	ê , yê
Ađe	____, e , ye		

- **Hin xal:**

1_ Ev cînav li dawîya lêkerên dema borîyên pêwîst û hwd têne zêdekirin, angî nasnavên wan in.

2_ Niha bibînin ku em her yek ji wan cînavan kengê bi kar tînin:

➤ **Min > a, anê, nê , ya/yanê**

1- Cînavê (a) û (anê): Ji bo wan lêkerên pêwîst bi kar tê ku koka dema borî ya wan bi tîpa bêdeng diqede.

Nimûne:

Hewramî

Witey > Koka dema borî > wi_t > wita/witanê

Kurmancî

raketim

2- Cînavê (nê): Ji bo wan lêkeran bi kar tê ku koka dema borî ya wan bi tîpa (a) diqede.

Nimûne:

Hewramî

Amay > Koka dema borî > ama > amanê

Kurmancî

hatim

3- Cînavê (ya) û (yanê): Ji bo wan lêkeran bi kar tê ku koka dema borî ya wan bi tîpa (î) diqede.

Nimûne:

Hewramî

Bîyey > Koka dema borî > bî > bîya/bîyanê

Kurmancî

bûm

➤ **To > î , y , yey(m:yêy)**

1- Cînavê (î): Ji bo wan lêkerên pêwîst bi kar tê ku koka dema borî ya wan bi tîpa bêdeng diqede.

Nimûne:

Hewramî

Witey > Koka dema borî > wi_t > witî

Kurmancî

raketî

2- Cînavê (y): Ji bo wan lêkeran bi kar tê ku koka dema borî ya wan bi tîpa (a) diqede.

Nimûne:

Hewramî

Amay > Koka dema borî > amā > amay

Kurmancî

hatî

3- Cînavê (yey): Ji bo wan lêkeran bi kar tê ku koka dema borî ya wan bi tîpa (î) diqede.

Nimûne:

Hewramî

Bîyey > Koka dema borî > bî > bîyey

Kurmancî

bûy

➤ Ađ : Ew(n) > Wê yekê nasnav tune.

1- Ji bo wan lêkerên pêwîst ên ku koka dema borî ya wan bi tîpa bêdeng diqede.

Nimûne:

Hewramî

Witey > Koka dema borî > wiṭ > wit

Kurmancî

raket

2- Ji bo wan lêkerên pêwîst ên ku koka dema borî ya wan bi tîpa (a) diqede.

Nimûne:

Hewramî

Amay > Koka dema borî > amā > ama

Kurmancî

hat

3- Ji bo wan lêkerên pêwîst ên ku koka dema borî ya wan bi tîpa (î) diqede.

Nimûne:

Hewramî

Bîyey > Koka dema borî > bî > bî

Kurmancî

bû

➤ Ađ : _ , e , ye

1- (_): Dema lêkerên pêwîst ên ku koka dema borî ya wan bi tîpa (a) diqede, vê yekê nasnav tune.

Nimûne:

Hewramî

Amay > Koka dema borî > amā > ama

Kurmancî

ew(m) hat

2- Cînavê (e): Ji bo wan lêkerên pêwîst ên ku koka dema borî ya wan bi tîpa bêdeng diqede. Jî giranî dikeve ser kîteya pêşîn.

Nimûne:

Hewramî

Witey > Koka dema borî > wit > wite

Kurmancî

ew(m) raket

3- Cînavê (ye): Ji bo wan lêkerên pêwîst ên ku koka dema borî ya wan bi tîpa (î) diqede. Jî giranî dikeve ser kîteya pêşîn.

Nimûne:

Hewramî

Bîyey > Koka dema borî > bî > bîye

Kurmancî

ew(m) bû

➤ Ême : îmê , ymê , yêymê

1- Cînavê (îmê): Dema lêkerên pêwîst ên ku koka dema borî ya wan bi tîpa bêdeng diqede.

Nimûne:

Hewramî

Witey > Koka dema borî > wit > witîmê

Kurmancî

em raketin

2- Cînavê (ymê): Ji bo wan lêkerên pêwîst ên ku koka dema borî ya wan bi tîpa (a) diqede.

Nimûne:

Hewramî

Amay > Koka dema borî > amā > amaymê

Kurmancî

em hatin

3- Cînavê (yêymê): Ji bo wan lêkerên pêwîst ên ku koka dema borî ya wan bi tîpa (î) diqede.

Nimûne:

Hewramî

Bîyey > Koka dema borî > bî > bîyêymê

Kurmancî

em bûn

➤ Şime : îdê , ydê , yêydê

1- Cînavê (îdê): Dema lêkerên pêwîst ên ku koka dema borî ya wan bi tîpa bêdeng diqede.

Nimûne:

Hewramî

Witey > Koka dema borî > wit > witîdê

Kurmancî

hûn raketin

2- Cînavê (ymê): Ji bo wan lêkerên pêwîst ên ku koka dema borî ya wan bi tîpa (a) diqede.

Nimûne:

Hewramî

Amay > Koka dema borî > amā > amaydê

Kurmancî

hûn hatin

3- Cînavê (yêymê): Ji bo wan lêkerên pêwîst ên ku koka dema borî ya wan bi tîpa (î) diqede.

Nimûne:

Hewramî

Bîyey > Koka dema borî > bî > bîyêydê

Kurmancî

hûn bûn

➤ **Ađê : ê , yê**

1- Cînavê (ê): Dema lêkerên pêwîst ên ku koka dema borî ya wan bi tîpa bêdeng diqede.

Nimûne:

Hewramî

Witey > Koka dema borî > wit > witê

Kurmancî

ew raketin

2- Cînavê (ê): Ji bo wan lêkerên pêwîst ên ku koka dema borî ya wan bi tîpa (a) diqede. Di vê rewşê de, (a)ya li dawiya lêkerê tê rakirin û li şûna wê, (ê) tê.

Nimûne:

Hewramî

Amay > Koka dema borî > amā > amê

Kurmancî

ew hatin

3- Cînavê (yê): Ji bo wan lêkerên pêwîst ên ku koka dema borî ya wan bi tîpa (î) diqede.

Nimûne:

Hewramî

Bîyey > Koka dema borî > bî > bîyê

Kurmancî

ew bûn

5_ Di çend xalên berê de me xwend ku ev cînav nasnavên kirde yê lêkerên pêwîstên dema borî ne. Lê xala girîng ev e ku ev cînav, cînavên bireserî yê lêkerên gerguhêz ên borî ne jî. Ev nimûne tenê ji bo dîtina cînavên kesane yê girêdayî yê cureyên sêyem di lêkera gerguhêz a borî de ne û perwerdeya sereke dê di besa lêkerê de were dayîn. Mînak:

➤ wînay : bînîn : dîtîn

Hewramî	Soranî	Kurmancî
wînaş	bînî /dî	wî/wê dît
wînanêş	bînîmî/dîmî	wî/wê <u>ez</u> dîtîm
wînaş	bînîtî/dîtî	wî/wê <u>tu</u> dîtî
wînaş	bînî/dî	wî/wê ew dît
wînaymêş	bînîmanî/dîmanî	wî/wê <u>em</u> dîtîn
wînaydêş	bînîtanî/dîtanî	wî/wê <u>hûn</u> dîtîn
wînêş	bînînî/dîyanî	wî/wê <u>ew</u> dîtîn

➤ gêrtey : girtin : girtin

Hewramî	Soranî	Kurmancî
gêrtîş	girtî	wî/wê <u>ew</u> girt
gêrtanêş/gêrtaş	girtîmî	wî/wê <u>ez</u> girtîm
gêrtîş	girtîtî	wî/wê <u>tu</u> girtî
gêrtîş	girtî	wî/wê <u>ew</u> girt
gêrtîmêş	girtmanî	wî/wê <u>em</u> girtîn
gêrtîdêş	girttanî	wî/wê <u>hûn</u> girtîn
gêrtêş	girtînî	wî/wê <u>ew</u> girtîn

7_ Xalên giştî dê wisa bin:

- Cînavên cureyên sêyem ji bo lêkera dema niha nayên bikaranîn. Ev cînav yan kirdeyên lêkerên pêwîst ên dema borî ne yan jî cînavên bireserîya lêkera gerguhêz a borî ne.

Dema ku:

koka dema borî + cînavên cureyên sêyem + cînavên cureyên yekem hebe, di vê demê de cînavên cureyên sêyem bireser in û cînavên cureyên yekem { (im,m) , (it,t) , (iş,ş) , ma , ta , şa } kirdeyên hevokê ne.

- Me berê xwend ku cînavên cureyên yekem, kirdeyên lêkerên gerguhêz ên dema borî ne û cînavên bireser ên lêkerên gerguhêz ên niha ne. Mînak:

➤ *Wînay:*

koka dema borî + cînavên cureyên sêyem + cînavên cureyên yekem

- ♦ *wîna + ymê + t = wînaymêt = (te em dîtîn) >> ku (ymê) bireser e û (t) kirdeya hevokê ye.*
- ♦ *wîna + y + ma = wînayma = (me tu dîtî) >> ku (y) bireser e û (ma) kirdeya hevokê ye.*

➤ *Wînay:*

koka dema niha + cînavên cureyên duyem + cînavên cureyên yekem

- ♦ *wîn + û + şa = wînûşa (ez wan dibînim) >> ku (û) kirde ye û (şa) biresera hevokê ye.*
- ♦ *wîn + a + m = wînam (ew min dibînin) >> ku (a) kirde ye û (m) biresera hevokê ye.*

➤ Cînavên cureyên yekem:

1_ Dema borî: Kirdeya lêkera gerguhêz 2_ Dema niha: Biresera lêkera gerguhêz

➤ Cînavên cureyên duyem:

1_ Dema niha: Kirdeya lêkerên gerguhêz û pêwîst

➤ Cînavên cureyên sêyem:

1_ Dema borî: Kirdeya lêkera pêwîst 2_ Dema borî: Biresera lêkera gerguhêz

- Biresera lêkerên jêrîn nêr e û dema lêkerên jêrîn borî ye.

➤ Armanca sereke ya vê beşê ew e ku we bi cînavan re bide naskirin, ji ber vê yekê vekolîna lêkerên gerguhêz dema ku bireser mê an pirjimar be, dê di beşa çarem de be.

	Min (n/m)	To (n/m)	Ađ	Ade	Ême	Şime	Adê
amay	amanê	amay	ama	ama	amaymê	amaydê	amê
hatin	hatim	hatî	hat	hat	(em) hatin	(hûn) hatin	(ew) hatin
astey	astim	astît	astiş	astiş	astma	astta	astşa
hêlan/hiştin	min hêla	te hêla	wî hêla	wê hêla	me hêla	we hêla	wan hêla
arđey	arđim	arđît	arđiş	arđiş	arđma	arđta	arđşa
anîn	min anî	te anî	wî anî	wê anî	me anî	we anî	wan anî
berđey	berđim	berđît	berđiş	berđiş	berđma	berđta	berđşa
birin	min bir	te bir	wî bir	wê bir	me bir	we bir	wan bir
bîyey	bîya = bîyanê	Bîyey/Bîyêy	bî	bîye	bîyêymê	bîyêydê	bîyê
bûn	bûm	bûy	bû	bû	(em) bûn	(hûn) bûn	(ew) bûn
bîyey	bêna	bênî	bê	bê	bênme	bêndê	bênê
hebûn	hebûm	hebûy	hebû	hebû	(ew) hebûn	(hûn) hebûn	(ew) hebûn
çîryey	çîrîm	çîrît	çîrîş	çîrîş	çîrîma	çîrîta	çîrîşa
gazî kirin	min gazî kir	te gazî kir	wî gazî kir	wê gazî kir	me gazî kir	we gazî kir	wan gazî kir
dîyey	dîm	dît	dîş	dîş	dîma	dîta	dîşa
dîtin	min dît	te dît	wî dît	wê dît	me dît	we dît	wan dît
êsteywe	êstimwe	êstitwe	êstişwe	êstişwe	êstmawe	êsttawe	êstşawe
peyda kirin	min peyda kir	te peyda kir	wî peyda kir	wê peyda kir	me peyda kir	we peyda kir	wan peyda kir
fařay	fařam	fařat	fařaş	fařaş	fařama	fařata	fařaşa
guherandin	min guhert	te guhert	wî guhert	wê guhert	me guhert	we guhert	wan guhert
gêlay	gêlanê	gêlay	gêla	gêla	gêlaymê	gêlaydê	gêlê
geriyan	geriyam	geriyay	geriya	geriya	(em) geriyan	(hûn) geriyan	(ew) geriyan
hor êstey	n: hor êsta /êstanê m: hore êsta /êstanê	n: hor êstî m: hore êstî	hor êst	hore êste	horê êstimê	horê êstîdê	horê êstê
rabûn	rabûm	rabûy	rabû	rabû	(em) rabûn	(hûn) rabûn	(ew) rabûn
kerđey	kerđim	kerđît	kerđiş	kerđiş	kerđma	kerđta	kerđşa
kirin	min kir	te kir	wî kir	wê kir	me kir	we kir	wan kir
kêştay	kêştim	kêştît	kêştîş	kêştîş	kêştma	kêştta	kêştşa
kişandin	min kişand	te kişand	wî kişand	wê kişand	me kişand	we kişand	wan kişand
kîyanay	kîyanam	kîyanat	kîyanaş	kîyanaş	kîyanama	kîyanata	kîyanaşa
şandin	Min şand	Te şand	Wî şand	Wê şand	Me şand	We şand	Wan şand
liway	liwanê	liway	liwa	liwa	liwaymê	liwaydê	liwê
çûn	çûm	çûy	çû	çû	(em) çûn	(hûn) çûn	(ew) çûn
mařay	mařam	mařat	mařaş	mařaş	mařama	mařata	mařaşa
şikandin	min şikand	te şikand	wî şikand	wê şikand	me şikand	we şikand	wan şikand
meřyay	meřyanê	meřyay	meřya	meřya	meřyaymê	meřyaydê	meřyê
şikestin	şikestim	şikestî	şikest	şikest	(em) şikestin	(hûn) şikestin	(ew) şikestin
midirnay	midirnam	midirnat	midirnaş	midirnaş	midirnama	midirnata	midirnaşa
sekinandin	min sekinand	te sekinand	wî sekinand	wê sekinand	me sekinand	we sekinand	wan sekinand
midray	midranê	midray	midra	midra	midraymê	midraydê	midrê
sekinîn	sekinîm	sekinî	sekinî	sekinî	(em) sekinîn	(hûn) sekinîn	(ew) sekinîn

	Min (n/m)	To (n/m)	Ađ	Ade	Ême	Şime	Adê
nîşteyre	nîştare/nîştanêre	nîştîre	nîştre	nîştere	nîştîmêre	nîştîdêre	nîştêre
rûniştin	rûniştîm	rûniştî	rûnişt	rûnişt	(em) rûniştin	(hûn) rûniştin	(ew) rûniştin
niwîstey	niwîstîm	niwîstî	niwîstîş	niwîstîş	niwîstma	niwîstta	niwîstşa
nivîsandin	min nivîsand	te nivîsand	wî nivîsand	wê nivîsand	me nivîsand	we nivîsand	wan nivîsand
parêznay	parêznam	parêznat	parêznaş	parêznaş	parêznama	parêznata	parêznaşa
parastin	min parast	te parast	wî parast	wê parast	me parast	we parast	wan parast
persay	persam	persat	persaş	persaş	persama	persata	persaşa
pirsîn	min pirsî	te pirsî	wî pirsî	wê pirsî	me pirsî	we pirsî	wan pirsî
řemay	řemanê	řemay	řema	řema	řemaymê	řemaydê	řemê
revîn	reviyam	reviyay	reviya	reviya	(em) reviyam	(hûn) reviyam	(ew) reviyam
řemnay	řemnam	řemnat	řemnaş	řemnaş	řemnama	řemnata	řemnaşa
revandin	min revand	te revand	wî revand	wê revand	me revand	we revand	wan revand
sanay	sanam	sanat	sanaş	sanaş	sanama	sanata	sanaşa
kirrîn/standin	min kirrî/stand	te kirrî/stand	wî kirrî/stand	wê kirrî/stand	me kirrî/stand	we kirrî/stand	wan kirrî/stand
soçnay	soçnam	soçnat	soçnaş	soçnaş	soçnama	soçnata	soçnaşa
şewitandin	min şewitand	te şewitand	wî şewitand	wê şewitand	me şewitand	we şewitand	wan şewitand
soçyay	soçyanê	soçyay	soçya	soçya	soçyaymê	soçyaydê	soçyê
şewitîn	şewitîm	şewitî	şewitî	şewitî	(em) şewitîn	(hûn) şewitîn	(ew) şewitîn
şitey	şitim	şitit	şitiş	şitiş	şitma	şitta	şitşa
şuştin	min şuşt	te şuşt	wî şuşt	wê şuşt	me şuşt	we şuşt	wan şuşt
taway	tawam	tawat	tawaş	tawaş	tawama	tawata	tawaşa
karîn	min karî	te karî	wî karî	wê karî	me karî	we karî	wan karî
tersay	tersanê	tersay	tersa	tersa	tersaymê	tersaydê	tersê
tirsîn	tirsiyam	tirsiyay	tirsiya	tirsiya	(em) tirsiam	(hûn) tirsiam	(ew) tirsiam
wanay/wenay	wanam	wanat	wanaş	wanaş	wanama	wanata	wanaşa
xwendin	min xwend	te xwend	wî xwend	wê xwend	me xwend	we xwend	wan xwend
wardêy	wardîm	wardît	wardîş	wardîş	wardîma	wardîta	wardîşa
xwarin	min xwar	te xwar	wî xwar	wê xwar	me xwar	we xwar	wan xwar
watey	watîm	watît	watiş	watiş	watma	watta	watşa
gotin	min got	te got	wî got	wê got	me got	we got	wan got
wînay	wînam	wînat	wînaş	wînaş	wînama	wînata	wînaşa
dîtin	min dît	te dît	wî dît	wê dît	me dît	we dît	wan dît
witey	witanê / wita	witî	wit	wite	witîmê	witîdê	witê
razan	razam	razay	raza	raza	(em) razan	(hûn) razan	(ew) razan
xiway	xiwanê	xiway	xiwa	xiwa	xiwaymê	xiwaydê	xiwê
kenîn	keniyam	keniyay	keniya	keniya	(em) keniam	(hûn) keniam	(ew) keniam
yaway	yawanê	yaway	yawa	yawa	yawaymê	yawaydê	yawê
gihîştin	gihîştîm	gihîştî	gihîşt	gihîşt	(em) gihîştin	(hûn) gihîştin	(ew) gihîştin
zanay	zanam	zanat	zanaş	zanaş	zanama	zanata	zanaşa
zanîn	min zanî	te zanî	wî zanî	wê zanî	me zanî	we zanî	wan zanî

2 _ Cînavên îşaretê:

Gava ku em tişteki yan tiştan îşaret dikin yan jî nîşan didin, em li cihê navê wî tiştî yan wan tiştan bikar tînin.

+ Ji alîyê cîhetê ve sê celeb hene:

1_ Amaje bi nêzîk

2_ Amaje bi navîn

3_ Amaje bi dûr

- Gelek cînavên îşaretê li Hewramî hene. Cînavên îşaretê yên nêr ji bo nêr û yên mê jî ji bo mê tene bikaranîn, lê cînavên amajeyî yên pirjimar ji bo nêr û mê yek in.

>>> Cureyê halê xwerû yê cînavên îşaretê ji bo nêzîk:

Hewramî	Kurmancî
---------	----------

Êd / Îne (n)	Ev (n)
--------------	--------

Êde / Înê (m)	Ev (m)
---------------	--------

Êdê / Înê (pj)	Ev (pj)
----------------	---------

- Êd / Êde / Êdê ji bo mirovan in, lê Îne / Înê ji bo mirov û nesneyan in.

>>> Cureyê halê xwerû yê cînavên îşaretê ji bo navîn:

Hewramî	Kurmancî
---------	----------

Ađ / Ane (n)	Ew (n)
--------------	--------

Ade / Anê (m)	Ew (m)
---------------	--------

Adê / Anê (pj)	Ew (pj)
----------------	---------

- Ađ / Ade / Adê ji bo mirovan in û Ane / Anê ji bo mirov û nesneyan in.

>>> Cureyê halê xwerû yê cînavên îşaretê ji bo dûr:

Hewramî	Kurmancî
---------	----------

Ew / Ûne (n)	Ew (n)
--------------	--------

Ewe / Ûnê (m)	Ew (m)
---------------	--------

Ewê / Ûnê (pj)	Ew (pj)
----------------	---------

- Ew / Ewe / Ewê ji bo mirovan in û Ûne / Ûnê ji bo mirov û nesneyan in.

>>> Cureyê halê tewandî yê cînavên îşaretê ji bo nêzîk:

Hewramî **Kurmancî**

Êdî / Îney (n) Vî (n)

Êdê / Înê (m) Vê (m)

Êdîşa / Înîşa (pj) Van (pj)

>>> Cureyê halê tewandî yê cînavên îşaretê ji bo navîn:

Hewramî **Kurmancî**

Ađî / Aney (n) Wî (n)

Ađê / Anê (m) Wê (m)

Ađîşa / Anîşa (pj) Wan (pj)

>>> Cureyê halê tewandî yê cînavên îşaretê ji bo dûr:

Hewramî **Kurmancî**

Ewî / Ûney (n) Wî (n)

Ewê / Ûnê (m) Wê (m)

Ewîşa / Ûnîşa (pj) Wan (pj)

Cînav	Nêr		Mê		Pirjimar	
Amaje bi nêzîk	Êd	Îne	Êde	Înê	Êdê	Înê
Amaje bi navîn	Ađ	Ane	Ađe	Anê	Adê	Anê
Amaje bi dûr	Ew	Ûne	Ewe	Ûnê	Ewê	Ûnê

1_ Şêweyekî din ê cînavê (îne), (ye) ye ku li helbestan de tê gotin. Di Kelhûrî de jî (ye) heye > ye çes?: ev çi ye.

Mînak > persam ey êetar ye çêş barit en / wat boy êetrî zolf gîsûy yarit en

➤ *min pirsî lo etaro, ev çi ye{ku} barê te ye / got bêhna etra gêsûya yara te ye*

2_ Ev cînav bi daçeka (îç, yç, ç) jî tene hevgirtin. (îç, yç, ç) = jî (îç) paş tîpeke bêdeng:

- Ađîç mê: Ew jî tê

(yç) paş tîpên bidengên { a, o, û, e, ê }:

- Îneyç hen : ev(n) jî heye
Înêyç/Înêyçe hene : ev(m) jî heye
Înêyç/Înêyçê henê : ev(pj) jî hene

(ç) paş tîpa (î/y/ê):

- Tawî be Hewramîç goranîyê biwaçî? : Dikarî bi Hewramî jî stranê bibêjî?

3_ Çend cînavên amaje yên din jî hene ku pir girîng in û pir jî tên bikaranîn. Piştî navdêrê tên berevajî cînavên amaje yên ku me niha xwendin û kêmek peyvê diguherînin. Ew ne taybetmendiya zayend û jimar in. Xaleke girîng a vî cînavî heye ku em ê niha bixwînin.

Hewramî	Kurmancî
kuř kê n	kur kî ye
jenî kê ne	jin kî ye
kuřê/jenî kê nê	kur/jin kî ne

Lê niha em cînavên îşaretê yên (î/a) bikêr bînin:

Hewramî	Kurmancî
î/a kuře kê n	ev/ew kur kî ye
î/a jenê kê ne	ev/ew jin kî ye
î/a kuřa/jena kê nê	ev/ew kur/jin kî ne

- Wekî ku we dît, dawiya peyvan guheriye. Kuř bûye (kuře, kuřa), jenî bûye (jenê, jena). Ev taybetmendî di Soranî de jî heye:

Soranî	Kurmancî
Em kuře kê ye/kuřane kê n	Ev kur kî ye/kur kî ne
Em jine kê ye/jinane kê n	Ev jin kî ye/jin kî ne
Ew kuřane kê n/kuře kê ye	Ew kur kî ne/kur kî ye
Ew jinane kê n/jine kê ye	Ew jin kî ne/jin kî ye

Xala girîng ku diviya were gotin ev e ku:

1_

- Ger (î / a) berî navdêreke nêr a qedandî bi bêdeng were, li dawiya navdêra nêr, (e) tê zêdekirin. Halê xwerû:
 - Des > î / a + des = î / a dese : ev/ew dest
 - Çem > î / a + çem = î / a çeme : ev/ew çav
 - Kuř > î / a + kuř = î / a kuře : ev/ew kur
 - Şar > î / a + şar = î / a şare : ev/ew bajar
 - Wext > î / a + wext = î / a wexte : ev/ew dem
 - Keş > î / a + keş = î / a keşe : ev/ew çiya
- Ger (î / a) berî navdêreke nêr a qedandî bi (a) an (e) were, li dawiya navdêra nêr, tişteke nayê zêdekirin. Halê xwerû:
 - Bere > î / a + bere = î / a bere : ev/ew derî
 - Pîya > î / a + pîya = î / a pîya : ev/ew mên
 - Tate > î / a + tate = î / a tate : ev/ew bav
- Ger (î / a) berî navdêreke nêr a qedandî bi (î) were, li dawiya navdêra nêr, (ye) tê zêdekirin. Halê xwerû:
 - Gicî > î / a + gicî = î / a gicîye kewe n : ev/ew kiras şîn e
- Ger (î / a) berî navdêreke nêr a qedandî bi (o) an (û) were, dawiya navdêra nêr tê guhertin: (o) an (û) dibe (iwe). Halê xwerû:
 - Ko > î / a + ko = î / a kiwe : ev/ew çiya
 - Mû > î / a + mû = î / a miwe : ev/ew mû
 - Řo > î / a + řo = î / a řiwe : ev/ew roj
- Ger (î / a) berî navdêreke nêr a qedandî bi (y) were, li dawiya navdêra nêr, (e) tê zêdekirin. Halê xwerû:
 - Jîway > î / a + jîway = î / a jîwaye : ev/ew jîyan

>>> î / a jîwaye bê to merg a: ev/ew jîyan bê te mirin e.

2_ Ger (î / a) berî navdêreke mê were em dengdêra li dawiya navdêrê radikin û (ê) û hin car jî (yê) tê zêdekirin. Halê xwerû:

- Jenî > î / a + jenî = î/a jenê : ev/ew jin
- Dega > î / a + dega = î/a degê/degayê : ev/ew gund
- Kerge > î / a + kerge = î/a kergê : ev/ew mirîşk
- Goraniye > î / a + goraniye = î/a goraniyê : ev/ew stran
- Kinaçê > î / a + kinaçê = î/a kinaçê : ev/ew keç

- Ger (î / a) berî navdêreke pirjimar(nêr/mê) ku bi (ê/yê/iwê) bi dawî bûye were, tîpa li dawîya wan dibe (a). Halê xwerû:

- Desê > î / a + desê = î / a desa : ev/ew dest (pj)
- Çemê > î / a + çemê = î / a çema : ev/ew çav (pj)
- Kuřê > î / a + kuřê = î / a kuřa : ev/ew kur (pj)
- Şarê > î / a + şarê = î / a şara : ev/ew bajar (pj)
- Keşê > î / a + keşê = î / a keşa : ev/ew çiya(pj)
- Berê > î / a + berê = î / a bera : ev/ew derî (pj)
- Yanê > î / a + yanê = î / a yana : ev/ew xanî (pj)
- Kiwê > î / a + kiwê = î / a kiwa : ev/ew çiya (pj)
- Gicîyê > î / a + gicîyê = î / a gicîya : ev/ew kiras (pj)
- Jenê > î / a + jenê = î / a jena : ev/ew jin (pj)
- Birayê > î / a + birayê = î / a biraya : ev/ew bira (pj)
- Kergê > î / a + kergê = î / a kerga : ev/ew mirîşk (pj)
- Kinaçê > î / a + kinaçê = î / a kinaça : ev/ew keç (pj)

- Ger (î / a) berî navdêreke pirjimar(nêr/mê) ku ba (a) bi dawî bûye were, (ya) li dawîya peyvê tê lê zêdekirin:

- Bira (n) > î / a + bira = î / a biraya : ev / ew bira (pj)
- Dega(m) > î / a + dega = î / a degaya : ev / ew gund (pj)

- ◆ Î / A: Hem di halê xwerû yê navdêrê de tê û hem jî di halê tewandî yê navdêrê:

- halê xwerû:

Hewramî

î/a şare bê to wêran a

î/a jenê çêş maço?

î/a pîyaya kê nê?

î/a kinaça ders wena

Kurmancî

ev/ew bajar bê te wêran e

ev/ew jin çi dibêje?

ev/ew mênr kê ne?

ev/ew keç ders dixwînin

- halê tewandî:

Hewramî

asmanû î/a şarî

kinaçêw î/a jenê

kitêbû î/a pîyaya

pey î/a kinaça

Kurmancî

ezmanê vî/wî bajarî

keça vê/wê jinê

pirtûka van/wan mênr

ji bo van/wan keçan

- Halê xwerû û tewandiya van cînavan pir dişibin hev an wisa baştir e bêjim ku tenê halê tewandiya nêr ji yê xwerû cuda ye:

Hewramî	Kurmancî
î/a şare	ev/ew bajar
î/a şarî	vî/wî bajarî
î/a awê	ev/ew av
î/a awê	vê/wê avê
î/a kesa	ev/ew kes
î/a kesa	van/wan kesan

- Her weha heke çend peyv li pey hev werin:

Hewramî	Kurmancî
î/a şar û asmane	ev/ew bajar û ezman
î/a aw û kergê	ev/ew av û mirîşk
î/a des û paya	ev/ew des û pê

- Jî me got ku ji bo ku cînavên îşaretê beriya navdêran bikêr bînin divê (a/î) bikar bînin. Her weha ev cînav girêdayî zayend, hejmar û mirov û nesneyan nîn e.

- Dema ku (î / a) bi cînavên cureyê yekem re were, awayê nivîsandin û gotinê dê wisa be:

Hewramî	Soranî	Kurmancî
î /a desme	em /ew desem(desme)	ev /ew destê min
î /a desîme	em /ew desem(desme)	vî /wî destê min
î /a kinaçête	em /ew kiçet(kiçte)	ev /ew keça te
î /a kinaçête	em /ew kiçet(kiçte)	vê /wê keça te
î /a desame	em /ew destanem(destanme)	ev /ew destên min
î /a desame	em /ew destanem(destanme)	van /wan destên min
î /a kinaçate	em /ew kiçanet(kiçante)	ev /ew keçên te
î /a kinaçate	em /ew kiçanet(kiçante)	van /wan keçên te

Hevok:

Hewramî	Soranî	Kurmancî
Min a kuřîme wî nabê	Min ew kuřem bînîbû	Min ew xort dîtîbû
To î kitêbî wenî	To em kitêbe dexwênît	Tu vê pirtûkê dixwînî
Be a kinaçate waçe	Be ew kiçanet bilê	Ji wan keçên xwe re bêje

3_ Cînavê hevpar:

_ Cînavek e ku ji bo hemû kêşeyan bi heman awayî tê bikaranîn û di Hewramî de yek peyv heye û ew jî (wê) ye. Helbet ev cînav kêşeyan bi tena serê xwe tê bikaranîn, belkî piştî wî, cînavên girêdayî yên cureyên yekem tên: { Di Soranî de jî bi cînavên girêdayî re tê girêdan:

- *wê + cînavên girêdayî yên cureyên yekem:*

wêm: ez(min) bi xwe

wêt: tu(te) bi xwe

wêş: ew(wî/wê) bi xwe

wêma: em(me) bi xwe

wêta: hûn(we) bi xwe

wêşa: ew(wan) bi xwe

- *wêm:* (Soranî: Xom, Eng: myself, Tr: kendim)
- *wêt:* (Soranî: Xot, Eng: yourself, Tr: kendin)
- *wêş:* (Soranî: Xoy, Eng: him/herself, Tr: kendi)
- *wêma:* (Soranî: Xoman, Eng: ourselves, Tr: kendimiz)
- *wêta:* (Soranî: Xotan, Eng: yourselves, Tr: kendiniz)
- *wêşa:* (Soranî: Xoyan, Eng: themselves, Tr: kendiler)

+ Ger ev cînav bi tena serê xwe were bikaranîn, ew kesekî/ê diyar nake:

- *wê řaznaywe = xwe xemilandin*

Mînak:

Hewramî

Soranî

Kurmancî

Ađ/Ađe ce wêş êz kero.

Ew le xoy êz dekat.

Ew ji xwe hez dike.

Ađe wêşa maça.

Ewan xoyan delên.

Ew xwe dibêjin.

Min wêm fêr/fêre bîya.

Min xom fêr bûm.

Min bi xwe fêr bûm.

Îtir wêt zanî.

Êdî(Îtir) xot dezanî.

Êdî tu bi xwe dizanî.

+Kirde → wêm zanam = min{bi xwe} zanî (Tr: Kendim bildim, Eng : I knew it by myself)

+ Temamker:

→ be wêş watma: me jê re got (Tr: kindisiye dedik, Soranî: Be xoyman gut)

→ yanew wêt: mala te bi xwe (Soranî: xanûy xot)

+ Xaleke pir girîng:

Wêm na(n) : ez bi xwe me

Wêm ena(m) : ez bi xwe me

Wêt nî(n) : tu bi xwe yî

Wêt enî(m) : tu bi xwe yî

Wêş a(n): ew bi xwe ye

Wêş ene(m): ew bi xwe ye

Wêma nmê: em bi xwe ne

Wêta ndê: hûn bi xwe ne

Wêşa nê: ew bi xwe ne

+ Lê dema ku em bi cînavê hevpar bixwazin bibêjin ku kesek an tiştek yê/ya me ye, tesîra zayenda wî/wê tiş an jî kesî/ê li ser cînavê hevpar dê wiha be:

>> *Ađ biraw wêm a* : Ew birayê min[bi xwe] e

Hin mînak:

Ađ weşewîsû wêm a = Ew delalê min[bi xwe] e

Ađe weşewîsew wêm ene = Ew delala min[bi xwe] e

Ađê weşewîsêw wêm enê = Ew delalên min[bi xwe] in

Eđaw wêt ene : Dayika te[bi xwe] ye

Tatew wêt a : Bavê te[bi xwe] ye

Biraw wêt a : Birayê te[bi xwe] ye

Walêw wêt ene : Xûşka te[bi xwe] ye

*Namêw wêş a : Navê wî bi xwe ye > Sor : Nawî xoyetî

*Namêw wêş ene : Navê wê bi xwe ye > Sor : Nawî xoyetî

Hin mînakên navan:

- **A kuře namêş çêş bê?** : Navê wî xortî çi bû?
- **A kinaçê namêş çêşe bê?** : Navê wê keçikê çi bû?
- **A kuŗa (kinaça) namêşa çêşê bênê?** : Navên wan xortan(keçan) çi bûn?

an:

- **Namêw a kuŗey/kuŗî çêş bê?** : Navê wî xortî çi bû?
- **Namêw a kinaçê çêşe bê?** : Navê wê keçikê çi bû?
- **Namêw a kuŗa (kinaça) çêşê bênê?** : Navên wan xortan(keçan) çi bûn?

* Cînavê hevpar bi daçeka (yç, îç, ç = jî) re wisa ye:

Wê + (yç , ç) + cînavên girêdayî yên cureyên yekem

Hewramî	Soranî	Kurmancî
Wêyçim (Wêçim)	Xoyşim	Ez bi xwe jî
Wêyçit (Wêçit)	Xoyşit	Tu bi xwe jî
Wêyçiş (Wêçiş)	Xoyşî	Ew bi xwe jî
Wêyçma (Wêçma)	Xoyşman	Em bi xwe jî
Wêyçta (Wêçta)	Xoyştan	Hûn bi xwe jî
Wêyçşa (Wêçşa)	Xoyşyan	Ew bi xwe jî

4_Cînavê xwedanî:

+ Ev cînav têgîna xwedîbûn an jî xwedîtiyê radigihîne ku peyva (hin) e:

→ Lê dîsa mixabin ji ber nebûna yek rêzimanekê çend awayên bikaranîna wê hene

→ hin, hîn, hîne, hine, hînye ...

Lê mentiqî dixuye ku meriv wek Kurmancî, vê rêyê ji bo lihevhatina wê bi nêr û mê û pirjimar bikar bîne:

- Hin (n): yê → î dese hinû kê n : ev dest yê kê ye
- Hine (m): ya → î kinaçê hinew kê ne : ev keç ya kê ye
- Hinê (pj): yê → î baxa hinêw kê nê : ev bax yê kê ne
→ anê hinêw kê nê : ew yê kê ne

Jî ev cînav bi cînavên kesane yê girêdayî ve nayê girêdan:

➤ Hinim xelet e.

Hewramî

Kurmancî

Ane hinû min a.

Ew yê min e.

Anê hinew min ene.

Ew ya min e.

Anê hinêw min enê.

Ew yê min in.

Beşa duyem: Ravek

_ Ravek tê manaya îzafeyê yanî temamkirinê. Dema ku navdêrek bi alîkarîya veqetandekê bi navdêrek yan rengdêreka din ve tê girêdan, yanî yek dibe raveker û ya din jî dibe raveber, hingê jê re dibêjin “ravek”.

Di Hewramî de wekî Kurmancî du awa ravek hene:

- 1) Ravekên navdêran
- 2) Ravekên rengdêran

_ Ravekên navdêran: Ew in ku bi alîkarîya veqetandekê, navdêrek bi navdêreka din ve tê girêdan. Yanî hem raveker hem raveber navdêr in.

Veqetandekên ravekirinê di Hewramî de berevajî Kurmancî li gor nêrîtî, mêkîtî û pirjimrîyê nîn in. Ango ji bo wan her sêyan jî heman veqetandek tê bikaranîn.

Hewramî

dengû to weş a. (n)

yanew ême gewre n. (n)

lemew min peře ne. (m)

çemêw şime sîyawê nê. (pj)

Kurmancî

dengê te xweş e.

xanîyê me mezin e.

zikê min tijî ye.

çavên we reş in.

⇒(û , w) ku dikevin di navbera navdêran de. (Ji bo nêr û mê û pirjimar).

- (û) piştî tîpên bêdeng tê lê:

Guł(n) + û + min → gułû min : gula min >> Gułûm xelet e. Ger (û) were divê cînavê veqetandî were bikaranîn û ger jî neyê divê cînavê cureyê yekem were bikaranîn:

>> gułim : gula min/gula`m ☺

dem(n) + û + to → demû to : devê te > jî : demit = devê te

>>> Me berê xwend ku navdêrên mê yên qedandî bi (î) dikarin bi (e) jî biqedin. Ji ber vê yekê, dema ku peyvên mê yên qedandî bi (î) di ravekên navdêran de bin, bêtir di forma xwe ya qedandî bi (e) ne. Ev jî ji ber rehetiya bilêvkirinê ye.

Jenî >>> Jenîw min = Jenew min : *Jîna min*

Wezî >>> wezîw baxa = wezew baxa : *Goza baxan*

- (w) >> Peyvên (nêr û mê) ku bi (a , e , ê , î , o , û , y) diqedin, nîşana (w) li dawîya wan tê zêdekirin:

hane(n) + w + ême → hanew ême : kanîya me

leme (m) + w + min → lemew min : zikê min

eḏa (m) + w + to → eḏaw to : dayika te

pa (n) + w + şime → paw şime : pêyê we

yane (n) + w + ême → yanew ême : xanîyê me

bira (n) + w + min → biraw min : birayê min

dega(m) + w + şime → degaw şime : gundê we

lûte(m) + w + to → lûtew to : pozê te

hanê (pj) + w + ême → hanêw ême : kanîyên me

lemê (pj) + w + kerge → lemêw kerga : zikên mirîşkan

eḏayê (pj) + w + adê → eḏayêw adîşa : dayikên wan

payê (pj) + w + şime → payêw şime : pîyên we

yanê (pj) + w + ême → yanêw ême : xanîyên me

birayê (pj) + w + min → birayêw min : birayên min

degayê (pj) + w + şime → degayêw şime : gundên we

lûtê (pj) + w + herê → lûtêw hera : pozên keran

>>> Raveka peyvên ku bi (y) diqedin dikarin bi çend awayan be:

Fêrbîyey + w + Hewramî → fêrbîyew Hewramî : fêrbûna Hewramî

Wardey + w + nimeřo → wardey nimeřoy : xwarina nîvrojê

Jîway + w + Kurdê → jîwayw Kurda : Jîna/Jîyana Kurda

- Helbestvanan bi piranî di helbestên xwe de nîşana (î/y) li şuna (w , û) jî bikaranîne:

Mînak > zamî di ba kem hûniş ce řa bo : bila kêw xwîna birîna dil di rê de be

> balay yar : bejna yar

Ravekên rengdêran: Ew in ku bi alîkariya veqetandekê navdêr û rengdêrekê wekî raveker û raveber bi hev ve tên girêdan.

Hewramî

Ba^lay berz. (n)
Çemî sîyaw. (n)
Kinaçêy zerîfe. (m)
Çemê weşlê. (pj)

Kurmancî

Bejna bilind.
Çavê reş.
Keça bedew.
Çavên xweşik.

⇒ **Nîşanên wê (î , y) ne, lewma cudakirina pêkhatina wesfî û zêdeyî li Hewramî de hêsan e. (î , y) dikevin di navbera navdêr û rengdêran de.**

- **(î) piştî tîpên bêdeng tê.** Ji ber wê ku li Hewramî tu peyva mê bi tîpa bêdeng naqede, mirov dikare bêje ku nîşana (î) tenê ji bo peyvên nêr e.

- **Peyva nêr >> gu^l + î + sûr → gu^lî sûr : gula sor**

- **(y) piştî tîpên (a, e, ê, o, û) tê:**

Bira + y + ba^laberz → biray ba^laberz : birayê bejnbilind

Yane(n) + y + gewre → yaney gewre: xanîyê mezin (Ji bo nêr heger rengdêr bi tîpa dengdêr bi dawî bibe, herfa dengdêr li dawiya rengdêrê nayê derxistin û rengdêr dê wekî xwe bimîne û ger tîpa dengdêr li dawiya rengdêrê nebe jî rengdêr dê wekî xwe bimîne.)

kinaçê (m) + y + ba^laberze → kinaçêy ba^laberze : keça bejnbilind

dega(m) + y + gewrê → degay gewrê : gundê mezin

➤ **Pêkhatiya wesfî ji bo peyvên pirjimar:**

- ♦ **keş (n:yk) → keşê(pj) + berz → keşê berzê : çiyayên bilind**
- ♦ **eđa (m:yk) → eđayê + di^lsoz → eđayê di^lsozê : dayikên di^lsoz**

Hewramî

- + To kinaçêw kê nî?
- + To kuřû kê nî?
- + Şime kinaçêw /kuřêw kê ndê?
- + To kinaçêwey éaqîle nî.
- + To kuřêwî zîrek nî.
- + To kinaçêw /kuřû Kurdistanî nî.
- + Şime zařolêw Kurdistanî ndê.
- + Kurdistan welatû ême Kurda n.
- + Ziwanû ême Kurdî n.
- + Ziwanî Kurdî şîrîn a. Dilû Kurda n.
- + Ême xelkû Kurdistanî nmê.

Kurmancî

- Tu keça kê yî?
- Tu kurê kê yî?
- Hûn keçên /kurên kê ne?
- Tu keçeka aqil î.
- Tu kurekî zîrek î.
- Tu keça /kurê Kurdistanê yî.
- Hûn zarokên Kurdistanê ne.
- Kurdistan wilatê me Kurda ye.
- Zimanê me Kurdî ye.
- Zimanê Kurdî şêrîn e. Dilê Kurda ye.
- Em xelkê Kurdistanê ne.

_ Di zimanê Kurdî de cureyekî din ê rengdêran heye ku bi vî rengî ye:

Hewramî

çemsîyaw, -e
serweş, -e
bałaberz, -e

Soranî

çawreş
serxoş
bałaberz

Kurmancî

çavreş
serxweş
bejnbilind

- a kinaçê çemsîyawê ne : ew keç çavreş e
- a kuře çemsîyaw a : ew kur çavreş e
- ce éeqû to serweş/serweşe na : ji evîna te serxweş im
- to bałaberz/bałaberze nî : tu bejnbilind î

Em ê bixwînin ku di Soranî, Hewramî û Kelhûrî de taybetmendîyeke wisa heye ku di Kurmancî û Zazakî de tune:

Hewramî

Çemsîyawekem
Çemsîyawekêm

Soranî

Çawreşekem
Çawreşekem

Kelhûrî

Çewsîyagem
Çewsîyagem

Kurmancî

Çavreşê min
Çavreşa min

Mînaekeke xweş:

Kurmancî

Li pey te pir gerîyam
Min te pirsî li her cîyan
Wek kewa ser banîya
Çavreşa min

Hewramî

Şonew tore fire gêlanê
Min tom persa ce her yagane
Pêsew jerejew serû bana
Çemsîyawekêm . . .

_ Niha werin ku em pêkhateyekê bixwînin ku tê de cînavên cureyê yekem bi kar bînin.
 Di Kurmancî de, cînavên kesan dikevî navbera navdêr û rengdêrê. Lê di Hewramî de ne wisa ye û rengdêr dikeve navbera navdêr û cînavên kesan. Bi vî rengî:

Kurmancî	Hewramî
Çavê te yê reş	Çemî sîyawu to

Her weha, cînavên cureyê yekem bi gelemperî di van pêkhateyeyan de bi kar tên:

Kurmancî	Hewramî
Çavê te yê reş	Çemî sîyawit

Mînak:

Hewramî

Eday pîrem = Eday pîrew min

Tatey pîrim = Tatey pîrû min

Balay berzit = Balay berzû to

Lûtey dirêjet = Lûtey dirêjew to

Biroy kewanîş = Biroy kewanîw ađî/ađê

Awe germekêş = Awe germekêw ađî/ađê

Welatî azadma = Welatî azadû ême

Walêy weşewîsema = Walêy weşewîsew ême

Kitêbî kurdîta = Kitêbî kurdîw şime

Biray gewreta = Biray gewrew şime

Mêzey gewrêşa = Mêzey gewrêw ađîşa

Fikrî xasşa = Fikrî xasû ađîşa

Kurmancî

Dêya min a pîr

Bavê min ê kal

Bejna te ya bilind

Pozê te yê dirêj

Birûyê wê/wî yê kevanî

Ava wê/wî ya germ

Wilatê me yê azad

Xuşka me ya delal

Pirtûka we ya kurdî

Birayê we yê mezin

Maseya wan a mezin

Ramana wan a baş

+ Pêkhate(nêr):

Nêr yekjimar	nîşana pêvekê	nîşana wesfî
qedandî bi bêdeng	û	î
qedandî bi { w }	u	î
qedandî bi { a,e,o,û }	w	y
qedandî bi { î }	1_ Standard: (w) li dawiya peyvê tê. 2_ Hin car tiştek nayê lê zêdekirin.	1_ Hin car (y/î) li dawiya peyvê tê. 2_ Hin car tiştek nayê lê zêdekirin.
qedandî bi { y }	1_ Bêtir (w) li şûna (y)ya li dawiya peyvê tê. 2_ Hin car (y)ya li dawiya peyvê dimîne û (w) jî li peyvê zêde dikin. 3_ Hin car (y)ya li dawiya peyvê dimîne û (u) jî li peyvê zêde dikin. 4_ Hin car tiştek lê zêde nakin.	1_ Bêtir tiştek nayê lê zêdekirin tenê giranî dikeve ser (y)ya li dawiya peyvê. 2_ Hin kes tîpa (î) li dawiya peyvê, piştî tîpa(y) zêde dikin.

+ Pêkhate(mê):

Mê yekjimar	nîşana pêvekê	nîşana wesfî
qedandî bi {a}	w	y
qedandî bi {e}	w	y
qedandî bi {ê}	1_ Standard: (w) li dawiya peyvê tê. 2_ Hin car tiştek nayê lê zêdekirin.	y
qedandî bi {î}	1_ Hin car (w) , piştî (î)ya li dawiya peyvê tê. 2_ Bêtir (ew) li şûna (î)ya li dawiya peyvê tê.	1_ Bi gelemperî tiştek nayê lê zêdekirin. 2_ Hin car (î) li dawiya peyvê tê.

+ Pêkhate(pirjimar):

Pirjimar	nîşana pêvekê	nîşana wesfî
qedandî bi {ê}	w	Tenê rengdêr bi navdêrê re li hev dike.
qedandî bi {yê}	w	Tenê rengdêr bi navdêrê re li hev dike.
qedandî bi {î}	1_ Yan (w) li dawiya wan zêde dibe. 2_ Yan (î) dibe (ê) dûv re (w) zêde dibe.	Tenê rengdêr bi navdêrê re li hev dike.
qedandî bi {iwê}	w	Tenê rengdêr bi navdêrê re li hev dike.

Beşa duyem: Navdêr

_ Peyvên ku tiştan yek bi yek yan jî cins bi cins didin naskirin, dîsa term, fikir, rewş, yan jî têkiliya wan bi hev re nîşan didin re dibêjin “*navdêr*”. Navdêr ji aliyê cuda cuda xwedî taybetmendiyan cuda ye lewma dikare ji çend alîyê ve were analîzkirin.

Du cure navdêr hene:

- 1) Navdêrên taybet
- 2) Navdêrên zayendî(cinsî)

_ Navdêrên taybet: Navê tiştan e ku tek in, ji yekî zêdetir tune ne.

Hewramî	Kurmancî
Kurdistan	Kurdistan
Hewraman	Hewraman
Qazî Mihemed	Qazî Mihemed

_ Navdêrên cinsî: Navê wan tiştan e ku ji yekî zêdetir in yan jî grûp in.

Hewramî	Kurmancî
dar (n)	dar
dega (m)	gund

Di Kurmancî de navê şengehan û cihan mê ne. Ev qayîde di Hewramanî de tune. Çawa ku di beşa peyvan de jî behsa wê hat kirin, di Hewramî de nêrîtî û mêkîtîya navdêran li gor avanîya peyvê ye. Nimûne:

Hewramî	Kurmancî
Hewraman (n)	Hewraman (m)
Bêşaran (n)	Bêşaran (m)
Merîwan (n)	Merîwan (m)
Dizîye (m)	Dizlî (m)
Derewkê (m)	Derekê (m)

Halê xwerû yê navdêran:

- Halê xwerû yê navdêran wek kirdeya hevokê di dema niha de (pêwîst û gerguhêz):

Dema niha: Lêkera gerguhêz { bireser diyar e }.

Hewramî

Ađ nan/nanî wero.
Ađe nan/nanî wero.
Ađê nan/nanî wera.

Kurmancî

Ew nanî/nên/nan dixwe.
Ew nanî/nên/nan dixwe.
Ew nanî/nên/nan dixwin.

Dema niha: Lêkera gerguhêz{ bireser diyar nebe }.

Hewramî

Ađ wero.
Ađe wero.
Ađê wera.

Kurmancî

Ew dixwe.
Ew dixwe.
Ew dixwin.

Dema niha: Lêkera pêwîst.

Hewramî

Ađ soço.
Ađe soço.
Ađê soça.

Kurmancî

Ew dişewite.
Ew dişewite.
Ew dişewitin.

- Halê xwerû yê navdêran wek kirdeya hevokê di dema borî de (pêwîst û gerguhêz)

Dema borî: Lêkera gerguhêz dema ku bireser diyar be.

Hewramî

Ađ naniş ward.
Ađe naniş ward.
Ađê nanşa ward.

Kurmancî

Wî nan xwar.
Wê nan xwar.
Wan nan xwar.

Dema borî: Lêkera pêwîst.

Hewramî

Ađ liwa.
Ađe liwa.
Ađê liwê.

Kurmancî

Ew çû.
Ew çû.
Ew çûn

Halê tewandî yê navdêran:

- Di Hewramî de halê tewandî yê navdêran sê cure ne:

1_ Kirdeya lêkera gerguhêz a dema borî, dema ku bireser nadiyar e.

2_ Dema ku biresera lêkera gerguhêz a dema borî û niha bin.

3_ Piştî navdêrên din werin { di ravekên navdêran de an piştî navdêran }

Dema borî: Lêkera gerguhêza dema borî ku bireser diyar nebe.

Hewramî

Ađî ward /warde /wardê.

Ađê ward /warde /wardê.

Ađîşa ward /warde /wardê.

Kurmancî

Wî xwar /xwarin.

Wê xwar /xwarin.

Wan xwar /xwarin.

Dema borî: Lêkera gerguhêza dema borî ku bireser diyar be.

Hewramî

Ađ ađîş arđ.

Ađ ađêş arde.

Ađ ađîşaş arđê.

Ađe ađîş arđ.

Ađe ađêş arde.

Ađe ađîşaş arđê.

Ađê ađîşa arđ.

Ađê ađêşa arde.

Ađê ađîşaşa arđê.

Kurmancî

Wî ew(n) anî.

Wî ew(m) anî.

Wî ew(pj) anîn.

Wê ew(n) anî.

Wê ew(m) anî.

Wê ew(pj) anîn.

Wan ew(n) anî.

Wan ew(m) anî.

Wan ew(pj) anîn.

Piştî navdêran:

Hewramî

Eđaw ađî /ađê /ađîşa kê ne?

Tatew ađî /ađê /ađîşa kê n?

Birayêw ađî /ađê /ađîşa kê nê?

Walêw ađî /ađê /ađîşa kê nê?

Kurmancî

Dayika wî /wê /wan kê ye?

Bavê wî /wê /wan kê ye?

Birayên wî /wê /wan kê ne?

Xuşkên wî /wê /wan kê ne?

Hin mînak:

Hewramî

Zanko naniş ward.
Zanko teweneş wiste.
Zanko yanêş sanê.
Dilbere Rôjaneş berde.
Dilbere maşînîş sana.
Dilbere kitêbêş dîyê.
Adê nanşa ward.
Adê teweneşa newiste.
Adê kitêbêşa ardê.

Kurmancî

Zanko nan xwar.
Zanko kevir avêt. (tewene: m)
Zanko mal kîrîn.
Dilberê Rojan bir.
Dilberê otomobîl kîrî.
Dilberê pirtûk dîtin.
Wan nan xwar.
Wan kevir niavêt.
Wan pirtûk anîn.

- Rola pêşdaçekan di çêbûna halê tewandî yê navdêran de:

Hewramî

îney bide be Ehmedî
anê ce Nermînê sane
pey refêqa

Kurmancî

vî bide Ehmed/Ehmedî
wê ji Nermînê bistîne/bikirre
ji bo hevalan

- waçe be edêt nima nekero / to biđo be min, beheştî bero
ji dayika xwe re bêje ku nimêj neke / (ew) te bide min, bihuştê dibe {ji xwe re}

- Xaleke girîng: Heke çend navdêr li pey hev werin, halê wan ê tewandî wisa ye:

Hewramî

Ce eđa û tatey
Ce tate û edê

Kurmancî

ji dê û bav
ji bav û dayikê

_ Jimar:

Ji alîyê hejmarî ve sê cureyên navdêran hene:

1_ yekjimar 2_ pirjimar 3_ navdêra pirjimar

Yekjimar: Navdêrek e ku li ser kesekî/ê ye û nîşana pirjimarîyê tune. Mînak: mil, sere

Pirjimar: Navdêrek e ku ji kesekî/ê zêdetir û xwedî yek ji nîşana pirjimarîyê.

Pirjimariya nêr:

1_ Dema ku navekî nêr bi tîpeke dengdêr biqede:

- Tîpa (e): Li dawiya peyvê tê derxistin û tîpa (ê) li dawiya peyvê tê zêdekirin.
Mînak:

Yane(xanî:yj) → yanê(xanî:pj) → anê yanê nê : ew mal in

tate(bav:yj) → tatê(bav:pj) → diwê tatê nê : (ew) du bav in

- Tîpa (o, û): Li dawiya peyvê têne derxistin û (iwê) li dawiya peyvê tê zêdekirin.
Mînak:

Ko(çiya:yj) → kiwê (çiya:pj) → îwê kiwê nê : ev çiya ne

Řo(roj:yj) → řiwê(roj:pj) → diwê řiwê bo pey yaneyma : du roj were mala me

Mû(mû:yj) → miwê(mû:pj) → îwê çêşê nê? miwê nê : ev çi ne? mû ne

♦ Hin kes (yê) jî bo van peyvan bi kar tînin > Koyê, Řoyê

- Tîpa (î, a) : Li dawiya peyvê (yê) tê zêdekirin.
Mînak:

Gicî (kiras:yk) → gicîyê (kiras:pj) → çîwar gicîyê : çar kiras

Gonî (telîs,gunî:yk) → gonîyê (telîs:pj)

Pa (pê:yj) → payê (pê:pj) → diwê payêma henê : me du pêyan hene

2_ Dema ku navekî nêr bi tîpeke bêdeng biqede:

- Nîşana pirjimarîyê (ê): Piraniya peyvên(nêr û mê) dişên pê re bibin pirjimar.
Mînak:

Çem(n) : çav (yekjimar) → çemê : çav (pirjimar) >> Mînak:

- çemim (çemû min) : çavê min
- çemê (çemêw min) : çavên min
- serû çemî : serê çav(bi ser çav)
- serû çema : serê çavan (bi ser çavan)

Hin mînak:

- çemê : çav(pj)
- çemê zerîfê : çavên bedew
- çemê zerîfê nê : çavên bedew in
- çemê zerîfê nê : çavên min bedew in

Li Hewramî hin peyv bi gelemperî pirjimar tèn gotin ji bona wê ku ji yekê zêdetir in wek:

goşê(desê, payê): goşêt (desêt , payêt) mêşa ? : guhên te diêşen (gelo)?

qijê: qijêş sîyawê nê: porên wê/wî reş in.

qijêw adê /adî sîyawê nê: porên wê/wî reş in.

Pirjimariya mê:

- Tîpa (ê): Navdêrên weha yên mê hem yekjimar û hem jî pirjimar bê guhertin tèn bikaranîn:

anê: 1-ew (pj) 2-ew (mê)

înê: 1-ev (pj) 2-ev (mê)

Şîşê(Şîşe, Şûşe:yj) → Şîşê(Şîşe, Şûşe:pj)

→ 1_ anê şîşê ne: ew şîşe ye 2_ anê şîşê nê : ew şîşe ne.

Kinaçê(keç: yj): → Kinaçê(keç: pj)

→ 1_ îne kinaçê ne: ev keç e 2_ îne kinaçê nê : ev keç in

- Tîpa (e): Li dawiya peyvê tê derxistin û (ê) li dawiya peyvê tê zêdekirin:

kerge (mirîşk: yk) → kergê (mirîşk: pj)

wile (hêro, xêrî, gul: yj) → wilê (hêro, xêrî, gul: pj)

tenafe(kinder, kinif: yj) → tenafê (kinder, kinif: pj)

- Tîpa (a): Li dawiya peyvê (yê) tê zêdekirin:

dega(gund: yj) → degayê, degê (gund: pj)

- Tîpa (î): Dikarin neguherî bimînin lê hin kes (ê) li dawiya wan zêde dikin.

Jenî (jin:yj) → jenê, jenî (jin: pj)

Wezî → wezê, wezî (goz, gûz: pj)

_ Navdêr ji alîyê naskirî (me´refe) û nenas (nekere):

- ♦ Navdêra naskirî ew nav e ku ji xwendevanan an jî guhdarvanan re tê naskirin. Ji bo naskirina navê naskirî rêyên cuda hene:

1_ Bi lê zêdekirina yek ji cînavkên kesane yên girêdayî an veqetandî ku li dawiya navdêrê tê:

<>Cînavên girêdayî (m, t, ş, ta, ma, şa) an (min, to, adî, adê, ême, şime, adîşa) Mînak:

sere (n) : ser (n)

→ serem: serê min /// seret: serê te /// sereş: serê wî/wê

serema: serê me /// sereta: serê we /// sereşa: serê wan

→ serew min: serê min /serew to: serê te /serew adî: serê wî /serew adê: serê wê

serew ême: serê me /// serew şime: serê we /// serew adîşa: serê wan

2_ Nîşaneyên din ên navê naskirî:

Ev taybetmendî di Kurmancî û Zazakî de nîne, lê di Hewramî, Soranî û Kelhûrî de heye. Loma jî ev beş belkî ji bo we Kurmancan dibe ku hinekî zehmet be. Ger em bixwazin hevwatera wê ya Îngilîzî bihesibînin, ew ê (the) be. Bo nimûne (woman) nenas e lê (the woman) di Îngilîzî de naskirî ye.

- Ji bo nêr: eke, ke, yeke:

→ kuř → kuřeke : kurê ku me berê ew naskirî ye.

Mînak:

Hewramî	Soranî	Kelhûrî	Kurmancî	Îngilîzî
pîy <u>ake</u>	pîyaw <u>eke</u>	pîyag <u>e</u>	mêr	<u>the</u> man
yane <u>ke</u>	ma <u>leke</u>	ma <u>lege</u>	mal	<u>the</u> house
gicîy <u>eke</u>	kirase <u>ke</u>	kiraseg <u>e</u>	kiras	<u>the</u> shirt
kiwe <u>ke</u>	kêw <u>eke</u>	kêfeg <u>e</u>	çîya	<u>the</u> mountain
miwe <u>ke</u>	muw <u>eke</u>	muweg <u>e</u>	mû	<u>the</u> hair
jîway <u>eke</u>	jîne <u>ke</u>	zindigîyeg <u>e</u>	jîn	<u>the</u> life
kitêb <u>eke</u>	kitêb <u>eke</u>	kitaw <u>eke</u>	pirtûk	<u>the</u> book

♦ Navê nêr ê naskirî di pêkhateyên pêvekê, wesfî û hevokê de:

- Pêkhateyên pêvekê: navê nêr + (eke,ke,yeke) + w + ...

Hewramî	Soranî	Kurmancî	Îngilîzî
pîyakew hîzî	pîyawekey diwênê	mêrê duh	the man of yesterday
yaneke w a jenê	malekey ew jine	mala wê jinê	the woman`s house
gicîyekew min	kirasekey min	kirasê min	my shirt
kiwekew degê	kêwekey gund	çîyayê gund	the village`s mountain
miwekew sereym	muwekey serim	mûyê serê min	the hair of my head
jîwayekew ađî/ađê	jînekey ew	jîna wî/wê	his/her life
kitêbekew laloyt	kitêbekey xalit	pirtûka xalê te	your uncle`s book

> **deseke w min /ađî /ađê:** destê ku yê min /wî /wê ye

> **pîyakew hîzî:** mêrê ku me duh ew naskirî ye

> **yaneke w a jenê:** mala ku ya wê jinê ye

> **şareke w ême:** bajarê ku yê me ye

> **kitêbekew Fatmê:** pirtûka ku ya Fatimê ye

> **maşînekew laloym:** otombîla ku ya xalê min e

> **miwekew sereym:** mûyek ku yê serê min e

- **Pêkhateyên wesfî:** Li vir êdî (y) nayê zêdekirin. Ji bo ku em nîşana naskirî ya (eke, ke, yeke) di pêkhateya wesfî bi kar bînin, divê ku em nîşana naskirî ya (eke, ke, yeke), ne li navdêrê, belkî li rengdêrê zêdebikin. Ji ger navdêr bi tîpeke bêdeng biqede, tîpa (e) li dawîya navdêrê tê zêdekirin. Li Soranî û Kelhûrî jî wisa ye.

Hewramî	Soranî	Kelhûrî	Kurmancî	Îngilîzî
pîya xaseke	pîyawe başeke	pîya xasege	mêrê baş	the good man
yane koneke	male koneke	male konege	mala kevn	the old house
gicîye keweke	kirase şîneke	kirase awîyege	kirasê şîn	the blue shirt
kiwe berzeke	kêwe berzeke	kêfe berzege	çîyayê bilind	the high mountain
miwe çermeke	muwe spîyeke	muwe sifideke	mûyê spî	the white hair
jîwaye weşeke	jîne xoşeke	zindigîye xweşege	jîna xweş	the nice life
kitêbe Kurdîyeke	kitêbe Kurdîyeke	kitawe Kurdîyeke	pirtûka Kurdî	the Kurdish book

Nîşana naskirî ya(eke, ke, yeke) bi cînavê girêdayî yê cureyên yekem jî bi kar tên:

Hewramî	Soranî	Kurmancî	Îngilîzî
biraket	biraket	birayê te	your brother
yanekes	malekey	mala wê/wî	his/her house
gicîyekem	kirasekem	kirasê min	my shirt
kiwekema	kêwekeman	çîyayê me	our mountain
miweket	muweket	mûyê te	your hair
jîwayekeşa	jînekeyan	jîna wan	their life
kitêbeketa	kitêbeketan	pirtûka we	your book

• Di hevokê de:

> kuřekew ême gewre n. : kurê me mezin e.

Elbet em dikarin bêjin kuřû ême gewre n. Cudahiya wan tenê di naskirî û nenas de ye.

Hewramî	Soranî	Kurmancî	Îngilîzî
dsekem dirêj a	destekem dirêj e	destê min dirêj e	my hand is long
yanekes gewre n	malekey gewre ye	mala wî/wê mezin e	his/her house is big
şarekema weş a	şarekeman xoş e	bajarê me xweş e	our city is nice
maşînekeşa çêş a	otombêlekeyan çi ye	otombîla wan çi ye	what is their car
miweket siyaw a	muweket řeş e	mûyê te reş e	your hair is black

- Ji bo mê : kê,ekê >>> Ji ber ku navdêrên mê bi dengdêrên (a, e, ê, î) diqedin, bi zêdekirina (kê) fonema wan a dawî tê derxistin:

➤ Peyvên mê yên ku bi (a,e) diqedin nayên guhertin û tenê (kê) li dawiya wan tê zêdekirin.

→ gawe → gawekê

→ eđa → eđakê

Lê: Peyvên mê yên ku bi (ê,î) diqedin bi vî rengî ne ku (ê,î) li dawiya wan dibe (e).

→ kinaçê → kinaçekê > (ê) di kinaçê de tê rakirin.

→ jenî → jenekê > (î) di jenî de tê rakirin

→ çemsîyawe(çavreş {mê}) > çemsîyawekêm: çavreşa min

>>> kinaçe çemsîyawekê: keça çavreş

Mînak:

Hewramî	Soranî	Kelhûrî	Kurmancî	Îngilîzî
degakê	gundeke	dêhatege	gund	the village
lûtekê	lûteke	lûtege	poz	the nose
walekê	xuşkeke	xwêşgege	xwişk	the sister
wezekê	giwêzeke	girdekanegê	goz	the nut
goranîyekê	goranîyeke	ahengege	stran	the song

Navdêrê mê yê naskirî di pêkhatayên pêvekê, wesfî û hevokê de:

- pêkhatayên pêvekê: navê mê + (kê) + w + ...

Hewramî	Soranî	Kurmancî	Îngilîzî
degakêw adîşa	gundekey ewan	gundê wan	their village
lûtekêw Zanyarî	lûtekey Zanyar	pozê Zanyar	Zanyar`s nose
walekêw Zîlanê	xuşkekey Zîlan	xwişka Zîlanê	Zîlan`s sister
wezekêw baxî	giwêzekey bax	goza bax	garden nut
goranîyekêw to	goranîyekey to	strana te	your song

- **Pêkhatayên wesfî:** Li vir wekî nêr êdî (y) nayê zêdekirin. Ji bo ku em nîşana naskirî ya (kê/ekê) di pêkhataya wesfî bi kar bînin, divê ku em nîşana naskirî ya (kê/ekê), ne li navdêrê, ku li rengdêrê zêdebikin.

Hewramî	Soranî	Kurmancî	Îngilîzî
dega dûrekê	gunde dûreke	gundê dûr	the distant village
lûte gewrekê	lûte gewreke	pozê mezin	the big nose
wale zerîfekê	xuşke ciwaneke	xwişka bedew	the beautiful sister
weze éalekê	giwêze başeke	goza baş	the good nut
goranîye weşekê	goranîye xoşeke	strana xweş	the nice song

Nîşana naskirî ya (kê) bi cînavên girêdayî yên cureyên yekem jî bi kêr tên:

Hewramî	Soranî	Kurmancî	Îngilîzî
degakêma	gundekeman	gundê me	our village
lûtekêm	lûtekem	pozê min	my nose
walekêt	xuşkeket	xwişka te	your sister
wezekêşa	giwêzekeyan	gûza wan	their nut
goranîyekêş	goranîyekey	strana wê/wî	his/her song

- Di hevokê de:

>> kinaçekêta zerîfe ne: keça we bedew e

Hewramî	Soranî	Kurmancî	Îngilîzî
degakêma anê ne	gundekeman ewe ye	gundê me ew e	that is our village
lûtekêm dirêje ne	lûtekem dirêj e	pozê min dirêj e	my nose is long
walekêt ko ne?	xuşkeket kiwa?	xwişka te li ku ye	where`s your sister
wezekêşa keme ne	giwêzekeyan kem e	goza wan kême	their nut is little
goranîyekêş weşe ne	goranîyekey xoş e	strana wê/wî xweş e	his/her song is nice

Ji bo pirjimar: eka, ka, yeka:

kuřeka : kurên ku me berê ew naskirî ne.

kinaçeka : keçên ku me berê ew naskirî ne.

gicîyeka : kirasên ku me berê ew naskirî ne

Hewramî	Soranî	Kurmancî	Îngilîzî
deseka	destekan	dest	the hands
pîyaka	pîyawekan	mêr	the men
yaneka	maîekan	mal	the houses
şareka	şarekan	bajar	the cities
kitêbeka	kitêbekan	pirtûk	the books
miweka	muwekan	mû	the hair

Hewramî	Soranî	Kurmancî	Îngilîzî
lûteka	lûtekan	poz	the noses
aweka	awekan	av	the waters
waleka	xuşkekan	xwişk	the sisters
degaka	gundekan	gund	the villages
kergeka	mirîškekan	mirîşk	the hens
goranîyeka	goranîyekan	stran	the songs

• pêkhateyên pêvekê:

Hewramî	Soranî	Kurmancî	Îngilîzî
desekaw beşerî	destekanî mirov	destên mirov	human hands
pîyakaw degê	pîyawekanî gund	mêrên gund	the men of the village
yanekaw şarî	maîekanî şar	malên bajêr	the houses of the city
şarekaw Kurdîstanî	şarekanî Kurdistan	bajarên Kurdistanê	Kurdistan cities
kitêbekaw Sarînê	kitêbekanî Sarîna	pirtûkên Sarînayê	books of Sarina
maşînekaw min	otombêlekanî min	otombîlên min	my cars
miwekaw sereyt	muwekanî serit	mûyên serê te	the hairs of your head
lûtekaw ême	lûtekanî ême	pozên me	our noses
awekaw dinyê	awekanî dinya	avên dinê	the waters of the world
walekaw Şaxewanî	xuşkekanî Şaxewan	xwişkên Şaxewan	Shakhewan`s sisters
degakaw Hewramanî	gundekanî Hewraman	gundên Hewramanê	village`s of Hewraman
kergekaw degê	mirîškekanî gund	mirîşkên gund	the village hens
wezekaw şime	giwêzekanî êwe	gozên we	your nuts
goranîyekaw Êosmanî	goranîyekanî Êosman	stranên Osmên	Osman`s songs

- pêkhateyên wesfî:

Hewramî	Soranî	Kurmancî	Îngilîzî
dese kuleka	deste kurtekan	destên kurt	the short hands
pîya xaseka	pîyawê başekan	mêrên baş	the good men
yane tazeka	maîle niwêkan	malên nû	the new houses
şare gewreka	şare gewrekan	bajarên mezin	the big cities
kitêbe weşeka	kitêbe xoşekan	pirtûkên xweş	the good books
maşîne keweka	otombêlê şînekan	otombîlên şîn	the blue cars
miwe sîyaweka	muwe reşekan	mûyên reş	the black hairs
lûte gewreka	lûte gewrekan	pozên mezin	the big noses
awe serdeka	awe sardekan	avên sar	the cold waters
walê zerîfeka	xuşke ciwanekan	xwişkên bedew	the beautiful sisters
dega weşeka	gunde xoşekan	gundên xweş	the nice villages
kerge çermeka	mirîşke spîyekan	mirîşkên spî	the white hens
weze miçkileka	giwêze biçûkekan	gozên biçûk	the small nuts
goranîye Kurdîyeka	goranîye Kurdîyekan	stranên Kurdî	the Kurdish songs

Nîşana naskirî ya (eka, ka) bi cînavên girêdayî yê cureyên yekem jî bi kêr tên:

Hewramî	Soranî	Kurmancî	Îngilîzî
dese kam	destekanim	destên min	my hands
şarekaş	şarekanî	bajarên wî/wê	its cities
kitêbekata	kitêbekantan	pirtûkên we	your books
maşînekat	otombêlekanî	otombîlên te	your cars
miwekaş	muwekanî	mûyên wî/wê	her/his hair
walêkata	xuşkekantan	xwişkên we	your sisters
degakama	gundekanman	gundên me	our villages
kergekaş	mirîşkekanyan	mirîşkên wan	their hens
goranîyekam	goranîyekanim	stranên min	my songs

◆ Navdêra nenas:

Ew navdêr e ku ji xwendevan û guhdaran re nenas e û bi gelemperî bi yek ji nîşanên jêrîn ve girêdayî ye:

1_ êw / yêw 2_ êwe / yêwe 3_ ye 4_ ê, yê

- Mirov di sohbetên xwe de, hemûyan bi kar tînin û her çar halet dikarin li dawiya hemû peyvan (nêr û mê) werin.

_ (-êw / -yêw) yan jî (-êv / -yêv): Ji bo navdêrên nêr in. Mînak:

1_ kuřêw : kurek >>> kuřêw ama : kurek hat

2_ birayêw : birayek >>> birayêwim hen : birayekî min heye

_ (-êwe / -yêwe) yan jî (-êve / -yêve): Ji bo navdêrên nêr in. Mînak:

1_ kinçêwe : keçek >>> kinçêwe ama : keçek hat

2_ degayêwe : gundek >>> degayêwe bê : gundek hebû

- Jî ger navdêrek bi (a) biqede, (a) nayê derxistin û (yêw) li dawiya wê tê zêdekirin. Ger navdêrek bi (e,ê)(î: mê) biqede, (e, ê, î) tên rakirin û (êw) li şûna wan tê. Ger navdêrek bi (o, û) biqede, (o, û) dibin (iw) û paşan (êw) li dawiya wê tê lê zêdekirin.

Mînakên din:

bira : bira > birayêw : birayek

eđa : dayik > eđayêwe : dayikek

pa : pê > payêw : pêyek

yane : mal > yanêw : malek

leme : zik > lemêwe : zikek

wane : ders > wanêw : dersek

gicî : kiras > gicîyêw : kirasek

çalî : çal > çalêwe : çalek

yagê : cîh > yagêwe : cihek

jenî : jin > jenêwe : jinek

wezî : goz > wezêwe : gozek

ko : çîya > kiwêw : çîyayek

mû : mû > miwêw : mûyek

sale : sal > salêwe : salek

jîway : jîn > jîwayêwe : jînek

_ ye: Ev nîşan bêtir paşê tîpên bêdeng tê:

Dîlye : Dilek

Kuŕye : Kurek

_ ê / yê: Ev paşdaçek gelek karanîn hene, ya herî zêde ku ji wan tê bikaranîn çêkirina halê xwerû yê peyvên pirjimar e. Lê ji bilî wê, ew dikare karanîna din jî hebe. Yek ji wan ew e ku nediyariyê çêdike. Yeka din ji wan jî çêkirina halê tewandî yê peyvên mê ye. Yeka din jî heye ku em ê di hokerê de bixwînin.

- Jenê : 1- jinê 2- jinek 3- jin(pj)
- Pîyayê : 1- mêt (pj) 2- mêrek
- Yanê : 1- mal (pj) 2- malek
- Desê : 1- dest (pj) 2- destek
- Birayê : 1- bira (pj) 2- birayek
- Birayê hen : Min birayek heye
- Birayê henê : Min bira hene
- Edayê : 1- dayik (pj) 2- dayikek 3- dayikê
- A eîê : 1- ev dayik 2- vê dayikê
- A eîaya : 1- ev dayik(pj) 2- wan dayikan
- Kinaçê : 1- keçê 2- keç(pj) 3- keç 4-keçek

♦ **Şiroveyên bêtir ji navdêrê:**

_ Çêkirina navdêrê: Navdêr ji alîyê çêkirinê ve li çend beşan hatiye dabeşkirin:

1_ Navdêra sade: Ew navdêreke ku tenê endameke wê heye û nabe ku li beşên piçûktir ên watedar were dabeşkirin: rô, çem, des, to

2_ Navdêra hevedudanî:

> Navdêreke ku ji du pêkhatayan pêk hatiye:

* navdêr + navdêr : kitêb + yane = kitêbyane (pirtûkxane)

* navdêr + ga/ge : seyran + ga = seyranga

* navdêr + koka lêkerê : diî + ber = diîber

* navdêr + paşgir : gul + istan = gulistan /// cejne + ane = cejnane

* pêşgir + navdêr : wer + des = werdes

_ Cureyên navdêrên din jî hene ku peyvên bêwate ne û piştî navdêr û rengdêran tên:

➤ *Çinar û minar, rêk û pêk, dirext û mirext*

_ Hin peyv û navdêr hene ku ji aliyê zindiyan an jî tiştan ve tên çêkirin:

- Çoře : Dengê ketina avê
- Şilpe : Dengê tişteki dema dikeve avê
- Boře : Dengê çêlek an golikan
- Şilqe : Dengê tevlihevkirina/bûna şilekan di hundirê tişteki de
- Qaspe/Qaqbe: Dengê kewê <> Qaspew jerejê weş a
- Gife : Dengê kûçikê
- Qaře : Dengê pez
- Çirîke : Dengê bibilê
- Wîtewî : Dengê cûcîk
- Haje : Dengê tavge û çeman

Xala dawî ku lazim e hûn bizanibin ev e:

Hewramî	Kurmancî
Yanew min	Mala min
Berew yanew min	Derîyê mala min
Yanem	Mala min
Berew yaneym	Derîyê mala min

Niha bo mê:

Hewramî	Kurmancî
Gilkew min	Tiliya min
Řengew gilkew min	Rengê tiliya min
Gilkem	Tiliya min
Řengew gilkêm	Rengê tiliya min

Niha bo pirjimar:

Hewramî	Kurmancî
Çemêw min	Çavên min
Sîyawîw çemaw min	Reşîya çavên min
Çemêm	Çavên min
Řengew Çemam	Rengê çavên min

We dît ku heke paş navdêrên nêr/mê (û/w) were, navdêr nayê tewandin lê bo pirjimar ne wisa ye.

Beşa duyem: Rengdêr

_ Peyvên ku ji alîyê reng, rewş, hereket, şekil, cih, wate, îşaret, hejmar û pirsê ve navdêran temam dikin. Ango peyvên ku navdêran ji alîyê çendinî û çawaniyê ve rave dikin û wesfên wan nîşan didin re dibêjin “*rengdêr*”.

Di Hewramî de peyv di halê xwe yê xwerû de jî zayenda xwe nîşan dide, lewre *rengdêr* dikare hem nêr, hem mê hem jî pirjimar be. Bo nimûne *rengdêra* ‘ *weş* ’ ku bi tîpeke *bêdeng* diqede, di Hewramî de li halê xwe yê xwerû dişê hem nêrîtiya xwe wek forma *weş(n)*, hem mêkîtiya xwe wek forma *weşe(m)* û hem jî pirjimariya xwe wek forma *weşê(pj)* nîşan bide. Jî bo nimûne *rengdêra* ‘ *fire* ’ ku bi tîpeke *bideng* diqede, nêrîtiya xwe wek forma *fire(n)*, mêkîtiya xwe wek forma *firê(m)* û pirjimariya xwe wek forma *firê(pj)* nîşan dide.

_ Ji nihêrînên cihêreng, *rengdêr* xwedan dabeşbûnê ne:

- Sade, kirdeyî, bireserî, nisbî, û hwd.
- ♦ **Rengdêra sade**. Berî dîtina nimûneyê, baş e ku meriv zanibe ku di Hewramî de *rengdêr* wek lêkerê bi kirdeyê re li hev dikin. Mînak:
 - *gul(n)* → *gulî zerîf* : gula bedew → a gule, zerîf *a* : ew gul, bedew e
 - *mange(m)* → *mangey zerîfe* : heyva bedew → êşew mange zerîfe ne : îşev heyv bedew e
 - *keşê(pj)* → *çîwar keşê zerîfê* : çar çîyayên bedew
→ Şaho û Kosalan diwê keşê zerîfê nê : Şaho û Kosalan du çîyayên bedew in.

Sê mînakên jorîn ji bo *rengdêrên* ku bi herfa *bêdeng* diqedin in. Heger *rengdêr* bi tîpeke *dengdêr* *biqede*, forma *rengdêra* nêr nayê guhertin lê *dengdêra* dawî ya *rengdêra* *mê* dibe (ê). *Rengdêra* pirjimari jî wek berê ye:

- *fire*: gelek, pir
 - *kar(n)* → *karî fire* → *karî firem hen* : min gelek kar heye
 - *awe(m)* → *away firê* → *î awê, firê ne* : ev av gelek e
 - *derdê(pj)* → *derdê firê* → *derdêma firê nê* : derdên me gelek in

- ♦ **Rengdêra kirdeyî:** Hin rengdêr hene ku faila lêkerê û taybetmendiya wê îfade dikin.
Hin awayên çêkirina wê hene:

1_ Navdêr + koka dema niha ya lêkerê. Nimûne:

- nan + peç → nanpeç, -e : nanopêj > yê/ya ku nan dipêje
- talan + ker → talanker, -e : talanker > yê/ya ku talan dike
- awate + waz → awatewaz, -e : xwestekar > yê/ya ku arezûdar e

2_ Navdêr + der. Nimûne:

- beş + der → beşder, -e : yê/ya ku para xelkan dide
- goş + der → goşder, -e : yê/ya ku guh dide

3_ Navdêr + gîr. Nimûne:

- diz + gîr → dizgîr, -e : yê/ya ku diz digire
- des + gîr → desgîr, -e : yê/ya ku dest digire

4_ Navdêr + dar. Nimûne:

- bax + dar → baxdar, -e : baxçevan > yê/ya ku baxçeyek wî/wê heye
- yane + dar → yanedar, -e : maldar > yê/ya ku maldar e
- dûkan + dar → dûkandar, -e : dikandar > yê/ya ku dikanek wî/wê heye

5_ Navdêr + kar. Nimûne:

- tika + kar = tikakar, -e : tikakar > yê/ya ku tika dike

6_ Navdêr + ger. Nimûne:

- asin + ger → asinger, -e : hesinkar
- mis + ger → misger, -e : mîsger

7_ Navdêr + ewan. Nimûne:

- bax + ewan → baxewan, -e : baxvan > yê/ya ku baxek wî/wê heye
- keş + ewan → keşewan, -e : çîyager

8_ Navdêr + çî. Nimûne:

- qafle + çî → qafleçî, -ye : yê/ya ku karwanvan e

9_ Koka dema niha + a/ê. Nimûne:

- zan + a → zana, -ê : yê/ya ku zana ye

10_ Rengdêr + koka dema niha. Nimûne:

- fire + zan → firezan, -e : yê/ya ku pir zana ye
- kem + wan → kemwan, -e : yê/ya ku kêr dixwîne

- ♦ **Rengdêra bireserî:** Ew rengdêr e ku tiştek li ser wê hatiye kirin û bi awayên jêrîn çêdibe:

1 Rengdêra bireseriya nêr:

- ♦ Radera bi nîşana (ey): Bi rakirina tîpa (y) ji nîşana raderiya(ey) û giranî li ser kîteya dawîn, rengdêra bireserîya nêr çêdibe:

➤ Kuştay → rakirina (y) → kuşte (yê ku hatiye kuştin: kuştî)

➤ Sotay → rakirina (y) → sote (yê ku şewitiye: şewitî)

- Niha hûn dizanin ku di rengdêrên (kuşte , sote û hwd) de ku ji bo nêr in, giranî dikeve ser kîte ya dawîn.

Me berê xwend ku:

Hewramî

Kurmancî

ađ sot

ew (n) şewitî

ađ sote

ew (n) şewitiye

ađe sote

ew (m) şewitî

ađe sotene

ew (m) şewitiye

- Ji bo wê ku em sote li (ađe sote) û sote li (sote: rengdêr) tevlihev nekin:

Di bilêvkirina soteya (ađe sote) de giranî dikeve ser kîte ya pêşîn û di bilêvkirina soteya rengdêr de, giranî dikeve ser kîte ya dawîn:

Sara sote: Sara şewitî

Kuřî sote: kurê şewitî

- ♦ Radera bi nîşana (y): Bi rakirina tîpa (y) ji nîşana raderiya(y), rengdêra bireserîya nêr çêdibe. Jî divê giranî li ser kêteya dawîn be:

Amay → rakirina (y) → ama (yê ku hatiye : hatî)

- ađ aman : ew(n) hatiye

- Xaleke girîng: Di Kurmancî de lêkera bûnê ji rengdêrên ku ji raderan çênebûne wek *bedew, tehl, bilind* û hwd, cuda tê nivîsandin. Nimûne:

Tu bedew î /// Dar bilind e.

- Lê bi rengdêrên ku ji raderan çêbûne wek *hatî, şewitî* û hwd ve girêdayî ne. Nimûne:

Ez hatime /// Em şewitîne.

- Di vê pirtûkê de bo Hewramî jî wisa ye da ku hûn tevlihev nekin. Ango:

To(n) zerîf nî : Tu bedew î

To(m) zerîfe nî : Tu bedew î

To(n) amanî : Tu hatiyî

To(m) amênî : Tu hatiyî

- ♦ Radera bi nîşana (yey): Bi rakirina tîpa (y) ji nîşana raderiya(yey), rengdêra bireserîya nêr çêdibe. Jî divê giranî li ser kêteya dawîn be::

Bîyey → rakirina (y) → Bîye (yê ku bûye)

- Ađ xemgîn bîyen : Ew xemgîn bûye

2_ Rengdêra bireserîya mê:

- ♦ Radera bi nîşana (ey): Bi rakirina tîpa (y) ji nîşana raderiya(ey) û guhertina (e)ya li dawîya peyvê bi (ê), rengdêra bireserîya mê çêdibe:

- Kuştay → rakirina (y) û guhertina (e) bi (ê) → kuştê (ya ku hatiye kuştin: kuştî)

- Sotay → rakirina (y) û guhertina (e) bi (ê) → sotê (ya ku şewitiye: şewitî)

- ♦ Radera bi nîşana (y): Bi rakirina tîpa (y) ji nîşana raderiya(y) û guhertina (a)ya li dawîya peyvê bi (ê) rengdêra bireserîya mê çêdibe:

Amay → rakirina (y) û guhertina (a) bi (ê)→ amê (ya ku hatiye: hatî)

- aê amêne : ew(m) hatîye

- ♦ Radera bi nîşana (yey): Bi rakirina tîpa (y) ji nîşana raderiya(yey) û guhertina (e)ya li dawîya peyvê bi (ê), rengdêra bireserîya mê çêdibe:

Bîyey → rakirina (y)→ Bîyê (ya ku bûye)

- Aê xemgîne bîyêne: Ew xemgîn bûye

3_ Rengdêra bireserîya pirjimar:

- ♦ Radera bi nîşana (ey): Bi rakirina tîpa (y) ji nîşana raderiya(ey) û guhertina (e)ya li dawîya peyvê bi (ê), rengdêra bireserîya pirjimar çêdibe:

➤ Kuştay → rakirina (y) û guhertina (e) bi (ê)→ kuştê (yê ku hatine kuştin: kuştî)

➤ Sotay → rakirina (y) û guhertina (e) bi (ê) → sotê (yê ku şewitîne: şewitî)

- ♦ Radera bi nîşana (y): Bi rakirina tîpa (y) ji nîşana raderiya(y) û guhertina (a)ya li dawîya peyvê bi (ê) rengdêra bireserîya pirjimar çêdibe:

Amay → rakirina (y) û guhertina (a) bi (ê)→ amê (yê ku hatine : hatî)

- aê amênê : ew(pj) hatîne

- ♦ Radera bi nîşana (yey): Bi rakirina tîpa (y) ji nîşana raderiya(yey) û guhertina (e)ya li dawîya peyvê bi (ê), rengdêra bireserîya pirjimar çêdibe:

Bîyey → rakirina (y)→ Bîyê (yê ku bûne)

- Aê xemgîne bîyênê: Ew xemgîn bûne

1_ Koka dema borî + e/ê :

Nêr: Kuştay → kuşt + e: kuşte> Min(n) kuştew nîgaw to na : Ez kuştîyê awirên te me

Mê: Kuştay → kuşt + ê: kuştê> Min(m) kuştêw nîgaw to na : Ez kuştîya awirên te me

Pj: Kuştay → kuşt + ê: kuştê> Ême kuştêw nîgaw to nmê : Em kuştîyên awirên te ne

2_ Koka dema niha + ya/yê = Lêkerên pasîf. Mînak: Kuşyay = Hatî kuştin

Nêr: Kuşyay → kuş + ya: kuşya> To(n) kuşyanî : Tu hatiye kuştin

Mê: Kuşyay → kuş + yê: kuşyê> Aê kuşyêne : Ew(m) hatiye kuştin

Pj: Kuşyay → kuş + yê: kuşyê> Şime kuşyêndê : Hûn hatine kuştin

3_ Navdêr + koka dema niha + /e/ê :

Nêr: Des + peç + _ = despeç (xwarinek(n) ku bi dest hatiye amadekirin.)

Mê: Des + peç + e = despeçe (xwarineke(m) ku bi dest hatiye amadekirin.)

Pj: Des + peç + ê = despeçê (xwarinên ku bi dest hatine amadekirin.)

4_ Pêşgir + rengdêra bireseriya sade:

Nêr: wa + mendê : wa mendê = mat mayî /şaş bûyî

Mê: wa + mendê : wa mendê = mat mayî /şaş bûyî

Pj: wa + mendê : wa mendê = mat mayî /şaş bûyî

Rengdêra nisbî: Ev navdêrek e ku kesek an tiştek bi kesek an tiştek din ve girê û nisbet dide û awayên çêkirina wê jî wisa ne:

1_ Navdêr + î/yî. Nimûne:

Kurdistan + î = kurdistanî(n), kurdistanîye(m), kurdistanîyê(pj)

Sine + yî = Sineyî(n), Sineyîye (m), Sineyîyê (pj)

➤ Dema ku peyvên mê paşqertafa (î/yî) bigirin, giranî dikeve ser kîte ya dawîn.

>> wînî + î (paşqertafa rengdêra nisbî) = wînî > êdî giranî dikeve ser kîte ya dawîn = xwînî.

Nimûne:

Desim wînî n: Destê min xwînî ye

Lûtem wînîye ne: Pozê min xwînî ye

2_ Navdêr + î. Nimûne:

Zeř + î : zeřî(n), zeřîne(m), zeřîne(pj)

3_ Navdêr + e. Nimûne:

Zimsan + e = zimsane(n), zimsanê(m), zimsanê(pj)

4_ Navdêr + ane. Nimûne:

Kuř + ane = kuřane (n), kuřanê(m/pj)

Jenî + ane = jenane (n), jenanê(m/pj)

5_ Navdêra hevpar + ne. Nimûne:

Wêma + ne: wêmane,-ê (bi xwe ve girêdayî)

6_ Navdêr + îne:

Şelem + îne = şelemîne

♦ Nisbetê zêdetir: Nîşanên wê (ter, tere, terê) ne ku li dawîya rengdêrê tene zêdekirin:

Nêr → berz + ter: berzter (bilindtir): ađ ce min berzter a = ew ji min bilindtir e

Mê → berz + tere: berztere (bilindtir): ađe ce to berztere ne = ew ji te bilindtir e

Pj → berz + terê: berzterê (bilindtir): ađe ce ême berzterê nê = ew ji me bilindtir in

• Weke ku dixuye ji bo mê nabêjin berzeter an berzeterere.

• Ji bo pirjimar jî nabêjin berzêter an berzêterê.

_ **Nisbetê zêdetirîn: Nîşanên wê (terîn, terîne, terîne) ne ku li dawiya rengdêrê tê zêdekirin:**

Nêr :

a(î) pîya, berzterîn a = ev(ew) mêt, bilindtirîn e
a(î) pîya, berzterîn kes a = ev(ew) mêt, kesê herî bilind e
berzterîn pîya, ane n (îne n) = bilindtirîn mêt, ew e (ev e)
Zanko berzterînû pîyaya n = Zanko herî bilindê mêran e
berzterînû pîyaya, Zanko n = herî bilindê mêran, Zanko ye

Mê :

a(î) jenê zerîfterîne ne: ew(ev) jin, bedewtirîn e
a(î) jenê zerîfterîn kese ne: ev(ew) jin kesa herî bedew e
berzterîn jenî, anê ne: jina herî bilind, ew e
Rûnak berzterînnew jena ne: Rûnak herî bilinda jinan e
berzterînnew jena, Rûnake ne: herî bilinda jinan, Rûnak e

Pirjimar :

î(a) pîyaya(jena) berzterînê nê: ev{ew} mêt{jîn: pj} bilindtirîn in
î(a) pîyaya(jena) berzterîn kesê nê: ev{ew} mêt{jîn:pj} kesên herî bilind in
berzterîn pîyaya, anê nê: mêtên herî bilind, ew in
berzterîn jena, anê nê: jînên herî bilind, ew in
adê berzterînêw girdî nê: ew herî bilindên hemûyan in
berzterînêw girdî, adê nê: herî bilindên hemûyan, ew in

♦ **gird/gird: hemû**

girdma: me hemûyan > ce girdîma: ji me hemûyan
girdta: we hemûyan > ce girdîta: ji we hemûyan
girdşa: wan hemûyan > ce girdîşa: ji wan hemûyan

- Rêbwar ce girdî berzter a = Rêbwar ji hemûyan bilindtir e.
- Şekîla ce girdî zerîftere ne = Şekîla ji hemûyan bedewtir e.
- Adê ce girdî weşleterê nê = Ew ji hemûyan xweşiktir in.

♦ **Cureyên din ên rengdêra îfadeyî:**

Rengdêra amajeyî: Di Hewramî de du cînavên îşaretê yê (î , a) bi piranî di sohbetan de tên bikaranîn. Van cînavan hin taybetmendî hene ku pir girîng in. Ev cînavên îşaretê hevwaterên (em/ew)a Soranî ne.

- **Î:** Ji bo kesek/ên an tiştek/ên ku nêzîk e/in. Bo nêr, mê û pirjimar.

Hewramî	Soranî	Kurmancî
pîya(n)	pîyaw	mêr
î pîya	em pîyawê	ev mêr
î pîyaya	em pîyawane	ev mêr(pj)
jenî(m)	jin	jin
î jenê	em jine	ev jin(m)
î jena	em jinane	ev jin(pj)

- **A:** Ji bo kesek/ên an tiştek/ên ku di navbera nêzîk û dûr de ye/ne.

Hewramî	Soranî	Kurmancî
guł (n)	guł	gul
a gułê	ew gułê	ew gul
a guła	ew gułane	ew gul(pj)
kerge(m)	mirîşk	mirîşk
a kergê	ew mirîške	ew mirîşk
a kerga	ew mirîşkane	ew mirîşk(pj)

- **Û:** Ji bo kesek/ên an tiştek/ên ku pir dûr e/in. Ji ber ku ev cînav pir kêmtir tê bikaranîn, em jî bêtir cînavên (î/a) lêkolîn bikin. Hemî taybetmendiyan vî cînavî wek taybetmendiyan (î/a) ye.

- **Navdêrên din ku me di rûpelên (141-142) de xwendin, (îne /ane /ûne) û (êd /ad /ew) li şûna navdêran tên, lê (î , a , û) berî navdêran tên û hin guhertinan jî çêdikin.**

Dema ku rengdêrên amajeyî yê jorîn piştî navdêran werin, hin tîp paşê navdêrê tên:

Bo nêr <> Halê xwerû :

- Qedandî bi bêdeng => î/a + navdêr + e

Hewramî

Soranî

Kurmancî

î + kuř > î kuře

em + kuř > em kuře

ev + kur > ev kur (yj)

a + çem > a çeme

ew + çaw > ew çawe

ew + çav > ew çav (yj)

- Qedandî bi (a, e) => î/a + navdêr

Hewramî

Soranî

Kurmancî

î + bira > î bira

em + bira > em bira

ev + bira > ev bira (yj)

a + hêlê > a hêlê

ew + hêlke > ew hêlkeye

ew + hêk > ew hêk (yj)

- Qedandî bi (î) => î/a + navdêr + ye

Hewramî

Soranî

Kurmancî

î + gicî > î gicîye

em + kiras > em kirase

ev + kiras > ev kiras (yj)

a + mizgî > a mizgîye

ew + mizgewt > ew mizgewte

ew + mizgeft > ew mizgeft(yj)

- Qedandî bi (o, û) => î/a + navdêr(o/û dibe iwe)

Hewramî

Soranî

Kurmancî

î + mû > î miwe

em + mû > em muwe

ev + mû > ev mû (yj)

a + řo > a řiwe

ew + řoj > ew řoje

ew + roj > ew roj (yj)

- Qedandî bi (y) => î/a + navdêr + e

Hewramî

Soranî

Kurmancî

î + jîway > î jîwaye

em + jîyan > em jîyane

ev + jîyan > ev jîyan (yj)

a + liway > a liwaye

ew + řoyştin > ew řoyştine

ew + çûn > ew çûn (yj)

Bo mê <> Halê xwerû :

- Qedandî bi (a) => î/a + navdêr + an (a)ya li dawîya peyvê dibe (ê) an jî (yê) tê zêdekirin.

Hewramî

î + dinya > î dinyê/dinyayê

a + eđa > a eđê/eđayê

Soranî

em + dinya > em dinya

ew + dayk > ew daykê

Kurmancî

ev + dinya > ev dinya (yj)

ew + dayik > ew dayik (yj)

- Qedandî bi (e, î) => î/a + navdêr + (e, î)ya li dawîya peyvê dibe (ê)

Hewramî

î + jenî > î jenê

a + seêate > a seêatê

Soranî

em + jin > em jîne

ew + katjimêr > ew katjimêrê

Kurmancî

ev + jin > ev jin (yj)

ew + saet > ew saet(yj)

- Qedandî bi (ê) => î/a + navdêr

Hewramî

î + kinaçê > î kinaçê

a + waîê > a waîê

Soranî

em + kiç > em kiçê

ew + xuşk > ew xuşkê

Kurmancî

ev + keç > ev keç (yj)

ew + xuşk > ew xuşk (yj)

- Qedandî bi (yî) => î/a + navdêr + (î)ya li dawîya peyvê dibe (ê)

Hewramî

î + beyî > î beyê

a + diŕeyî > a diŕeyê

Soranî

em + bey > em beye

ew + diŕk > ew diŕkê

Kurmancî

ev + bîyok > ev bîyok (yj)

ew + stirî > ew stirî (yj)

- Qedandî bi (ye) => î/a + navdêr + (e)ya li dawîya peyvê dibe (ê)

Hewramî

î + metîye > î metîyê

a + qalîye > a qalîyê

Soranî

em + pûr > em pûrê

ew + ferş > ew ferşe

Kurmancî

ev + xaltî/met > ev xaltî/met (yj)

ew + xalîçe > ew xalîçe (yj)

Bo pirjimar <> Halê xwerû :

- Qedandî bi (ê) => î/a + navdêr + (ê)ya li dawîya peyvê dibe (a)

Hewramî

î + çemê > î çema

î + yanê > î yana

î + kergê > î kerga

a + jenê > a jena

a + kinaçê > a kinaça

Soranî

em + çawan > em çawane

em + mañan > em mañane

em + mirîşkan > em mirîşkane

ew + jinan > ew jinane

ew + kiçan > ew kiçane

Kurmancî

ev + çav > ev çav (pj)

ev + mal > ev mal (pj)

ev + mirîşk > ev mirîşk (pj)

ew + jin > ew jin (pj)

ew + keç > ew keç (pj)

- Qedandî bi (yê) => î/a + navdêr + (ê)ya li dawîya peyvê dibe (a)

Hewramî

î + birayê > î biraya

a + degayê > a degaya

a + gicîyê > a gicîya

Soranî

em + birayan > em birayane

ew + gundan > ew gundane

ew + kirasan > ew kirasane

Kurmancî

ev + bira > ev bira (pj)

ew + gund > ew gund (pj)

ew + kiras > ew kiras (pj)

- Qedandî bi (î) => î/a + navdêr + (î)ya li dawîya peyvê dibe (a)

Hewramî

î + jenî > î jena

a + awî > a awa

Soranî

em + jinan > em jinane

ew + awan > ew awane

Kurmancî

ev + jin > ev jin (pj)

ew + av > ew av (pj)

- Qedandî bi (iwê) => î/a + navdêr + (ê)ya li dawîya peyvê dibe (a)

Hewramî

î + kiwê > î kiwa

a + miwê > a miwa

Soranî

em + kêwan > em kêwane

ew + muwan > ew muwane

Kurmancî

ev + çîya > ev çîya (pj)

ew + mû > ew mû (pj)

Niha halê tewandiya (î/a) bibînin:

Bo nêr <> Halê tewandî

- Qedandî bi bêdeng => î/a + navdêr + î

Hewramî

î + kuř > î kuřî

a + çem > a çemî

Soranî

em + kuř > em kuře

ew + çaw > ew çawe

Kurmancî

ev + kur > vî kurî (yj)

ew + çav > wî çavî (yj)

- Qedandî bi (a , e) => î/a + navdêr + y

Hewramî

î + bira > î biray

a + hête > a hêley

Soranî

em + bira > em bira

ew + hêlke > ew hêlkeye

Kurmancî

ev + bira > vî bira (yj)

ew + hêk > wê hêkê (yj)

- Qedandî bi (î) => î/a + navdêr + yey

Hewramî

î + gicî > î gicîyey

a + mizgî > a mizgîyey

Soranî

em + kiras > em kirase

ew+mizgewt > ew mizgewte

Kurmancî

ev + kiras > vî kirasî (yj)

ew +mizgeft >wê mizgeftê (yj)

- Qedandî bi (o, û) => î/a + navdêr(o/û dibe iwe) + y

Hewramî

î + mû > î miwey

a + řo > a řiwey

Soranî

em + mû > em muwe

ew + řoj > ew řoje

Kurmancî

ev + mû > vî mû (yj)

ew + roj > wê rojê (yj)

- Qedandî bi (y) => î/a + navdêr + ey

Hewramî

î + jîway > î jîwayey

a+ liway > a liwayey

Soranî

em + jîyan > em jîyane

ew + řoyştin > ew řoyştine

Kurmancî

ev + jîyan> vê jîyanê (yj)

ew + çûn > wê çûnê (yj)

Bo mê <> Halê tewandî

- Qedandî bi (a) => î/a + navdêr + an (a)ya li dawîya peyvê dibe (ê) an jî (yê) tê zêdekirin.

Hewramî

î + dinya > î dinyê/dinyayê

a + eđa > a eđê/eđayê

Soranî

em + dinya > em dinya

ew + dayk > ew daykê

Kurmancî

ev + dinya > vê dinê (yj)

ew + dayik > wê dayikê (yj)

- Qedandî bi (e, î) => î/a + navdêr + (e, î)ya li dawîya peyvê dibe (ê)

Hewramî

î + jenî > î jenê

a + seêate > a seêatê

Soranî

em + jin > em jine

ew + katjimêr > ew katjimêrê

Kurmancî

ev + jin > vê jinê (yj)

ew + saet > wê saetê (yj)

- Qedandî bi (ê) => î/a + navdêr

Hewramî

î + kinaçê > î kinaçê

a + wałê > a wałê

Soranî

em + kiç > em kiçê

ew + xuşk > ew xuşkê

Kurmancî

ev + keç > vê keçê (yj)

ew + xuşk > wê xuşkê (yj)

- Qedandî bi (yî) => î/a + navdêr + (î)ya li dawîya peyvê dibe (ê)

Hewramî

î + beyî > î beyê

a + diřeyî > a diřeyê

Soranî

em + bey > em beye

ew + diřk > ew diřkê

Kurmancî

ev + jîyan > vê bîyokê (yj)

ew + stirî > wî stirî (yj)

- Qedandî bi (ye) => î/a + navdêr + (e)ya li dawîya peyvê dibe (ê)

Hewramî

î + metîye > î metîyê

a + qalîye > a qalîyê

Soranî

em + pûr > em pûrê

ew + ferş > ew ferşê

Kurmancî

ev + xaltî/met > vê xaltîyê/metê (yj)

ew + xalîçe > wê xalîçeyê (yj)

Bo pirjimar <> Halê tewandî

- Qedandî bi (ê) => î/a + navdêr + (ê)ya li dawîya peyvê dibe (a)

Hewramî	Soranî	Kurmancî
î + çemê > î çema <u>̎</u>	em + çawan > em çawane <u>̎</u>	ev + çav > van çavan (pj)
î + yanê > î yana <u>̎</u>	em + maîan > em maîane <u>̎</u>	ev + mal > van malan (pj)
î + kergê > î kerga <u>̎</u>	em + mirîşkan > mirîşkane <u>̎</u>	ev + mirîşk > van mirîşkan (pj)
a + jenê > î jena <u>̎</u>	ew + jinan > ew jinane <u>̎</u>	ew + jin > wan jinan (pj)
a + kinaçê > a kinaça <u>̎</u>	ew + kiçan > ew kiçane <u>̎</u>	ew + keç > wan keçan (pj)

- Qedandî bi (yê) => î/a + navdêr + (ê)ya li dawîya peyvê dibe (a)

Hewramî	Soranî	Kurmancî
î + birayê > î biraya <u>̎</u>	em + birayan > em birayane <u>̎</u>	ev + bira > van birayan (pj)
a + degayê > a degaya <u>̎</u>	ew + gundan > ew gundane <u>̎</u>	ew + gund > wan gundan (pj)
a + gicîyê > a gicîya <u>̎</u>	ew + kirasan > ew kirasane <u>̎</u>	ew + kiras > wan kirasan (pj)

- Qedandî bi (î) => î/a + navdêr + (î)ya li dawîya peyvê dibe (a)

Hewramî	Soranî	Kurmancî
î + jenî > î jena <u>̎</u>	em + jinan > em jinane <u>̎</u>	ev + jin > van jinan (pj)
a + awî > a awa <u>̎</u>	ew + awan > ew awane <u>̎</u>	ew + av > wan avan (pj)

- Qedandî bi (iwê) => î/a + navdêr + (ê)ya li dawîya peyvê dibe (a)

Hewramî	Soranî	Kurmancî
î + kiwê > î kiwa <u>̎</u>	em + kêwan > em kêwane <u>̎</u>	ev + çîya > van çîyayan (pj)
a + miwê > a miwa <u>̎</u>	ew + muwan > ew muwane <u>̎</u>	ew + mû > wan mûyan (pj)

Hûn dibînin ku halê xwerû û tewandîya peyvên mê û pirjimar wek hev in. Lê ji bo peyvên nêr ne wisa ye.

- Niha em taybetmendiya cînavên (a/î) di pêkhatayên wesfî de bixwînin.

Hewramî	Soranî	Kurmancî
gulî sûr	gulî sûr	gulê sor
guley sûre	gulî sûr	gula sor
gulê sûrê	gulanî sûr	gulên sor

Ev mînaka jorîn tiştek bû ku me di debarê rengdêrên Hewramî de xwend. Lê dema ku cînavên (a/î) werin hin guhertin çêdibin.

- Halê xwerû:

Hewramî	Soranî	Kurmancî
a/î gule sûre	ew/em gule sûre	ew/ev gulê sor
a/î gule sûrê	ew/em gule sûre	ew/ev gula sor
a/î gule sûra	ew/em gule sûrane	ew/ev gulên sor

- Halê tewandî:

Hewramî	Soranî	Kurmancî
a/î gule sûrî/sûrey	ew/em gule sûre	wî/vî gulê sor
a/î gule sûrê	ew/em gule sûre	wê/vê gula sor
a/î gule sûra	ew/em gule sûrane	wan/van gulên sor

- We dît ku rewşa cînavên (a/î) di pêkhatayên wesfî de, dema ku hal xwerû an tewandî be çawa ye.

Bo nêr <> Halê xwerû :

- Qedandî bi bêdeng => î/a + navdêr + e + rengdêr + /e/ye ([e] piştî rengdêra qedandî bi bêdeng /// [ye] piştî rengdêra qedandî bi [î].)

Hewramî	Soranî	Kurmancî
a/î çeme sîyaw <u>e</u>	ew/em çawe řeş <u>e</u>	ew/ev çavê reş
a/î dese çerme	ew/em deste spî <u>ye</u>	ew/ev destê spî
a/î kuře Hewramî <u>ye</u>	ew/em kuře Hewramî <u>ye</u>	ew/ev kurê Hewramî

- Qedandî bi (a, e) => î/a + navdêr + rengdêr + /e/ye

Hewramî	Soranî	Kurmancî
î/a pa dirêj <u>e</u>	em/ew pa dirêj <u>e</u>	ev/ew pêyê dirêj
î/a yane berz <u>e</u>	em/ew male berz <u>e</u>	ev/ew mala bilind

- Qedandî bi (î) => î/a + navdêr + ye + rengdêr + /e/ye

Hewramî	Soranî	Kurmancî
î/a gicîye qaweyî <u>ye</u>	em/ew kirase qaweyî <u>ye</u>	ev/ew kirasê qehweyî
î/a weşîye gewre	em/ew xoşîye gewre	ev/ew xweşîya mezin

- Qedandî bi (o, û) => î/a + navdêr(o/û dibe iwe) + rengdêr + /e/ye

Hewramî	Soranî	Kurmancî
î/a miwe barîk <u>e</u>	em/ew muwe tenik <u>e</u>	ev/ew mûyê tenik
î/a řiwe waranî <u>ye</u>	em/ew řoje baranî <u>ye</u>	ev/ew roja baranî

- Qedandî bi (y) => î/a + navdêr + e + rengdêr + /e/ye

Hewramî	Soranî	Kurmancî
î/a jîwaye weş <u>e</u>	em/ew jîyane xoş <u>e</u>	ev/ew jîyana xweş
î/a meye tal <u>e</u>	em/ew meye tal <u>e</u>	ev/ew meya tehl

Bo mê <> Halê xwerû :

- Qedandî bi (a , e , ye) => î/a + navdêr + rengdêr + ê/yê

Hewramî

î/a dega dûrê

î/a kerge çermê

î/a metîye pîrê

Soranî

em/ew gunde dûrê

em/ew mirîşke spîye

em/ew pûre pîrê

Kurmancî

ev/ew gundê dûr

ev/ew mirîşka spî

ev/ew xaltiya/meta pîr

- Qedandî bi (î / yî) = î/a + navdêr + (î)ya li dawiya peyvê dibe (e) + rengdêr + ê/yê

Hewramî

î/a jene degayîyê

î/a wine sûrê

î/a beye tişê

Soranî

em/ew jine gundîye

em/ew xwêne sûrê

em/ew beye tirşê

Kurmancî

ev/ew jina gundî

ev/ew xwîna sor

ev/ew bîyoka tirş

- Qedandî bi (ê) => î/a + navdêr + (ê)ya li dawiya peyvê dibe (e) + rengdêr + ê/yê

Hewramî

î/a kinaçe zerîfê

î/a yage wêranê

Soranî

em/ew kiçe ciwane

em/ew şiwêne wêranê

Kurmancî

ev/ew keça bedew

ev/ew cihê wêran

Bo pirjimar <> Halê xwerû :

- Qedandî bi (ê) => î/a + navdêr (ê)ya li dawîya peyvê dibe (e) + rengdêr + a/ya

Hewramî

î/a çeme sîyawa

î/a yane gewra

î/a kerge çerma

î/a jene zerîfa

î/a kinaçe balaaberza

Soranî

em/ew çawe řeşane

em/ew małe gewrane

em/ew mirîşke spîyane

em/ew jine ciwanane

em/ew kiçe balaaberzane

Kurmancî

ev/ew çavên reş (pj)

ev/ew malên mezin (pj)

ev/ew mirîşkên spî (pj)

ev/ew jinên bedew (pj)

ev/ew keçên bejnîlind (pj)

- Qedandî bi (yê) => î/a + navdêr +(ye)+ rengdêr + a/ya

Hewramî

î/a bira gewra

î/a dega weşa

î/a gicîye kurdîya

Soranî

em/ew bira gewrane

em/ew gunde xoşane

em/ew kirase kurdîyane

Kurmancî

ev/ew birayên mezin (pj)

ev/ew gundên xweş (pj)

ev/ew kirasên kurdî (pj)

- Qedandî bi (î) => î/a + navdêr (î) dibe (e) + rengdêr + a/ya

Hewramî

î/a jene şarîya

î/a awe pîsa

Soranî

em/ew jine şarîyane

em/ew awe pîsane

Kurmancî

ev/ew jinên bajarî

ev/ew avên qirêj

- Qedandî bi (iwê) => î/a + navdêr(ê) dibe (e) + rengdêr + a/ya

Hewramî

î/a kiwe berza

î/a miwe sewza

Soranî

em/ew kêwe berzane

em/ew muwe sewzane

Kurmancî

ev/ew çîyayên bilind(pj)

ev/ew mûyên kesk (pj)

Bo nêr <> Halê tewandî :

- Qedandî bi bêdenq => î/a + navdêr + e + rengdêr + /e/ye + y

Hewramî	Soranî	Kurmancî
a/î çeme sîyaw <u>e</u> y	ew/em çawe řeş <u>e</u>	wî/vî çavê reş
a/î dese çerm <u>e</u> y	ew/em deste spî <u>e</u>	wî/vî destê spî
a/î kuře Hewramî <u>e</u> y	ew/em kuře Hewramî <u>e</u>	wî/vî kurê Hewramî

- Qedandî bi (a , e) => î/a + navdêr + rengdêr + /e/ye + y

Hewramî	Soranî	Kurmancî
î/a pa dirêj <u>e</u> y	em/ew pa dirêj <u>e</u>	vî/wî pêyê dirêj
î/a yane berz <u>e</u> y	ev/ew małe berz <u>e</u>	vê/wê mala bilind

- Qedandî bi (î) => î/a + navdêr + ye + rengdêr + /e/ye + y

Hewramî	Soranî	Kurmancî
î/a gicîye qaweyî <u>e</u> y	em/ew kirase qaweyî <u>e</u>	vî/wî kirasê qehweyî
î/a weşîye gewr <u>e</u> y	em/ew xoşîye gewr <u>e</u>	vê/wê xweşiya mezin

- Qedandî bi (o, û) => î/a + navdêr(o/û dibe iwe) + rengdêr + /e/ye + y

Hewramî	Soranî	Kurmancî
î/a miwe barîk <u>e</u> y	em/ew muwe tenik <u>e</u>	vî/wî mûyê tenik
î/a riwe waranî <u>e</u> y	em/ew řoje baranî <u>e</u>	vê/wê roja baranî

- Qedandî bi (y) => î/a + navdêr + e + rengdêr + /e/ye + y

Hewramî	Soranî	Kurmancî
î/a jîwaye weş <u>e</u> y	em/ew jîyane xoş <u>e</u>	vê/wê jîyana xweş
î/a meye tal <u>e</u> y	em/ew meye tal <u>e</u>	vê/wê meya tehl

Bo mê <> Halê tewandî:

- Qedandî bi (a , e , ye) => î/a + navdêr + rengdêr + ê/yê

Hewramî

î/a dega dûrê

î/a kerge çermê

î/a metîye pîrê

Soranî

em/ew gunde dûrê

ev/ew mirîşke spîye

ev/ew pûre pîrê

Kurmancî

vî/wî gundê dûr

vê/wê mirîşka spî

vê/wê xaltiya/meta pîr

- Qedandî bi (î / yî) = î/a + navdêr + (î) ya li dawîya peyvê dibe (e) + rengdêr + ê/yê

Hewramî

î/a jene degayîyê

î/a wine sûrê

î/a beye tişê

Soranî

em/ew jine gundîye

em/ew xwêne sûrê

em/ew beye tişê

Kurmancî

vê/wê jina gundî

vê/wê xwîna sor

vê/wê bîyoka tirş

- Qedandî bi (ê) => î/a + navdêr + (ê) ya li dawîya peyvê dibe (e) + rengdêr + ê/yê

Hewramî

î/a kinaçe zerîfê

î/a yage wêranê

Soranî

em/ew kiçe ciwane

em/ew şiwêne wêranê

Kurmancî

vê/wê keça bedew

vê/wê cihê wêran

Bo pirjimar <> Halê tewandî :

- Qedandî bi (ê) => î/a + navdêr (ê)ya li dawiya peyvê dibe (e) + rengdêr + a

Hewramî

î/a çeme sîyawa

î/a yane gewra

î/a kerge çerma

î/a jene zerîfa

î/a kinaçe balaberza

Soranî

em/ew çawe řeşane

em/ew małe gewrane

em/ew mirîşke spîyane

em/ew jine ciwanane

em/ew kiçe balaberzane

Kurmancî

van/wan çavên reş (pj)

van/wan malên mezin (pj)

van/wan mirîşkên spî (pj)

van/wan jinên bedew (pj)

van/wan keçên bejn**bilind**(pj)

- Qedandî bi (yê) => î/a + navdêr +(ye)+ rengdêr + a/ya

Hewramî

î/a bira gewra

î/a dega weşa

î/a gicîye kurdîya

Soranî

em/ew bira gewrane

em/ew gunde xoşane

em/ew kirase kurdîyane

Kurmancî

van/wan birayên mezin (pj)

van/wan gundên xweş (pj)

van/wan kirasên kurdî (pj)

- Qedandî bi (î) => î/a + navdêr (î) dibe (e) + rengdêr + a/ya

Hewramî

î/a jene şarîya

î/a awe pîsa

Soranî

em/ew jine şarîyane

em/ew awe pîsane

Kurmancî

van/wan jinên bajarî

van/wan avên qirêj

- Qedandî bi (iwê) => î/a + navdêr(ê) dibe (e) + rengdêr + a/ya

Hewramî

î/a kiwe berza

î/a miwe sewza

Soranî

em/ew kêwe berzane

em/ew muwe sewzane

Kurmancî

van/wan çîyayên bilind(pj)

van/wan mûyên kesk (pj)

Hin rengdêr:

Hewramî Kurmancî

Aram, -e	Aram
Asan, -e	Hêsan
Berz, -e	Bilind
Çîya, -ê	Honik (Ji bo avê)
Dirêj, -e	Dirêj
Fênîk, -e	Honik (Ji bo hewa)
Fire, -ê	Gelek, Zaf, Pir
Germ, -e	Germ
Gewre, -ê	Mezin
Gul, -e	Kirêt
Gulale, -ê	Biçûk
Kem, -e	Kêm
Kota, -ê	Kurt
Miçkile, -ê	Biçûk
Nařehet, -e	Aciz
Nerm, -e	Nerm
Pîs, -e	Qirêj
Saf, -e	Sayî
Serđ, -e	Sar
Sext, -e	Zor
Temîs, -e	Paqij
Tin, -e	Tund
Weş, -e	Xweş
Weşhał, -e	Kêfxweş
Xas, -e	Baş
Xirab, -e	Xirab
Zerîf, -e	Bedew
Zibr, -e	Zibir

Beşa duyem: Hoker

_ Peyvên ku wateya lêkeran li gor rewş, dem, alî û çendinîyê diyar dikin re dibêjin “*hoker*”. Bi piranî hoker ji peyvên mîna *çî, çenî, çîñne, key û kam lawe* ku ji pêveberê tên pirsîn pêk tê. Peyvên mîna *çêr, ser, fire, biřê, îse, zû, dêr* û hwd di nav hevokê de wek hoker tên bikaranîn. Hoker di hin cihan de wateya lêkerê hêzdar û di hin cihan de jî bisînor dikin:

- Aras zû ama welê to dêr amay: Aras zû hat lê tu dereng hatî.

_ Hoker ji du alîyan ve tê seh kirin:

1_ Têgeh 2_ Çêkirin

➤ Di warê têgehê de çend celeb hene:

1_ Hokera demê: Wateya lêkeran ji alîyê demê ve diyar dike, anga hereketê ku bûye wextê wê nîşan dide. Bersiva pirsên mîna *key(kengê), heta key(heya kengê), key we(ji kengê ve), çî wext*. Mînak:

Hewramî	Kurmancî
îse, éelan	niha
sewa, seêbê, seba	sibê
car car	carinan
ewsa / caran	berê
hîzî(hêzî)	doh
heşay, hîştay	hîn, hêj

- Aro dîm we çem, min newnemamê / çemsîyawê bê, nazikendamê îro min bi cavî re nemamek nû dît / caverşek bû û nazikendamek

2_ Hokera cîhetê: Nîşan dide ku kar ber bi kîderê ve yan bi kîjan alîyê ve dibe. Bersiva pirsên *kogere, kowe, berew koy û hwd*.

Hewramî	Kurmancî
<u>kogewe</u> amay pey yaneyma	<u>ji kîjan alîyê ve</u> hatî mala me

3_ Hokera rewşê: Nîşan dide ku kar çawa û çima dibe.

Hewramî	Kurmancî
misyar <u>xas</u> goşdarî kero	şagirt <u>baş</u> guhdarî dike

4_ Hokera cihî: Nîşan dide ku kar li ku derê dibe. Bersiva pirsên mîna *koge, ko û hwd.*
 dilê = nav(hundir). Ger daçeka (ne) li dawiya peyvekê were zêde kirin wateya (di... de) ye.
 Mînak:

Hewramî	Kurmancî
min dilê <u>ne</u> kar kerû	ez <u>di</u> hundir <u>de</u> kar dikim.
yan <u>ene</u>	<u>li</u> malê
zeř(n) nîya desim <u>ne</u>	<u>di</u> destê min <u>de</u> pere nîn e (tune)

- sere endama bedenê ye lê ser alî û hêl e:

Hewramî	Kurmancî
serem mêşo	serê min diêşe
serû çemî	ser çav

5_ Hokera çendiniyê: Wateya lêkerê ji aliyê mîqdarê ve diyar dike, bersiva pirsên *çiñne û hwd.* Mînak:

Hewramî	Kurmancî
ađ/ađe <u>fire</u> qisê kero	ew <u>pir</u> qise dike

6_ Hokera pirsê: Ji aliyê pirsê ve wateya pêveberan diyar dike. Bersiva pirsên *çêş, pey çî û hwd* tê dayîn. Mînak: tûre = bi hêrs

Hewramî	Kurmancî
<u>pey çî</u> tûre nî(n) /tûrê nî(m)	çima (ji bo çî) bi hêrs î ?

7_ Hokera îstisnayê:

Hewramî	Kurmancî
tenya, -ê	tenê
bêcge	ji bilî
feqet	bes

8_ Hokera duayî: xiwakero(bikero), yaxwa(yaxiwa), xêr bo

9_ Hokera hezkirî:

Hewramî	Kurmancî
şellay/beş	xwezî
oxey	oxey

10_ Hokera teşbîhê:

Hewramî	Kurmancî
pêse (pêsne)	wek , wisa (nêzîk)
pase (pasne)	wek , wisa (dûr)
asa	wek , wisa

11_Hokera gumanî:

Hewramî	Kurmancî
daxom/daxim řenga	dibe ku ...? renge

12_Hokera sedemîyê:

Hewramî	Kurmancî
pey aney çûn/çûnke	ji bo wê çûn/çûnke

13_Hokera řertî:

Hewramî	Kurmancî
eger pařertê er	eger bi wî řertî eger

14_Hokera dubare:

Hewramî	Kurmancî
dîsan/wawey beyn beyn	dîsa carinan

15_Hokera rêzî:

Hewramî	Kurmancî
ewel dese dese pol pol	ewel kom kom ref ref

16_Hokera eriniyê:

Hewramî	Kurmancî
eľbet miřo meřo	eľbet divê navê

- Taybetmendiye di Hewramî de heye ku pir dişibe ya Kurmancî:

Hewramî	Kurmancî
wehar(n) rengîn a	buhar(m) rengîn e
hamin(n) germ a	havîn(m) germ e
payîz(n) weş a	payîz(m) xweş e
zimsan(n) serd a	zivistan(m) sar e

Lê:

Hewramî	Kurmancî
weharê mew	buharê tēm
haminê beydê	havînê werin
payîzê mênê	payîzê (ew) tēn
zimsanê melmê	zivistanê (em) naçin

We dît ku mîna Kurmancî tîpa (ê) li dawîya peyvên hatiye zêdekirin. { Bi wê ferqê ku giranî nakeve ser tu beşekî peyvê}. Di Hewramî de hin navdêr hene ku dikarin roka hokeran bigirin û di pêkhateya wan de guhertin çêbibin. Ev guhertin ji hinek aliyan ve dişibin Kurmancî û ji hinek aliyan ve jê cuda ne.

- 1- Navên demsalan (ê) digirin. Elbet dema ku bi tena serê xwe bin û di pêkhateyan de nebin. Nimûne:

Hewramî	Kurmancî
weharê milû	buharê diçim
to haminê înay çiko	tu havînê li ku yî

- 2- Rojên hefteyê (y) digirin:

Hewramî	Kurmancî
diweşemme yeremîn row heftey n.	duşem roja sêyem a hefteyê ye.
diweşemmey bilmê.	duşemê em biçin.

- 3- Navdêrên nêr (î/y) digirin û navdêrên mê (ê) digirin.

Hewramî	Kurmancî
wêrega (n)	êvar (m)
wêregaw haminî	êvara havînê
wêregay milû	êvarê diçim
şewe (m)	şev (m)
şewew zimsanî	şeva zivistanê
şewê bilmê	şevê em herin

- 4- Ger sal, meh, hefte û saet navdêr bin, zayenda wan mê ye û heke hoker bin wek nêr tîn bikaranîn.

Hewramî	Kurmancî
salêwey weşe ne	saleke xweş e
diwê salê n tom nedîyen	ev du sal in min tu(n) nedîtiye
çin salê a?	tu çend salî yî?
diwê mangê nê	du meh in

♦ **Hin hoker:**

anne: ewqas
aro: îro
ax: ax
bêcge: ji bilî
ber(ciber): derve
be şertê ke: bi şertê ku
beyn beyn: carinan
bicuz: ji bilî
car car: carinan
çêr: jêr
çûn(çûnke): ji ber ku, çimkî
daxom: dibe ku? (bi dîtina te/we).Termek bi şik re ye
dêr: dereng
dese dese: ref ref
dilê: nav(hundir)
dima: pişt
dîsan: dîsa
dûbare: dîsan
ecom(icom): wisa difikirim, bi dîtina min
eger: eger
elan: niha
elbet: elbet
er: eger
ewel: ewel
ewsa: berê
feqet: bes
fire: pir, gelek
gul: kirêt, kotî
helay: hî(hîn)
her çin wext carê: carinan
hetmen: bêguman
hîştay(hîšta): hî(hîn)
hîzî: doh
înana werû berey: li ber derî me
înne, ênne, inne: evqas
îse: niha
kem: kêr

ko: ku(der)
koge: ku derê
la: cem, kêlek
mişyo(mişom, mişo): divê, lazim e
oxey: termek hezkirî
pase(pasne): wisa(dûr)
paşertê: bi wî şertî
pêse (pêse): 1_wisa (nêzîk) 2_ wek, mîna
pey aney: ji bo wê ku
poçî: lewma
pokay: lewma
pol pol: ref ref
řas: rast
řenga: renga
asa: wek
seêbê: sibê
ser: ser
seway: sibê
sîway: ji bilî
şelay: termek duayî (ji bo dema borî)
şelay pase bîyaya:xwezî wisa bûya
şelay pase bîyê: xwezî wisa bûya
tenya: tenê
waway: dîsa
welter: berê
wêne: wek, mîna
wer: li ber
werû aney: ji ber wê ku
weşley(welşê): termek duayî= şelay
xas: baş
žeyr(žêr): ji bilî
xiwakero pase bo:xweda bike ku wisa be
xiwakero: termek duayî(ji bo dema niha)
yaxwa(yaxiwa): termek duayî(înşAllah)
zerîf: bedew, xweşik
zû: zû

_ Him nimûneyên hokerê:

Hewramî

Hamin temamyê û payiz îna şane.
Werzê firê amê û liwê.
Hîzî/Hêzî fire wermim ê, îtir wita.
Karî firem kerď.
Karê firê m kerďê.
Hermaney firê m kerďe.
Hermanê firê m kerďê.
Pase nîya.
Aro germ a.
Êşew serď a.
Dimayîn qisêta çêşe ne?
Êsa! waranî fire wara.
Par werwey firê wara.
Pêrar tewergey firê newara.
Tatem nîya lamne.
Çenî/Çenîw min bo ba bilmê.
Bo law awîrekeyne nîşere/binîşere.
Dilê/Dilû zimsanêwî bê dimayne.
Şelay îse Amedne bîyayênmê.
Kiweke fire berz a.
Jenekê dêr ama û zûyç liwa.
Ce dûrît inne girewanê kor/kore bîya.
Îse çiko nî? // Îse înay(henî) çiko?
Car car beydê pey yaneyma.
Saşey tazê mibareke bo.
Kosar kam a ?

Kurmancî

Havîn qediya û payîz di rê de ye.
Gelek demsal hatin û çûn.
Duh gelek xewa min dihat, êdî razam.
Min gelek kar kir.
Min gelek kar kirin.
Min gelek kar kir.
Min gelek kar kirin.
Wisa nîn e.
Îro germ e.
Îşev sar e.
Gotina we ya dawî çi ye?
Îsal gelek baran barî.
Par gelek berf barî.
Pêrar gelek zîpik nebarî.
Bavê min ne ba min e.(la: cem, kêlek)
Bi min re were bila (em) herin.
Were li kêleka agir rûne.
Di nav zivistanêke bê dawî de.
Xwezî niha (em) di Amedê de bûna.
Çiya gelek bilind e.
Jin dereng hat û zû jî çû.
Ji dûriya te ewqas giriyam kor bûm.
Niha li ku yî?
Carinan werin mala me.
Sersala nû pîroz be.
Kosar kîjan e?

Hewramî

Sayê kame ne?

Adê kamê nê?

Dimayî be yotirînî waçênê.

Wêregay mew pey layt.

Haminanê milmê pey hewarî.

Ême fire manyênmê.

Bîrê /Kemê /Kuçê nanîm de.

Ême saêbê zû milmê.

Helay namana(n)/namêna(m).

Seferêw /Carêw /Gilêw /Keřetêw amanê.

Ewsa zû zû êna.

Çî î awê inne keme ne (firê ne).

Wawey waran waro.

Şewew Kirmaşanî fire weşe ne.

Aro yereşemme n.

Key milî? _ Yereşemmey.

Welterîç amabê(n)/amêbê(m).

Welterîç namabêna(n)/namêbêna(m).

Ewsa babam liwê pey hêcî.

+ Xiwakero aro waran biwaro.

+ Řas a ke maça.

+ Bêcge /Sîway /Bicûz to.

+ Yaxwa /Yexwa to weş/weşe bî.

+ Koge milî / Pey kogey milî?

+ Meger newatim ke ane nîya?

+ Ziwan şeref a, pokay mişo biparêznîş.

Kurmancî

Saye kîjan e?

Ew kîjan in?

Paşê ji hev ra digotin.

Êvarê têm cem te.

Havînan em diçin zozanê.

Em pir westiyane.

Hinek nan bide min.

Em sibê zû diçin.

Hêj /Hî /Hêja nehatime.

Carekê hatim.

Berê zû zû dihatim.

Çima ev av ewqas kême e (zêde ye).

Dîsa baran dibare.

Şeva Kirmaşanê pir xweş e.

Îro sêşem e.

Kengê diçî? _ Sêşemê.

Berê jî hatibû.

Berê jî nihatibûm.

Berê(demeke pir dirêj berê) bapîrê min diçû hecê.

ÎnşAllah/Xweda bike îro baran bibare.

Rast e ku dibêjin.

Ji bilî te.

Ji bo xatirê Xwedê /ÎnşAllah tu xweş bî.

Diçî ku derê?

Ma min negot ku ew nîn e?

Ziman şeref e, lewma divê wî biparêzî.

Beşa duyem: Daçek

_ Peyvên ku bi tena serê xwe manayeka xwe tune ye lê gava ku di nav hevokê de bi peyvan re tên ber hev û wezîfeyekê digirin, yanî bi alîkariya wan di nav peyv û terman de mana çêdibe re dibêjin “*daçek*”.

Di Hewramî de sê cure daçek hene:

- 1) Pêşdaçek
- 2) Paşdaçek
- 3) Dordaçek

_ Pêşdaçek:

- **Be:** Ev pêşdaçek li hin helbestên Hewramî wek (we) jî tê gotin.

Hewramî

bîdeş **be** min.

be ađîm wat.

be çêşî berîş?

to **be** qelemî minwîsî.

min **be** maşînî milû.

be zeřû wêş sanaş.

řo **be** řo xaster bo.

Soranî

bîde **be** min.

be ewim gut.

be çî deybeyt?

to **be** qelem denûsî.

min **be** otombêl deřom.

be parey xoy kirî.

řoj **be** řoj baştir debêt.

Kurmancî

wî/wê bide**[bi]** min.

min **bi** wî got.

bi çî wî/wê dibî?

tu **bi** qelemê dinivîsî.

ez **bi** otomobîlê diçim.

wî/wê **bi** pereyê xwe kirî.

roj **bi** roj baştir dibe.

- Heke ev pêşdaçek berî cînavên îşareteyên (a/î) were, dibe guhertinek çêbibe:

be + (î) > pî

be + (a) > pa

Hewramî

a/î desa

be + a/î desa = be a/î desa

be + a/î desa = pa/pî desa

Kurmancî

ew/ev dest (wan/van destan)

bi wan/van destan

bi wan/van destan

- **Bê:** Ev pêşdaçek negatîvê daçeka “be” ye. Wek pêşqertafa negatîfîyê jî heye lê ferqa xwe ev e ku daçek bi tena serê xwe pêşqertafa bi peyvê ve beste tê nivîsîn. Nimûne:

“Bê” wek daçek:

Hewramî

bê to metawu bijîwu.

bê maşîn bilmê?

Soranî

bê to natwanim bijîm.

bê otombêl biroyn?

Kurmancî

bê te nikarim bijîm.

em bê erebe herin?

- **Ce:** Di hinek devokên Hewramî de wek (ew) jî tê gotin. Lê bi piranî (ce) tê bikaranîn. Nimûne:

Hewramî

ce kê bipersû?

ce kurdî weşter nîya.

ce desîm ber nimê.

ce to weşim mê.

ew kê persa?

ew yoy mişa.

Soranî

le kê bipirsim?

le kurdî xoştir nîye.

le destim der nayêt.

le to xoşim dêt.

le kê pirsî?

le yek deçin.

Kurmancî

ji kê bipirsim?

ji kurdî xweştir tune.

ji destê`m der nayêt.

ji te hez dikim.

(te) ji kê pirsî?

dişibin hev.

- Heke ev pêşdaçek berî cînavên îşareteyên (a/î) were, dibe guhertinek çêbibe:

ce + (î) > çî

ce + (a) > ça

Hewramî

a/î çema

ce + a/î çema = ce a/î çema

ce + a/î çema = ça/çî çema

Kurmancî

ew/ev çav (wan/van çavan)

ji wan/van çavan

ji wan/van çavan

- **Dil/Dilê:** Ev peyv hema bêje hevwatera (nav: *hundir*) di Kurmancî de ye. Nimûne:

Hewramî

dilû yaney

dilû dilîm

dilû degê

Soranî

nêw/naw mał

nêw/naw dilim

nêw/naw gund

Kurmancî

nava malê

nava dilê`m

nava gund

- **Vel/Wel:** Ev pêşdaçek hema bêje hevwatera (*berî, pêş*) ya Kurmancî ye.

Hewramî

to velû min amay

Soranî

to pêş min hatî

Kurmancî

tu berî min hatî

- **Çenî:** Ev peyv çend wateyên xwe hene:

1_ li gel <> çenî: Giranî li ser kête ya (nî)

2_ çawa <> çenî: Giranî li ser kête ya (nî)

3_ derzî <> çenî (m): Giranî li ser kête ya (çe)

Hewramî

min çenî{çenîw} ađî/ađê milû.
min çenîş milû.
çenî{çenîw} to jîway weş a.
ađ/ađê nebê çenîm.
min mew çenî.
çî çenîma qisê mekerdê?
çenîşa bildê.

Soranî

min le gel ew deřom.
min le gelî deřom.
le gel to jîyan xoş e.
ew le gelîm nebû.
min dêm le gelî.
bo le gelman qise nake?
le gelyan biřon.

Kurmancî

ez li gel wî/wê diçim.
ez li gel wî/wê diçim.
li gel te jîyan xweş e.
ew li gel min nebû.
ez tîm li gel te.
çima bi me re naxivin?
bi wan re herin.

- Her weha wateyeke din a nivîsandina wê (çenîn) e ku dema em rewşa tiştekî bipirsîn, wê bikar tînin:

Hewramî

tatet çenîn a?
eđat çenîne ne?
hêlît çenîn a?

Soranî

bawkit çon e?
daykit çon e?
hêlît çon e?

Kurmancî

bavê te çawa ye?
dêya te çawa ye?
çawa yî /kêfa te çawa ye?

- **Çene/Çîne:** Ev daçek du wateyên xwe hene: 1_ *ji ...* 2_ *tê da*

Hewramî

hêz kerû çenet.
(hêzit kerû çene).
çêşiş îna/hen çene.

Soranî

hêz dekem lêt.
(hêzit lê dekem).
çî tê da ye.

Kurmancî

ji te hez dikim.
ji te hez dikim.
çî tê da ye.

- **Pene/Pine:** Ev pêşdaçek hema bêje hevwatera (pê)ya Kurmancî ye. Lê di Hewramî û Soranî de, cînavên girêdayî dikarin lê zêde bibin.

Hewramî

des pene kerdey
min penem wat
penema waçdê

Soranî

dest pê kirdin
min pêm gut
pêman biên

Kurmancî

dest pê kirin.
min pê got
bi me bêjin

- **Wene:** Ev pêşdaçek hema bêje hevwatera (lê)ya Kurmancî ye.

Hewramî

wene day
mobarek wene kerdey
newroz weneta mibarek bo

Soranî

lê dan
lê pêroz kirdin
newroz lêtan pêroz bê

Kurmancî

lê dan
lê pêroz kirin
newroz li we pêroz be

- **Dima**: Ev pêşdaçek hema bêje hevwatera (*piştî/dawî/paş*)a Kurmancî ye.

Hewramî	Soranî	Kurmancî
dimaw to	diway to	piştî te
dimayîw/dimaw î dastanê	kotayî em çîroke	dawiya vê çîrokê
min dimayî mew	min diwayî dêm	ez ê paşê werim

- **La**: Ev pêşdaçek hema bêje hevwatera (*ba, cem, alî, kêlek*)a Kurmancî ye.

Hewramî	Soranî	Kurmancî
bew pay layt?	bêm bo lat?	werim cem te?
law tone nîştenare	lay to da danîştuwim	li cem te rûnîştîme
be kam laywe milî?	be kam lawe deŕoyt?	bi kîjan alîyê ve diçî?

- **Pey**: Du karanîna wê hene: 1_ *bo ...{ ji ... re}* 2_ *ber bi ...*

Hewramî	Soranî	Kurmancî
îne pay to n	eme bo to ye	eve bo te ye
aney bare peym{pay min}	ewe bêne bom	wî bîne bo min
milmê pay şarî	deŕoyn bo şar	em diçin (ber bi) bajêr

- **Ver/Wer**: Ev pêşdaçek eynî wek pêşdaçeka “*ji(li) ber/ber*”a Kurmancî ye. Elbet du waterên wê hene: 1_ *wer*: tav 2_ *wer*: *ber/ ji ber*. (*Ver*) rasttir e.

Hewramî	Soranî	Kurmancî
werû werîne werwê werû	le ber xorda befir dexom	li ber tavê berfê dixwim
werû berew yaney	le ber dergay maî	li ber deriyê malê
werû aney ke ...	le ber ewey ke	ji ber wê ku

- **Paî**: Ev pêşdaçek hema bêje hevwatera (*cem, kêlek*)a Kurmancî ye.

Hewramî	Soranî	Kurmancî
paîû desû to	paîî destî to	kêleka destê te
paîû adê	paîî ew	kêleka wê

- **Bine/Bin**: Ev pêşdaçek eynî wek pêşdaçeka “*bin*”a Kurmancî ye.

Hewramî	Soranî	Kurmancî
bindes	bindest	bindest
binew dirextî	binî dirext	binê darê

- **Peştî/Peşte**: Ev pêşdaçek eynî wek pêşdaçeka “*pişt*”a Kurmancî ye.

Hewramî	Soranî	Kurmancî
peştew sereym	piştî serim	pišta serê min
peştew keşa	piştî kêwan	pišta çîyayan

- **Ser:** Ev pêşdaçek eynî wek pêşdaçeka “ser” a Kurmancî ye.

Hewramî	Soranî	Kurmancî
serû sereym	serî/banî serim	ser serê min
werwe îna/hene serû keşî	befir li ser çîya ye	berf li ser çîya ye

- **Çêr:** Ev pêşdaçek eynî wek pêşdaçeka “jêr” a Kurmancî ye.

Hewramî	Soranî	Kurmancî
çêrû paym	jêrî pam	jêr pêyê min
çêrû asmanî	jêrî asman	jêr ezmên

_ Paşdaçek:

- **we/ve:** Ev pêşdaçek hema bêje hevwatera (ve) ya Kurmancî ye. Dikare bi tiştê an kesê ve girêdayîbûnê çêbike. Jî di Hewramî de dikare li dawî an destpêka raderê were. Di beşa sêyem de em ê bêtir şirove bikin. Jî şêweyekî din ê wê (o) ye ku devkî ye û paş tîpên bêdeng û (y) tê. Di Hewramî û Soranî de dikare waterên din jî çêbike:

Hewramî	Soranî	Kurmancî
kerdey <u>we</u>	kirdin <u>ewe</u>	<u>ve</u> kirin
kerdey <u>we</u>	kirdin <u>ewe</u>	<u>dîsa</u> kirin
gêlay	geřan	geriyan
gêlay <u>we</u>	geřan <u>ewe</u>	<u>ve</u> geriyan
law wê <u>ve</u> /wê <u>to</u>	lay xotew <u>e</u> /xot <u>o</u>	cem te bi xwe <u>ve</u>
be kam lay <u>we</u> milî	be kam law <u>e</u> deçî	bi kîjan aliyê <u>ve</u> diçî

- **re/ere:** Ev peyv du waterên xwe hene:

1- Hema bêje hevwatera (*da /rû /ra*) ya Kurmancî ye ku li raderên Kurmancî tê zêdekirin.

Hewramî	Soranî	Kurmancî
nîştay + re = nîştayre	da + nîştin = danîştin	rû + niştin = rûniştin
kewtey + re = kewteyre	da + kewtin = dakewtin	da + ketin = daketin
midray + re = midrayre	řa + westan = řawestan	ra + westan = rawestan

2- Her weha heke piştî navdêrê were, dikare manaya (li), (bi), (ber bi ...) û bi taybetî (bi ... de) bide. Hewwatera wê di Soranî de (be ... da) ye.

Hewramî	Soranî	Kurmancî
şonew <u>tore</u> gêlmê	<u>be</u> şiwên to <u>da</u> degeřîn	em <u>li</u> te digerin
serû ađî <u>re</u> ama	<u>be</u> serî ew <u>da</u> hat	<u>bi</u> ser wî <u>de</u> hat

- **ne/ene:** Têdebûnê çêdike. Nimûne:

Hewramî	Soranî	Kurmancî
kitêb <u>ne</u> hen/hene	<u>le</u> kitêb <u>da</u> heye	<u>di</u> kitêbê <u>de</u> heye
îna kitêb <u>ne</u>	<u>le</u> kitêb <u>da</u> ye	<u>di</u> kitêbê <u>de</u> ye
yan <u>ene</u>	<u>le</u> mal <u>da</u>	<u>di</u> malê <u>da</u>
degan <u>e</u>	<u>le</u> gund <u>da</u>	<u>di</u> gund <u>da</u>
ađ/ađe îna degan <u>e</u>	ew <u>le</u> gund <u>da</u> ye	ew <u>di</u> gund <u>da</u> ye
min înana yan <u>ene</u>	min <u>le</u> mal <u>da</u> m	ez <u>di</u> malê <u>da</u> me
to înay dilimne	to <u>le</u> dilim <u>da</u> y	tu <u>di</u> dilê min <u>da</u> yî
êeşqit îna/hen dilm <u>ene</u>	ewînit <u>le</u> dilim <u>da</u> ye	evîna te <u>di</u> dilê min <u>da</u> ye

- Em ê bixwînin ku ev daçek li raderê zêde bibe û wateyeke nû çêbike:

Kerdey + ne = kerdeyne: têkirin

- Hin car li helbestan de, (ne) li wateya têdebûnê berî navdêrê tê. Jî di heman helbestan de bi alîkariya (da) ku ji Soranî û Kurmancî hatiye, dordaçek çêdikin:

Řefêqêm yo yo mila kera geşt / Minîç çûn Mecnûn dêwane m ne deşt

Hevalên min yek bi yek diçin digerin / Ez jî wek Mecnûn dîn im di deştê de

:> Di helbestên bi vî rengî de du xal hene: 1- Peyva (ne) di wateya (di ... de)yê de hatiye û me got ku ev peyv paşdaçek e ku piştî navdêrê tê lê di vê helbestê de berî navdêrê hatiye. 2- Di Hewramî de lêkera bûnê ji bo (min), (na/ena) ye lê we dît ku helbestvan gotiye (*dêwane m*). Helbestvanên Hewramî di gotinan de gelek peyvên Soranî bikaranîne û ew jî mînakek e.

_ Dordaçek: Dibe ku di Hewramî de gelek dordaçek hebin, lê yên ku herî zêde tên bikaranîn, ev in:

- **Law ... ne:** li ba, li cem, li kêlek

Hewramî	Soranî	Kurmancî
min law ađîne bêna	min lay ew da bûm	ez li kêleka wî bûm
kê îna latne /law tone?	kê le lay to da ye	kî li ba/cem te ye
law minne nîşere	lay min da danîşe	li kêleka min rûne

- **Ce peştew ... we:** ji paş

Hewramî	Kurmancî
ađe ce peştew keşîwe amênê	ew ji paş çîya hatine

- **Law ... we:** li kêlek, li ba, ji aliyê ... ve

Hewramî	Kurmancî
(ce) law ađîwe	ji aliyê wî ve
îna law minwe(mino)	li ba min e
- **Werû ... ne:** li ber

Hewramî	Kurmancî
werû bereyne midro	li ber derî disekine
- **Paû ... ne:** li kêlek

Hewramî	Kurmancî
îna paû desîmne	li kêleka destê min e
- **Bînew ... ne:** li bin

Hewramî	Kurmancî
înana bînew darîne	li bin darê me
- **Serû ... ne:** li ser

Hewramî	Kurmancî
îna serû sereymne	dî ser serê min da ye
- **Dilû (Dilêw) ... ne:** di nava ... da

Hewramî	Kurmancî
dilû yaneyne	di nava malê da
- **Pîne/Pene:** pê re

Hewramî	Kurmancî
pinem wat	min pê got
îne ziwanêw a ke pineş qisê kerû	ev zimanek e ku pê re(bi wî re) diaxivim
- **Be peyliwa:** bi gora

Hewramî	Kurmancî
be peyliwaw zanaya	bi gora zanayan
- **Be nezere:** bi dîtîn

Hewramî	Kurmancî
Be nezerew min	bi dîtîna min

- **Wer/Ver:** ji ber, ji bona.

Hewramî	Kurmancî
werû çêşî nama	ji ber çi /ji bona çi nehat
werû řezaw xuday	ji ber rizaya xwedê

- **Werû aney:** ji bona wê, ji ber

Hewramî	Kurmancî
werû aney ke manyabê	ji bona/ji ber wê ku westiyabû

- **Pey çî:** bo çi , çima

Hewramî	Kurmancî
pey çî nimeydê	ji bo çi (hûn) nayên

- **Bonew çêşî/çêşîwe:** ji bona çi, çima>>> bone : bon

Hewramî	Kurmancî
Bonew xudaywe	ji bona xweda

- **Pey/Pê:** ji bo , ji ... re / ber bi

Hewramî	Kurmancî
pey min/to/adî/adê/ême/şime/adîşa	ji min/te/wî/wê/me/we/wan re
milo pey şarî	diçe bajêr > <u>ber bi bajêr</u>

➤ Di beşa sêyem de ev daçek û peyvên din wek (hor, yore, piwe, pore) û hwd dîsa tene şirovekirin.

Beşa duyem: Ginahek

_ Ji peyvên ku di nav hevokê de peyvan yan grûpa peyvan yan jî îfadeyan bi hev re girê didin re dibêjin “*ginahek*”. Ginahek jî dimînin daçekan lê ferqa wan ji daçekan ev e ku daçek ji alîyê manayê ve eleqeyê saz dikin lê ginahek beşên hevokê bi hev re girê didin. Heke daçek ji nav hevokê were derxistin, mana çênabe yan jî bi tevayî diguhere. Lê ginahek ji nav hevokê were derxistin, mana naguhere lêbelê dibe ku teng bibe. Esas ginahek ji bo temambûna manayê wezîfeyê digirin. Ginahek jî eynî wek daçekan di nav hevokê de hertim cihê tên nivîsîn.

➤ Hin ginahek:

Hewramî	Kurmancî
be	bi
belam /welê	lê
belkû	belkî
ca /îmca /îmcay	ancax /ca
çenî	li gel
çi heyf ke	çi heyf ku
çin	çend
çinne	çiqas
çûnke	çunke
er /eger /ger	ger
hem	hem
hemîç	hem jî
her	her
heta /heta	heta
îç /ç /yç	jî
inne /enne /ênne	ewqas
ke	ku
mişom /işo /mişyo	divê
na /ne	ne /na
ne ke/ neka	ne ku
pewkay /pokay	lewre/lewma
ta	ta
ta ku	da ku
tenya	tenê
ya /yam /yan	an /yan
yaniç	yan jî
ena /erna	an na
û	û

- Di alfabeya aramî-kurdî (û) wek (و) tê nivîsandin ango (u:و) ye lê di vê pirtûkê de, em (û) bi kêr tînin. Jî hin car (û) wek (we) tê gotin

Hewramî

Min çinne biwanû, anne fêr/fêre bû.
Eger to çîwêw zanî, be êmeyç waçe.
Pêsew êeşqû Mem û Zînê nmê, min û to.
Mişom çêş waçû{biwaçû}?
Ziwanim mêşo, elbet diđanîçim mêşo.
Îse tateyçit /tatew toyç mê.
Min Kurmancî zanû. Hewramîç zanû.
To ne wanî, ne minwîsî.
Be min ya {yayç} be ađî/ađê waçe.
Ême amênmê ta to biwînmê.
Çin kitêbêt /birayêt /walet henê?
Ađê mila welê çî heyf ke şime meldê.
Ême melmê çûnke zërma nîya.
Er /Ger /Eger waran biwaro, zemîn teř bo.
Ba her kes ke îna çê, î qisê bijnewo.
Hem waçe, hem binwîse.
Hem îne, hemîç ane.
Heta/Heta key nimey?
Mişom /lşo /Mişyo bilî.
Meşo bilî.
Tenya aney /anê /anîşa bare û bo.
To çenî[çenîw] kê milî?
Mekere ne ku éaciz/éacize bo.
Min amanê welê şimem neđiyê.
Ziwan welat a, pewkay(pokay) parêzneş.
To bile/liwe belkû minîç liwanê.
Nan were ca bile.
Ca zû beydê.
Bil'axire amay?

- Bil'axire peyveke erebî ye.

Kurmancî

Ez çiqas bixwînim, ewqas fêr dibim.
Eger tu tişteke dizanî, bi me jî bêje.
Wek evîna Mem û Zînê ne, ez û tu.
Divê{lazim e} çî bêjim?
Zimanê min diêşe, elbet diranê`m jî diêşe.
Niha bavê te jî tê.
Ez Kurmancî dizanim. Hewramî jî dizanim.
Tu ne dixwîni, ne dinivîsi.
Bi min an { an jî } bi wî/wê bêje.
Em hatine ta te bibînin.
Te çend pirtûk /bira /xwişk hene?
Ew diçin lê çî heyf ku hûn naçin.
Em naçin çunke me pere tune.
Ger baran bibare, erd şil dibe.
Bila her kes ku li vir e, vê gotinê bibihîze.
Hem bibêje, hem binivîse.
Hem ev, hem jî ew.
Heya kengê nayêy?
Divê herî.
Navê tu herî.
Tenê wî /wê /wan bîne û were.
Tu li gel kê diçî?
Neke ne ku (ew) aciz bibe.
Ez hatim lê min hûn nedîtî.
Ziman wilat e, lewma wî biparêze.
Tu here belkî ez jî çûm.
Nan bixwe ancax here.
Ca zû werin.
Di dawiyê de hatî?

Beşa duyem: Qertaf

_ Di ziman de ji deng yan jî parçeyên ku manayeka xwe tune ye lê gava ku bi peyvê ve dibestin manayeka nû çêdikin re dibêjin “*qertaf*”. Nimûne:

Hewramî

weî + *în* = welîn
şar + *î* = şarî
bê + şeref = bêşeref
be + êeqîl = beêeqîl
niwîs + *er* = niwîser
weş + *î* = weşî
gêl + *yar* = gêlyar
tirs + *nok* = tirsnok

Kurmancî

pêş + *în* = pêşîn
bajar + *î* = bajarî
bê + şeref = bêşeref
bi + aqil = bîaqil
nivîs + *kar* = nivîskar
şa + *hî* = şahî
gerr + *ok* = gerrok
tirs + *ok* = tirsok

- Piraniya qertafên Hewramî dişibin yên Kurmancî. Her weha di her du zaravayan de jî gelek qertaf hene, lewma em di vê beşê de behsa hinekan ji wan dikin.

_ Hin pêşqertaf:

- **Bê:** Ev pêşqertaf eynî wek Kurmancî manaya negatîvîyê çêdike û ji navdêrê rengdêrê çêdike. Nimûne:

Hewramî

bê + kar = bêkar
bê + kar + *î* = bêkarî
bê + kes = bêkes
bê + kes + *î* = bêkesî

Kurmancî

bê + kar = bêkar
bê + kar + *î* = bêkarî
bê + kes = bêkes
bê + kes + *î* = bêkesî

- **Be:** Ev pêşqertaf eynî wek Kurmancî manaya pozîtîvîyê çêdike û ji navdêrê rengdêrê çêdike. Nimûne:

Hewramî

be + bext = bebext
be + bext + *î* = bebextî
be + şeref = beşeref

Kurmancî

bi + bext = bibext
bi + bext + *î* = bibextî
bi + beşeref = bişeref

- **Ne**: Ev pêşqertaf eynî wek Kurmancî manaya negatîvîyê dide peyvê. Nimûne:

Hewramî

ne + zan = nezan

ne + zan + î = nezanî

Kurmancî

ne + zan = nezan

ne + zan + î = nezanî

- **Bi**: Ev pêşqertaf dikare bi koka dema niha re were û navdêra failî çêbike. Nimûne:

Bi + şor = bişor(n) + bişore(m) + bişorê(pj) > tişteke an kesek ku tiştan dişo.

- **Rengdêr**: Hin car rengdêr berî navdêrê tên. Nimûne:

Hewramî

çîwar + parçe = çîwar parçe

new + roz = newroz

Kurmancî

çar + perçe = çar perçe

new + roz = newroz

- **Hoker**: Hin car hoker jî berî navdêrê tên. Nimûne:

Hewramî

weş + bext = weşbext

Kurmancî

bext + yar = bextyar

- **Navdêr**: Dikare berî navdêrê were. Nimûne:

Hewramî

des + mal = desmal

Kurmancî

dest + mal = destmal

- **Wer/Ver**: Nimûne:

Hewramî

wer/ver + des = wer/verdes

Kurmancî

ber + dest = berdest

_ Hin paşqertaf:

- **-yar**: Ev paşqertaf ji navdêran rengdêrê çêdike. Nimûne:

Hewramî

heste + yar = hestyar

gêl + yar = gêlyar

Kurmancî

hest + yar = hestyar

gerr + ok = gerrok

- **-a/ya:** Ev paşqertaf eynî wek paşqertafa “-an”a Kurmancî di halê tewandî de pirhejmariyê çêdike. Nimûne:

Hewramî	Kurmancî
î kitê <u>ba</u> biwane/wane	van kitê <u>ban</u> bixwîne
be wanyar <u>a</u> waçe/biwaçe	bi xwendekar <u>an</u> bibêje
be a pîyar <u>a</u> waçe	bi wan mêr <u>an</u> bêje

Dema ku navdêrên pirhejmar di halê tewandî de raveka rengdêrê bigirin, wê demê di bikaranîna vê paşqertafê de ferqek di navbera Hewramî û Kurmancî de çêdibe.

Nimûne:

Hewramî	Kurmancî	Soranî
kitêb(n)	kitêb	kitêb
î kitê <u>be</u>	ev kitêb	em kitê <u>be</u>
î kitê <u>be</u> sû <u>re</u>	ev kitêba sor	em kitê <u>be</u> sû <u>re</u>
î kitêbî biwane	vê kitêbê bixwîne	em kitê <u>be</u> bixwêne
î kitê <u>be</u> sû <u>rey</u> biwane	vê kitêba sor bixwîne	em kitê <u>be</u> sû <u>re</u> bixwêne
î kitê <u>ba</u>	ev kitêb	em kitê <u>bane</u>
î kitê <u>be</u> sû <u>ra</u>	ev kitêb <u>ên</u> sor	em kitê <u>be</u> sû <u>rane</u>
î kitê <u>ba</u> biwane	van kitêban bixwîne	em kitê <u>bane</u> bixwêne
î kitê <u>be</u> sû <u>ra</u> biwane	van kitêb <u>ên</u> sor bixwîne	em kitê <u>be</u> sû <u>rane</u> bixwêne
be wanyare ziringa waçe	bi xwendekarên jêhatî bêje	be xwêndekare ziringan bilê

- **-ane/yane:** Ev paşqertaf eynî wek paşqertafa “-ane”ya Kurmancî aîdîyetê dide peyvê. Nimûne:

Hewramî	Kurmancî
kuř + ane = kuřane	kur + ane = kurane
pîya + yane = pîyayane	mêr + ane = mêrane
mange + ane = mangane	meh + ane = mehane
kinaçê + ane = kinaçane	keç + ane = keçane
jenî + ane = jenane	jin + ane = jinane
řo + ane = řiwane	roj + ane = rojane

- **-ber:** Ev paşqertaf eynî wek paşqertafa “-ber”ya Kurmancî ji navdêrê, navdêr û rengdêrê çêdike. Nimûne:

Hewramî	Kurmancî
řa + ber = řaber	rê + ber = rêber
řenc + ber = řencber	renc + ber = rencber
bar + ber = barber	bar + ber = barber

- **-dar:** Ev paşqertaf eynî wek paşqertafa “-dar”a Kurmancî di manaya xwedîtîyê de ji navdêrê, rengdêrê çêdike. Nimûne:

Hewramî	Kurmancî
bayex + dar = bayexdar	bayex + dar = bayexdar
naz + dar = nazdar	naz + dar = nazdar
bax + dar = baxdar	bax + van = baxvan

- **-ê/yê:** Gelek karanîna vê hene ku pir girîng in:

- 1- Dibe nîşana pirjimariyê be.
- 2- Dibe nediyaîyê çêbike.
- 3- Me li beşa hokerê xwend ku ev paşqertaf dikare hin car hokerê çêbike.
- 4- Jî dikare halê tewandî yê peyvên mê jî çêbike. Nimûne:

Hewramî	Kurmancî
kuřê amê	kur hatin
kuřê ama	kurek hat
weharê meymê	buharê em tîn
řow jenê	roja jinê

- **-y (-ey / -yey):** Ev paşqertafa raderê ye. Nimûne:

Hewramî	Kurmancî
zana + y = zanay	zanî + n = zanîn
wist + ey = wistey	xist + in = xistin
bî + yey = bîyey	bû + yîn = bûyîn

- **-dan:** Ev paşqertaf eynî wek paşqertafa “-dan”ya Kurmancî di manaya cih de ji navdêrê navdêr çêdike. Nimûne:

Hewramî	Kurmancî
gul + dan = guldan	gul + dan + k = guldank
mekî + dan = mekdan	xwê + dan + k = xwêdank

- **-în:** Ev paşqertaf manaya aîdiyetê dide peyvê. Nimûne:

Hewramî	Kurmancî
çêr + î = çêrîn	jêr + î = jêrîn
dar + î = darîn	dar + î = darîn
zeř + î = zeřîn	zerr + î = zerrîn

- **-er/yer:** Ji lêkerê rengdêrê çêdike. Nimûne:

Hewramî	Kurmancî
niwîs + er = niwîser	nivîs + kar = nivîskar

- **-êw (-êwe) / -yêw (-yêwe)**: Ev paşqertaf jî nediyarîyê çêdike. Nimûne:

Hewramî	Kurmancî
kuřêw milo	kurek diçe
kinaçêwe mê	keçek tê
pîyayêwim dî	min mêrek dît
jenêwem dîye	min jinek dît

- **-ter**: Ev paşqertaf du wateyên xwe hene. Yek ji wan eynî wek paşqertafa “-tir”a Kurmancî nîsbetê zêdetir dike. Nimûne:

Hewramî	Kurmancî
xas + ter = xaster	baş + tir = baştir
weş + ter = weşter	xweş + tir = xweştir
fire + ter = fireter	pir + tir = bêtir

- ♦ Yek ji wan jî rengdêr e û wek paşqertafa “-din”a Kurmancî ye:

Hewramî	Kurmancî
kitêbêwî ter	pirtûkeka din
kinaçêwey tere	keçeka din
riwêwî ter	rojeka din
yoter / yotere	yeka/ê din
carêwî ter	careka din

- **-kar/ker**: Ev paşqertaf eynî wek Kurmancî, kar û taybetîyan çêdike. Nimûne:

Hewramî	Kurmancî
talán + ker = talanker	talán + ker = talanker
xebat + kar = xebatkar	xebat + kar = xebatkar

- **-mend/mend**: Xwedîtîyê çêdike. Nimûne:

Hewramî	Kurmancî
huner + mend = hunermend	huner + mend = hunermend
dewlet + mend = dewletmend	dewle + mend = dewlemend

- **-stan**: Navê cihê komela tiştan çêdike. Nimûne:

Hewramî	Kurmancî
gul + i + stan = gulistan	gul + i + stan = gulistan
Kurd + i + stan = Kurdistan	Kurd + i + stan = Kurdistan

- **-î/yî:** Ev paşqertaf eynî wek paşqertafa “-î”ya Kurmancî ye. Nimûne:

Hewramî	Kurmancî
Kirmanc + î = Kirmancî	Kurmanc + î = Kurmancî
Hewram + î = Hewramî	Hewram + î = Hewramî
Kurd + î = Kurdî	Kurd + î = Kurdî
sûk + î = sûkî	sivik + î = sivikî
xas + î = xasî	baş + î = başî
Sine + yî = Sineyî	Sine + yî = Sineyî

- ♦ Me berê jî behsa taybetmendiye peyvên mê kiribû. Li vir, ew taybetmendî ji bo vê paşqertafê tê dîtin. Jî bizanibin ku li vir giranî dikeve ser kîte ya dawîn:

Hewramî	Kurmancî
Eđa + yî = Eđayî	Dayik + î = Dayikî
Dega + yî = Degayî	Gund + î = Gundî
Werwe + î = Werwî	Berf + î = Berfî
Tewene + î = Tewenî	Kevir + î = Kevirî
Winî + î = Winî	Xwîn + î = Xwînî
Şîşê + yî = Şîşeyî	Şûşe + yî = Şûşeyî

- **- emîn /-imîn / omîn /în/im/m:** Ev paşqertaf eynî wek paşqertafa “-emîn/ î/yem/em”a Kurmancî ye. Nimûne:

Hewramî	Kurmancî
yo + mîn = yiwemîn	yek + emîn = yekemîn
yo + m = yiwem	yek + em = yekem
ewel + î = ewelîn	ewil + î = ewelîn
diwê + mîn = diwemîn	du + yemîn = duyemîn
diwê + m = diwem	du + yem = duyem
yerê + mîn = yeremîn	sê + yemîn = sêyemîn

- **- ewan:** Ji navdêran navê karî çêdike. Nimûne:

Hewramî	Kurmancî
bax + ewan = baxewan	baxçe + van = baxçevan
şax + ewan = şaxewan	çîya + ger = çîyager

- **- der:** Ev jî ji navdêran navê karî çêdike {yê/ya ku tiştan dide}. Nimûne:

Hewramî	Kurmancî
beş + der = beşder	beş + der = beşder

- **-îç / yç / ç:** Hewwateya “jî”ya Kurmancî ye. Lê li hin herêman wê paşqetafê wek hevtayê wê yê Soranî (îş / yş / ş) bikar tînin. Nimûne:

-îç paş tîpên bêdeng:

Hewramî	Kurmancî
minîç	ez jî
kitêbîçim hen	min pirtûk jî heye. (<i>Cînavê{im} paş {îç} hatiye</i>)
minîç kitêbim hen	min jî pirtûk heye
adîç kitêbiş bê	wî jî pirtûk hebû

-yç paş tîpên bideng (ji bilî {î} û {y}):

Hewramî	Kurmancî
toyç	tu jî
walêyçit hene?	te xuşk jî heye?
toyç walêt hene?	te jî xuşk heye?
min tejne na, ewrayç na	ez tî me, birçî me jî

-ç paş tîpên {î} û {y} û {ê}:

Hewramî	Kurmancî
Hewramî zanû, Kirmancîç zanû	Hewramî dizanim, Kurmancî jî dizanim
To zerîfe nî. Jîwayç zerîf a	Tu bedew î. Jîyan jî bedew e.
Kêlanêç werî?	Kenlaneyê jî dixwî?

- - gîr: Nimûne:

Hewramî	Kurmancî
goş + gîr = goşgîr	guh + dar = guhdar
cehan + gîr = cehangîr	cîhan + gîr = cîhangîr

- - ger: Nimûne:

Hewramî	Kurmancî
asin + ger = asinger	hesin + kar = hesinkar

- - çî: Nimûne:

Hewramî	Kurmancî
qafle + çî = qafleçî	karwan + van = karwanvan

- -tî / yetî / ayetî / yî / î: Navdêrên razber çêdike. Nimûne:

Hewramî	Kurmancî
bira + yetî = birayetî	bira + tî = biratî
řefêq + ayetî = řefêqayetî	heval + tî = hevaltî

➤ **-awe:** Nimûne:

Hewramî

werwe + awe = werwawe

gul + awe = gulawe

Kurmancî

berf + av = berfav

gul + av = gulav

➤ **-yane/xane:** Nimûne:

Hewramî

kitêb + yane/xane = kitêbxane

Kurmancî

pirtûk + xane = pirtûkxane

➤ **-ga/ge:** Nimûne:

Hewramî

fêr + ga = fêrga

Kurmancî

fêr + ge = fêrge

_ Di Hewramî de hin paşqertaf hene ku yan tişteki biçûk an jî hezkirî dikin. Wek:

1_ **çe:**

Hewramî

bax + çe = baxçe

Kurmancî

bax + çe = baxçe

2_ **le/lê:**

Hewramî

weş + le = weşle, -ê

bira + le = birale

kinaçê + lê = kinaçlê

Kurmancî

xweş + ik = xweşik

birayê can (delal), Birako

keç + ik = keçik

3_ **lane, -ê:**

Hewramî

weş + lane = weşlane, -ê

Kurmancî

xweş + ik = xweşik

û hwd ...

Beşa duyem: Partîkel

_ Partîkel jî mîna daçek û ginahekan bi tena serê xwe manaya wan tune ye lê daçek nîn in, ginahek jî nîn in. Bi alîkarîya partîkelan raweyên hinek deman çêdibin, dîsa bi hebûna wan manaya pêveberê tamam dibe.

➤ Hin partîkel ku pir tîn bikaranîn ev in:

- **Dey (De)**: Di qisekirinê de xwestinê îfade dike û alîkarî dike ku pêveber bêtir qethî be.

Nimûne:

Hewramî

Dey waçe, çêş hen çêş nîya?

Dey mekere.

Dey bo(borê).

Kurmancî

De bêje, çi heye çi tune?

De neke.

De were.

- **Da**: Ev partîkel jî alîkarîyê dike ku lêker bişide.

Nimûne:

Hewramî

Da biê, bizanû çêş a.

Da bo.

Da ba: Termeke ku hevwatera wî/wê nîşanî min bide ye.

Da la: Termeke ku hema bêje hevwatera here aliyekî ye.

Da kem girewe.

Kurmancî

Ka bide, bizanim çi ye.

Ka were.

- **Ba**: Ev partîkel alîkarîyê dike ku pêveber çêbibe; fermana endîrekt çêdike.

Nimûne:

Hewramî

Wazîş çine bare ba waço.

Ba bilmê îtir dêr a.

Ba bê, biwînmê bo be çêşî.

Kurmancî

Dev jê berde bila bibêje.

Bila em herin êdî dereng e.

Bila were, em bibînin dibe çi.

- **Şellay /Weşley /Weşlê**: Hema bêje hevwatera (xwezî) di Kurmancî de ye.

Nimûne:

Hewramî

Şellay watayat.

Şellay liwayanmê.

Kurmancî

Xwezî te bigota.

Xwezî em biçûna.

- **Beş /Beşkem:** Ev jî hema bêje hevwatera (xwezî) di Kurmancî de ye, lê ev ji bo hêvî û daxwazên dema niha tê bikaranîn. Şellay bo dema borî ye.

Nimûne:

Hewramî

Beş aro waran biwaro.

Beşkem şime bizandê.

Beşkem kurdê yoy bigêra.

Kurmancî

Xwezî îro baran bibare.

Xwezî hûn bizanibin.

Xwezî kurd hev bigirin.

- **Yaxiwa /Yaxwa /Yexwa:** Forma duayî, hêvî û daxwazê heye dema ku em tiştekî bixwazin. Hema bêje yanî Xwedê tiştek bike an jî bibe sedem ku tiştek were kirin.

Nimûne:

Hewramî

Yaxiwa/Yaxwa silamet bî.

Yaxiwa/Yaxwa to menî peym.(giranî li ser me)

Kurmancî

Xwedê bike ku sax bî.

ÎnşAllah tu bimînî bo min.

- **Nek/Neka:** Ev ji bo hişyariyê bi gumanbariyê tê. Ango ne ku karek hatibe kirin = Ne ku.

Nimûne:

Hewramî

Ba bilû nek eđam midrêbo.

Meqêrne, neka tatem horbêzo. Wite n.

Kurmancî

Bila ez herim ne ku dêya min rawestabe.

Neqîrîne, ne ku bavê min rabe. Razaye.

- **Xo:** Hema hevwatera (ke: ku) ye lê cihê bikaranîna wê kêmek cuda ye.

Nimûne:

Hewramî

Çî pase kerî? Xo har nîye nî.

To xo kurd nî. Çî kurdî qisê mekerî?

To ke kurd nî. Çî kurdî qisê mekerî?

Kurmancî

Çima wisa dikî? (Tu) ku har nîn î.

Tu ku kurdî. Çima kurdî qise nakî?

Tu ku kurdî. Çima kurdî qise nakî?

- **Pes:** Ev yek jixwe farisî lê bi gelemperî tê bikaranîn. Hewwatera (peki)ya tirkî û (so) di îngilîzî de ye. Piştî dawîbûn û kurtkirina mijarekê tê. Hin car hevwatera (ji ber vê yekê)ya Kurmancî ye. Jî hevwaterayeka din a wê di Hewramî de (sa) ye.

Nimûne:

Hewramî

pes çenî zanî?

Îngilîzî

so how do you know?

Kurmancî

ji ber vê yekê çawa dizanî?

Beşa duyem: Hejmarnav

_ Grûpa peyvan ya ku pîvandî, wezinandî û hejmartinê nîşan didî, ango ew grûpa peyvan ku mesafe, ebad, giranî û mîqdarê nîşan didî bi “*hejmarnav*” tên nasîn.

_ Hejmarnav di nav xwe de dibin çar beş:

- 1) Hejmarnavên bingehîn
- 2) Hejmarnavên parvekirinê
- 3) Hejmarnavên hokerî
- 4) Hejmarnavên rêzkî

1_ Hejmarnavên bingehîn:

Hewramî	Kurmancî
Yo /Yek	Yek
Diwê /Dû	Du(Didu)
Yerê /Sê	Sê
Çiwar	Çar
Penc	Pênc
Şiş	Şeş
Êwt /Êot /Êft	Heft
Heşt	Heşt
No	Neh
De	Deh
Yanze	Yanzdeh
Diwanze	Duwanzde
Sinze/Sênze	Sêzdeh
Çiwarde	Çardeh
Panze	Panzdeh
Şanze	Şanzdeh
Hefde	Hevdeh
Hejde	Hejdeh
Nozde	Nozdeh
Wîs /Bîs	Bîst

Hewramî	Kurmancî
Wîs û yek	Bîst û yek
Wîs û diwê(dû)	Bîst û du
Wîs û yerê(sê)	Bîst û sê
Wîs û çîwar	Bîst û çar
Wîs û penc	Bîst û pênc
Wîs û şîş	Bîst û şeş
Wîs û hewt /hêot /hêft	Bîst û heft
Wîs û heşt	Bîst û heşt
Wîs û no	Bîst û neh
Sî	Sî
Çil	Çil
Penca	Pêncî
Şes	Şêst
Êfta	Heftê
Heşta	Heştê
Newed	Nod
Sed	Sed
Sed û de	Sed û deh
Sed û wîs{bîs}	Sed û bîst
Sed û wîs û yerê	Sed û bîst û sê
Sed û bîs û sê	Sed û bîst û sê
Diwe sed	Du sed
Yere sed	Sê sed
Çîwar sed	Çar sed
Pansed	Pênc sed
Şîş sed	Şeş sed
Êwt /Êot /Êft sed	Heft sed
Heşt sed	Heşt sed
No sed	Neh sed
Hezar	Hezar

Hewramî	Kurmancî
Diwê hazarê	Du hezar
Yerê hezarê	Sê hezar
Wîs{Bîs} hezarê	Bîst hezar
Sed hezarê	Sed hezar
Diwe sed hezarê	Du sed hezar
Yere sed hezarê	Sê sed hezar
Yek milyon (milwên)	Mîlyonek
Diwê milyonê (milwênê)	Du mîlyon
Yerê milyonê (milwênê)	Sê mîlyon

2_ Hejmarnavên parvekirinê:

_ Ji çend paran parekê yan jî parên ku hatine parvekirin nîşan didin. Di Hewramî de dikarin bi çend awayan çêbibin:

Hewramî	Kurmancî
Nîmenîme	Nîvenîv
Nîme/Nîm	Nîv
Yek çîwarim /Çîwarne yek(yo) /Ce çîwarîne yek(yo)	ji çaran yek
Sê pencom /Pencne sê(yerê) /Ce pencîne sê(yerê)	sê pêncan
Çîwar dehom /Dene çîwar /Ce deyne çîwar	Ji dehan çar
Sedne heşta /Ce sedîne heşta	Ji sedî heştê
Sedne sed /Ce sedîne sed	Ji sedî sed
Hefde sî û pencom /Sî û pencîne hefde	Ji sî û pêncan hevde

3_ Hejmarnavên hokerî:

_ Ji hejmarên ku dubare dibin û di nav hevokê de wezîfeya hokerê dikin re tê gotin:

➤ Yo yo / Diwe diwe / Yere yere / Çîwar çîwar / Penc penc / .../ De de

- *Mobarek badî, bikerdê yo yo / Cejn û weşî yen, dúbare ce no*
Yek bi yek pêrozbahî bikin / Cejn û şahî ye, dîsa ji nû

4_ Hejmarnavên rêzkî:

_ Rêza navan nîşan didin:

Hewramî	Kurmancî
Eweî /Eweîîn	Ewil /Ewilîn
Yekem /Yekemîn	Yekem /Yekemîn
Yiwem /Yiwemîn	Yekem /Yekemîn
Diwem /Diwemîn	Duyem /Duyemîn
Yerem /Yeremîn	Sêyem /Sêyemîn
Çiwarem /Çiwaremîn	Çarem /Çaremîn
Pencem /Pencemîn	Pêncem /Pêncemîn
Şişem/Şişemîn	Şeşan
Heftem /Heftemîn	Heftem
Heştem /Heştemîn	Heştem
Niwem /Niwemîn	Nehan
Dehem /Dehemîn	Dehan

+ Rêbazek din ji bo nivîsandina hin ji van hejmaran:

Hewramî	Kurmancî
Yekom /Yekem	Yekem
Yerom	Sêyem
Çiwarom /Çiwarem	Çarem
Pencom	Pêncem
Şişom	Şeşan
Heftom	Heftem
Heştom	Heştem

- Xala dawiya vê beşê, awayê bikaranîna hejmarnavên rêzkî ye ku bi du awayan tê bikaranîn:

	Hewramî	Kurmancî
Hejmarnav di rola <u>navdêrê</u> de > řow niwemî		roja nehan /nehê
Hejmarnav di rola <u>rengdêrê</u> de > řoy niwem		roja nehan

Hin nimûne:

Hewramî

Heştemîn ziwani dewlemendû dinyê, kurdi n.
 Diwe diwe beydê dilê.
 Î direxte, de de wezî gêro.
 Ewelîn çew(çiw) çêş a?
 Ewel kes ke ama kê bê?
 Neferû ewelî kê n?
 Neferî ewelî kê n?
 Ewelîn mangew salê, Newroz a.
 Çiwar kesê watşa.
 Çiwar kesa wat.
 Be yerê tifenga.
 Min diwê midew be to.
 Kurdistan welatêw a û mebo be çiwari.
 Jîwaw diwê dildara.
 Diwê salê û hot riwê.
 Min penc hêlêm girînênê.
 Çil û penc kesê/neferê/beşerê/îsanê.
 Diwê terê / Yerê terê.
 Kuêwî çiwarde sale û kinaçêwey sinze salê.
 Min(n/m) wîs û yek salêm a.
 Min(n) wîs û yek sale na.
 Min(m) wîs û yek salê na.
 Kinaçêy çilriwêy min.

Kurmancî

Heştemîn zimanê dewlemendê dinê, kurdi ye.
 Du bi du werin hundir.
 Ev dar, deh deh gûzê digire.
 Yekemîn tişt çi ye?
 Ewil kes ku hat kê bû?
 Kesê yekem kê ye?
 Kesê yekem kê ye?
 Yekemîn meha salê , Adar e.
 Çiwar merivan got.
 Çiwar merivan got.
 Bi sê tîfingên.
 Ez diduyan didm te.
 Kurdistan yek wilat e û nabe çar.
 Jîna du dildaran.
 Du sal û heft roj.
 Min pênc hêk kelandine.
 Çil û pênc mirov.
 Didu yê din / Sisê yê din.
 Xortekî çardeh salî û qîzeka sêzde salî.
 Ez bîst û yek salî me.
 Ez bîst û yek salî me.
 Ez bîst û yek salî me.
 Keça min a çil rojî.

Hewramî

Kuřî çilřiwey min.
Yoy biđe min // Yoym de // Yoym biđe.
Ce yoy fireter a /firetere ne.
Ce yoy ta hezarî bijmare.
Ce a diwa yoym de.
Ça diwa yoym de.
Yerê seferê(carê/keřetê) ce adîřa persa.
Yerê seferê(carê/keřetê) ce adîřařa persa.
Ce hezarî fireter.
Ce diwê hezara kemter /zîyater.
Ce dey /wîsî /sî /çilî /pencay fireter a.
Ce sedî polawe.
Welû sed û heftay.
Hezar û pencane.
Ce hezar û pencayne.
Dû dehom // Ce deyne dû.
Çiwar sedom // Ce sedîne çiwari // Sedne çiwari.
Yek û nîm.
Î beře beřû diwemî n.
Î beře beřî diwem a.
Yoma /Yota /Yořa.
Yo ce ême /Yo ce řime /Yo ce adîřa.
Diwêma /Diwêta /Diwêřa.
Diwê ce ême /Diwê ce řime /Diwê ce adîřa.
To(n) zařolêw ewelî nî.
To(n) ewelîn zařolê nî.
To(m) zařolêw ewelîye nî.
To(m) ewelîn zařolê nî.

Kurmancî

Kurê min ê çil rojî.
Yekê bide min.
Ji yekê bêtir e.
Ji yekê heta hezar bihijmêre.
Ji wan diduyan yekê bide min.
Ji wan diduyan yekê bide min.
Sê caran ji wî pirsî.
Sê caran ji wan pirsî.
Ji hezarî pirtir/bêtir.
Ji du hezarî kêmtir /zêdetir.
Ji deh /bîst /sî /çil /pêncî zêdetir e.
Ji sed pê va.
Berî sed û heftê.
Di hezar û pêncî de.
Di hezar û pêncî de
Ji dehan didu.
Ji sedan çar.
Yek û nîv.
Ev beř beřa duyem e.
Ev beř beřa duyem e.
Yek ji me /Yek ji we /Yek ji wan.
Yek ji me /Yek ji we /Yek ji wan.
Du ji me /Du ji we /Du ji wan.
Du ji me /Du ji we /Du ji wan.
Tu zarokê yekem î.
Tu yekemîn zarok î.
Tu zaroka yekem î.
Tu yekemîn zarok î.

Beşa duyem: Baneşan

_ Di ziman de ji peyvên ku heyretkirin, şaşbûyîn, xemgînbûyîn, veciniqîn, tirsîn, dilê xwe şewitîn, canê xwe êşîn, gazîkirin û hwd îfade dikin re dibêjin “*baneşan*”. Nimûne:

Hewramî

Ho zařola!

Řefêqa/Hamřaya ko ndê?

Kurmancî

Lo zarokino!

Hevalino li ku ne?

Gava ku baneşan tên nivîsandin, gelekê caran îşareta baneşanê (!) li dawîya wan tê danîn. Di zimanê devkî de gelek baneşan dema ku tên gotin, herfên li dawîya navdêrê dirêj dibin yan jî baneşan bi xwe dubare dibin. Yanî di xwendin û gotinê de awayê bilêvkirina baneşanan gelek girîng e.

➤ Hinek baneşanên Hewramî ev in:

ya, ey, hey, hay, ho, ax, aha, wey, way, wax, of, oxey, oxeyş, ox, oys, heyf, ey hawar, dađ û bêdađ, ey řo, kure, teĥa, ohow, êê, êĥew, tate řo, řole řo, aferîn, tobe, tobe bo, aman, awwê, eha, ehaa ha, tate gîyan, çe heyf, ey şêř, eđayy, éayîî, êîww, ĥay, tiff, řole gîyan, ey xiwa(xuđa), erê, meger û hwd ...

➤ Piraniya baneşanan xwedan wateyeke tam nîn in û divê di axaftinê de bêne bihîstin da ku were famkirin kengê wan bikar tînin.

➤ Peyvên mê yên qedandî bi (ê) wek (kinaçê, Xecê, Amînê û hwd) dikarin hin car wek yên Kurmancî derkevin:

Hewramî

Kinaçê mekere.

Xecê bo îge.

Amînê ko nî?

Kurmancî

Keçê neke.

Xecê were vir.

Amînê li ku yî?

➤ Carinan dibe ku em nîşana (eke, ke, kê, eka) ji bo gazîkirina kesan bikar bînin.

Hewramî

kuřeke ane çêş a?

jenekê anîşa bare.

kuřeka/kinaçeka beydê.

Kurmancî

kuro ew çi ye?

jinê wan bîne.

kurino/keçino werin.

- (mineke, toke , ađeke û hwd) xelet e.

- Hin car em dikarin bi zêdekirina(e) li dawiya hin peyvên qedandî bi bêdeng, wan peyva bo bangkirina kesan bi kar binin. Jî di vê rewşê de giranî dikeve ser kêteya pêşîn.

Hewramî

kuř → kuře

her → here

Kurmancî

kur → kuro

ker → kero

- Hin car em dikarin (e)ya li dawiya peyvên mê yê qedandî bi (e) bikin (ê) û wan peyva bo bangkirina kesan bi kar binin. Di vê rewşê de jî giranî dikeve ser kêteya pêşîn.

Hewramî

bize → bizê

Kurmancî

bizin → bizinê

- Bo gazîkirina kesên pirjimar jî tîpên (a/ya) bi kar tinin:

Hewramî

Ey kurda!

Ey weşesîyayaa!

Kurmancî

Lo kurdino!

Lo delalino!

- Berî ku em mînakan bixwînin divê li ser bangkirina mirovan tiştekî girîng bê gotin. Di Hewramî de, berevajî Kurmancî, ji bo gazîkirina kesan peyvên wek (lo, lê) tune ne. Jî ji bo gazîkirina jin û keçan, nîşana mênî (e) ku li dawiya peyvê ye, tê rakirin:

Hewramî

_ Dilber!?

+ Belê?

Kurmancî

_ Dilber!?

+ Belê?

Dîlan xanime kê ne?

Dîlan xanim!?

Dîlan xanim kê ye?

Dîlan xanim!?

Hin nimûneyên din:

Hewramî

Aferîn! Her pase kere/bikere.

Aman! Nelî.

Awwe! Çi inne fire n? Awwe: Termek ji bo heyirînê.

Kurmancî

Aferîn! Her wisa ke/bike.

Aman! Neçî.

Hewramî

Ax ce min! Îne çi hêl a înanas çine.

Ax desû towel!

Ay hawar desû xemawe.

Ay! Ewrayne merda.

Çe heyf ke şime metawdê beydê!

Dexîl! Ey saqî.

Êak! Ane çêş a?

Êayî! Tate ro! Serem teqa.

Edaay! Çinne gunah a> Edaay : *Hema bêje hevwatera (qunekê) ye*

Êê!? Rêş maçî?> Êê termeke ku di dema heyirînê de tê bikaranîn.

Ehaa ha! Pes pêse bîyen!!?> Ehaa ha: Piştî famkirina tiştêkî tê gotin.

Êîwww! Î ahengê çinne weşe ne> Êîwww: Di dema lêxistina straneke şad de tê gotin.

Erê ho kinaçê.

Erê kinaçê to zanî, min Kurmancî mezanû. Erê keçê tu zanî, ez Kurmancî nizanim.

Ey min newatim ane n!?

Ey şêr! Ađ çiko, a kare çiko.

Ey Xiwa(Xuđa) îtir merg!

Ey Xuđa hawarrrrrrrr.

Here! Ane nîya.

Ho ehmeq!

Hooooş here!: Hoş termeke ku ji bo sekinandina kerê tê gotin.

Hoy! Çêş kerî ça?

Meger min newatim ane n!?

Off! Şêtê kerdîmê.

Kurmancî

Ax li min. Ev çi hal e ez tê da me.

Ax ji destê te.

Hawaro ji destê xeman.

Ay! Ez ji birçîna mirim /di birçîtî da mirim.

Çe heyf ku hûn nikarin werin!

Aman! Ey saqîyo/badegêrro.

Ooo! Ew çi ye?

Dayêê! Bawo! Serê`m teqîya.

Erê lê keçê.

Lê! Min negot ew e?

Çirr! Ew li ku, ew kar li ku.

Ey Xweda! Êdî mirina min bide.

Lo Xwediyo hawarrrrrrrr.

Kero! Ew nîn e.

Lo ehmeqo!

Hey! Çi dikî li wir?

Ma min negot ew e?

Off! Te em dîn kirin.

Hewramî

Ohow! Tenya îne kem bê.

Oxeyş! Edam amawe.

Oyş! Merd/Merde!?

Řole gîyan!!! Mekere.

Tate gîyan! Serďane řiçyaymê.

Tate řo! Çinne germ a.

Teĥa! Dey çî paset kerd?

Tiff! Pey şemsîm.

Tixwa: Termeke sondî ye. Em sond dixwin da ku kesek karekî bike/neke.

♦ Tixwa zîwanîta parêzndê: Ji xwedê re zîmanê xwe biparêzin.

Tobe bo! Îtir melû.

Way/Wey çinne serď a.

Ya Řebî Xiwa ĥafêzma bî.

Yaxiwa /Yaxwa /Yexwa = Termeke duayî ku hevwatera însAllah e.

Kurmancî

Tew lo! Tenê ev kêmbû.

Oxeyş! Dêya min vegeriya.

Oyş! Ew mir!?

Zaroko/Zarokê! Neke.

Bawo! (Em) di sermayê de cemidîn.

Bawo! Çiqas germ e.

Tehe! De (te) çima wisa kir?

Tifû! Ji talihê min re.

Tobe be! Êdî naçim.

Way çiqas sar e.

Ya Rebî Xwediyo hafizê me bî.

- Elbet di zaravayên Kurdî de gelek baneşan hene lê em nikarin hemûyan lêkolîn bikin.

Maça her kes diwê seferê be dinyê mê.
Yoşa a řo n ke ce lemew eďê beriř mara û
yoyçşa a řo n ke zano pey çêřî ce eďê bîyen.
Be nezerew min, beydê û
řow diwemî mibarek baďî kerdê wenem.
Werû aney ke zanam pey merďew řaw a nazďarê,
jîwu ...

ماچا هەر کەس دیوێ سەفەرێ بە دنیی مێ.
یۆشا ئا رۆن کە جە لەمەو ئەدۆی بەرش مارا و
یۆیچشا ئا رۆن کە زانو پە ی چیشی جە ئەدۆی بییەن.
بە نەزەرەو من، بەیدی و
رۆو دوەمی مبارەک بادی کەردی وەنەم.
وەروو ئانە ی کە زانام پە ی مەردەو راو ئا نازاری؛
ژیوو ...

Dibêjin her kes du caran tê dinê.

Yek ji wan ew roj e ku wî ji zikê dayikê dertînin û

yek ji wan jî ew roj e ku dizane ji çi re ji dayik bûye.

Bi dîtina min, werin û

roja duyem li min pîrozbahî bikin.

Ji ber wê ku min zanî ji bo mirina rêya wê nazdarê,

dijîm ...

Beşa sêyem

Beşa sêyem: Hevokên lêkerî

_ Di vê beşê de em ê hin peyvan bixwînin ku di çêbûna piraniya lêkeran de, gelek girîng in. Me berê hinik ji wan xwendibûn, lê li vir em ê wan bi başî lêkolîn bikin û fêr bibin. Hin ji wan peyvan qertaf in, hin ji wan daçekin û hwd. Ev peyv di her du zaravayan de gelek in. Em dîsa hin ji peyvên ku berê jî hatibûn şirovekirin, dixwînin. Di beşa lêkerê de em ê taybetmendiya wan di tewandinê de bixwînin.

- **Hor:** Ev peyv hevwatera peyva (*Hil*)a Kurmancî ye û wek Kurmancî berî lêkerê tê. Ev peyv di her du zaravayan de gelek karanîn hene û dikare gelek lêkerên nû çê bike.

Hewramî

Hor + gêrtey = Horgêrtey

Hor + amay = Horamay

Hor + ardey = Horardey

Kurmancî

Hil + girtin = Hilgirtin

Hil + hatin = Hilhatin

Hil + anîn = Hilanîn

- Ev peyv di Hewramî de hin lêker çê dike ku di Kurmancî de bi peyveke din çê dibe lê bi heman waterê:

Hewramî

Hor + êstey = Horêstey

Kurmancî

Ra + bûn = Rabûn

- Wisa ku em dizanin lêkerên ku ev peyv çê dike hevedudanî ne. Ji ber vê yekê, bikaranîna nasnavên lêkeran di van lêkeran de gelek girîng e. Di destpêkê de dibe ku kêmek tevlihev bin lê bi çend nimûne hûn dikarin fêr bibin. Her weha cînavên cureyê yekem û zanîna taybetmendiya wan jî pir girîng e ku me di beşa cînavê de gotin. Jî zayenda bireserê li her du beşa lêkerê li hev dike.

Nimûne:

- ♦ Dema niha > Horgêrtey : Hilgiritn

Hewramî

Min hor gêrû

Min horiş gêrû

Min horeş gêrû

Kurmancî

Ez hil digirim

Ez wî hil digirim

Ez wê hil digirim

- ♦ Dema Borî > Horgêrtey : Hilgiritn

Hewramî

Min horim gêrt

Min horem gêrte

Min horêm gêrtê

Kurmancî

Min ew(n) hil girt

Min ew(m) hil girt

Min ew(pj) hil girtin

- **Ber**: Ev peyv hevwatera peyva (*Der*) a Kurmancî ye. Her weha di hin deran de li şûna peyva (*Ciber: Derve*) jî bi kêr tê. Nimûne:

Hewramî

Ber + amay = Beramay
 Ber + ardey = Berardey
 Înana ber
 Beriş bare = aney ber bare
 Bereş bare = anê ber bare
 Berim ard = Aneym ber ard
 Berem arde = Anê ber bere arde

Kurmancî

Der + hatin = derhatin
 Der + anîn = Deranîn
 Li derve me
 Wî derbîne
 Wê derbîne
 Min ew deranî
 Min ew(m) deranî

- **Ver**: Ev peyv hevwatera peyva (*Ber*) a Kurmancî ye. Ev peyv di Hewramanê de bi du awayên (*Ver*) û (*Wer*) tê gotin. Tenê yek watera (*Ver*) heye lê du waterên (*Wer*) hene. Yek ji wan di watera (*Ber*) a Kurmancî de ye û ewa din jî (*Tav*) e. Ji aliyê rêzimanî ve, gotina (*Ver*) rasttir e. Nimûne:

Hewramî

Ver + bîyey = Verbîyey
 Ver + day = Verday
 Guleke ver bîyen
 Tenafekê vere bîyêne
 Min a awême vere dêne
 Min î maşînîme ver dan

Kurmancî

Ber + bûn = Berbûn
 Ber + dan = Berdan
 Gul berbûye
 Kindir berbûye
 Min ew av berdaye
 Min ew erebe berdaye

- **Yo**: Ev peyv ji bilî watera (*Yek*)ê, dikare watera (*Hev/ êk*) jî bide. Her weha ev peyv dikare hin car wekî (*Yotirîn*) jî were. Nimûne:

Hewramî

Yo + gêrtey = Yogêrtey
 Bi yoy waçdê
 Bi yotirînî waçdê
 Çenî yoy bildê
 Çenî yotirînî bildê
 Birayêw yoy nê

Kurmancî

Hev + gitin = Hevgirtin
 Ji hev re bêjin
 Ji hev re bêjin
 Bi hev re biçin
 Bi hev re biçin
 Birayên êk in

- **Pêwere**: Ev peyv hevwatera peyva (*Bi hev re*) ya Kurmancî û (*Çenî yoy/yotirînî*) ya Hewramî ye. Carinan jî wek (*Pêwe*) an (*Pêvere*) tê gotin. Nimûne:

Hewramî

Bo ba ême pêwere bilmê
 Şime înaydê pêwere?

Kurmancî

Were bila em bi hev re herin
 Hûn bi hev re ne?

- **Piwe:** Ev peyv hevwatera peyva (*Pêve*)ya Kurmancî ye. Carinan jî wek (*Powe/Po*) tê gotin.

Nimûne:

Hewramî	Kurmancî
Piweday	Pêvedan
Meney piwe	Man pêve
Marî dan piwe	Mar daye pêve
Hîçîş nemenen piwe	Tu tişt nemaye pêve

- **Pore:** Ev peyv hevwatera peyva (*Pêde*)ya Kurmancî ye. Hewwatera wê ya Soranî jî (*Pêda*) ye. Nimûne:

Hewramî	Kurmancî
Kerdey pore	Pêdakirin
Ardey pore	Pêdaanîn
Kerdim pore	Min pêda kir
Ardit poremre	Te bi min da anî

- **Yore:** Ev peyv hevwatera peyva (*Bi hev de*)ya Kurmancî ye. Hewwatera wê ya Soranî jî (*Pêkda*) ye. Nimûne:

Hewramî	Kurmancî
Yoredîyay	Bi hev da nêrîn
Yorebestey	Bi hev da girêdan
Midyeymê yore	Em bi hev da dinêrin
Anîşa bese yore	Wan bi hev de girêbide

- **-ne:** Ev peyv dikare têgîna *tê de bûnê* çê bike mîna (*dî ... de*)ya Kurmancî. Her weha, dikare mîna peyva (*tê*) di peyva (*têgihîştin*)a Kurmancî be. Heke ev peyv di watera *tê de bûnê* de were, peyva sereke nayê tewandin.

Hewramî	Kurmancî
Desimne	Di destê min de
Yaway + ne = Yawayne	Tê + gihîştin = Têgihîştin

- **-re:** Ev peyv têngîna (*bi ... de*) çê bike. Lê dikare mîna peyvên (*da/rû/ra*)ya Kurmancî jî were û radereke nû çê bike.

Hewramî

Îne çêş bê ama seremare?

Kewtey + re = Kewteyre

Nîştey + re = Nîşteyre

Yaway + re = Yawayre

Kurmancî

Eve çi bû hat bi serê me da?

Da + ketin = Daketin

Rû + niştin = Rûniştin

Ra + xistin = Raxistin

- **-we:** Ev peyv an wekî (*Ve*)ya Kurmancî radereke nû çê dike, an jî dubarebûn û dubarekirina karekî îfade dike.

Hewramî

Kerdeywe

Kewtey + we = Kewteywe

Kurmancî

Vekirin/Dîsa kirin

Dîsa kirin

- ♦ Sê peyvên (-ne), (-re) û (-we) di çêkirina raderan gelek girîng in ku em ê di beşa çarem de, lêkolîn bikin.

Beş a çarem

Beşa çarem: Hin rênima

_ Di vê beşê de em ê rader û lêkerên Hewramî bixwînin. Ev beş hema li gel beşa duyem, beşên herî girîngên pirtûkê ne. Ji ber wê yekê ez hêvîdar im ku bikaribim vê beşê bi başî fêrî we bikim.

_ Du xal hene ku roleke pir girîng di lêkerên Hewramî de dilîzin. Yek ji wan lihevhatina zayenda kirde û bireseran bi lêkerê re ye û yeka din jî cudahiya nasnavên lêkerên pêwîst û gerguhêz e.

_ Di Hewramî de hin lêker hene ku hevwatera wana tam di Kuramancî de tune û divê ku watera wan bi tevahî were gotin. Armanca serekeya vê beşê ev e ku we fêrî tewandina lêkerên Hewramî bike û lêkolîna watera van lêkeran meseleyek din e.

_ Di Hewramî de şeweya nivîskî û heta bilêvkirina hin lêkeran dişibin hev, lê wate û têgehên wan bi tevahî ji hev cuda ne. Ev pirsgirêk û tevlihevî dê bi pratîkkirin û dîtina mînakên çareser bibe.

_ Hevokên şertî di vê beşê de nîn e û di beşa pêncem de hatine şirovekirin.

Beşa çarem: Rader

_ Me berê xwendiyê ku peyv ji çend tîpên ku bi hev re girêdayî ne, pêk hatiye û cureyên wê hene. Lêker peyveke ku pêkanîna çalakiyekê vedibêje. Lêkerê du kok hene:

- 1- Koka dema borî
- 2- Koka dema niha

_ Ji ber ku koka hemiya zaravayên Kurdî yek e, rêbaza çêbûna peyvan di van zaravayan de jî wek hev e. Di Hewramî û Kurmancî de sê paşqertaf hene ku cureyekî din ê peyvan bi navê raderê çêdikin. Paşqertafên radersazên Hewramî ev in:

Hewramî	Kurmancî
y, ey, yey	n, in, yîn

Di Hewramî û Kurmancî de dema koka borî ya lêkerê û paşqertafên radersaz werin ber hev, bêyî ku rewşa lêkerê bi demê ve girêdayî be, hingê lêker di forma “*rader*” de ye. Mînak:

Hewramî	Kurmancî
Bî + <u>yey</u> = Bîyey	Bû + <u>yîn</u> = Bûyîn
Wist + <u>ey</u> = Wistey	Xist + <u>in</u> = Xistin
Wara + <u>y</u> = Waray	Barî + <u>n</u> = Barîn

- Hejmara raderên ku nîşana raderiya wan (*yey*) e ji ya ku nîşana raderiya wan (*y*) yan (*ey*) e, pir kêmtir e.

_ Di Hewram de koka dema borî ya lêkerê bi sê tîpan diqede:

- 1- Qedandî bi tîpên bêdeng ve.
- 2- Qedandî bi tîpa (a) ve.
- 3- Qedandî bi tîpa (î) ve.

_ Dema ku koka dema borî ya lêkerê bi tîpên bêdeng ve biqede, dê paşqertafa radersaza wê (ey) be. Mînak:

Hewramî	Kurmancî
Wat + ey = Watey	Got + in = Gotin
Pet + ey = Petey	Peht + in = Pehtin
Best + ey = Bestey	Best + in = Bestin

_ Dema ku koka dema borî ya lêkerê bi tîpa (a) ve biqede, dê paşqertafa radersaza wê (y) be.

Mînak:

Hewramî	Kurmancî
Liwa + y = Liway	Çû + n = Çûn
Zana + y = Zanay	Zanî + n = Zanîn
Persa + y = Persay	Pirsî + n = Pirsîn

_ Dema ku koka dema borî ya lêkerê bi tîpa (î) ve biqede, dê paşqertafa radersaza wê (yey) be.

Mînak:

Hewramî	Kurmancî
Bî + yey = Bîyey	Bû + yîn = Bûyîn
Şî + yey = Şîyey	Çû + yîn = Çûyîn
Dî + yey = Dîyey	Dît + in = Dîtin

_ Di beşên duyem û sêyem de, sê peyvên ku dikarin li raderê werin zêdekirin û radereke nû çêbikin, hatin ravekirin. Ev sê peyv (-re), (-we) û (-ne) bûn. **Mînak:**

Hewramî	Kurmancî
Nîştey + re = Nîşteyre	Rû + niştin = Rûniştin
Kerdey + we = Kerdeywe	Ve + kirin = Vekirin
Wistey + ne = Wisteyne	Tê + xistin = Têxistin

Mînak:

Hewramî	Kurmancî
Min nîştare	Ez rûniştim
Min nîşûre	Ez rûdinê
Min kerdimwe	Min vekir > Biresera mê: kerdemwe
Min kerûwe	Ez vedikim
Min wistimne	Min têxist > Biresera mê: wistemne

_ Lê ev sê peyvên girîng dikarin bi awayekî din jî raderê çêbikin, lê bi vê ferqê ku êdî di wê rewşê de nayên tewandin û tenê dikarin wekî raderê hebin. Mînak:

Hewramî

Ere + nîştey = Erenîştey

Ewe + kerdey = Ewekerdey

Ene + wistey = Enewistey

Kurmancî

Rû + niştin = Rûniştin

Ve + kirin = Vekirin

Tê + xistin = Têxistin

- Ango tucar nabêjin (Erenîşû, Ewekerû, Enewizû). Tişteki wisa tune û tenê di moda raderê de heye.

Hewramî

Nîşteyre = Erenîştey

Kerdeywe = Ewekerdey

Wisteyne = Enewistey

Kurmancî

Rûniştin

Vekirin

Têkirin

Beşa çarem: Lêker

_ Ji peyvên ku di hevokê de hereket, bûyîn, kirin û rewşê nîşan didin re “*lêker*” tê gotin.

Di Hewramî de jî wek Kurmancî du cure lêker hene:

1- *Lêkerên xwerû*

2- *Lêkerên hevedudanî*

- *Lêkerên hevedudanî di nav xwe de li ser çend beşan parve dibin.*

1_ *Lêkerên xwerû*

- Lêkerên ku di halê xwe yê xwerû de çêdibin, ji wan re dibêjin “*lêkerên xwerû*”.

Nimûne:

Hewramî	Kurmancî
Ardey	Anîn
Berdey	Birin
Kerdey	Kirin
Niwîstey	Nivîsandin
Wanay	Xwendin

2_ *Lêkerên hevedudanî*

Lêkerên ku bi alîkariya preverb, daçek, peyv yan jî lêkereka din çêdibin, ji wan re dibêjin “*lêkerên hevedudanî*”. Nimûne:

Hewramî	Kurmancî
Kerdey <u>ne</u>	<u>Tê</u> kirin
Gêlay <u>we</u>	<u>Ve</u> gerîn
<u>Hor</u> ardey	<u>Hil</u> anîn
Yaway <u>re</u>	<u>Rax</u> istin
<u>Aw</u> day	<u>Av</u> dan
<u>Pers</u> kerdey	<u>Pir</u> skirin
<u>Pak</u> kerdey <u>we</u>	Paqijkirin
Des pine kerdey	Dest pê kirin

Lêker ji aliyên din ve jî tê parvekirin. Yek ji wan aliyan, “*gerguhêz*” an “*negerguhêz*” bûna wan e:

_ Lêkerên gerguhêz:

Karê ku dikare bireserê bigire pêvebera wî dibe “*lêkera gerguhêz*”. Di lêkera gerguhêz de, bersiva pirsên mîna “*çi tiştêkî*” an “*çi kesekî*” heye. Yanî di lêkerên gerguhêz de, karê ku kirde dike, li ser kesek an tiştêkî tesîrê dike. Di Hewramî de bi awayê nêrîtî, mêkîtî û pirjimariyê kişandina lêkerê bi bireserê ve eleqedar e. Nimûne:

- Nîşana raderiya (ey) > Wardey: Xwarin

Hewramî

Min(m/n) nanim ward.

Min(m/n) sawîm warde.

Min(m/n) diwê mozê m warde.

Kurmancî

Min nan xwar. (*Nan:n*)

Min sêv xwar. (*Sawî:m*)

Min du moz xwarin. (*Mozê:pj*)

- Nîşana raderiya (y) > Sanay: Kîrîn

Hewramî

Min(m/n) nanim sana.

Min(m/n) sawîm sana.

Min(m/n) diwê mozê m sanê.

Kurmancî

Min nan kîrî. (*Nan:n*)

Min sêv kîrî. (*Sawî:m*)

Min du moz kîrîn. (*Mozê:pj*)

- Nîşana raderiya (yey) > Dîyey: Dîtin

Hewramî

Min(m/n) nanim dî.

Min(m/n) sawîm dîye.

Min(m/n) diwê mozê m dîyê.

Kurmancî

Min nan dît. (*Nan:n*)

Min sêv dît. (*Sawî:m*)

Min du moz dîtin. (*Mozê:pj*)

_ Lêkerên negerguhêz(pêwîst):

Karê ku nikare bireserê bigire pêvebera wî dibe “*lêkera negerguhêz*”. Di lêkerên negerguhêz de, karê ku kirde dike, li ser kesek an tiştêkî tesîrê nake. Di Hewramî de, di lêkerên negerguhêz de kişandina lêkeran ji aliyê nêrîtî, mêkîtî û pirjimariyê ve rasterast bi kirdeyê ve eleqedar e. Nimûne:

Hewramî	Kurmancî
Ađ aman	Ew(n) hatîye
Ađe amêne	Ew(m) hatîye
Ađê amênê	Ew(pj) hatîne

♦ Lêker û dem

Lêker ji aliyê demê ve dibe sê beş:

- 1- Lêkera dema borî
- 2- Lêkera dema niha
- 3- Lêkera dema bê

- *Her yek ji wan lêkeran di nav xwe de li ser çend beşan parve dibin ku di vê beşê de em ê wan lêkolîn bikin.*

Beşa çarem: Dema borî ya diyar

_ Manaya xwe ev e ku kar temam bûye û diyar e. Nasnavên lêkerên pêwîst û gerguhêzên vê demê ji hev cuda ne. Lewa em ê wan cuda cuda bixwînin.

_ Lêkerên negerguhêz(pêwîst):

♦ Heke nîşana raderiya lêkera pêwîst (y) be, formul bi vî rengî ye:

➤ Kirde + Koka dema borî ya lêkerê + Cînavên { nê, y, ---, ymê, ydê, ê }

Nimûne > Amay: Hatin

Cînav	Lêkera Hewramî	Cînav	Lêkera Kurmancî
Min(m/n)	Amanê	Ez	Hatim
To(m/n)	Amay	Tu	Hatî
Ađ	Ama	Ew(n)	Hat
Ađe	Ama	Ew(m)	Hat
Ême	Amaymê	Em	Hatin
Şime	Amaydê	Hûn	Hatin
Ađê	Amê	Ew(pj)	Hatin

- Hûn dikarin vegerin beşa cînavan û cînavên girêdayî yên cureyên sêyem dîsa bixwînin.

♦ Heke nîşana raderiya lêkera pêwîst (ey) be, formul bi vî rengî ye:

- Kirde + Koka dema borî ya lêkerê + Cînavên { a/anê, î, -e, îmê, îdê, ê }

Nimûne > Witey: Razan

Cînav	Lêkera Hewramî	Cînav	Lêkera Kurmancî
Min	Wita = Witanê	Ez	Razam
To	Witî	Tu	Razay
Ađ	Wit	Ew(n)	Raza
Ađe	Wite	Ew(m)	Raza
Ême	Witîmê	Em	Razan
Şime	Witîdê	Hûn	Razan
Ađê	Witê	Ew(pj)	Razan

♦ Heke nîşana raderiya lêkera pêwîst (yey) be, formul bi vî rengî ye:

- Kirde + Koka dema borî ya lêkerê + Cînavên { ya/yanê, yey/yêy, -/ye, yêymê, yêydê, yê }

Nimûne > Bîyey: Bûn

Cînav	Lêkera Hewramî	Cînav	Lêkera Kurmancî
Min	Bîya = Bîyanê	Ez	Bûm
To (n)	Bîyey	Tu	Bûy
To (m)	Bîyêy	Tu	Bûy
Ađ	Bî	Ew(n)	Bû
Ađe	Bîye	Ew(m)	Bû
Ême	Bîyêymê	Em	Bûn
Şime	Bîyêydê	Hûn	Bûn
Ađê	Bîyê	Ew(pj)	Bûn

- Rêbaza neyînîkirina van jî wek Kurmancî bikaranîna pêşgira (ne/n) ye:

Hewramî	Kurmancî
amanê > <u>n</u> amanê	hatim > <u>n</u> ihatim
wita/witanê > <u>n</u> ewita/ <u>n</u> ewitanê	raketim > <u>r</u> an <u>e</u> ketim
bîya/bîyanê > <u>n</u> ebîya/ <u>n</u> ebîyanê	bûm > nebûm

Lêkerên gerguhêz:

- Ji bo van lêkeran, zayenda bireserê girîng e û tesîrê li ser kişandina lêkerê dike. Di Hewramî de birser li ser *nêrîtî û mêkîtî û pirjimariyê* parve dibe. Em pêşî biresera nêr dixwînin û paşê biresera mê û pirjimar. Jî girîng e ku bireser rasterast di hevokê de hatiye an na. Ji ber ku heke di hevokê de hatibe, em ê cînavên { *m, t, ş, ma, ta, şa* } bi wê ve girêdidin û heke nehatibe em ê wan cînavan bi lêkerê ve girêdidin. Di Kurmancî û Zazakî de, dema ku lêker gerguhêza dema borî ya diyar be, cînavên kirdeyî, yanî (*Ez, Tu, Ew, Em, Hûn, Ew*), di halê xwe yê tewandî de ne û lêker jî di koka dema borîya xwe de ye. Nimûne:
- Xwarin > Dema niha > Ez dixwim
> Dema borî > Min xwar

Ev qayde di Hewramî de tune. Di Hewramî de li şûna wê ku (*Min, To, ađ/ađe, Ême, Şime, ađe*) werin tewandin, cînavên { *m, t, ş, ma, ta, şa* } têne bikaranîn. Bo nimûne heman (*Xwarin*):

➤ Wardey : Dema niha		➤ Wardey : Dema niha : Biresera nêr	
Hewramî	Kurmancî	Hewramî	Kurmancî
Min werû	Ez dixwim	Min wardim	Min xwar
To werî	Tu dixwî	To wardit	Te xwar
Ađ/Ađe wero	Ew dixwe	Ađ/Ađe wardiş	Wî/Wê xwar
Ême wermê	Em dixwin	Ême wardma	Me xwar
Şime werdê	Hûn dixwin	Şime wardta	We xwar
Ađe wera	Ew dixwin	Ađe wardşa	Wan xwar

Jî di Hewramî de heke bireser were gotin, dema ku lêker gerguhêza dema borî ya diyar be, cînavên { *m, t, ş, ma, ta, şa* }, êdî ne bi lêkerê ve, lê bi bireserê ve tê girêdan. Bo nimûne:

➤ Wardey : Dema niha

Hewramî	Kurmancî
Min nan werû	Ez nan dixwim
To nan werî	Tu nan dixwî
Ađ/Ađe nan wero	Ew nan dixwe
Ême nan wermê	Em nan dixwin
Şime nan werdê	Hûn nan dixwin
Ađe nan wera	Ew nan dixwin

➤ Wardey : Dema niha : Biresera nêr

Hewramî	Kurmancî
Min nanim ward	Min nan xwar
To nanit wardit	Te nan xwar
Ađ/Ađe naniş ward	Wî/Wê nan xwar
Ême nanma ward	Me nan xwar
Şime nanta ward	We nan xwar
Ađe nanşa ward	Wan nan xwar

Her weha zayenda bireserê bi lêkerê re li hev dike. (Rûpel: 246)

♦ Heke nîşana raderiya lêkera gerguhêz (y) be, formul bi vî rengî ye:

- Kirde + Koka dema borî ya lêkerê + Cînavên { m, t, ş, ma, ta, şa }

Nimûne > Sanay: Kirrîn > Biresera nêr (*Di hevokê de nehatiye*)

Cînav	Lêkera Hewramî	Cînav	Lêkera Kurmancî
Min(m/n)	Sanam	Min	Kirrî
To(m/n)	Sanat	Te	Kirrî
Ađ	Sanaş	Wî	Kirrî
Ađe	Sanaş	Wê	Kirrî
Ême	Sanama	Me	Kirrî
Şime	Sanata	We	Kirrî
Ađe	Sanaşa	Wan	Kirrî

- Hûn dikarin vegerin beşa cînavan û cînavên girêdayî yên cureyên yekem dîsa bixwînin.

♦ Heke nîşana raderiya lêkera gerguhêz (y) be, formul bi vî rengî ye:

- Kirde + Bireser + Cînavên { m, t, ş, ma, ta, şa } + Koka dema borî ya lêkerê

Nimûne > Sanay: Kirrîn > Biresera nêr (Di hevokê de hatiye)

Cînav	Lêkera Hewramî	Cînav	Lêkera Kurmancî
Min(m/n)	nanim sana	Min	nan kirrî
To(m/n)	nanit sana	Te	nan kirrî
Ađ	naniş sana	Wî	nan kirrî
Ađe	naniş sana	Wê	nan kirrî
Ême	nanma sana	Me	nan kirrî
Şime	nanta sana	We	nan kirrî
Ađê	nanşa sana	Wan	nan kirrî

♦ Heke nîşana raderiya lêkera gerguhêz (y) be, formul bi vî rengî ye:

- Kirde + Koka dema borî ya lêkerê + Cînavên { m, t, ş, ma, ta, şa }

Nimûne > Sanay: Kirrîn > Biresera mê (Di hevokê de nehatiye)

Cînav	Lêkera Hewramî	Cînav	Lêkera Kurmancî
Min(m/n)	Sanam	Min	Kirrî
To(m/n)	Sanat	Te	Kirrî
Ađ	Sanaş	Wî	Kirrî
Ađe	Sanaş	Wê	Kirrî
Ême	Sanama	Me	Kirrî
Şime	Sanata	We	Kirrî
Ađê	Sanaşa	Wan	Kirrî

♦ Heke nîşana raderiya lêkera gerguhêz (y) be, formul bi vî rengî ye:

- Kirde + Bireser + Cînavên { m, t, ş, ma, ta, şa } + Koka dema borî ya lêkerê

Nimûne > Sanay: Kîrrîn > Biresera mê (Di hevokê de hatiye)

Cînav	Lêkera Hewramî	Cînav	Lêkera Kurmancî
Min(m/n)	kergem sana	Min	mirîşk kirrî
To(m/n)	kerget sana	Te	mirîşk kirrî
Ađ	kergeş sana	Wî	mirîşk kirrî
Ađe	kergeş sana	Wê	mirîşk kirrî
Ême	kergema sana	Me	mirîşk kirrî
Şime	kergeta sana	We	mirîşk kirrî
Ađê	kergeşa sana	Wan	mirîşk kirrî

♦ Heke nîşana raderiya lêkera gerguhêz (y) be, formul bi vî rengî ye:

- Kirde + (a)ya li dawîya koka borî dibe (ê) + Cînavên { m, t, ş, ma, ta, şa }

Nimûne > Sanay: Kîrrîn > Biresera pirjimar (Di hevokê de nehatiye)

Cînav	Lêkera Hewramî	Cînav	Lêkera Kurmancî
Min(m/n)	Sanêm	Min	Kîrrîn
To(m/n)	Sanêt	Te	Kîrrîn
Ađ	Sanêş	Wî	Kîrrîn
Ađe	Sanêş	Wê	Kîrrîn
Ême	Sanêma	Me	Kîrrîn
Şime	Sanêta	We	Kîrrîn
Ađê	Sanêşa	Wan	Kîrrîn

♦ Heke nîşana raderiya lêkera gerguhêz (y) be, formul bi vî rengî ye:

- Kirde + Bireser + Cînavên { m, t, ş, ma, ta, şa } + (a)ya li dawiya koka borî dibe (ê)

Nimûne > Sanay: Kîrrîn > Biresera pirjimar (Di hevokê de hatiye)

Cînav	Lêkera Hewramî	Cînav	Lêkera Kurmancî
Min(m/n)	kitêbêm sanê	Min	pirtûk kîrrîn
To(m/n)	kitêbêt sanê	Te	pirtûk kîrrîn
Ađ	kitêbêş sanê	Wî	pirtûk kîrrîn
Ađe	kitêbêş sanê	Wê	pirtûk kîrrîn
Ême	kitêbêma sanê	Me	pirtûk kîrrîn
Şime	kitêbêta sanê	We	pirtûk kîrrîn
Ađê	kitêbêşa sanê	Wan	pirtûk kîrrîn

♦ Heke nîşana raderiya lêkera gerguhêz (ey) be, formul bi vî rengî ye:

- Kirde + Koka dema borî ya lêkerê + Cînavên { m, t, ş, ma, ta, şa }

Nimûne > Wistey: Xistin > Biresera nêr (Di hevokê de nehatiye)

Cînav	Lêkera Hewramî	Cînav	Lêkera Kurmancî
Min(m/n)	Wistim	Min	Xist
To(m/n)	Wistit	Te	Xist
Ađ	Wistiş	Wî	Xist
Ađe	Wistiş	Wê	Xist
Ême	Wistma	Me	Xist
Şime	Wistta	We	Xist
Ađê	Wistşa	Wan	Xist

♦ Heke nîşana raderiya lêkera gerguhêz (ey) be, formul bi vî rengî ye:

- Kirde + Bireser + Cînavên { m, t, ş, ma, ta, şa } + Koka dema borî ya lêkerê

Nimûne > Wistey: Xistin > Biresera nêr (Di hevokê de hatiye)

Cînav	Lêkera Hewramî	Cînav	Lêkera Kurmancî
Min(m/n)	desim wist	Min	dest xist
To(m/n)	desit wist	Te	dest xist
Ađ	desiş wist	Wî	dest xist
Ađe	desiş wist	Wê	dest xist
Ême	desma wist	Me	dest xist
Şime	desta wist	We	dest xist
Ađê	desşa wist	Wan	dest xist

♦ Heke nîşana raderiya lêkera gerguhêz (ey) be, formul bi vî rengî ye:

- Kirde + Koka dema borî ya lêkerê + e + Cînavên { m, t, ş, ma, ta, şa }

Nimûne > Wistey: Xistin > Biresera mê (Di hevokê de nehatiye)

Cînav	Lêkera Hewramî	Cînav	Lêkera Kurmancî
Min(m/n)	Wistem	Min	Xist
To(m/n)	Wistet	Te	Xist
Ađ	Wisteş	Wî	Xist
Ađe	Wisteş	Wê	Xist
Ême	Wistema	Me	Xist
Şime	Wisteta	We	Xist
Ađê	Wisteşa	Wan	Xist

♦ Heke nîşana raderiya lêkera gerguhêz (ey) be, formul bi vî rengî ye:

- Kirde + Bireser + Cînavên { m, t, ş, ma, ta, şa } + Koka dema borî ya lêkerê + e

Nimûne > Wistey: Xistin > Biresera mê (Di hevokê de hatiye)

Cînav	Lêkera Hewramî	Cînav	Lêkera Kurmancî
Min(m/n)	tewenem wiste	Min	kevir xist
To(m/n)	tewenet wiste	Te	kevir xist
Ađ	teweneş wiste	Wî	kevir xist
Ađe	teweneş wiste	Wê	kevir xist
Ême	tewenema wiste	Me	kevir xist
Şime	teweneta wiste	We	kevir xist
Ađê	teweneşa wiste	Wan	kevir xist

♦ Heke nîşana raderiya lêkera gerguhêz (ey) be, formul bi vî rengî ye:

- Kirde + Koka dema borî ya lêkerê + ê + Cînavên { m, t, ş, ma, ta, şa }

Nimûne > Wistey: Xistin > Biresera pirjimar (Di hevokê de nehatiye)

Cînav	Lêkera Hewramî	Cînav	Lêkera Kurmancî
Min(m/n)	Wistêm	Min	Xistin
To(m/n)	Wistêt	Te	Xistin
Ađ	Wistêş	Wî	Xistin
Ađe	Wistêş	Wê	Xistin
Ême	Wistêma	Me	Xistin
Şime	Wistêta	We	Xistin
Ađê	Wistêşa	Wan	Xistin

♦ Heke nîşana raderiya lêkera gerguhêz (ey) be, formul bi vî rengî ye:

- Kirde + Bireser + Cînavên { m, t, ş, ma, ta, şa } + Koka dema borî ya lêkerê + ê

Nimûne > Wistey: Xistin > Biresera pirjimar (Di hevokê de hatiye)

Cînav	Lêkera Hewramî	Cînav	Lêkera Kurmancî
Min(m/n)	diwê tewenê m wistê	Min	du kevir xistin
To(m/n)	diwê tewenê t wistê	Te	du kevir xistin
Ađ	diwê tewenê ş wistê	Wî	du kevir xistin
Ađe	diwê tewenê ş wistê	Wê	du kevir xistin
Ême	diwê tewenê ma wistê	Me	du kevir xistin
Şime	diwê tewenê ta wistê	We	du kevir xistin
Ađê	diwê tewenê şa wistê	Wan	du kevir xistin

♦ Heke nîşana raderiya lêkera gerguhêz (yey) be, formul bi vî rengî ye:

- Kirde + Koka dema borî ya lêkerê + Cînavên { m, t, ş, ma, ta, şa }

Nimûne > Dîyey: Dîtin > Biresera nêr (Di hevokê de nehatiye)

Cînav	Lêkera Hewramî	Cînav	Lêkera Kurmancî
Min(m/n)	Dîm	Min	Dît
To(m/n)	Dît	Te	Dît
Ađ	Dîş	Wî	Dît
Ađe	Dîş	Wê	Dît
Ême	Dîma	Me	Dît
Şime	Dîta	We	Dît
Ađê	Dîşa	Wan	Dît

♦ Heke nîşana raderiya lêkera gerguhêz (yey) be, formul bi vî rengî ye:

- Kirde + Bireser + Cînavên { m, t, ş, ma, ta, şa } + Koka dema borî ya lêkerê

Nimûne > Dîyey: Dîtin > Biresera nêr (*Di hevokê de hatiye*)

Cînav	Lêkera Hewramî	Cînav	Lêkera Kurmancî
Min(m/n)	asmanî dî	Min	ezman dît
To(m/n)	asmanî dî	Te	ezman dît
Ađ	asmanîş dî	Wî	ezman dît
Ađe	asmanîş dî	Wê	ezman dît
Ême	asmanta dî	Me	ezman dît
Şime	asmanta dî	We	ezman dît
Ađê	asmanşa dî	Wan	ezman dît

♦ Heke nîşana raderiya lêkera gerguhêz (yey) be, formul bi vî rengî ye:

- Kirde + Koka dema borî ya lêkerê + ye + Cînavên { m, t, ş, ma, ta, şa }

Nimûne > Dîyey: Dîtin > Biresera mê (*Di hevokê de nehatiye*)

Cînav	Lêkera Hewramî	Cînav	Lêkera Kurmancî
Min(m/n)	Dîyem	Min	Dît
To(m/n)	Dîyet	Te	Dît
Ađ	Dîyeş	Wî	Dît
Ađe	Dîyeş	Wê	Dît
Ême	Dîyema	Me	Dît
Şime	Dîyeta	We	Dît
Ađê	Dîyeşa	Wan	Dît

♦ Heke nîşana raderiya lêkera gerguhêz (yey) be, formul bi vî rengî ye:

- Kirde + Bireser + Cînavên { m, t, ş, ma, ta, şa } + Koka dema borî ya lêkerê + ye

Nimûne > Dîyey: Dîtin > Biresera mê (Di hevokê de hatiye)

Cînav	Lêkera Hewramî	Cînav	Lêkera Kurmancî
Min(m/n)	mangem dîye	Min	heyv dît
To(m/n)	manget dîye	Te	heyv dît
Ađ	mangeş dîye	Wî	heyv dît
Ađe	mangeş dîye	Wê	heyv dît
Ême	mangema dîye	Me	heyv dît
Şime	mangeta dîye	We	heyv dît
Ađê	mangeşa dîye	Wan	heyv dît

♦ Heke nîşana raderiya lêkera gerguhêz (yey) be, formul bi vî rengî ye:

- Kirde + Koka dema borî ya lêkerê + yê + Cînavên { m, t, ş, ma, ta, şa }

Nimûne > Dîyey: Dîtin > Biresera pirjimar (Di hevokê de nehatiye)

Cînav	Lêkera Hewramî	Cînav	Lêkera Kurmancî
Min(m/n)	Dîyêm	Min	Dîtin
To(m/n)	Dîyêt	Te	Dîtin
Ađ	Dîyêş	Wî	Dîtin
Ađe	Dîyêş	Wê	Dîtin
Ême	Dîyêma	Me	Dîtin
Şime	Dîyêta	We	Dîtin
Ađê	Dîyêşa	Wan	Dîtin

♦ Heke nîşana raderiya lêkera gerguhêz (yey) be, formul bi vî rengî ye:

- Kirde + Bireser + Cînavên { m, t, ş, ma, ta, şa } + Koka dema borî ya lêkerê + yê

Nimûne > Dîyey: Dîtin > Biresera pirjimar (Di hevokê de hatiye)

Cînav	Lêkera Hewramî	Cînav	Lêkera Kurmancî
Min(m/n)	adîşam dîyê	Min	ew dîtin
To(m/n)	adîşat dîyê	Te	ew dîtin
Ađ	adîşaş dîyê	Wî	ew dîtin
Ađe	adîşaş dîyê	Wê	ew dîtin
Ême	adîşama dîyê	Me	ew dîtin
Şime	adîşata dîyê	We	ew dîtin
Ađê	adîşaşa dîyê	Wan	ew dîtin

- Rêbaza neyînîkirina van jî wek Kurmancî bikaranîna (ne/n) berî lêkerê ye:

Hewramî

sanam/sanêm > nesanam/nesanêm

wistim/wistem/wistêm > newistim/newistem/newistêm

dîm/dîyem/dîyêm > nedîm/nedîyem/nedîyêm

Kurmancî

min kirrî/kirrîn > min nekirrî/nekirrîn

min xist/xistin > min nexist/nexistin

min dît/dîtin > min nedît/nedîtin

- Mînakên jorîn ji bo lêkerên xwerû bûn. Lazim e ku em fêrî awayê tewandina lêkerên hevedudanî jî bibin. Hema tu cudahiyeke mezin di navbera tewandina wan lêkeran tune û di her duyan de cînavên girêdayî yên cureyên yekem û sêyem têne bikaranîn.

_ Lêkerên negerguhêz(pêwîst):

♦ Heke nîşana raderiya lêkera pêwîst (y) be, formul bi vî rengî ye:

➤ Kirde + ... + Koka dema borî ya lêkerê + Cînavên { nê, y, ---, ymê, ydê, ê } + ...

Nimûne > Gêlaywe: Vegerîn

Cînav	Lêkera Hewramî	Cînav	Lêkera Kurmancî
Min(m/n)	Gêlanêwe	Ez	Vegeriyam
To(m/n)	Gêlaywe	Tu	Vegeriyay
Ađ	Gêlawe	Ew(n)	Vegeriya
Ađe	Gêlawe	Ew(m)	Vegeriya
Ême	Gêlaymêwe	Em	Vegeriyan
Şime	Gêlaydêwe	Hûn	Vegeriyan
Ađê	Gêlêwe	Ew(pj)	Vegeriyan

♦ Heke nîşana raderiya lêkera pêwîst (ey) be, formul bi vî rengî ye:

➤ Kirde + ... + Koka dema borî ya lêkerê + Cînavên { a/anê, î, -e, îmê, îdê, ê } + ...

Nimûne > Horêstey: Rabûn

Cînav	Lêkera Hewramî	Cînav	Lêkera Kurmancî
Min(n)	Hor êsta/Hor êstanê	Ez	Rabûm
Min(m)	Hore êsta/Hore êstanê	Ez	Rabûm
To(n)	Hor êstî	Tu	Rabûy
To(m)	Hore êstî	Tu	Rabûy
Ađ	Hor êst	Ew(n)	Rabû
Ađe	Hore êste	Ew(m)	Rabû
Ême	Horê êstîmê	Em	Rabûn
Şime	Horê êstîdê	Hûn	Rabûn
Ađê	Horê êstê	Ew(pj)	Rabûn

♦ Heke nîşana raderiya lêkera pêwîst (yey) be, formul bi vî rengî ye:

- Kirde + ... + Koka dema borî ya lêkerê + Cînavên { ya/yanê, yey/yêy, -/ye, yêymê, yêydê, yê } + ...

Nimûne > Weşbîyeywe: Başbûn (Mebest saxbûna dubare ji nexweşiyekê ye)

Cînav	Lêkera Hewramî	Cînav	Lêkera Kurmancî
Min(n)	Weş bîyawê/bîyanêwe	Ez	(dîsa) sax bûm
Min(m)	Weşe bîyawê/bîyanêwe	Ez	(dîsa) sax bûm
Bi + l + dê = Bildê an jî lodê

B + az + dê = Bazdê

Kurmancî

Bi + xwîn + e = Bixwîne

B + î + e = Bîne

Bi + ç + in = Biçin

Bi + hêl + in = Bihêlin

Mînak:

Hewramî

Dersekeyt wane/biwane

Be min waçde/biwaçdê

Anîşa bare peym

Îney bere/bibere pey wêt

Bile/Luwe pey medresey

Megrewe!

Kurmancî

Dersa xwe bixwîne

Bi min bibêjin

Wan bîne bo min

Vî bibe ji xwe re

Here dibistanê

Negirî!

Beşa çarem: Lêkera fermanîya endîrekt

_ Heke lêkera fermanî bi koka dema niha û alîkariya pêşgira “*bi/b*” û paşgira “*e/dê*” çêbibe, lêkera fermanîya enkîrekt, bi alîkariya pêşgira “*bi/b*” û cînavên girêdayî yê cureyên duyem çêdibe. Jî forma neyînî ya wê jî bi alîkariya pêşgira “*ne/n*” çêdibe. Nimûne:

➤ Rêbaza çêkirina lêkera fermanî

♦ *Bi + Koka dema niha ya lêkerê + cînavên cureyên duyem*

Hewramî

Bi + wan + û = Biwanû

Bi + ker + î = Bikerî

B + az + o = Bazo

Bi + l + mê = Bilmê

Bi + nwîs + dê = Binwîsdê

Bi + waç + a = Biwaça

Kurmancî

Bi + xwîn + im = Bixwînim

Bi + k + î = Bikî

Bi + hêl + e = Bihêle (Ew)

Bi + ç + in = Biçin (Em)

Bi + nivîs + in = Binivîsin (Hûn)

Bi + bêj + in = Bibêjin (Ew)

➤ Neyînî: *Ne/N + Koka dema niha ya lêkerê + cînavên cureyên duyem*

Hewramî

Ne + wan + û = Newanû

Ne + ker + î = Nekerî

N + az + o = Nazo

Ne + l + mê = Nelmê

Ne + nwîs + dê = Nenwîsdê

Ne + waç + a = Newaça

Kurmancî

Ne + xwîn + im = Nexwînim

Ne + k + î = Nekî

Ne + hêl + e = Nehêle (Ew)

Ne + ç + in = Neçin (Em)

Ne + nivîs + in = Nenivîsin (Hûn)

Ne + bêj + in = Nebêjin (Ew)

- Dîsa sohbetên Hewramî de pêşqerta “*bi/b*” jî bo piraniya lêkeran nayê gotin û giranî dixine ser kîteya pêşîna lêkerê. Nimûne:

Hewramî

wan + û = wanû

Bi + ker + î = kerî

B + az + o = Bazo

Bi + l + mê = Bilmê

Bi + nwîs + dê = Binwîsdê

waç + a = waça

Kurmancî

Bi + xwîn + im = Bixwînim

Bi + k + î = Bikî

Bi + hêl + e = Bihêle (Ew)

Bi + ç + in = Biçin (Em)

Bi + nivîs + in = Binivîsin (Hûn)

Bi + bêj + in = Bibêjin (Ew)

Beşa çarem: Ferhengoka lêkeran

Arđey: Anîn

Aryay: Hatîn anîn

Berđey: Birin

Bestey: Bestin

Besyay/Bisyay: Hatîn bestin

Bêznay: Betilandin

Bêzyay: Betilîn

Birîqyaywe: Birîqîn

Biryay: Hatîn birin

Bîyey: Hebû, Bûn

Bořnay: Borrîn

Çikay/Tikay: Çikîn

Çiknay/Tiknay: Çikandin

Çikyay/Tikyay: Hatîn çikandin

Day: Dan

Diřnay: Dirrandin

Diryay: Hatîn dan

Diřyay: Hatîn dirrandin

Dîyay: Nêrîn

Dîyey: Dîtin

Dizyay: Hatîn dizîn

Dizyey: Dizîn

Êşay: Êşîn

Êşnay: Êşandin

Fařay: Guhertin

Fařyay: Hatîn guhertin

Fêrbîyey: Fêrbûn

Fêrkerđey: Fêrkirin

Fêrkiryay: Hatîn fêrkirin

Fîqnay: Fîkandin

Fiřay: Firîn

Fiřnay: Firandin

Gêlay: Gerîn

Gêlaywe: Vegerîn

Gêlnay: Gerandin

Gêlnaywe: Vegerandin

Gêlyay: Hatîn gerandin

Gêrtey: Girtin

Ginay: Ketin

Ginayre: Daketin

Girawnay: Giriyaandin

Gireway: Girîn

Girînay: Kelandin

Gîryay: Hatîn giritn

Giryay: Kelîn

Hařnay: Hêrandin

Hařyay: Hatîn hêrandin

Horçinyay: Hatîn hilçînîn

Horçinyey: Hilçînîn

Horêstey: Rabûn

Horêznay: Rakirin

Horêzyay: Hatîn rakirin

Jaway: Cûtin
Jawyay: Hatın cûtin
Jimaray/Jimartey: Hejmartin
Jinasay: Naskirin
Jinasnay: Dan nasîn
Jinasyay: Nasbûn
Jinyay/Ejnewyay: Hatın bihîstin
Jinyey/Ejnewtey: Bihîstin
Jîway: Jîyan
Jîwnay: Jîyandin
Jîwyay: Hatın jîyandin
Kaļay: Kalîn
Karkerdey: Karkirin
Kenney/Kendeay: Kolan
Kerdey: Kirin
Kêşay/Kêştey: Kişandin
Kêşyay: Hatın kişandin
Kewtey: Ketin
Kewteyre: Daketin
Kiryay: Hatın kirin
Kiway: Kutan
Kîyanay: Şandin
Kîyanyay: Hatın şandin
Kîyastey: Şandin
Koyay: Hatın kutan
Kuştey: Kuştin
Kuşyay: Hatın kuştin
Leqay: Leqîn

Lerzay: Lerizîn
Lerznay: Lerizandin
Lerzyay: Hatın lerizandin
Lêsay/Lêsaywe: Alastin
Lêstey/Lêsteywe: Alastin
Lêsyay/Lêsyaywe: Hatın alastin
Leweřay: Çerîn
Leweřnay: Çerandin
Leweřyay: Hatın çerandin
Likay: Zeliqîn
Liknay: Zeliqanidin
Likyay: Hatın zeliqanidin
Loçbîyey: Qurmiçîn
Mannay: Betilandin
Manyay: Betilîn
Mařay: Şikandin
Masay: Werimîn
Masnay: Werimandin
Masyay: Hatın werimandin
Meney: Man
Merdey: Mirin
Meřyay: Şikestin
Micyay: Hatın rijandin
Midirnay: Sekinandin
Midiryay: Hatın sekinandin
Midray: Sekinîn
Midrayre: Rawestan
Mirnay: Mirandin

Misay: Fêrbûn
 Misnay: Fêrkirin
 Misyay: Hatîn fêrkirin
 Mitey: Rijandin
 Naîay: Naîîn
 Nîşanday: Nîşandan
 Nîşnayre: Hatîn rûniştin
 Nîşteyare: Rûniştin
 Nîşteywe: Veniştin
 Niwîstey: Nivîsandin
 Niwîsyay: Hatîn nivîsandin
 Parêznay: Parastin
 Parêzyay: Hatîn parastin
 Persay: Pirsîn
 Qaŕkerdey: Qehirîn
 Qêrnay: Qîrîn
 Qetbîyey: Qetîn
 Qetkerdey: Qetandin
 Qewmnay: Qewimandin
 Qewmyay: Qewimîn
 Qirtnay: Jêkirin
 Qozay: Kuxîn
 Ŗaznaywe: Xemilandin
 Ŗazyaywe: Xemilîn
 Ŗemay: Revîn
 Ŗemnay: Revandin
 Ŗemyay: Hatîn revandin
 Ŗeqsay: Reqisîn
 Ŗêstey: Ristin

Ŗêsyay: Hatîn ristin
 Ŗêzay: Rizîn
 Ŗêznay: Rizandin
 Ŗiçyay: Cemidîn
 Şanay: Avêtin
 Sanay: Kirrîn
 Sanyay: Hatîn kirrîn
 Şaraywe/Şarteywe: Veşartin
 Şaryaywe: Hatîn veşartin
 Serfkerdey: Tewandin
 Serfkiryay/Serfyay: Tewîn
 Sîsbîyey: Çilmisîn
 Sîsnay: Çilmisandin
 Sîsyay: Hatîn çilmisandin
 Soçnay: Şewitandin
 Soçyay: Şewitîn
 Şortey/Şitey: Şûştin
 Şoryay: Hatîn şûştin
 Sotey: Şewitîn
 Taway: Karîn
 Tawnaywe: Helandin
 Tawyaywe: Helîn
 Temamnay/Temamkerdey: Qedandin
 Temamyay/Temambîyey: Qedîn
 Teqay: Teqîn
 Teqnay: Teqandin
 Teqyay: Hatîn teqandin
 Tersay: Tirsîn

Tersnay: Tirsandin
 Tezay: Tevizîn
 Teznay: Tevizandin
 Tornay: Xeyidandin
 Toryay: Xeyidîn
 Tûřebîyey: Hêrsbûn
 Verday: Berdan
 Verdiryay: Hatîn berdan
 Waçyay: Hatîn gotin
 Wanay/Wenay: Xwendin
 Wanay: Xwendin
 Wanyay: Hatîn xwendin
 Waray: Barîn
 Wardey: Xwarin
 Wardeywe: Vexwarin
 Warnay: Barandin
 Waryay: Hatîn barandin
 Wastey: Xwestin
 Watey: Gotin
 Wazyay: Hatîn xwestin
 Wînay: Dîtin
 Wînyay: Hatîn dîtin
 Wirastey: Dirûtin
 Wirazyay: Hatîn dirûtin
 Wiryay: Hatîn xwarin
 Wiryaywe: Hatîn vexwarin
 Wîyerdey: Buhurîn

Wîyernay: Buhurandin
 Wîyeryay: Hatîn buhurandin
 Xiletnay: Ewiqandin
 Xiletyay: Hatîn ewiqandin
 Xinîknay: Fetisandin
 Xinîkyay: Fetisîn
 Xiway: Kenîn
 Xiwaynay: Sebrkirin
 Xonay: Kenandin
 Xułkkerdey: Vexwendin
 Xulqay: Xuliqîn
 Xulqnay: Xuliqandin
 Xulqyay: Hatîn xuliqandin
 Yaway: Gihîştin
 Yawnay: Gihandin
 Yawyay: Hatîn gihandin
 Zanay: Zanîn
 Zanyay: Hatîn zanîn
 Zay: Zayîn
 Zinyay: Derkirin
 Zinyayre: Derkirin derve
 Zîyadîyey: Zêdebûn
 Zîyay: Derketin
 Zîyayre: Derketin derve

Lêker	Koka borî	Koka niha
Ardey ***	arđ	ar
Aryay ***	arya	ary
Berdey	berđ	ber
Bestey	best	bes
Besyay	besya	besy
Bêznay	bêzna	bêzn
Bêzyay	bêzya	bêzy
Birîqyaywe	birîqya...we	birîqy...we
Biryay	birya	biry
Bîyey	bî	b
Bîyey (hebûn)	bê	b/he
Bořnay	bořna	bořn
Çikay/Tikay	çika/tika	çik/tik
Çiknay/Tiknay	çikna/tikna	çikn/tikn
Çikyay/Tikyay	çikya/tikya	çiky/tiky
Day ***	da	đ
Diřnay	diřna	diřn
Diryay	dirya	diry
Diřyay	diřya	diřy
Dîyay***	dîya	đy
Dîyey	dî	wîn
Dizyay	dizî	diz
Dizyey	dizya	dizy
Êşay***	êşa	êş
Êşnay***	êşna	êşn
Fařay	fařa	fař
Fařyay	fařya	fařy

Lêker	Koka borî	Koka niha
Fêrbîyey	fêr bî	fêr b
Fêrkerdey	fêr kerđ	fêr ker
Fêrkiryay	fêr kiryā	fêr kiry
Fîqnay	fîqna	fîqn
Fiřay	fiřa	fiř
Fiřnay	fiřna	fiřn
Gêlay	gêla	gêl
Gêlaywe	gêla...we	gêl...we
Gêlnay	gêlna	gêln
Gêlnaywe	gêlna...we	gêln...we
Gêlyay	gêlya	gêly
Gêrtey	gêrt	gêr
Ginay	gina	gin
Ginayre	gina...re	gin...re
Girawnay	girawna	girawn
Gireway	girewa	girew
Girînay	girîna	girîn
Gîryay	gîrya	gîry
Giryay	giryā	giry
Hařnay	hařna	hařn
Hařyay	hařya	hařy
Horçinyay	hor çinya	hor çiny
Horçinyey	hor... çinî	hor çin
Horêstey***	horêst	hor êz
Horêznay***	hor...êzna	hor êzn
Horêzyay***	hor êzya	hor êzy

Lêker	Koka borî	Koka niha
Jaway	jawa	jaw
Jawyay	jawya	jawy
Jimaray/Jimartey***	jimara/jimart	jmar
Jinasay***	jinasa	jnas
Jinasnay***	jinasna	jnasn
Jinasyay	jinasyay	jnasy
Jinyay/Ejnewyay***	jinya/ejnewya	jnewy
Jinyey/Ejnewtey***	jinî/ejnewt	jnew
Jîway	jîwa	jîw
Jîwnay	jîwna	jîwn
Jîwyay	jîwya	jîwy
Kalay	kała	kał
Karkerdey	kar kerđ	kar ker
Kenney/Kendeý	kenn/kend	kenn
Kerdey	kerđ	ker
Kêşay/Kêştey	kêşa/kêşt	kêş
Kêşyay	kêşya	kêşy
Kewtey	kewt	gilêr/gin
Kewteyre	kewt...re	gin...re
Kiryay	kirya	kiry
Kiway	kiwa	kiw
Kîyanay	kîyana	kîyan
Kîyanyay	kîyanya	kîyany
Kîyastey	kîyast	kîyan
Koyay	koya	koy
Kuştey	kuşt	kuş
Kuşyay	kuşya	kuşy

Lêker	Koka borî	Koka niha
Leqay	leqa	leq
Lerzay	lerza	lerz
Lerznay	lerzna	lerzn
Lerzyay	lerzya	lerzy
Lêsay/Lêsaywe	lêsa/lêsa ...we	lêş/lêş...we
Lêstey/Lêsteywe	lêst/lêst ...we	lêş/lêş...we
Lêsyay/Lêsyaywe	lêşya/lêşya ...we	lêşy/lêşy...we
Leweřay	leweřa	leweř
Leweřnay	lewřna	leweřn
Leweřyay	leweřya	lewřy
Likay	lika	lik
Liknay	likna	likn
Likyay	likya	liky
Loçbîyey	loç bî	loç b
Mannay	manna	mann
Manyay	manya	many
Mařay	mařa	mař
Masay	masa	mas
Masnay	masna	masn
Masyay	masya	masy
Meney	men	men
Merđey	merđ	mir
Meřyay	meřya	meřy
Micyay	micya	micy
Midirnay	midirna	midirn
Midiryay	midiryay	midiry
Midray	midra	midr

Lêker	Koka borî	Koka niha
Midrayre	midra...re	midr...re
Mirnay	mirna	mirn
Misay	misa	mis
Misnay	misna	misn
Misyay	misya	misy
Mitey	mit	mic
Naîay	naîa	naî
Nîşanday***	nîşna da	nîşna d̄
Nîşnayre	nîşna...re	nîşn...re
Nîşteyre	nîşt...re	nîş...re
Nîşteywe	nîşt...we	nîş...we
Niwîstey***	niwîst	nwîs
Niwîsyay***	niwîsya	nwîsy
Parêznay	parêzna	parêzn
Parêzyay	parêzya	parêzy
Persay	persa	pers
Qařkerđey	qař kerđ	qař ker
Qêřnay	qêřna	qêřn
Qetbîyey	qet bî	qet b
Qetkerđey	qet kerđ	qet ker
Qewmnay	qewmna	qewmn
Qewmyay	qewmya	qewmy
Qozay	qoza	qoz
Řaznaywe	řazna...we	řazn...we
Řazyaywe	řazy...we	řazy...we
Řemay	řema	řem
Řemnay	řemna	řemn

Lêker	Koka borî	Koka niha
Řemyay	řemya	řemy
Řeqsay	řeqsa	řeqs
Řêstey	řêst	řês
Řêsyay	řêsy	řêsy
Řêzay	řêza	řêz
Řêznay	řêzna	řêzn
Řiçyay	řêçya	řêçy
Sanay	sana	san
Sanyay	sanya	sany
Serfkerđey	serf kerđ	serf ker
Serfkiryay/Serfyay	serf kirya/serfya	serd kiry/serfy
Sîsbîyey	sîs bî	sîs bî
Sîsnay	sîsna	sîsy
Sîsyay	sîsya	sîsy
Soçnay	soçna	soçn
Soçyay	soçya	soçy
Sotey	sot	soç
Şanay	şana	şan
Şaraywe/Şarteywe	şara...we/şart...we	şar...we
Şaryaywe	şarya...we	şary...we
Şortey/Şitey	şort/şit	şor
Şoryay	şorya	şory
Taway	tawa	taw
Tawnaywe	tawna...we	tawn...we
Tawyaywe	tawya...we	tawy...we
Temamnay/Temamkerđey	Temamna/temam kerđ	temamn/temam ker
Temamyay/Temambîyey	Temamya/temam bî	Temamy/temam b

Lêker	Koka borî	Koka niha
Teqay	Teqa	Teq
Teqnay	Teqna	Teqn
Teqyay	Teqya	Teqy
Tersay	Tersa	Ters
Tersnay	Tersna	Tersn
Tezay	Teza	Tez
Teznay	Tezna	Tezn
Tornay	Torna	Torn
Toryay	Toryay	Tory
Tûřebîyey	tûře bî	tûře b
Verday***	ver... da	ver đ
Verdiryay	ver dirya	ver dir
Waçyay***	waçya	waçy
Wanay/Wenay	wana/wena	wan/wen
Wanyay	wanya	wany
Waray	wara	war
Warđey	wardđ	wer
Warđeywe	wardđ...we	wer...we
Warnay	warna	warn
Waryay	warya	wary
Wastey	wast	waz
Watey	wat	waç
Wazyay	wazya	wazy
Wînay	wîna	wîn
Wînyay	wînya	wîny
Wirastey	wirast	wiraz
Wirazyay	wirazya	wirazy

Lêker	Koka borî	Koka niha
Wiryay	wirya	wiry
Wiryaywe	wirya...we	wiry...we
Wîyerdey	wîyerd	wîyer
Wîyernay	wîyerna	wîyern
Wîyeryay	wîyerya	wîyery
Xiletnay	xiletna	xiletn
Xiletay	xiletya	xilet
Xinîknay	xinîkna	xinîkn
Xinîkyay	xinîkya	xinîky
Xiway	xiwa	xiw/xo
Xiwaynay	xiwayna	xiwayn
Xonay	xona	xon
Xuĭkkerdey	xuĭk kerd	xuĭk ker
Xulqay	xulqa	xulq
Xulqnay	xulqna	xulqn
Xulqay	xulqya	xulqy
Yaway	yawa	yaw
Yawnay	yawna	yawn
Yawyay	yawya	yawy
Zanay	zana	zan
Zanyay	zanya	zany
Zinyay	zinya	
Zîyađbîyey	zîyađ bî	zîyađ b
Zîyay ***	zîya	zy
Zîyayre***	zîya...re	zy...re

- Lêkerên ku (***) heye, pêşgira (mi/m) heye.

Beşa çarem: Hin tişt

_ Berî ku em vê beşê biqedînin, bila hin xalên girîng werin gotin:

1_ Sê têngînên lêkera (*Bîyey*):

➤ Têgîna yekema vê lêkerê tê manaya (*Hebûn*)ê.

Dem	Min(n/m)	To(n/m)	Ađ	Ađe	Ême	Şime	Ađê
Borî	Bêna	Bênî	Bê	Bê	Bênme	Bêndê	Bênê
Kurmancî	Hebûm	Hebûy	Hebû	Hebû	Hebûn(em)	Hebûn(hûn)	Hebûn(ew)
Niha	Hena	Henî	Hen	Hene	Henme	Hendê	Henê
Kurmancî	Heme	Heyî	Heye	Heye	Hene(em)	Hene(hûn)	Hene(ew)

Forma neyînî ya wê jî wisa ye:

Dem	Min(n/m)	To(n/m)	Ađ	Ađe	Ême	Şime	Ađê
Borî	Nebêna	Nebênî	Nebê	Nebê	Nebênme	Nebêndê	Nebênê
Kurmancî	Nebûm	Nebûy	Nebû	Nebû	Nebûn(em)	Nebûn(hûn)	Nebûn(ew)
Niha	N: Nîyena M: Nîyêna	N: Nîyenî M: Nîyênî	Nîya	Nîyêne	Nîyênme	Nîyêndê	Nîyênê
Kurmancî	Ez nîn im Ez tune me	Tu nîn î Tu tune yî	Nîn e Tune	Nîn e Tune	Em nîn in Em tune ne	Hûn nîn in Hûn tune ne	Ew nîn in Ew tune ne

➤ Têgîna duyema vê lêkerê tê vê manayayê ku me tişkek hebe/nebe.

Dema bireser nêr be:

Dem	Min(n/m)	To(n/m)	Ađ	Ađe	Ême	Şime	Ađê
Borî	Bêm	Bêt	Bêş	Bêş	Bêma	Bêta	Bêşa
Kurmancî	Min hebû	Te hebû	Wî hebû	Wê hebû	Me hebû	We hebû	Wan hebû
Niha	Henim	Henit	Heniş	Heniş	Henma	Henta	Henşa
Kurmancî	Min heye	Te heye	Wî heye	Wê heye	Me heye	We heye	Wan heye

Dema bireser mê be:

Dem	Min(n/m)	To(n/m)	Ađ	Ađe	Ême	Şime	Ađê
Borî	Bêm	Bêt	Bêş	Bêş	Bêma	Bêta	Bêşa
Kurmancî	Min hebû	Te hebû	Wî hebû	Wê hebû	Me hebû	We hebû	Wan hebû
Niha	Henem	Henet	Heneş	Heneş	Henema	Heneta	Heneşa
Kurmancî	Min heye	Te heye	Wî heye	Wê heye	Me heye	We heye	Wan heye

Dema bireser pirjimar be:

Dem	Min(n/m)	To(n/m)	Ađ	Ađe	Ême	Şime	Ađê
Borî	Bênem	Bênêt	Bênêş	Bênêş	Bênêma	Bênêta	Bênêşa
Kurmancî	Min hebûn	Te hebûn	Wî hebûn	Wê hebûn	Me hebûn	We hebûn	Wan hebûn
Niha	Henem	Henet	Heneş	Heneş	Henema	Heneta	Heneşa
Kurmancî	Min heye	Te heye	Wî heye	Wê heye	Me heye	We heye	Wan heye

Forma neyînî ya wê jî wisa ye:

Dema bireser nêr be:

Dem	Min(n/m)	To(n/m)	Ađ	Ađe	Ême	Şime	Ađê
Borî	Nebêm	Nebêt	Nebêş	Nebêş	Nebêma	Nebêta	Nebêşa
Kurmancî	Min tunebû	Te tunebû	Wî tunebû	Wê tunebû	Me tunebû	We tunebû	Wan tunebû
Niha	Nîyam	Nîyat	Nîyaş	Nîyaş	Nîyama	Nîyata	Nîyaşa
Kurmancî	Min tune	Te tune	Wî tune	Wê tune	Me tune	We tune	Wan tune

Dema bireser mê be:

Dem	Min(n/m)	To(n/m)	Ađ	Ađe	Ême	Şime	Ađê
Borî	Nebêm	Nebêt	Nebêş	Nebêş	Nebêma	Nebêta	Nebêşa
Kurmancî	Min tunebû	Te tunebû	Wî tunebû	Wê tunebû	Me tunebû	We tunebû	Wan tunebû
Niha	Nîyênem	Nîyênêt	Nîyêneş	Nîyêneş	Nîyênema	Nîyêneta	Nîyêneşa
Kurmancî	Min tune	Te tune	Wî tune	Wê tune	Me tune	We tune	Wan tune

Dema bireser pirjimar be:

Dem	Min(n/m)	To(n/m)	Ađ	Ađe	Ême	Şime	Ađê
Borî	Nebênêm	Nebênêt	Nebênêş	Nebênêş	Nebênêma	Nebênêta	Nebênêşa
Kurmancî	Min tunebûn	Te tunebûn	Wî tunebûn	Wê tunebûn	Me tunebûn	We tunebûn	Wan tunebûn
Niha	Nîyênêm	Nîyênêt	Nîyênêş	Nîyênêş	Nîyênêma	Nîyênêta	Nîyênêşa
Kurmancî	Min tune ne	Te tune ne	Wî tune ne	Wê tune ne	Me tune ne	We tune ne	Wan tune ne

➤ Têgîna sêyema vê lêkerê tê manaya (*Bûyîn*)ê. Ji rewşekê bo rewşeke din.

Dem	Min(n/m)	To(n/m)	Ađ	Ađe	Ême	Şime	Ađê
Borî	Bîya=Bîyanê	N: Bîyey M: Bîyêy	Bî	Bîye	Bîyêymê	Bîyêydê	Bîyê
Kurmancî	Bûm	Bûy	Bû	Bû	Bûn(em)	Bûn(hûn)	Bûn(ew)
Niha	Bû	Bî	Bo	Bo	Bîmê	Bîdê	Ba
Kurmancî	Dibim	Dibî	Dibe	Dibe	Dibin(em)	Dibin (hûn)	Dibin (ew)

Forma neyînî ya wê jî wisa ye:

Dem	Min(n/m)	To(n/m)	Ađ	Ađe	Ême	Şime	Ađê
Borî	Nebîya= Nebîyanê	N: Nebîyey M: Nebîyêy	Nebî	Nebîye	Nebîyêymê	Nebîyêydê	Nebîyê
Kurmancî	Nebûm	Nebûy	Nebû	Nebû	Nebûn(em)	Nebûn(hûn)	Nebûn(ew)
Niha	Mebû	Mebî	Mebo	Mebo	Mebîmê	Mebîdê	Meba
Kurmancî	Nabim	Nabî	Nabe	Nabe	Nabin(em)	Nabin (hûn)	Nabin (ew)

2_ Cudahiya di navbera sê lêkerên (*Kewtey, Ginay, Gilêray*) de.

_ (Kewtey) û (Ginay) yek in û hevwatera (*Ketin*)a Kurmancî ne. Lê (Gilêray) tê watera bi erdê da ketin vê demê ku em dimeşin.

Lêker	Koka dema borî	Koka dema niha
Kewtey	Kewt	Gin
Ginay	Gina	Gin
Gilêray	Gilêra	Gilêr

Mînak:

Hewramî

Min neweş/e kewta

Min neweş/e ginû

Min ginanê dilû awekê

Min ginû dilû awekê

Min řemanê û gilêranê

Tersû biremû û dimayî bigilêrû

Kurmancî

Ez nexweş ketim

Ez nexweş dikevim

Ez ketim nava avê

Ez dikevim nava avê

Ez reviyam û ketim bi erdê da

Ditirsim birevim û paşê bikevim bi erdê da

3_ Bikaranîna (*Ewra, -ê: Birçî*) û (*Tejne, -ê: Tî*).

_ Ev du peyv bi du awayan tê gotin:

♦ Awayê yekem: *Kirde + ewra/tejne + cînavên cureyên yekem + a/n (a paş bêdeng, n paş bideng)*

Hewramî

Min ewram a

To ewrat a

Ađ/Ađe ewraş a

Ême ewrama n

Şime ewrata n

Ađe ewraşa n

Kurmancî

Ez birçî me

Tu birçî yî

Ew birçî ye

Em birçî ne

Hûn birçî ne

Ew birçî ne

Hewramî

Min tejnem a

To tejnet a

Ađ/Ađe tejneş a

Ême tejnema n

Şime tejneta n

Ađe tejneşa n

Kurmancî

Ez tî me

Tu tî yî

Ew tî ye

Em tî ne

Hûn tî ne

Ew tî ne

Forma neyînî ya wê: *Kirde + ewra/tejne + cînavên cureyên yekem + nîya*

Hewramî	Kurmancî	Hewramî	Kurmancî
Min ewram nîya	Ez ne birçî me	Min tejnem nîya	Ez ne tî me
To ewrat nîya	Tu ne birçî yî	To tejnet nîya	Tu ne tî yî
Ađ/Ađe ewraş nîya	Ew ne birçî ye	Ađ/Ađe tejneş nîya	Ew ne tî ye
Ême ewrama nîya	Em ne birçî ne	Ême tejnema nîya	Em ne tî ne
Şime ewrata nîya	Hûn ne birçî ne	Şime tejneta nîya	Hûn ne tî ne
Ađe ewraşa nîya	Ew ne birçî ne	Ađe tejneşa nîya	Ew ne tî ne

♦ Awayê duyem: *Kirde + (ewra, -ê/tejne, -ê) + (na, nî, a/n/ne, nmê, ndê, nê)*

Hewramî	Kurmancî	Hewramî	Kurmancî
Min(n) ewra na	Ez birçî me	Min(n) tejne na	Ez tî me
Min(m) ewrê na	Ez birçî me	Min(m) tejnê na	Ez tî me
To(n) ewra nî	Tu birçî yî	To(n) tejne nî	Tu tî yî
To(m) ewrê nî	Tu birçî yî	To(m) tejnê nî	Tu tî yî
Ađ ewra n	Ew birçî ye	Ađ tejne n	Ew tî ye
Ađe ewrê ne	Ew birçî ye	Ađe tejnê ne	Ew tî ye
Ême ewrê nmê	Em birçî ne	Ême tejnê nmê	Em tî ne
Şime ewrê ndê	Hûn birçî ne	Şime tejnê ndê	Hûn tî ne
Ađe ewrê nê	Ew birçî ne	Ađe tejnê nê	Ew tî ne

Forma neyînî ya wê: *Kirde + ewra/tejne + cînavên cureyên yekem + nîya*

Hewramî	Kurmancî	Hewramî	Kurmancî
Min ewra nîye na	Ez ne birçî me	Min tejne nîye na	Ez ne tî me
Min ewrê nîyê na	Ez ne birçî me	Min tejnê nîyê na	Ez ne tî me
To ewra nîye nî	Tu ne birçî yî	To tejnet nîye nî	Tu ne tî yî
To ewrê nîyê nî	Tu ne birçî yî	To tejnê nîyê nî	Tu ne tî yî
Ađ ewra nîya	Ew ne birçî ye	Ađ tejne nîya	Ew ne tî ye
Ađe ewrê nîyê ne	Ew ne birçî ye	Ađe tejnê nîyê ne	Ew ne tî ye
Ême ewrê nîyê nmê	Em ne birçî ne	Ême tejnê nîyê nmê	Em ne tî ne
Şime ewrê nîyê ndê	Hûn ne birçî ne	Şime tejnê nîyê ndê	Hûn ne tî ne
Ađe ewrê nîyê nê	Ew ne birçî ne	Ađe tejnê nîyê nê	Ew ne tî ne

4_ Piraniya lêkerên pasîf di Hewramî de wisa çêdibin.

- *Koka dema niha ya lêkerê + ya + y*
- *Elbet hin car şekilê koka dema niha ya lêkerê kêmek diguhere.*

Mînak:

Hewramî

Ardey > Koka dema niha > ar > aryay
Berdey > Koka dema niha > ber > biryay
Bestey > Koka dema niha > bes > besyay
Day > Koka dema niha > d̄ > diryay
Dizyey > Koka dema niha > diz > dizyay
Fařay > Koka dema niha > fař > fařyay
Jaway > Koka dema niha > jaw > jawyay
Jîway > Koka dema niha > jîw > jîwyay
Kerdey > Koka dema niha > ker > kiryay
Kêştey > Koka dema niha > kêş > kêşyay
Kiway > Koka dema niha > kiw > koyay
Kîyanay > Koka dema niha > kîyan > kîyanyay
Kuştey > Koka dema niha > kuş > kuşyay
Niwîstey > Koka dema niha > nwîs > niwîsyay
Sanay > Koka dema niha > san > sanyay
Şortey/Şitey > Koka dema niha > şor > şoryay
Wanay > Koka dema niha > wan > wanyay
Waray > Koka dema niha > war > waryay
Wînay > Koka dema niha > wîn > wînyay

Kurmancî

Hatin anîn
Hatin birin
Hatin bestin
Hatin dayîn
Hatin dizîn
guherîn
Hatin cûtin
Hatin jîyandin
Hatin kirin
Hatin kişandin
Hatin kutan
Hatin şandin
Hatin kuştin
Hatin nivîsandin
Hatin kirrîn
Hatin şûştin
Hatin xwendin
Hatin barandin
Hatin dîtin

5_ Hoş şîyey.

_ Ev peyv hevwatera (jibîrkirin)a Kurmancî ye. (Hoş) tê watera (bîr,hiş) û (şîyey) jî tê watera (çûn). Ango bi giştî yanî (jibîrkirin/ jibîrçûn).

Hewramî

Hoşit neşo

Hoşm a ke to par liway pey degê

Hoşm nimê ke to par liway pey degê

To a çîwet hoş şîyen

To a çîwet hoş şîyenwe/şîyeno

Hoşta wêta bo/ ce wêta bo

Ba îneyç barmê neka hoşma bişo

Kurmancî

Tu ji bîr nekî!

Tê bîra min ku tu par çûy gund

Nayê bîra min ku tu par çûy gund

Te ew tişt ji bîr kiriye

Te dîsa ew tişt ji bîr kiriye

Miqatê xwe bin

Bila em vî jî bînin ne ku em vî ji bîr bikin

6_ Gerek.

_ Ev peyv gelek karanîn hene. Bi pîranî tê watera xwestinê û viyan.

Hewramî

Gerekm a bilû

Gerekt a çêş kerî

Gerekş a aney waço

Aneyma gerek nîya

Çêşta gerek a?

Gerekş a bê pase kera

Kurmancî

Ez dikim herim

Te divê çi bikî

wê/wî divê/dike wî tiştî bêje

Em wê naxwazin

We çi divê?

Wan dixwest ku wisa bikin

7_ Cudahiya du lêkerên (şîyey) û (liway).

_ Dema ku em bixwazin (çûn)ê, li wateya meşîn û çûn bi rê da bi kar bînin, em lêkera (liway) bi kar tînin. Nimûne:

Hewramî	Kurmancî
Min liwanê/milû	Ez çûm/diçim
To liway/milî	Tu çûy/diçî
Ađ liwa/milo	Ew çû/diçe
Ađe liwa/milo	Ew çû/diçe
Ême liwaymê/milmê	Em çûn/diçin
Şime liwaydê/mildê	Hûn çûn/diçin
Ađe liwê/mila	Ew çûn/diçin

_ Lê heke em bixwazin (çûn)ê, li wateyeke din mîna ji dest çûn bikarbînin, em lêkera (şîyey) bi kar tînin. Nimûne:

Hewramî	Kurmancî
Ce des şî/şîye	Ji dest çû
Ba ce des neşo	Bila ji des neçe

_ Jî wateyeke din a (şîyey) heye ku havwateya (şibîn)a Kurmancî ye. Bi vê ferqê ku paş navdêrê tê. Jî dibe ku (ce) jî were. Nimûne:

Hewramî	Kurmancî
Min to mişû = Min ce to mişû	Ez dişibim te
To ađî mişî = To ce ađî mişî	Tu dişibî wî
Ađ ađe mişo = Ađ ce ađe mişo	Ew dişibe wê
Ême şime mişmê = Ême şime mişmê	Em dişibin we
Şime ađîşa mişdê = Şime ce ađîşa mişdê	Hûn dişibin wan
Ađe kê mişa = Ađe ce kê mişa	Ew dişibe kê

8_ Du lêkerên (*mişyay*) û (*icyay*).

_ Mişyay hevwatera (viyan,vîn)a Kurmancî ku wek (işyay) jî tê nivîsandin.

Hewramî	Kurmancî
Mişo/Işo bey	Divê bêy
Meşo bey	Divê bêy e

_ (icyay) dikare çend waterên xwe hebin. Lêkereke ku bi şik re ye.

1- Wisa fikirîn/Textmînkirin :

Hewramî	Kurmancî
Icom pase bo	Wisa difikirim/Textmîn dikim ku wisa be
Icyanit pase n?	Te wisa fikiriye ku wisa ye?

2- Wisa hatin dîtin:

Hewramî	Kurmancî
Ico nimênê	Wisa tê dîtin ku ew nayên

9_ Xerîk:

_ Hewwatera wê ya Kurmancî hema (mijûl) e. Ango em mijûlî karekî ne. Nimûne:

Hewramî	Kurmancî
Xerîkû/Xerîkew çêşî nî	Tu mijûlî çi yî?/ Niha çi dikî?
Xerîkû/Xerîkew hermana na	Mijûlî karan im.
+ Dey bo. _ Dey xerîk/e na	+ De were. _ De va tîm. (Ez niha va ye tîm, Mijûlî hatinê me

_ Ev peyv di lêkera dema niha ya diyar jî tê. Nimûne:

Hewramî	Kurmancî
Xerîk na mew = Xerîk na may mew = May mew	Ez va tîm
Xerîke na mew = Xerîke na may mew = May mew	Ez va tîm

Beşa pên cem

Beşa pêncem: Hevokên şertî

_ Yek ji girîngtirîn beşên rêzimana her zimanî hevokên şertî yên wî zimanî ne. Van hevokan bi gelemperî xwedan formul in. Di Soranî de bi qasî ku min dîtiye ji bo van hevokan du formulên giştî hene. Yek ji wan ya standard e ku li bajarên wek Hewlêr, Mehabad û hwd tê bikaranîn. Yek ji wan jî li bajarên wek Seqiz, Merîwan, Sine û hwd tê bikaranîn. Elbet ev du rêbez ji bo hin lêkeran eynî ne. Nimûne:

Soranî

Standard: Eger min nawî tom negutiba

Devkîya rojhilatî: Eger min naw tom newitayê

Kurmancî

Ger min navê te negota

Ger min navê te negota

Mînakeke din:

Soranî

Standard: Xozga/Birya to hatîtaye

Devkîya rojhilatî: Xozga to hatayî

Kurmancî

Xwezî tu hatiba

Xwezî tu hatiba

_ Min xwest bibêjim ku di Hewramî de jî cudahiya çêkirina hevokên şertî heye û bi sê awayan tê dîtin. Nimûne:

Hewramî

Jawero: Eger ême watayama

Lehon: Eger ême watayêma

Hewraman Text: Eger ême watêma

Kurmancî

Eger me bigota

Eger me bigota

Eger me bigota

Mînakeke din:

Hewramî

Jawero: Eger şime liwayandê

Lehon: Eger şime liwayêndê

Hewraman Text: Eger şime liwêndê

Kurmancî

Eger hûn biçûna

Eger hûn biçûna

Eger hûn biçûna

_ Hûn dibînin ku bingeha sereke ya lêkerê di her sê devokan de sabit e û tenê formula çêkirina şertî ji hev cuda ye. Di vê beşê de em ê hevokên şertî yên her sêyan hîn bibin û ji bo her sê jî mînakan bixwînin.

_ Me berê lêkerên pêwîst û gerguhêz û nasnavên van xwendin. Zanîna nasnavên lêkerên pêwîst û gerguhêz li vir jî pir girîng e ji ber ku li vir jî nasnavên pêwîst û gerguhêz ji hev cuda ne.

Nimûne:

Lêkera pêwîst:

Hewramî

Jawero: Weşlê ême azadê bîyayanmê

Lehon: Weşlê ême azadê bîyayênmê

Hewraman Text: Weşlê ême azadê bîyênmê

Kurmancî

Xwezî em azad bûna

Xwezî em azad bûna

Xwezî em azad bûna

Lêkera gerguhêz:

Hewramî

Jawero: Eger ême tawayma

Lehon: Eger ême tawayêma

Hewraman Text: Eger ême tawêma

Kurmancî

Eger me bikariba

Eger me bikariba

Eger me bikariba

- Me berê hemiya nasnavên lêkerên pêwîst û gerguhêz û cudahiya li navbera wan xwendibûn. Elbet me xwend ku ev cudahî ji bo dema borî ya lêkeran e û nasnavên dema niha ya lêkeran eynî ne. Hûn dikarin vegerin (cînav) û dîsa cînav û nasnavên lêkeran bixwînin.
- Lê niha werin em rêbaza çêkirina hevokên şertî di Hewramî û devokên wê de bixwînin û fêr bibin. Di rûpelên din de awayê çêkirina şertî li devokên Jaweroyî, Lehon û Textî hatiye nivîsandin:

Hevokên şertî li devoka Jaweroyê:

➤ Ji bo lêkerên pêwîst:

1- Heke nîşana raderiya lêkerê (y) be, formul bi vî rengî ye:

- *koka dema borî + ya + (na / nî / --- / nmê / ndê / nê)*

Hewramî

Amay

➤ **ama + ya + (na / nî / --- / nmê / ndê / nê)**

min amayana

to amayanî

ađ/ađe amaya

ême amayanmê

şime amayandê

ađe amayanê

Kurmancî

Hatin

ez hatibama

tu hatibayî

ew hatiba

em hatibana

hûn hatibana

ew hatibana

2- Heke nîşana raderiya lêkerê (ey) be, formul bi vî rengî ye:

- *koka dema borî + aya + (na / nî / --- / nmê / ndê / nê)*

Hewramî

Witey

➤ **wit + aya + (na / nî / --- / nmê / ndê / nê)**

min witayana

to witayanî

ađ/ađe witaya

ême witayanmê

şime witayandê

ađe witayanê

Kurmancî

Raketin/Razan

ez raketibama

tu raketibayî

ew raketiba

em raketibana

hûn raketibana

ew raketibana

3- Heke nîşana raderiya lêkerê (yey) be, formul bi vî rengî ye:

- *koka dema borî + yaya + (na / nî / --- / nmê / ndê / nê)*

Hewramî

Bîyey

- **bî + yaya + (na / nî / --- / nmê / ndê / nê)**

min bîyayana

to bîyayanî

ađ/ađe bîyaya

ême bîyayanmê

şime bîyayandê

ađe bîyayanê

Kurmancî

Bûyîn

ez bûma

tu bûyayî

ew bûya

em bûna

hûn bûna

ew bûna

- **Ji bo lêkerên gerguhêz:**

1- Heke nîşana raderiya lêkerê (y) be, formul bi vî rengî ye:

- *koka dema borî + ya + (m / t / ş / ma / ta / şa)*

Hewramî

Zanay

- **zana + ya + (m , t , ş , ma , ta , şa)**

min zanayam

to zanayat

ađ/ađe zanayaş

ême zanayama

şime zanayata

ađe zanayaşa

Kurmancî

Zanîn

min zanibûya

te zanibûya

wî/wê zanibûya

me zanibûya

we zanibûya

wan zanibûya

2- Heke nîşana raderiya lêkerê (ey) be, formul bi vî rengî ye:

- *koka dema borî + aya + (m / t / ş / ma / ta / şa)*

Hewramî

Watey

➤ **wat + aya + (m , t , ş , ma , ta , şa)**

min watayam

to watayat

ađ/ađe watayaş

ême watayama

şime watayata

ađe watayaşa

Kurmancî

Gotin

min bigota

te bigota

wî/wê bigota

me bigota

we bigota

wan bigota

3- Heke nîşana raderiya lêkerê (yey) be, formul bi vî rengî ye:

- *koka dema borî + yaya + (m / t / ş / ma / ta / şa)*

Hewramî

Dîyey

➤ **dî + yaya + (m , t , ş , ma , ta , şa)**

min dîyayam

to dîyayat

ađ/ađe dîyayaş

ême dîyayama

şime dîyayata

ađe dîyayaşa

Kurmancî

Dîtin

min bidîta

te bidîta

wî/wê bidîta

me bidîta

we bidîta

wan bidîta

Hevokên şertî li devoka Lehonê:

➤ Ji bo lêkerên pêwîst:

1- Heke nîşana raderiya lêkerê (y) be, formul bi vî rengî ye:

- *koka dema borî + yê + (na(nan) / nî / --- / nmê / ndê / nê)*

Hewramî

Liway

➤ **liwa + yê + (na / nî / --- / nmê / ndê / nê)**

min liwayêna

to liwayênî

ađ/ađe liwayê

ême liwayênmê

şime liwayêndê

ađe liwayênê

Kurmancî

Çûn

ez biçûma

to biçûya

ew biçûya

em biçûna

hûn biçûna

ew biçûna

2- Heke nîşana raderiya lêkerê (ey) be, formul bi vî rengî ye:

- *koka dema borî + ayê + (na / nî / --- / nmê / ndê / nê)*

Hewramî

Wîyerdey

➤ **wîyerđ + ayê + (na(nan) / nî / --- / nmê / ndê / nê)**

min wîyerđayêna

to wîyerđayênî

ađ/ađe wîyerđayê

ême wîyerđayênmê

şime wîyerđayêndê

ađe wîyerđayênê

Kurmancî

Derbas bûn / Buhurîn

ez derbas bûma

tu derbas bûya

ew derbas bûya

em derbas bûna

hûn derbas bûna

ew derbas bûna

3- Heke nîşana raderiya lêkerê (yey) be, formul bi vî rengî ye:

- *koka dema borî + yayê + (na / nî / --- / nmê / ndê / nê)*

Hewramî

Bîyey

- **bî + yayê + (na(nan) / nî / --- / nmê / ndê / nê)**

min bîyayêna

to bîyayênî

ađ/ađe bîyayê

ême bîyayênme

şime bîyayêndê

ađe bîyayênê

Kurmancî

Bûyîn

ez bûma

tu bûyayî

ew bûya

em bûna

hûn bûna

ew bûna

➤ Ji bo lêkerên gerguhêz:

1- Heke nîşana raderiya lêkerê (y) be, formul bi vî rengî ye:

- *koka dema borî + yê + (m / t / ş / ma(man) / ta(tan) / şa(şan))*

Hewramî

Wanay

- **wana + yê + (m , t , ş , ma , ta , şa)**

min wanayêma

to wanayêt

ađ/ađe wanayêş

ême wanayêma

şime wanayêta

ađe wanayêşa

Kurmancî

Xwendin

min xwendiba

te xwendiba

wî/wê xwendiba

me xwendiba

we xwendiba

wan xwendiba

2- Heke nîşana raderiya lêkerê (ey) be, formul bi vî rengî ye:

- *koka dema borî + ayê + (m / t / ş / ma(man) / ta(tan) / şa(şan))*

Hewramî

Arđey

➤ **arđ + ayê + (m , t , ş , man , tan , şan)**

min arđayê**m**

to arđayê**t**

ađ/ađe arđayê**ş**

ême arđayê**ma**

şime arđayê**ta**

ađe arđayê**şa**

Kurmancî

Anîn

min anî**ba**

te anî**ba**

wî/wê anî**ba**

me anî**ba**

we anî**ba**

wan anî**ba**

3- Heke nîşana raderiya lêkerê (yey) be, formul bi vî rengî ye:

- *koka dema borî + yayê + (m / t / ş / ma(man) / ta(tan) / şa(şan))*

Hewramî

Bîyey

➤ **bî + yayê + (m , t , ş , man , tan , şan)**

min bîyayê**m**

to bîyayê**t**

ađ/ađe bîyayê**ş**

ême bîyayê**ma**

şime bîyayê**ta**

ađe bîyayê**şa**

Kurmancî

Hebûn

min hebû**ya**

te hebû**ya**

wî/wê hebû**ya**

me hebû**ya**

we hebû**ya**

wan hebû**ya**

Hevokên şertî li devoka Hewraman Textê:

➤ Ji bo lêkerên pêwîst:

1- Heke nîşana raderiya lêkerê (y) be, formul bi vî rengî ye:

- *koka dema borî bêyî(a) + ê + (na / nî / --- / nmê / ndê / nê)*

Hewramî

Xiway

- **xiwa + ê + (na / nî / --- / nmê / ndê / nê)**

min xiwêna

tu xiwênî

ađ/ađe xiwê

ême xiwênmê

şime xiwêndê

ađe xiwênê

Kurmancî

Kenîn

ez bikeniyama

tu bikeniyayî

ew bikeniya

em bikeniyana

hûn bikeniyana

ew bikeniyana

2- Heke nîşana raderiya lêkerê (ey) be, formul bi vî rengî ye:

- *koka dema borî + ê + (na / nî / --- / nmê / ndê / nê)*

Hewramî

Kewtey

- **kewt+ ê + (na / nî / --- / nmê / ndê / nê)**

min kewtêna

to kewtênî

ađ/ađe kewtê

ême kewtênmê

şime kewtêndê

ađe kewtênê

Kurmancî

Ketin

ez ketibama

tu ketibayî

ew ketiba

em ketibana

hûn ketibana

ew ketibana

3- Heke nîşana raderiya lêkerê (yey) be, formul bi vî rengî ye:

- *koka dema borî + yê + (na / nî / --- / nmê / ndê / nê)*

Hewramî

Şîyey

- **Şî + yê + (na / nî / --- / nmê / ndê / nê)**

min şîyêna

to şîyênî

ađ/ađe şîyê

ême şîyênme

şime şîyêndê

ađe şîyênê

Kurmancî

Çûyîn

ez biçûma

tu biçûya

ew biçûya

em biçûna

hûn biçûna

ew biçûna

➤ Ji bo lêkerên gerguhêz:

1- Heke nîşana raderiya lêkerê (y) be, formul bi vî rengî ye:

- *koka dema borî bêyî(a) + ê + (m / t / ş / ma / ta / şa)*

Hewramî

Zanay

- **zan + ê + (m , t , ş , ma , ta , şa)**

min zanêma

to zanêta

ađ/ađe zanêş

ême zanêma

şime zanêta

ađe zanêşa

Kurmancî

Zanîn

min bizaniya

te bizaniya

wî/wê bizaniya

me bizaniya

we bizaniya

wan bizaniya

2- Heke nîşana raderiya lêkerê (ey) be, formul bi vî rengî ye:

- *koka dema borî + ê + (m / t / ş / ma / ta / şa)*

Hewramî

Kerđey

➤ **kerđ + ê + (m , t , ş , ma , ta , şa)**

min kerđê^m

to kerđê^t

ađ/ađe kerđê^ş

ême kerđê^{ma}

şime kerđê^{ta}

ađe kerđê^{şa}

Kurmancî

Kirin

min bikira

te bikira

wî/wê bikira

me bikira

we bikira

wan bikira

3- Heke nîşana raderiya lêkerê (yey) be, formul bi vî rengî ye:

- *koka dema borî + yê + (m / t / ş / ma / ta / şa)*

Hewramî

Çîryey

➤ **çîř + yê + (m , t , ş , ma , ta , şa)**

min çîřyê^m

to çîřyê^t

ađ/ađe çîřyê^ş

ême çîřyê^{ma}

şime çîřyê^{ta}

ađe çîřyê^{şa}

Kurmancî

Gazîkirin

min gazî bikira

te gazî bikira

wî/wê gazî bikira

me gazî bikira

we gazî bikira

wan gazî bikira

_ Xalên hevokên şertî:

- Heger we bala xwe dabe ser avakirina hevokên şertî yên di sê devokan de, divê we dîtibe ku ev hevok di devoka Hewraman Textî de hinekî kurttir in. Lê ev kurtî di destpêkê de ji bo kesên ku Hewramî hîn dibin hinekî dijwar dibe. Ji ber ku dikare bi çend dem û têngên din re were tevlihevkirin. Bo nimûne:

Hewramî

ême liwênme

ême liwênme

ême liwênme

Kurmancî

em diçûn

em çûne

em biçûna

Ev tevlihevkirin dê bi dem û pratîkê re pir zû çareser bibe. Lê şîreta me ev e ku hevokên şertî yên her sê devokan fêr bibin ji ber ku di axaftinên Hewramî de tenê ev sê cureyên avakirina hevokên şertî hene û cureyekî din ê avakirina wê tune ye. Elbet hevokên şertî yên hin helbestan cuda ne. Jî vê xala girîng bizanibin ku di hevokên şertî de giranî dikeve ser kêteya pêşîn. Nimûne:

Hewramî

ême liwênme

ême liwênme

ême liwênme

merđêna

merđêna

Kurmancî

em diçûn

em çûne

em biçûna

ez(m) mirîme

ez(n/m) bimira

- Me berê xwend ku di Hewramî de ji bo lêkerên gerguhêz ên borî, heke bireser di hevokê de were gotin an nivîsandin, dê nasnavê lêkerê bi bireserê ve tê girêdan û heke neyê gotin an nivîsandin, dê nasnav bi lêkerê ve tê girêdan. Nimûne:

Hewramî

Min wanam

Min kitêbim wana

Kurmancî

Min xwend

Min pirtûk xwend

Di hevokên şertî de jî wisa ye. Ango heke bireser hebe nasnav bi wê ve tê girêdan û heke nebe jî nasnav bi lêkerê ve tê girêdan. Nimûne:

Hewramî

Min wanayam

Min kitêbim wanaya

♦ Hewraman Textî: Wanê /// Lehonî: Wanayê

Kurmancî

Min xwendiba

Min pirtûk xwendiba

- Jî du peyvên ku ji bo hevokên şertî bi kêr tên û hevwater yên peyvên *xwezî*, *xwezîka*, *xwezila* û hwd in, *weşlê*(*weşle*, *weşley*) û *şellay*(*şella*, *şela*, *şelay*) ne.
- Di Hewramî de taybetmendiyeke hevokên şertî heye ku ji ya Kurmancî cuda ye. Bo nimûne:

Hewramî

Eger to watayat, minîç êna.

Kurmancî

Ger te gotibûya, ez ê jî hatibama.

We dît ku beşa duyem a hevoka şertî wek Kurmancî nîn e. Bi vî rengî ku di Hewramî de û di vê hevokê de lêkera beşa duyem a hevoka şertî, çîrokîya dema niha ye. Heke em bixwazin hevwateryeke wê ya Kurmancî çêbikin ji aliyê rêzimanî ve xelet e lê em ji bo têgihîştineke baştir vebêjin:

Eger to watayat, minîç êna.

Ger te gotibûya, ez jî dihatim.

Xala giştî ev e ku di Kurmancî de heke beşa yekem a hevokê, şertî be ew bandor li beşa duyem a hevokê dike lê di Hewramî de û Soranî de wisa nîn e û her beş ji ya din cuda ye û her beş dikare jixwe şertî be.

- Ji bo xala dawîn ku pir girîng e, ev e ku avakirina hevokên şertî yên dema niha wek Kurmancî ye. Nimûne:

Hewramî

Eger ême beymê şimeyç meydê?

Er waran biwaro şime çêş kerdê?

Kurmancî

Ger em werin hûn jî tên?

Heke baran bibare hûn çi dikin?

Mînakên hevokên şertî:

- 1- Eger to karû wêt zûter temamnaya, to welû min liwênî.
Eger te karê xwe zûtir biqedanda, tuyê berî min biçûya.
- 2- Eger tatem hîzî amaya, birakem řane wînêş.
Eger bavê min doh hatibûya, dê birayê min di rê de wî bidîta.
- 3- Eger cilekam tazê bîyayanê, min weşleter/e bêna.
Eger cilên min nû bûna, ez ê xweşiktir bûma.
- 4- Weşley řiwê min Sarînam dîyaya.
Xwezî rojekê min Sarîna bidîta.
- 5- Şelay to zeřit ardaya.
Xwezî te pere anîbûya.
- 6- Şelay (ême) řemayanmê, îtir waran terêma nekerê.
Xwezîka em revîyabûna, êdî baranê me şil nekira.
- 7- Eger werwe waraya ême nênmê.
Eger berf barîbûya em ê nehatibana.
- 8- Egr ça bîyayandê, netawê gêrom(bigêrom).
Ku (hûn) li wir bûna, wî/wê nedikarî min bigirta.
- 9- Eger ađ/ađe newastayaş, min nelêna.
Eger wî/wê nexwesta, ez ê neçûma.
- 10- Şelay nanit arđaya ta minîç nanim wardaya.
Xwezî te nan anîbûya da ku min jî nan bixwara.

11-Şelay çemêm korê bîyayanê û min tom çî hâlîne nedîyaya.

Xwezî çavên min kor bûna û min tu di vî halî de nedîta.

12- Eger to amayanî, min yardît dêna.

Eger tu bihata, min ê alîkarîya te bikira.

13- Lazim bê bilo.

Lazim bû biçûya.

14- Çî nastit bê, ba amaya û qisêş kerdaya û zanayama çêş maço.

Çima (te) nehêla (ew) were,bila bihata û biaxiviya û me yê bizaniya ku çî dibêje.

15- Mişyaya /Weşlê amayanê û tawayama adîşama dîyaya.

Diviya /Xwezî (ew) hatibana û (me) bikariba wan bidîta.

16- Weşlê waran newaraya, ême cilekaw wêma wişkê kerdawawe.

Xwezî baran nebarîya, me yê kincên xwe ziwa bikirana.

17- Eger diliş wastayaş, liwê.

Heke dilê wê/wî bixwesta, (ew ê) biçûya.

18- Eger adê zanayaşa, be min waçênê.

Eger wan zanîbûya, wan ê ji min re bigotana.

19- Eger pîrê nebîyayandê, şime kîyanêna.

Eger (hûn) ne kal bûna, min ê we bişanda.

20- Weşlê min dewlemend/e bîyayana, wînenî ke çinne yardît dêna.

Xwezî ez dewlemend bûma, te yê bidîta ka min çiqas alîkarîya te bikira.

21-Eger pîyazîma wardaya, biwe ji demîma ê.

Eger me pîvaz bixwara, dê bêhn ji devê me bihata.

22- Weşlê çê bîyaya, goranîyê kurdîyê waçê peyma.

Xwezî ew li vir bûya, wî yê stranên kurdî ji me re bigota.

23- Eger dêr nebîyaya, menênawe.

Heke dereng nebûya, dê bimama.

24- Eger amayandê, liwênemê pey keşî.

Heke (hûn) hatibana, em ê biçûna çîyê.

25- Er tifengim bîyaya, heşekê kuşêna.

Ger min tifing hebûya, min ê hirç bikuşt.

26-Lazim bê řasî waço.

Lazim bû rastî gotiba.

27- Weşlê kurdê yotirînîşa gêrtaya û îtir bindesê nebîyayanmê.

Xwezîka kurd hevdu bigirtana û êdî (em) bindest nebûna.

28-Eger to newatayat penem, a masawe genê werêna û neweş/e ginêna.

Eger te ji min re negota, min ê ew masîyê genî xwariba û nexweş ketibama.

29-Şelay ce min persayat.

Xwezî (te) ji min bipirsîya.

30-Weşlê min pelewêrêw bîyayana fiřayana serû keşî.

Xwezî ez teyrek bûma bifirîma ser çîya.

31-Mişyayê (ad/ade) paseş kerdayê.

Diviya wî/wê wisa bikira.

32-Şellay minîç tom dîyaya.

Xwezî min jî te bidîta.

33-Weşlê êşew to amayênî.

Xwezî îşev tu bihata.

34-Şellay minîç dîyayê.

Xwezî min jî bidîta.

35-Êz kerêna ke îse mamosa bîyayêna.

Min hez dikir ku niha mamoste bûma.

36- Eger î awê temîse bîyayê, werênaşwe.

Ger ev av paqij bûya, min ê wê vexwara.

37- Eger ad be dengî berzî qisêş kerdayê, jinyênaş.

Eger wî bi dengê bilind xeber dabûya, min ê wî bibihîsta.

38- Eger ad adîş dîyaya, adî berê pey şarî.

Eger wî ew bidîta, (wî yê) ew bibira bajêr.

39- Ger ade dariwekaw wêş wardayê, zûter xase bêwe.

Eger wê dermanên xwe xwaribûya, ew ê zûtir baş bûya.

40- Er awekê anne germe nebîyayê, min desaw wêm nesoçnêna.

Ger av ewqas germ nebûya, min ê destên xwe neşewitandana.

41-Weşlê gicîyeke anne giran nebîyayê ta sanayê.

Xwezî fistan ewqas buha nebûya da ku min ê bikirîya.

42-Eger bereke xas besyabîyayê, dizeke nê dilû yaney.

Eger derî baş girtîbûya, wê diz nehatiba hundirê malê.

43-Er maşînma sanayê, liwênme şarekaw terû Kurdîstanîne gêlênme.

Ger me erebe kirrîbûya, (em) dê biçûna di bajarên din ên Kurdistanê de bigeriyana.

44- Eger to a kitêbeyte dayê, min gêrênaş.

Ger te ev pirtûk bidaya, min ê ew bigirta.

45-Eger kurdê wêwiresê nebîyayênê, îtir îse emeyç welatma bê.

Heke ne kurdên xwefiroş bûna, êdî niha me jî wilat hebûya.

46-Eger min gerekim bîyayê, ađ dêm pene.

Ger min biviya, wî yê bidaya min.

47-Eger ađe dersû wêş wanayê, kinaçêyêwey jîre bê.

Eger wê dersa xwe bixwenda, dê keçeke jîr bûya.

48-Eger zimsanû parî werwe warayê, êsal deşt û ko řengînê bênê.

Ger zivistana par berf bibariya, dê îsal deşt û çîya rengîn bûna.

49-Çî aro hewa germ nebê ta wêma wistayê dilû hesêlekey.

Çima îro hewa germ nebû ka em xwe biavêta nav hewzê.

50-Şêla dewlemenê bîyayênme û tawayêma yanêwîma sanayê.

Xwezî (em) dewlemend bûna û bikariba malekê bikirîya.

51-Eger desim yawayê, mangê arênare war peyt.

Eger destê min bigihîşt, min ê heyvê ji te re anîba xwarê.

52- Şela midrayê û zû nelayê.

Xwezî rawestiba û zû neçûba.

53-Mişyayê midrnayêt û qisêt kerdayê peyş.

Diviya te wî rawestanda û ji wî re qise bikira.

54-Şellay peyami kîyanayê ta adêç amayanê.

Xwezîka te peyam bişanda ta ew ê jî hatibana.

55-Eger peyami kîyasayê emeyç ênmê.

Heke te peyam bişanda em ê jî hatibana.

56-Êz kerênmê kuçê goranîyêt watayê û horpiřayênmê.

Me hez fikir te ji me re stran bigota û (me yê) govend bigirtana.

57-Eger a zawle kewtayê dilû řoxanekey, mirê.

Heke ew zarok ketiba nava çem, dê bimira.

58-Eger gilêrayêna û desim negêrtayê pam meřyê.

Ger ez ketibama erdê û min destê xwe(bi cihekî ve)negirta, dê pêyê min şikestiba.

59-Er waran warayê, çeçênmê dilû heřê.

Heke baran barîya, em ê çeçabûna nav heriyê.

60- Er girdû gulaw dinyêm çinyayê, girdîm pêşkeşêw to kerêna.

Heke min hemîya gulên dinê çinîba, min ê hemûyan pêşkeşî te bikirana.

61-Şellay nanim petê, îtir îse ewra nebêna.

Xwezî min nan pehtiba, êdî niha birçî nebûma.

62-Weşlê yanemane menêndê û nelêndê.

Xwezî (hûn) di mala mê de bimana û neçûna.

63-Şellay hêzî çalekêkê kennê.

Xwezî duh min çal bikola.

64-Mişyê nanit wardê înca amênî.

Diviya te nan bixwara dûv re(ancax) bihatayî.

65-Eger zû hor êstênî zûyç liwênî pey medresey.

Heke tu zû rabûya (tu yê) zû jî biçûya dibistanê.

66- Eger desat şitêbîyênê îse neweş neginênî.

Ger te destên xwe bişûşt, niha tu yê nexweş neketiba.

67-Weşlê riwê yarem werû bereyne wîyerê û minîç gîyanû wêm pêşkeş kerdê.

Xwezî rojekê yara min di ber derî de derbas bibûya û min ê jî canê xwe pêşkeş bikira.

68-Şellay min merdêna û tom çî hâlîne nedîyayê.

Xwezî ez bimira û te di vê rewşê de nedîtiba.

69-Ger a tewenête şanê, serem meŕyê.

Heke te ew kevir biavêta, dê serê min bişkiya.

70-Ger serem meŕyê winîş ê çene û mirêna.

Heke serê min bihata şikandin, dê xwîn jê bihata û ez ê bimirama.

71-Er awew a heney firê bîyayê, êsal mêwê firêma bênê.

Heke ava wê kaniyê pir bûya, dê îsal me gelek mêwe hebûna.

72- Er par waran fire waraya , êsal awew haney firê bê.

Ger par pir baran bibariya , dê îsal ava kaniyê zêde bibûya.

73-Şellay î kitêbe zûter niwîsyayê û yawayê desû şime.

Xwezî ev pirtûk zûtir bihata nivîsandin û bigihîştê destê we.

74-Weşlê adê inne êmeşa nemannayê û astêşa bûsmê.

Xwezî wan ewqas me newestanda û bihêla em rabikevin.

75-Er a tenafê qirtyê û a setlê were bîyê, ginêre war û liwê dilû çalekê.

Heke ew zencîr qut bibûya û ew satil ber bibûya, dê ketiba xwarê û biçûya nav çalê.

Beşa pêncem: Peyvên pirsyarî

Hewramî

kê
çenî, -ye
çenîn, -e
key
çî
koge
çêş
kam, -e
çiko
çikone
çi wext
çin
çinne
ko / koge
kone / kogene
pey kê
be çêş/çêşî
pey çî
kogere
aya
çi
meger
îge
age

Kurmancî

kî/kê
çawa / li gel (bi ... re)
çawa
kengê
çima
ku derê
çi
kîjan
ku derê / li kî derê
li kî derê
çiçax / kengê / çi wext
çend
çiqas
li ku derê / li kî derê
li ku derê / kî derê ye
bo kê
bi çi
ji bo çi
bi kîjan aliyê de
gelo
çi
ma
vir
wir

Hewramî

Ane kê n qisê kero?

Anê kê ne qisê kero?

Anê kê nê qisê kera?

Kê wat?

Kê watiş?

Be kê waçû?

Çenî amay?

To çenîn nî? Weş nî?

To çenîne nî? Weşe nî?

Şime çenînê ndê? Weşê ndê?

Çenî/Çenîw kê milî?

Çenî/Çenîw min bo/borê

*** çenî çenî çenê çîwî çinî ? ☺

Ađê key mênê/meya ?

Key watit?

Keywe n neđiyenîm?

Çî paset kerd?

Çiş mewaçî pine/Çî mewaçiş pine/Çî mewaçî pineş? Çima pê nabêjî ?

Çiş pine mewaçî/Çî pineş mewaçî ?

Kogey maçî ?

Kurmancî

Ew(n) kî ye diaxive?

Ew(m) kî ye diaxive?

Ew(pj) kî ne diaxivin?

Kê got?

Kê got?

Bi kê bêjim?

Çawa hatî ?

Tu(n) çawa yî? baş î ?

Tu(m) çawa yî? baş î ?

Hûn çawa ne? baş in ?

Li gel kê diçî ?

Li gel min were

Çawa bi derziyê re tiştî diçinî?

Ew kengê tên?

Te kengê got?

Ji kengî ve ye/ Çend e min tu neditîye?

Te çima wisa kir?

Çima pê nabêjî ?

Çima pê nabêjî ?

Ku derê dibêjî ?

Hewramî

Kogeyî nî/Kogeyîye nî ?

Çêşta hen?

Çêş maçî?

+ Eđa? _ Çêş a/Çêş arê?

Namêt çêş a/çêşe ne?

Çêş hen çêş nîya?

Zanko kam a?

Sara kame ne?

Çiko nî?

Çiko/Çikone arđit/arđet?

Çi wext mey / Key mey?

Seêat çin a/çin arê?

Çin neferê nê?

Seêat çin bew?

Aney pey kê berî?

Be çêşî bilmê?

Çi seêatê/ seêatêne beymê?

Kurmancî

Xelkê kî derê yî?

We çî heye?

Çî dibêjî?

+ Dayê? _ Çî ye?

Navê te çî ye?

Çî heye çî nîn e?

Zanko kîjan e?

Sara kîjan e?

Li ku yî?

Te li ku derê anî?

Kengê têy?

Saet çend e?

(Ew) çend kes in?

Çî saetê bêm?

Wî bo kê dibî?

Em bi çî herin?

Çî saetê em werin?

_ Peyvên pirsyarî yên din jî hene lê yên ku herî zêde tên bikaranîn ev in.

Er girdû êemrîm, her tom dîyaya
Ya ta qîyamet, min tom bîyaya
Key têr bêna min ce bîyey, nazar !
Ne bêkes bêna û ne bînayç bêzar
Weşlê zanayê ke çî serde nî
Ce asman fêşter, çenem dûre nî
Ax ke carêw to řehmêt bikerda
Tîrêwit şanê û gîyanit biberda

ئەر گەردوو عەمریم؛ هەر تۆم دیایا
یا تا قیامت؛ من تۆم بیایا
کە ی تیر بێنا من جە بییهی؛ نازار!
نە بیکەس بێنا و نە بێنا یچ بێزار
وەشلی زاناییم کە چی سەردەنی
جە ئاسمان فێشتهر؛ چەنەم دوورەنی
ئاخ کە جاریو تۆ رەحمیت بکەردا
تیریوت شانی و گیانت بەردا

**Ger hemî emrê`m, min te bidîta
Yan ta qîyamet, min tu hebîya
Kengî têr dibûm ji hebûn nazdar
Ne bêkes dibûm ne dibûm bêzar
Xwezî bizaniya min çima sar î
Ji ezmên bêtir ji min tu dût î
Ax bo carekê te rehm bikira
Tîrek biavêta û te can bibira**

Beşa şeşan

(Em ê di vê beşê de hin peyv bixwînin ku ji yên din bêtir tên bikaranîn. Ev beş ferhenga dawî nîn e. Ferhengoka dawî beşa nehan e.)

Beşa şeşan: Endamên malbatê

Hewramî

bineyane/binemale/xanewade

baba

bawejenî

bawepîyare/babapîyare

bêwejenî

bira

birajenî

biray şîrî

biraza

birazê

dêdê

dêdê

desgîran, -e

eđa

hemzema

hesirwe

hesûre

hêwer

hêwerjenî

jen û şû

jenbira

take

kinaçêw laloy

kinaçêw mamoy

kinaçêw metîyê

kuŕû laloy

kuŕû mamoy

kuŕû metîyê

Kurmancî

malbat

bapîr

damarî/jinbav

bavmarî

jinebî

bira

jina bira

birasîr

birazî(n)

birazî(m/pj)

damarî

xuşka mezintir(Soranî: dade)

destgirtî

dayik

hevling

xesû

hezûr

tî

jintî

jin û mêr

birayê jina mirov(bûya)

kek

keça xal

keça ap

keça xaltîyê/metê

kurê xal

kurê ap

kurê xaltîyê/metê

Hewramî

lalo
lalojenî
laloza
lalozê
mama
mamo
mamojenî
mamoza
mamozê
metîye
metîyeza
metîyezê
necîkya, -ê
newê
newe
sêtê/dîşe
şûw metîyê
tate
walê
wareza
warezê
weywe
zaŕolê
zaŕole
zema

Kurmancî

xal
jinxal
zarokê xal
zaroka/ên xal
dapîr
ap/mam
jinap
zarokê ap
zaroka/ên ap
xaltî/met
zarokê xaltîyê/metê
zaroka/ên xaltîyê/metê
berşîr
nevî (m/pj)
nevî(n)
diş
mêrê xaltîyê/metê
bav
xuşk
xwarzî(n)
xwarzî(m/pj)
bûk
zarok(m/pj)
zarok(n)
zava

- Ger paşqertafa (za) du car li dawiya navên malbatê were, wek birazaza, ew kes êdî biraziyê me nîn e, belkî zaroka/ê yek ji zarokên birayê me ye.

> bira → biraza → birazaza /// mamo → mamoza → mamozaza

Beşa şeşan: Reng

Hewramî

řenge (m)

bij, bije, bijê

bor, bore, borê

çerme, çermê, çermê

éebasî, éebasîye, éebasîyê

heftreng, heftrengê, heftrengê

kewe, kewê, kewê

kirêmi, kirêmiye, kirêmiyê

narinci, narinciye, narinciye

pemeyî, pemeyîye, pemeyîyê

qaweyî, qaweyîye, qaweyîyê

řengařeng, řengařenge, řengařengê

(řengawřeng, řengawřenge, řengawřengê)

řengîn, řengîne, řengînê

sewz, sewze, sewzê

sîyaw, sîyawe, sîyawê

sûr, sûre, sûrê

sûretî, sûretîye, sûretîyê

tûsî, tûsîye, tûsîyê

wenewş, wenewşe, wenewşê

xakî, xakîye, xakîyê

zerd, zerde, zerdê

- Zerd jî tê gotin.

Kurmancî

reng

bej

kej

spî

pembe

heftreng

şîn

krem

narinci

pembe

qehweyî

rengareng

rengareng

rengîn

kesk

reş

sor

pembe

boz

binefş

qehweyî

zer

Hin reng, rengê fêkî, tişt û hwd in. Mînak:

- **Pirteqalî:** Rengekî ku dişibe rengê pirteqalê
- **Tilayî:** Rengekî ku dişibe rengê zêr
- **Nuqreyî:** Rengekî ku dişibe rengê zîv
- **Zeytûnî:** Rengekî ku dişibe rengê zeytûnê
- **Acorî:** Rengekî ku dişibe rengê tuxleyê/kerpîçê/acûrê

- **Kemřeng /Piřřeng:** Ev rengdêr tundiya rengê nîşan dide:

kewey kemřeng: renek ku tundiya şîniya wî kêr e.

kewey piřřeng: renek ku tundiya şîniya wî pir e.

Mînak:

+ **Asmanû şewê, siyaw a.**

+ **Ezmanê şevê, reş e.**

+ **Řiwem siyawe biyêne.**

+ **Rûyê min reş bûye.**

+ **Çemêw Dilberê siyawê nê.**

+ **Çavên Dilberê reş in.**

Beşa şeşan: Mêwe û dar û sebze

Hewramî

mêwe (n)

bancanî(m)

belal (n)

belû (n)

beyî (m)

bîbar (n)

bilçî (m)

fendoq (n)

gîwaw (n)

heçkoçî (m)

hełçî (m)

hełûçe (n)

hemro (n)

henar (n)

hencîr (n)

hengûrî (m)

hewîc (n)

isfenac (n)

kałek (n)

kulekê (m)

lîmo (n)

mozî (m)

naringî (n)

Kurmancî

mêwe

firingî

gilgil

belût

bîyok

îsot

guhîj

findiq

giya

kişmiş, mêwîj

kuvark

alûce

hermo

hinar

hêjîr

tirî

gizêr

îспенax

gundor, petêx, xerûze

gindor

leymûn

mûz

narinc

Hewramî

neweyî (m)

pirteqał (n)

piste (n)

pîyaz (n)

řîwawî (m)

řocyarpiris (n)

sawî /savî (m)

sêfî (m)

sewzî (n)

şotî /henî (n)

tifî (m)

tirozî (n)

wamî (m)

wezî (m)

wenî (m)

yewe /yewî (m)

Kurmancî

nok

pirteqal

fistiq

pîvaz

ribês

gularojê

sêv

kartol

sebze

zebeş

tû

tirozî

behîv

gûz

qezwan

ceh

Beşa şeşan: Aşxane

Hewramî

awe /awî (m)

çay (n)

çemçe (n)

do (n)

genme (m)

goşt (n)

kardî (m)

kase (n)

kebab /kewaw (n)

kerê (m)

mas (n)

mekî (m)

şîrîn, -e

soî, -e

şot (n)

taî, -e

tûn, -e

penîre (m)

parşêw (n)

nan (n)

birênc

Kurmancî

av

çay

kevçî

dew

genim

goşt

kêr

tas

kebab

nîvişk, kere

mast

xwê

şêrîn

şor

şîr

tehl

tûj

penîr

paşîv

nan

birinc

Beşa şeşan: Heywan

Hewramî

ask /aske

bayequş (n)

beq (n)

beran (n)

bewr /bebr (n)

bize (m)

bizeneçîre (m)

bizle (n)

çêlî (m)

çeqeł (n)

cucelê (m)

dele /deletûtê (m)

esp /hesp (n)

fîl (n)

ga (n)

gawe (m)

goreke (n)

heło (n)

heng (n)

her (n)

heşe (m)

hesere (m)

hewrêşe (n)

Kurmancî

xezal /ahû /ask

bum

nêrekew

beran

bebr

bizin

pezkovî

karik

mêkew

çeqel

çêçik

dêl

hesp

fîl

ga

çêlek

golik

eylo

mêşhingiv

ker

hirç

qantir

kevrosk

Hewramî**Kurmancî**

horyel (n)	kerkulan
jerejî /jerej	kew
jûjû (n)	jûjî
kawetrî /kawetre (m)	kevok
kawiř	kavir
keł (n)	ceylan /xezal /kîvî
keleşîr /keleşêr (n)	dîk
kemtar (n)	keftar
kerge (m)	mirîşk
kîselî /kîsele (m)	kûsî /kûsel /kîsel
kitê (m)	pisîk
kule /milekuř (n)	kulî /çekuçke
mahere (m)	maker
mar (n)	mar
marekoł (n)	dûpişk
meşî (m)	mêş
meşûlê (m)	pêşû
meye (m)	mehîn
meymûn (n)	meymûn
mezûklê /marmezûk	gumgumok
miłe (n)	mişk
mirîçlê (m)	cûcîk / çivîk
miroçe (n)	mûrî
nêreher (n)	nêreker
pałing /pałeng (n)	piling
pepûle (n)	pelatînk

Hewramî

Kurmancî

pepûsilêmane (n)	dîksilêman /hudhud
pespesekolê (m)	pîrk, pîlk, tevpîrk
pişîlê (m)	pisîk
qajingî (m)	kevjal
qalaw (n)	hacîreşk
qatir (m)	qantir
qışqêre (n)	hacîreşk
qurwaqî (m)	beq
řiwase (m)	rovî
şemşemekore (n)	şevşevik
şêr (n)	şêr
simore (n)	simolek, sivorî
şiwane (n)	şivan
tancîye (m)	tajî
tûte (n)	kûçik
were (m)	berx
werg (n)	gur
wîlax (n)	ker
wîştir (n)	deve
xûge (n)	beraz , xinzîr
zerdewale (n)	mêşhingiv

Beşa şeşan: Endamên bedenê

Hewramî

bał (n)

bała (n)

beden /laşe /cese (n)

berzî /qed (n)

birjangê /bijangê (pj)

biřnax (n)

biro (n)

biriwê (pj)

çem (n)

çenake /zinc (n)

cerg /ciger /yeher (n)

çok /zengoł /ejno (n)

dem (n)

des (n)

diđan (n)

dił /zêł (n)

dirêj

endām /bejn (n)

engûse /gilke (m)

gilare (n)

giłwî (m)

goş (n)

kuł

Kurmancî

bask

bejn

beden

bilindî

bijang

kuna poz

birû

birû

çav

çen

kezeb

çok

dev

dest

diran

dil

dirêj

bejn

tilî

bîbika çavan

gewrî

guh

kin

Hewram

leme (m)

leř /lařir /hejar

liç (n)

lûte (m)

maeêde (n)

mazî (n)

meçek /moç (n)

mejg, mežz (n)

miçkile /gulale

mil /gerden (n)

mişte (m)

mû (n)

naxûn (n)

nehe (n)

pa (n)

perasû (n)

pêşe (n)

peştî (m)

pos (n)

pûzê (pj)

qijê (pj)

řan (n)

řeg, demar (n)

řîş (n)

řiwe (m)

Kurmancî

zik

tenik

lêv

poz

meda

pişt

zend

mêjî

biçûk

ustî /gerden

kulm

mû

neynik

navik

pê

perasî

hestî

pişt

post

çîp

por

hêt

damar

rêdîn /rî

rû

Hewram

Kurmancî

řoxa /řixole /řoxla (n)

rîvî

şan (n)

mil

sere (n)

ser

simêl (n)

simbêl

sîne (n)

sing

şuşî (m)

pişik

tafe (n)

faterêşk

tevêle /tewêle (m)

enî

wîlk (n)

gurçik

winî (m)

xiwîn

wîr (n)

bîr

xale (m)

xal

xîş /çax

qelew

ziwan /zivan (n)

ziman

zîlf (n)

zolf

Beşa şeşan: Sal, meh , roj, saet

Hewramî

sale (m)

werz /fest (n)

êsaî (n)

saîjimar /saîname (n)

saîyad (n)

sedîsaî (n)

sedîsale, -ê

wehar (n)

hamin (n)

payîz (n)

zimsan (n)

par (n)

pêrar (n)

newroz (n)

pajerej (n)

çêlkiř (n)

kopiř (n)

gelawêj (n)

awewere (n)

tirazyê (m)

gelaxezan (n)

keleherz (n)

arga (n)

řabiřan (n)

sîyawkam (n)

Kurmancî

sal

demsal

îsal

salname

saleger

sedsal

sedsaî

buhar

havîn

payîz

zivisatn

par

pêrar

nîsan

gulan

hezîran

tîrmeh

tebax

îlon

cotmeh

mijdar

kanûn

çile

sibat

adar

Hewramî

şemme (n)

yekşeme/yekşemme (n)

diweşeme/diweşemme (n)

yereşeme/yereşemme (n)

çîwarşeme/çîwarşemme (n)

pencşeme/pencşemme (n)

cimêe (n)

hêfte (n)

saêbê /soh /simh

sewa /seway /seba

nîmeşew (n)

êşew (n)

şewe (m)

wêrega (n)

êesr (n)

ro (n)

riwê ce riwa

diwê riwê çewel

dimanîmeŕo (n)

nîmeŕo (n)

aro (n)

saêbê zû

hêzî /hîzî (n)

pêrê (m)

perê (m)

saêbê ta wêregay

Kurmancî

şemî

yekşem

duşem

sêşem

çarşem

pêncşem

înî

hefte

sibê

sibe

nîvê şevê

îşev

şev

êvar

esr

roj

rojek ji rojan

du roj berê

paş nîvro

nîvro

îro

sibê zû

do

du sibê

pêr

ji sibê heta êvarê

Hewramî

hêzî wêregay

perawerê

serperawerê

perewêrar

serperewêrar

wext (n)

deqêqe /deyeqe /xulek (n)

sanye /çirke (n)

saêete (m)

saêet çin a?

wextit hen?

wîyerde

îse

Qeŕne (m)

Sede (n)

Kurmancî

do êvar

bitir pêr

çîwar roj berê

bitir pêrar

çîwar sal berê r

wext

deqîqe

sanîye

seet

seet çend e?

dema te heye?

borî

niha /anika

Sedsal

Sedsal

Beşa şeşan: Hewa

Hewramî

va/wa (n)
waran /varan /weşt (n)
verve /werwe (m)
dilop /qetre (n)
gerdelûl (n)
teverge /tewerge (m)
mij , tem û mij (n)
girimnay
hewr (n)
asman (n)
germ, -e
serd, -e
sûrezeřînê /hesarezeřînê (m)
yexbendān (n)
asman saf a
asman tarîk a
hewa çenîn a
hewa germ/serd a
hewa weş a
serd̄m/germm a
waranî, -ye
weyule cinanê (m)
sermat a / germat a

Kurmancî

ba
baran
berf
dilop
bager
zîpik
mij
gurmîn
ewr
ezman
germ
sar
keskesor
cemed
ezman sayî ye
ezman tarî ye
hewa çawa ye
hewa germ/sar e
hewa xweş e
li min sar/germ e
baranî
bager
li te sar/germ e

Beşa şeşan: Ziman

Hewramî	Kurmancî
bêdeng, -e	bêdeng
biŕge (n)	kîte
biŕgeyî	kîteyî
çeme (n)	rader
deng (n)	deng (n)
dengdar, -e	dengdêr
dengşinas, -e	dengnas
dengşinasî (n)	dengnasî
deq (n)	nivîs
dese (n)	grûp
dilêne (n)	naverok
dimakewt (n)	paşgir
dirêjî (n)	dirêjî
diyar, -e	diyar
ejnasya, -ê	naskirî
êşare, îşare (n)	amaje
kar, kerde (n)	lêker
kara	fail
kelîmê (m)	peyv
kirya	bireser
ko	pirjimar
likder (n)	hoker
ma, mayne	mê
nadiyar, -e	nediyar
namê (m)	navdêr
namga (n)	cînav
namgay cîya (n)	cînavê veqetandî
namgay likya (n)	cînavê girêdayî
nejnasya, -ê	nenas

Hewramî Kurmancî

nêr û ma	nêr û mê
nêr, nêrîne	nêr
newyer	negerguhêz
řaziwan (n)	rêziman
řiste (n)	hevok
tak, -e	yekjimar
taybet	taybet
têkeř, -e	hevedudanî
watê (m)	peyv
welîne (n)	pêşekî
welkewt (n)	pêşgir
wîyer	gerguhêz
wîyerde	borî
zarawe/Lehce (n)	zarava
ziwan (n)	ziman

Beş a heftem

Beşa heftem: Nivîs û sohbetên Hewramî

_ Armanc û mebesta vê pirtûkê, naskirina binsaziya giştî ya Hewramî ye û lêkolîna devokan karekî gelek diwartir û demdirêjtir e û ez tenê dikarim bi çend rêziman û peyvan behsa wê bikim û ji bo vê mebestê, çendîn pirtûk û mirovên xwende û bi taybetî dem û alîkarî lazim in.

_ Di vê beşê de em ê çend nivîs û sohbetên Hewramî bixwînin ku em bibînin nivîsandina Hewramî çawa ye. Di vê beşê de hem alfabeya latînî û hem jî alfabeya aramî hatine bikaranîn. Ango rûpela yekem nivîsa Hewramî ye ku bi alfabeya aramî û latînî hatiye nivîsandin û rûpela duyem jî wergera wê ya Kurmancî ye.

_ Di dawiyê de jî em ê hin peyvan bixwînin ku di axaftinên rojane de tên bikaranîn.

_ Deqû yiwemî

➤ Hewramî:

Řiwêw Luqman law hanêwî niştebêre. Kabrayêw ke pagere wîyerê, ce Luqmanîş persa: Çin seêatê ter yawu degay dimayîne?

Luqmanî wat: Gine řa.

A kabra pêseş zana ke Luqman şet a û kewt řa.

Wextêw ke çin hengamê dûr kewtwe(kewto), Luqman çirîş û watiş: Kake seêatê ter yawî a degayê/degê.

Kabrakey wat: Çi welter newatit?

Luqmanî wat: Pey aney liway řarew tom neđiyebê. Nezanêna kirj milî yam xaw. Îse dîm zanam seêatêwî ter yawî degay dimayîne

_ دهقوو یوه می

➤ هه ورامی:

روڼو لوقمان لاهانڼوۍ نښته بڼه. کابرایو که پاگه ره وپه ری، جه لوقمانیش په رسا: چن

سه عاتی ته ریاوو ده گای دمایینه؟

لوقمانی وات: گنه را.

ئا کابرا پیسه ش زانا که لوقمان شیئا و کهوت را.

وهختیو که چن هه ننگامی دوور که وتوه (که وتو)، لوقمان چریش و واتش: کاکه، سه عاتی ته ریاوی

پا ده گای/ده گایی.

کابراکه ی وات: چی وهلته ر نه وات؟

لوقمانی وات: په ی ئانه ی لواوی راره و توم نه دیه بی. نه زانینا کرژ ملی یام خاو. ئیسه دیم زانام

سه عاتیو ته ریاوی ده گای دمایینه.

_ Nivîsa yekem

➤ Kurmancî:

Rojek Luqman li kêleka kanîyekê rûniştibû. Zilamekî ku bi wî aliyê de derbas dibû ji Luqmên pirsî: Ez ê çend saetên din bigihim gundê dawî?

Luqman got: Bimeşe.

Ew zilam wisa fikirî ku Luqman dîn e û bi rê ket.

Gava ku çend gavan dûr ket, Luqman gazî wî kir û got: Keko, tu dê saetek din bigihî wî gundî.

Zilamik got: Çima te zûtir negot?

Luqman got: Ji ber ku min meşa te nedîtibû. Min nedizanî bi lez diçî yan hêdî. Niha min dît, zanî dê saetek din bigihî gundê dawî

♦ Kabra: Zilamê nenas /// Pagere = Be agere = Pare > age: wir / îge: vir

_ Deqû diwemî

➤ Hewramî:

Parkêwne kuřêwî sîyawpos temaşaw kabrayêwî tîzangwireşî kerê ke be horkewt kesêwî řehmîn bê. Tîzangwireşeke tîzangêwey sûreş were da ta bilo asmanre û pî karî xelkêwî fireteriş pey law wêş kêşt. Încê tîzangêwey kewê û her pase danêwey zerde û dimayîçwe tîzangêwey çermêş were da. Tîzangeka wirde wirde liwê asmanre û wereçemawe gimê bîyê.

Kuře sîyawposeke heşay midrabêre û temaşaw tîzangêwey sîyawê kerê. Dimaw mebleqê, nizîkû tîzangwireşekê bîwe û be dûdîlîwe persaş: Buyer lalo! Eger tîzange sîyawekêçta were dayê liwê ser?

Kabray tîzangwireş xiwa û be didanî, a bene ke tîzange sîyawekêş bestê bêwe qirtna û dimayî watiş: Kuřekem, ane ke bo evû liway serû tîzangê, řengeş nîyê ne, a çîwe n ke îna dilû tîzangekêne.

_ دهقوو دوهمی

➤ هه ورامی:

پارکیونه کوریوی سیاو پۆس ته ماشا و کابرایوی تیزانگ ورهشی که ری که به هۆرکه وت که سیوی رهحمین بی. تیزانگ ورهشه که تیزانگیوهی سوورهش وهره دا تا بلۆ ئاسمانره و پی کاری خه لکیوی فره ته رش په ی لاو ویش کیشت. ئینجا تیزانگیوهی که وی و ههر پاسه دانیوهی زهرده و دمایچه تیزانگیوهی چه رمیش وهره دا. تیزانگه کا ورده ورده لوی ئاسمانره و وهره چه ماوه گمی بیی. کوره سیاو پۆسه که هه لای مدرابیره و ته ماشا و تیزانگیوهی سیاوی که ری. دماو مه بله قی، نزیکوو تیزانگ ورهشه که ی بیوه و به دوودلیوه په رساش: بویه ر لالۆ! ئه گهر تیزانگه سیاوه کیچتا وهره دای لوی سه ر؟

کابرای تیزانگ ورهش خوا و به ددانی، ئا به نه که تیزانگه سیاوه کیش به ستی بیوه قرتنا و دمای واتش: کوره که م، ئانه که بۆ ئه قوو لوی سه روو تیزانگی، رهنگهش نییینه، ئا چیوهن که ئینا دلوو تیزانگه کینه.

_ Nivîsa duyem

➤ Kurmancî:

Li parkekê, xortekî çermreş(reş post/seyah pûst) li zilamekî balonfiroş mêze dikir ku bi şens mirovekî dilovan bû. Balonfiroş, balonek sor ber da ta biçe ezmên û bi vî karî, (wî) gelek mirov ber bi xwe ve kişand. Paşê balonek şîn û her wisa zerek û dûv re jî balonek spî ber da. Balon hêdî hêdî çûn ezmên û ji ber çavan winda bûn.

Xortê çermreş hêj rawestiyabû û li baloneke reş dinêrî. Piştî demekê nêzîkî balonfiroş bû û bi dudilî ve pirsî: Bobore xalo! Heke te balona reş jî berdabûya, dê biçûya ser/jor(ezmên)?

Zilamê balonfiroş kenîya û bi diran têla ku balona reş girêdabû birrî û got: Kurê min, ew ku dibe sebaba hilkişîna balonê, ne rengê wê ye, ew tişt e ku di nav balonê de ye.

- **Pî karî = Be î karî /// Hin car (wa) dişê li şûna (ke) were /// Qirtnay = Jê kirin**
- **Ev(n) = sedem (m)**

_ Deqû yeremî:

➤ Hewramî:

Jen û pîayêw liwê dilê yane tazekaşa. Seêbanêw ke wermne horê êstê, jenekê pencerewe temaşayêw yane hamsakeyşa kerdiş û watiş: Azîzim temaşaw a cila kere çinne pîs şoryênê. Pase dîyar a, jenew a yaney mezano cilê şoro(bişoro). Kuçêç xiwa penêşa.

Î qisê gird saêbanê waweye bêwe ta yawa dewruberû mangê. Saêbanêw horê êstê, jenekê temaşas kerd cileka fire pak û poxtê bête, pewkey watiş: Azîzim çemit çiwe n? Şukrû Xiway fêrew cil şitey bîye.

Pîyakeyç watiş: Na azîzekêm. Min î saêbê zû hor êstanê û şîşekam poxtê kerdê. A şîşê ke to peştîşwe temaşa kerênî, fire pîs û çîlkine bê!!!

_ دهقوو يهره می

➤ هه ورامی:

ژهن و پیاپیو لوی دلی یانه تازه کاشا. سهعبانیو که وهرمنه هۆری ئیستی، ژهنه کی په نجه ره وه ته ماشاییو یانه هامساکه یشا که ردش و واتش: ئازیزم! ته ماشاو ئا جلا که ره چنه پیس شۆریینی. پاسه دیارا ژهنه و ئا یانه ی مه زانو جلی شۆرۆ. کوچیچ خوا په نه شا. ئی قسی گرد ساعبانی و او هیه بیوه تا یاوا ده و روبه روو مانگی. ساعبانیو هۆری ئیستی، ژهنه کی ته ماشاش که رد جله کا فره پاک و پوختی بیی، په وکای واتش: ئازیزم! چه مت چوهن؟ شوکروو خوای فیروهو جل شته ی بییه.

پیاکه یج واتش: نا ئازیزه کیم! من ئی ساعبی زوو هۆر ئیستانی و شیشه کام پوختی که ردی. ئا شیشی که تۆ په شتیوه ته ماشا که رینی، فره پیس و چلکنه بی.

_ Nivîsa sêyem

➤ Kurmancî:

Jin û mêrek çûn malên xwe yên nû. Sibehekê ku ji xewê rabûn, jinikê ji pencereyê li mala cîranê xwe temaşe kir û got: Delalê min, li wan cilan binêre çiqas qirêj hatine şuştin. Wisa diyar e jina wê malê nizane cilan bişo. Hinekî jî bi wan keniya.

Ev gotin(qise) her sibe dihat dubarekirin ta ku gihîşt dora mehekê. Sibehekê rabûn, jinikê temaşe kir cil pir paqij bûn, lewma got: Delalê min, dibînî(çavê te lê ye)? Şukrê Xwedê fêrî cil şuştinê bû.

Mêrik jî got: Na delala min. Ez vê sibê zû rabûm û min şîşeyan paqij kirin. Ew şîşe ku te ji piştê wê mêze dîkir, pir qirêj bû.

_ Deqû çiwaremî:

➤ Hewramî:

Siłammm. Beydê ba ême wêma xaster bijnasmê.

Ême kê nmê?

Ême Kurđistanne jîwmê. Kurđistan welatêw a ke îna werhorzî dilêrasîn.

Be a kesa ke Kurđistanne jîwa maça kurđê. Ziwanû kurđa Kurđî n. Kurđî ziwanêwî fire dewlemen a û leqê firêş henê. Pêsew zaraway Soranî, Kirmancî, Hewramî, Kelhûrî, Zazakî û Lekî.

Kurđistan şarê weşê firêş henê. Her pase şare gewrekaw î welatî îne nê: Amed, Urmîye, Heseke, Kirmaşan, Sine û Hewlêr.

Amed gewreterîn şar û paytextû î welatî n. Her bijîwo Amedû kurđa ☺

Sirûştû î welatî fire řengîn û bê wêne n. Her bijîwo ziwan û welatû kurđa.

_ دهقوو چوارهمی

➤ هه ورامی:

سالممم. بهیدی با ئیمه ویمه خاسته ر بژناسمى.

ئیمه کینمى؟

ئیمه کوردستانه ژیمى. کوردستان وهلاتیوا که ئینا وهرهۆزى دلپراسین. به ئا که سا که کوردستانه ژیا ماچا کورد. زوانوو کوردا کوردین. کوردی زوانیوی فره دهوله مه نا و له قى فریش هه نى. پیسه و زاراوه ی سورانی، کرمانجی، هه ورامی، که لهو وری، زازاکى و له کى. کوردستان شارى وهشى فریش هه نى. هه ر پاسه شاره گه و ره کاو ئى وهلاتى ئینینى: ئامه د، ئورمیه، هه سه کى، کرماشان، سنه و هه ولیر.

ئامه د گه و ره ته رین شار و پایته ختوو ئى وهلاتین. هه ر بژیوو ئامه د وو کوردا.

سروشوو ئى وهلاتى فره رهنگین و بى وینه ن. هه ر بژیوو زوان و وهلاتوو کوردا.

_ Nivîsa çarem

➤ Kurmancî:

Silavvv. Werin bila em xwe baştir nas bikin.

Em kî ne?

Em di Kurdistanê de dijîn. Kurdistan wilatek e ku li rojhilata navîn e.

Ji kesên ku li Kurdistanê dijîn re dibêjin kurd. Zimanê kurda Kurdî ye. Kurdî zimanek pir dewlemed e û gelek şax hene. Wek zaravayê Soranî, Kurmancî, Hewramî, Kelhûrî, Zazakî û Lekî.

Kurdistanê gelek bajarên xweş hene. Jî bajarên mezin ên vî wilatî ev in: Amed, Urmîyê, Heseke, Kirmaşan, Sine û Hewlêr.

Amed mezintirîn bajar û paytexta vî wilatî ye. Her bijî Ameda kurda ☺

Xwezaya vî wilatî bê hempa ye. Her bijî ziman û wilatê kurda.

_ Deqû pencemî:

➤ Hewramî:

Mamosayêw ce wanyaraw wêş persaş: Be peyliwaw şime çe çîwêw binyadêwî zerîf kero?

Her yo ciwabêwşa dawê:

Yo watiş: Çemê zerîfê. Yoy wat: Balay berz.

Yo watiş: Posî çerme.

Çî wextne mamosa diwê kasêş werû wanyarane nîyêre û watiş: Temaşaw î diwe kasa kerdê. Yoşa ce zeî weş bîyen û jariş çene n û ûneşa kasêwî heîrîn a û awî pak û poxtêş çene ne. Şime ce kamîşa werdêwe?

Wanyarê ciwabşa dawê: Ce kasey heîrînî.

Mamosa watiş: Wextêw derûnû kasekata verçem gêrt, řiwaletşa latawe esengîş nemen. Binyadêwîç pêsew î heweşey n. A çîwe ke zerîfîş kero akar û derûnş a. Eşom derûnîçma zerîf kermê nek her řiwaletma.

_ دهقوو په نجه می

➤ هه ورامی:

مامۆسا ییو جه وانیاراو ویش په رساش: به په یلواو شمه چه چیوو بنیاده می زهریف که رو؟

هه ریو جوابیوشا داوه:

یو واتش: چه می زهریفی.

یو وات: بالای بهرز.

یو واتش: پوسی چه رمه.

چی وهختنه مامۆسا دوی کاسیش نیی و هروو وانیارانه و واتش: ته ماشاوی دوه کاسا که ردی. یوشا جه زه ری وهش بییه ن و ژارش چه نه ن و ئوونه شا کاسیوی هه ری نا و ئاوی پاک و پوختیش چه نه نه. شمه چه کامیشا و هردیوه؟

وانیارای جوابشا داوه: جه کاسه ی هه ری نی.

مامۆسا واتش: وهختیو دهروونوو کاسه کاتا فه رچه م گپرت، رواله تشا لاتاوه ئه سه نگیش نه مه ن. بنیاده میچ پیسه و ئی هه وه ره ی ن. ئا چیوه که زهریفش که رو ئاکار و دهروونشا. ئه شو م دهروونیچما زهریف که رمی نه ک هه ر رواله تما.

_ Nivîsa pêncem

➤ Kurmancî:

Mamosteyekî ji xwendekarên xwe pirsî: Bi dîtina we çi tiştek mirovî xweşik dike?

Her yek bersivek da:

Yekî got: Çavên bedew.

Yekî got: Bejna bilind.

Yekî got: Posta spî.

Di vê demê de mamoste du tas li ber xwendekaran danîn û got: Li wan her du tasan binêrin. Yek ji wan ce zerr hatiye çêkirin û jehr tê de heye û ewa din tasa herrî ye û ava paqij tê de heye. Hûn ji kîjan vedixwin?

Xwendekaran bersiv da: Ji tasa herrî.

Mamoste got: Dema ku we hundirê tasê li ber çav girt, ji bo we giraniya xuyabûna wan nema. Mirov jî wek vê tasê ye. Ew tişt ku wî xweşik dike akar û derûna wî ye. Divê (em) derûna xwe jî bixemilînin ne tenê xuyabûna xwe.

- **Kermê /// Heweř = Kase**

Deqû şîşemî

 Hewramî:

Dimaw nimê Heme ce Biley řêfêqîş perso: Daxim kiryo wextû doêakerdey cigere biwerî?

Bile maço: Çî ce meşay mepersî?

Ême milo pey law metay û perso: Mamosa gîyan kiryo wextê xicilû doêakerdey na cigere biwerû?

Mela ciwab miðowe: Na gîyan mekiryo, îne bêrêzî n be dînî. Heme kornowe pey Biley ke mela çêşîş waten.

Bile maço: To diros nepersanit, midre ta wêm bilû û persûş çene.

Bile milo law me'ay û perso: Mamosa wextêw xicilû cigere wardey na tawu do'ea bikerû?

Meła be weşrûyîwe maço: Ey çenî metawî kuřekem?

۲_دهقوو ششہمی

➤ هه ورامی:

دماو نمې، حه‌مه جه بله‌ی ره‌فقی‌ش په‌رسو: دا‌خم کریو وه‌ختو و دو‌عا‌که‌ر ده‌ی ج‌گه‌ره بو‌ه‌ری؟

بله ماچۆ: چی جه مه لای مه په رسی؟

حه مه ملو په ی لاو مه لای و په رسو: ماموسا گیان کریو وهختی خجلوو دو عاکه رډه ینا جگه ره

بوهروو؟

مه لا جواب مڏووه: ناگيان مه ڪريو ٿينه بي رڙين به ديني. حه مه ڪورنووه پهي بلهه ڪه مه لا

چیشش واتهن.

بله ماچۆ: تۆ درۆس نه په رسانت، مدره تا وئیم بلوو و په رسووش چه نه.

بله ملو لاو مه لای و په رسو: ماموسا وهختیو خجلوو جگهره واردهینا تاوو دؤعا بکهروو؟

مه‌لا به وه‌شروویوه‌ ماچۆ: ئه‌ی چه‌نی مه‌تاوی کوره‌ که‌م؟

_ Nivîsa şeşan

➤ Kurmancî:

Piştî nimêjê Mihemed ji hevalê xwe, Îbrahîm dipirse: Dibe ku di dema duakirinê de cixarê bikişînim?

Îbrahîm dibêje: Çima ji mamoste napirsî?

Mihemed diçe cem mamoste û dipirse: Mamoste can dibe dema mijûlê duakirinê me cixarê bikişînim?

Mamoste bersiv dide: Na cano nabe, ev bo olê heqaret e.

Mihemed ji Îbrahîm re vedibêje ku mamoste çi gotiye.

Îbrahîm dibêje: Te rast nepirsiye, raweste ta ez bi xwe biçim û jê bipirsim.

Îbrahîm diçe cem mamoste û dipirse: Mamoste dema ku mijûlê cixarekişandinê me dikarim dua bikim?

Mamoste bi rûyekî xweş dibêje: Ey çawa nikarî kurê min?

Beşa heftem: Axaftina rojane

Hewramî

Be hîway siîametît

Be îcazeyt min milû

Çenî nî /Çenîn nî? (n)

Çenîye nî /Çenîne nî? (m)

Çêş kerî çêş mekerî ?

Desêt weşê ba

Desît maç kera

Desit weş bo

Desweş

Fermawe nîşere

Î wextet weş

Memnûn. Zehmetit kêşt/kêşa.

Memnûn, -e na.

Oxêr bo

Ŗo weş

Seba xêr

Seret weş bo

Serû çemam amaydê

Serû çemî

Şewe weşe

Şewet weşe

Siîam

Siîam yawna

Spas

Kurmancî

Bi hêviya ku tu baş bî

Bi destûra te ez ê herim

Çawa yî?

Çawa yî?

Çi dikî çi nakî?

Destên te sax bin

Destê te radimîsin

Destê te sax be

Destxweş

Kerem ke rûne

Dem baş

Memnûn. Te zehmet kişand

Memnûn im.

Oxir be

Roj baş

Beyanî baş / Sibe ya we(te) bi xêr

Bersiva (Destê te sax be) ye

Ser çavên min hatin

Bi ser çav

Şev baş

Şeva te baş

Silav

Silavên wan hene

Spas

Spasit kerû

Spasiya te dikim

Hewramî

To namêt çêş a / To namêt çêşe ne ?

To weş/xas nî? (n)

To weşe/xase nî? (m)

Watûwaç

Wêrega weş

Weşha/e na be ejnasayt

Weşha/e bîya be ejnasayt

Weşter pey to

Wêt bijnasne

Wextit bexêr (bo)

Xeberat

Xêr amay

Xuđa çenet řazî bo

Xuđa hêfzêşa kero / êmrdirêjêşa kero

Xuđa xêrta bîdo

Yanet awa bo

Erê

Na

Belê

Xuđa hêfêz

Kurmancî

Navê te çi ye?

Tu baş î ?

Tu baş î ?

Gotûbêj

Êvar baş

Kêfxweş im bi nasîna te

Kêfxweş bûm bi nasîna te

Bersiva (Roj baş) e

Xwe bide nasîn

Dema te bixêr (be)

Peyvek ku hevwatera (çi xeber) e

Bi xêr hatî

Xwedê ji te razî be

Xwedê wan bihêle / emrê wan dirêj ke

Xwedê xêrê bide we

Mala te ava be

Erê

Na

Be

Bi xatirê te

Beş a heştem

Beşa heştem: Gotareka kurt

_ Di vê beşê de em ê hin helbestên Hewramî bixwînin. Zimanê helbestên helbestvanên kevn di hin helbestên wan de ji zimanê axaftinê hinekî cuda ye. Bo nimûne, wan ji rêzimana zaravayên din ên wek Soranî alîkarî girtine, yan jî cihê pêşgir û paşgir guhertine.

_ Ji ber ku helbestvan ji herêman cuda yên Hewramanê bûne, di helbestên xwe de devokên heman herêman jî bi kar anîne. Ji ber vê yekê ev beş dikare bibe derfeteke baş bo naskirina devokên helbestiyên din ên Hewramî.

_ Jî em ê helbestên ku zêdetir nêzikî zaravayê îroyîn in û gelek stran jî bi heman zarava hatine gotin bixwînin.

_ Her weha zanibin dibe ku di van helbestan de taybetmendiyên nêr û mê neyên dîtin. Ev yek ji taybetmendiyên helbestên Hewramî ne.

_ Gelek helbestên Hewramî bi zaravayekî gelek dijwar û kevn hatine nivîsandin û em pir hindik ji wan di vê beşê de dibînin û bi piranî helbestên ku hêsan tên famkirin tê da ne.

_ Di hin zimanan de, rêzimanên helbestê ji rêzimana sohbetê ya standard hinekî cuda ne. Di Hewramî de jî wisa ye. Bi vî rengî ku hin rêgez nayên şopandin an hinên din bi tevahî tên guhertin.

_ Di dawiyê de em ê hinekî li ser Zazakî bixwînin. Peyvên ku di navbera Zazakî û Hewramî de dişibin hev û hwd.

_ Kevntirîn helbesta ku ji Hewramî maye helbesta (Hurmizgan) e. Derbarê vê helbestê de nêrînên cuda hene, lê em ê tenê helbestê û wateya wê bixwînin. Tê gotin ku ev helbest dema êrîşa Ereban a li ser Kurdistanê de hatiye nivîsandin, lewma temenê wê zêdetirî 1300 salî ye. Bi rastî balkêş e, li demên ku gelek millet, welat û ziman tunebûn, me kurdan helbest dinivîsandin. Devoka ku ev helbest pê hatiye nivîsandin gelekî kevn e ji ber wê jî ev helbest ji bo gelek kesan nayê famkirin û divê were wergerandin. Vê devokê ji mêj ve cihê xwe daye devokên Hewramî yên nûjen. Helbest bi vî rengî ye:

- Hurmizgan řiman, atiran kujan / Wêşan şardewe gewre gewrekan
- Zorkarî èereb kirdine xapûr / Gunayî Pate heta Şarezûr
- Şen û kenîkan we dîl bişîna / Mêrd aza tilêy we řûy hûnîna
- Řewşt Zedeştire manowe bê kes / Bezîka neyka, Hurmiz we hîç kes

Manaya helbestê:

Beyta yekem: Perestgehên agir wêran bûne, agir vemirî ne / Mezinan(Kalan) xwe veşartin
> Mebesta wê ji mezinan, yên ku di perestgehê de ne.

Beyta duyem: Erebên zalim, ji gundê Palê heta Şehrezûr wêran kirin.

Beyta sêyem: Ereban jin û keç dîl girtin / Zilamên bi xîret di xwînê de dizivîrîn.

Beyta çarem: Ola Zerdeştî bê kes ma / Ahura Mazda ji kesî re rehm nekir

_ Niha werin di rûpelên din de em çend beytên Hewramî, wateya wan û xalên beytan bixwînin.

Beşa heştem: Helbest

- ♦ Ce her terefda miwînûn gulzar / Reng reng medroşo be wêney dildar
 - *Li her alî gulzar dibînim / Reng reng dibirîqe mîna dildar*

Xalên beytê:

- 1- Ce her terefda > (da) paşdaçekeke ku di Soranî û Kurmancî de tê bikaranîn. Lê helbestvan di vê beytê de bi kar anîye. Jî (ce her terefne) hevwatera (ce her terefda) ye. Jî di warê rêzimanî de diviya ku (ce her terefine) be lê me gotibû ku rêzimana helbestî ji ya standard û axaftinê ji ber hin sedeman cuda ye.
- 2- Miwînûn: Di pirtûkê de çend caran di hin cihan de hatiye behskirin ku di devoka Hewraman Textî de hin lêker dikarin bê pêşgira (m/mi) werin bikaranîn. Bo nimûne lêkera (wînay) ku li navçeya Hewraman Textê de, di axaftinê de wisa tê tewndain: wînû /wînî /wîno /wînmê /wîndê /wîna. Lê ev rêbaz li deverên cuda yên Hewramanê bi awayên cuda tê gotin:

wînû = miwînû = miwînûn = mewînû = wînûne û hwd
- 3- Medroşo: Ku giranî dikeve ser kîte ya dawîn. Bi devoka Jaweroyê hatiye nivîsandin.
- 4- Be wêne: Hema hevwatera mîna/wek e.
- 5- Berî ku em beytên paşê bixwînin baş e ka em careka din muqayeseyeke biçûk di navbera devokên Hewramî de bibînin> Zanay

Hewraman Textî
Min zanû

Lehonî
Em mizanû

Jaweroyî
Min mezanû

Hûn dibînin ku bingeha lêkerê di her sê devokan de sabit e û tenê li bikaranîna pêşgirê cuda ne. Forma neyînî ya van devokan jî bibînin:

Hewraman Textî
Min mezanû

Lehonî
Em nimezanû/nimizanû

Jaweroyî
Min nimezanû

Niha hûn dibînin ku awayê nivîsandina yek-du ji wan be tevahî dişibin hev lê awayê bilêvkirina van ne wek hev in. Bi vî awayî ku qiranî watera lêkerê diyar dike.

Hewraman Textî
Min zanû
Min mezanû

Lehonî
Em mizanû
Em nimezanû

Jaweroyî
Min mezanû
Min nimezanû

Mînakek:

Hewraman Textî
To Hewramî zanî?
Erê min Hewramî zanû
Na min Hewramî mezanû

Lehonî
To Hewramî mizanî?
Erê em Hewramî mizanû
Na em Hewramî nimezanû

Jaweroyî
To Hewramî mezanî?
Erê min Hewramî mezanû
Na min Hewramî nimezanû

Bi her awayî, li ku pêwîst be, em ê van xalan bixwînin, lê bi tevahî vekolîna cudahiyên devokan kar û pêvajoyek cuda ye û pirtûkek din hewce dike.

- ♦ Dersim her xem en, her xem mewanû / Xeyr ce xem fêşter hîç nimezanû
 - *Dersa`m bes xem e, bes xem dizanim / Ji bilî xemê bêtir ti tişt nizanîm*

Xalên beytê:

- 1- Her: “Her” di zimanên Kurdî de gelek karanîn hene: 1- Bes 2- Qet û hwd.
- 2- Me berê gotibû ji bilî (a/n) bo nêr û (ne/ene) bo mê, (n/en) jî dikare lêkera bûnê ya kesê sêyem yekjimar be bi wê ferqê ku hem bo nêr e hem jî bo mê ye:
nîya: nîn e(n) // nîyê ne: nîn e(m) // nîye n: nîn e(n/m)
- 3- Mewanû: Li vir bi devoka Jaweroyê hatiye nivîsandin yanî dixwînim. Giranî li ser (nû)
- 4- Xeyr ce xem: Ji bilî xemê
- 5- Fêşter: Bêtir > Ev peyv li helbestan tê gotin û hevwatera wê di axaftinê de (fireter) e.

- ♦ Aĥam ger waço masîç sîyaw a / Maçû řas maçi ey eneyawa
 - *Mîrê(Axayê) min ger bêje mast jî reş e / Dîbêjim rast dîbêjî ey tégîhîştîyo*

Xalên beytê:

- 1- waço: Giranî dikeve ser kîte ya (wa) yanî (ew) bibêje.
- 2- eneyawa: ene > tê // yawa > gîhîştî (rengdêr)

- ♦ Liçe sûreket qend û şeker en / Maçeş nekerî gîyan ne zerer en
 - *Lêva te ya sor qend û şekir e / (Ger) Wê maç nekî can di zererê da ye*

Xalên beytê:

- 1- Liçe sûreket: Ev navdêr naskirî ye.
- 2- gîyan ne zerer en: Paşqertafa (ne) berî zerer hatiye = Gîyan îna/hen zererne

- ♦ Çeme sîyawekat mepîrne hersî / Dosew wêm enî, međewt be kesî
 - *Çavên xwe yên reş tijî bi hêsir neke / Yara min bi xwe yî, te nadim kesî*

Xalên beytê:

- 1- Çeme sîyawekat: Ev navdêr naskirî ye.
- 2- Pîrnay: Watera wê lêkerê yanî tiştêkî ji cihekî avêtin cihekî din. Lê di vir da watera tijîkirinê hatiye.
- 3- međewt be kesî = to međew be kesî = te nadim kesî

- ♦ **Ce dûrî balat, bałam xem werden / Endamim dayim gîrodey derd en**
 - *Ji dûriya bejna te, bejna min tewîye / Endamê`m tim girtîyê derd e*

Xalên beytê:

- 1- **Xemwardey:** Tewîn, Çemîn
- 2- **Gîrode:** Girtîbûn di tişteki de.

- ♦ **Řêzam ce heway dûrî dildarim / Sota ce kûrey dilî xembarim**
 - *Riziyam ji hewayê dûriya dildarê(a) xwe / Şewitîm ji êtûna dilê xwe yê xembar*

Xalên beytê:

- 1- **Řêzam:** Radera wê (Řêzay) ye û negerguhêz e û diviya ku nasnavê vê lêkerê (nê) bûya ango (Řêzanê) lê di helbestên Hewramî de hin car rêgezên nasnavên lêkeran tune ji ber hin sedema wek wezna beytê.
- 2- **Sota = Sotanê = Soçyanê**
- 3- **Di warê rêzimanî ve (ce kûrew dilî xembarîm) rast e lê ev helbest e û bi wî rengî ku helbestvan nivîsandiye di helbestê de baştir e.**

- ♦ **Di gîrodey dam zolfî to kerdim / Pey xalit ce maî dinya wîyerdim**
 - *Min dil girtîyê xefika pora te kir / Bo xala te ji malê dinê derbas bûm*

Xalên beytê:

- 1- **Di gîrodey dam zolfî to kerdim:** Me gotibû ku heke bireser di hevokê de be û dema lêkerê borî be, em nasnavê lêkerê bi bireserê re girêdidin lê we dît ku nasnav bi lêkerê re hatiye girêdan.
- 2- **Wîyerdim:** Di vir de jî lêker negerguhêz e lê nasnavê wê gerguhêz e.
- 3- **gîrodey dam zolfî to:** Di warê rêzimanî ve gîrodey damû zolfû to rast e.
- 4- **Pey xalit = Pey xalit = Pey xalû to /// Ce maî dinya > Ce maî dinyê**

- ♦ **Azîz ten we nêş zamanit xest en / Meynet pay amam we zencîr besten**
 - *Delalê/o leş bi geza birînên te westiyaye / Bêçaretî pêyê hatina min zencîrkirî ye*

Xalên beytê:

- 1- **ten:** beden, leş
- 2- **Zam:** birîn /// Xeste = Westiya(Rengdêr)
- 3- **We nêş zamanit:** 1_ Di hin der û helbestan de, dema ku navdêrên pirjimar werin tewandin, wek Kurmancî (an) li dawiya peyvê tê. 2_ **We nêş zamanit:** Be nêşû zamanit.
- 4- **we zencîr = bi zencîrê**
- 5- **Bestey:** Bestin
- 6- **Besyay/Bisyay:** Hatîn Bestin

- ◆ Xecaletbar im danim azarit / Key layeq na min wêm kerden yarit
 - *Ez şerm dikim ku min tu êşandîye / Kengê heq dikim ku min xwe kiriye yarê te*

Xalên beytê:

- 1- Xecaletbar im: Hûn dibînin ku lêkera bûnê wek Soranî û Kurmancî ye. Xecaletbar ew kes e ku barê şermê dikişîne = Xecaletbar, -e na.
- 2- Layeq: Sezawar, Behremend

- ◆ Felek nimzao satê ferahet / Ey Xudâ ya wesl ya merg ya taqet
 - *Felek demek rehetî nahêle / Lo Xwediyo an wesl an mirin an taqet*

Xalên beytê:

- 1- nimazo: nahêle
- 2- satê: 1- demek 2- dem(pj)

- ◆ Diçe ya d kere, diçe ya d kere / Fesî ciwanît îse ya d kere
 - *Dilo bi bîr bîne, dilo bi bîr bîne / Demsala ciwaniya xwe niha bi bîr bîne*

Xalên beytê:

- 1- Diçe: Dilo
- 2- Ya d: 1- Bîr 2- Fêr > Ya d gêrtey: Fêrbîyey
- 3- Kere: Giranî dikeve ser kêteya (ke) yanî bike > Bikere: Kere
- 4- Fesl: werz = demsal

- ◆ Dos en ne toy pos mewaço ya dos / Wer ne kê dîyen se da bi do pos?
 - *Dost e di hundirê post de dibêje lo dosto / An na kê dîtiye post deng derbixe?*

Xalên beytê:

- 1- Dos: Dost > Dos en: Dost e
- 2- Toy pos: Ev peyveke kevn e, yanî hundirê tiştekî. Di helbestan de tê gotin.
- 3- mewaço: Ev lêker bi devoka Jaweroyê ye û yanî dibêje.
- 4- ya: 1_ an /yan 2_ lo /lê /ey
- 5- se da: deng

- ◆ Gerdûn pêsew min, cergit kewaw bo / Pêsew min bext û barit sîyaw bo
 - *Lê felekê mîna min, kezeba te kebab be / Mîna min bext û barê te reş be*

Xalên beytê:

- 1- Pêsew min: Wek min /Cerg: Kezeb /Kewaw: Kebab

- ♦ Serapay azam, êsk û meş û pos / Dayim meyo lêş zayeley ya dos
 - *Ser ta pêyê endamê min, hestî û mêjî û post / Tim tê jê awaza xemgîna lê yarê*

Xalên beytê:

- 1- Serapa: Ser ta pa /// aza: endam /// êsk: hestî /// meyo: tê
- 2- lêş = Ev peyv ji du beş çêbûye: lê + ş > lê ango ji û ş ango wê(wî) >> lêş: jê.
(lê) Soranî-Kurmancî ye û cînavê (ş) bi wê re hatiye girêdan. Jî hevwatera wê ya Hewramî (çeneş) e.
- 3- Zayeley: Awazek ku pir xemgîn be.

- ♦ Keştî êqbalît her ne gêcaw bo / Êrzey derûnit ba bê cewaw bo
 - *Keştîya bexta te her li geravê be / Daxwaza derûna te bila bê bersiv be*

Xalên beytê:

- 1- ne gêcaw = gêcawne > Me got ku tenê li helbestan paşdaçeka (ne) berî navdêrê tê.
- 2- Êrze = Daxwaz // Cewaw = Ciwab = Bersiv

- ♦ Çemim çemeşay amay balay to n / Ger to ney azîz, çem qerariş ko n?
 - *Çavê min çaverê yê hatina bejna te ye / Ger to neyê delalê, aramiya çav li ku ye?*

Xalên beytê:

- 1- Çemeşa: Çaverê, Bendewar
- 2- Qerar: 1_ Biryar 2_ Aramî

- ♦ Arezûmendîm ce hêd wîyerden / Firawan xeylê tasew tom kerdên
 - *Arezûdariya min ji sînor derbas bûye / Min gelek bîra te kiriye*

Xalên beytê:

- 1- Arezûmendî: Arezûdarî
- 2- Hêd: ast, rade
- 3- Firawan = xeylê: gelek, zêde (Bêtir li helbestan tîn gotin.)
- 4- Tase kerdey: Bîra kesekî/ê kirin > Bêtir di helbestan de tê gotin lê di axaftinê de jî heye. /// Tase: Coş, zewq

- ♦ Pîyaŀey dîdem peŀ kerdên ce mey / Naŀey întizar mekêşûn çûn ney
 - *Min kasa nêrînê tije mey kiriye / Nalîna bendewarî dikişînim mîna bilûrê*

Xalên beytê:

- 1- dîde: nêrîn, çav
- 2- mekêşûn: dikişînim > Hewraman Textî: kêşû

- ♦ Dû çem er seŀ saŀ temaşa keran / Key tawan sêr seyr baŀat bikeran
 - *Eger du çav sed sal temaşe bikin / Kengê dikarin têr li bejna te binêrin*

Xalên beytê:

- 1- keran > bikin > Giranî li ser (ke) > Hewraman Textî = kera /// kera = ew dikin
- 2- tawan > (ew) dikarin > Giranî li ser (wan) > Hewraman Textî = tawa
- 3- sêr = têr
- 4- seyr = nêrîn
- 5- bikeran = (ew) bikin > Hewraman Textî = bikera(kera)

- ♦ Fîday dîdet bam, we bê mey mest en / Nîgay dîdey to, badey elest en
 - *Qurbana çavê te bim, bê mey mest e / Nêrîna çavê te, badeya ezelê ye*

Xalên beytê:

- 1- Fîda: Qurban /// dîde: çav, nêrîn
- 2- bam: bim >>> bam di helbestan de hevwatera (bû) ye > bû = bam: bibim
- 3- we: bi > be = we: bi /// bê: bê >> we bê: bê, bêyî
- 4- Nîga: nêrîn
- 5- Elest: Elest, Ezel > dema ku destpêka wê ne diyar e.

- ♦ Ta satêw meno germî henasey / To nî rocyarû asmanû tasey
 - *Heya wê demekê germahiya nefesê bimîne / Tu yî tava ezmanê zewqê*

Xalên beytê:

- 1- Satêw: Demek
- 2- Meno > Giranî li ser (Me) > Bimîne > Heke giranî li ser (no) be = dimîne
- 3- Rocyar: Tav

- ♦ **Xiwa wêt zanî dewrekem çol a / Waçe be Leylê Mecnûnit wêl a**
 - *Xwedêyo tu bi xwe dizanî dora min çol e / Ji Leylê re bêje Mecnûnê te beredayî ye*

Xalên beytê:

- 1- dewr: dor
- 2- çol: çol > Cihek ku ji meriv û tiştan vala ye.
- 3- wêl: yê ku beredayî ye.

- ♦ **Ce ferzî ferzter a welîa, mişo yađit ne yađim bo / Erê hew nameweş ta key xemû dûrît sizama do?**
 - *Ji wacib wacibtir e wele divê bîra te li bîra min be / Erê ho navxweş heya kengê xema dûriya te, me ceza bike?*

Xalên beytê:

- 1- Yađ = Yad: Bîr
- 2- Sizama miđo: Me ceza dike > Sizama biđo = Sizama do: Me ceza bike

- ♦ **Diî û gîyan û cese û rohm, xemînê nê dimaw êeşqît / Belam xo her nemařanim desûdîmû nimaw êeşqît**
 - *Dil û can û beden û ruha min, xemgîn in piştî evîna te / Lêbelê min qet destnimêja nimêja evîna te betal nekiriye.*

Xalên beytê:

- 1- dima: piştî // êeşq: evîn // xo > hema hevwatera (ku) di Kurmancî de ye > Xo min nekerdenim: min ku nekiriye.
- 2- her: di zimanên Kurdî de hin waterên (her) hene: 1- qet 2- hêj 3- her
- 3- desûdîm(n): destnimêj /// desûdîm gêrtey: destnimêj girtin /// desûdîm mařay: destnimêj betalkirin. /// nima: nimêj
- 4- Di Hewramî de radera betalkirina destnimêjê (mařay) e > Desûdîmit mařanê: Te destnimêja min betal kir.

- ♦ **Hergêz nimêwe emrî wîyerde / Mehał en amay yarî barkerde**
 - *Tucar venagere emrê buhurî / Ne memkûn e hatina yarê barkirî*

Xalên beytê:

- 1- Hergêz/Hergîz: Tucar
- 2- Amaywe: Vegerîn

- ♦ Mizanî çî dilim pey mangê lêw en / Şewê çemeřay amay kesêw en
 - *Dizanî çima dilê min bo heyvê dîn e? / Şevê bendewarê hatina kesekê ye*

Xalên beytê:

- 1- Mizanî: Dizanî > Bi devoka Lehonê.
- 2- Çî: Çima /// Lêw: Dîn, Şêt /// Çemeřa : Çaverê

- ♦ Bes en hay bes en sizam kafî yen / Çîney zîyater bê ênsafî yen
 - *Bes e hey bes e ceza`m bes e / Ji wê zêdetir neheqî ye*

Xalên beytê:

- 1- Kafî: Bes
- 2- Çîney = Ce + îne = ce îney: ji wî
- 3- Zîyater = zêdetir /// ênsaf = edil, heq

- ♦ Êşew yađû to kewten xeyalim / Ce min beraman henasey kalim
 - *Îşev bîra te ketiye xeyala min / Ji min derhatiye henaseya min a zeîf*

Xalên beytê:

- 1- Beramay: Derhatin
- 2- Kał: 1- lawaz 2- mêweya negihîştî

- ♦ Nîyen êkîmê dewayê kero / Yan we newayê xeman labero
 - *Hekîmek tune ku dermanek bike / Yan bi awazekê xeman rabike*

Xalên beytê:

- 1- Nîyen: 1_ Nîn e 2_ Tune
- 2- kero: Giranî li ser (ke) = bike

- ♦ Şîrîn to şemê û min perwane nan / Şîrîn to perî û min dêwane nan
 - *Lê Şîrîné tu find î û ez pelatîk im / Lê Şîrîné tu perî û ez dîwane me*

Xalên beytê:

- 1- perwane nan > Me xwend ku lêkera bûnê ya cînavê (min), (na) ye. Lê di Lehonê di li şûna wê, (nan) dibêjin> Em Hewramî/Hewramîye nan = Ez Hewramî me

- ♦ **Musulmona ez êaşiq no, ten û cestem peşêw hêl o / Tilê m xeste û dilim xemgîn, çemim hersîn, ziwan laî o**

➤ *Misilmanîno ez evîndar im, laş û bedena`m perîşan e / Bedena`m westiyayî û dilê`m xemgîn e, çavê`m bi hêsir e, ziman lal e*

Xalên beytê:

- 1- We dît ku berê (ez) hatiye gotin=> ez êaşiq no: ez evîndar im
- 2- peşêw = perîşan /// tilê = beden (Tenê di zimanê helbestkî de tê peyda kirin)

- ♦ **Azîzim pey to soçyan derûnim / Ce berzî balat, dayim mecnûn im**

➤ *Delalê bo te derûna min şewitîye / Ji bilindiya bejna te, tim mecnûn im*

Xalên beytê:

- 1- mecnûn im = mecnûn na: mecnûn im > Di zimanê sohbetî de (mecnûn im) nabêjin lê we dît ku bikaranîna (im) di helbestan de bi gelemperî ye.

- ♦ **Ebrot keman a, mujganit tîr a / Min nîşaneket, dîlekem neçîr a**

➤ *Birîya te kevan e, bijangên te tîr in / Ez nîşana te, dilê min nêçîr e*

Xalên beytê:

- 1- mujgan = birjangê: bijang > Mujgan di helbestê de tê gotin.

- ♦ **Wextê ke ce weslîç dîlekem rêş bo / Mişyo wesl û fest ferqşan çêş bo**

➤ *Dema ku ji weslê jî dilê`m birîndar be / Divê cudahiya di navbera wesl û cudayî de çî be*

Xalên beytê:

- 1- Rêş: Birîndar /// Mişyo = Mişo: Divê
- 2- Ferqşan > şan = şa > şan li Lehonê tê gotin

- ♦ **Řîyon daxû balaw to no, hezarêw derdedarê nê / Gird kuştew a dîdeyt enê, te dîdeyt cadûkarê nê**

➤ *Rîyon xema bejna te ye, hezar kes kuldar in /Tev kuştîyê çavên te ne, çavên te cadûger in*

_ Di Hewramî de gelek helbestvanên mezin hene. Herwisa ev pirtûk tenê ji bo nasîna we ya hindik bi Hewramî hatiye nivîsandin û bo lêkolîna zêdetir li ser helbestên Hewramî hûn dikarin pirtûkên helbestên Hewramiyan amade bikin û bixwînin. Hûn dikarin bi amadekirin û xwendina dîwanên kesên *Wek Seydî, Mela Bêsarani, Mewlewî Kurd, Ehmed Beg Komasi, Mîrza Abdulqadir Paweyî* û hwd helbestên din ên Hewramî bixwînin.

Jî bizanibin ku hemiya helbestên Hewramî bi alfabeya aramî-kurdî hatine nivîsandin û ji bo xwendina wan fêrbûna vê alfabeyê pêwîst e.

Beşa heştem: Zazakî û Hewramî

_ Di vê beşa kurt de em çend peyv û hevokên ku di Zazakî û Hewramî de dişibin hev bixwînin.

_ Hewramî şaxekî Goranî ye ku Goranî bi Zazakî re jî di heman kategoriya zimanan de ye. Ji ber vê yekê, Hewramî û Zazakî hevsengiyên ferhengî hene.

_ Hêvîdar im rojekê li ser Zazakî-Hewramî û Hewramî-Zazakî pirtûk bîn nivîsandin.

_ Nêzîkbûna wan ji aliyê rêzimanê ve:

Zazakî	Hewramî
sûr (n)	sûr (n)
sûre (m)	sûre (m)
sûrî (pj)	sûrê (pj)

...

Zazakî	Hewramî
to gulo sûr berd.(n)	to gulî sûrit berd.
to gula sûre berde.(m)	to guley sûret berde.
to gulê sûrê berdî.(pj)	to gulê sûrê berdê.

- Beşek ji straneke navdar a Zazakî:

Zazakî	Hewramî
ez to dima zaf bervune	min dimaw to fire girewanê
heta Erzîngan amune	heta Erzînganî amanê
teselya mi tora kewte	omêdû min ce to biŕya (kewt)
rindika mi to xêr ama	weşlekêw min to xêr amay

_ Wisa tê dîtin ku Hewramî û Zazakî ji hezar salî zêdetir e ku ji aliyê erdnîgarî ve ji hev cuda bûne. Lêbelê di gelek waran de hêj jî nêzîk in ji ber ku koka wan yek e. Bo nimûne bikaranîna peyva (namê: name: nav). Nav di Hewramî de wek (namê) tê nivîsandin ango mê ye û di Zazakî de wek (name) tê nivîsandin ku nêr e. Lê dema ku em bixwazin navê xwe û kesan bibêjin lêkera bûnê bi navê kesî/tiştî re li hev dike. Ev taybetmendî bi awayekî balkêş di her duyan de heye:

Zazakî	Hewramî	Kurmancî
Nameyê ey Zana <u>yo</u> .	Namêw adî Zana <u>n</u> .	Navê wî Zana ye.
Nameyê aye Zîlan <u>a</u> .	Namêw adê Zîlane <u>ne</u> .	Navê wê Zîlan e.

_ Di yek ji devokên Zazakî de nasnavê lêkera gerguhêz a dema niha (an) e bo kesê yekem yekjimar. Di hin ji devokên Hewramî de jî nasnavê lêkera gerguhêz a dema niha (ûnan) e. Jî berê di Hewramî de li şûna cînavê(min), (ez) dihat gotin. Ger em wê bihesibînin:

Zazakî

Ez spas kenan

Ez hez kenan

Hewramî

Ez spas kerûnan

Ez êz kerûnan

Kurmancî

Ez spas dikim

Ez hez dikim

_ Pir eşkere ye ku her çiqas vegerin ser rehên berê yên Hewramî, bêtir dişibe Zazakî. Bo nimûne di helbestên Seydî de bi piranî tê dîtin ku lêkera bûnê ya kesê sêyem yekjimar (a) û (n) nîn e û (o) ye:

Zazakî

Ziwan lal o

Hewramî

Ziwan laŀ o

Kurmancî

Ziman lal e

_ Her weha, yek ji mezintirîn wekheviyên van her duyan, zayenda peyvên û çawaniya avakirina zayenda wan e. Di Zazakî de çiqas peyvên ku bi herfa bêdeng ve diqedin, hemî nêr in. Di Hewramî de jî wisa ye û peyvên ku bi herfa bêdeng diqedin wek Zazakî, bi tevahî nêr in:

Zazakî

adir (n)

Kurdistan (n)

Hewramî

awîr (n)

Kurdistan (n)

Kurmancî

agir (n)

Kurdistan (m)

_ Di Zazakî de hin peyv bi herfa bideng diqedin lê dîsa jî nêr in. Di Hewramî de jî wisa ye:

Zazakî

va (n)

hewte (n)

Hewramî

va (n)

êfte (n)

Kurmancî

ba (n)

hefte (m)

_ Ez li ser Zazakî pir hindik dizanim. Ji ber vê yekê, ji bilî peyv û qayîdeyên jorîn, bêguman di navbera van her du zaravayan de gelek hevpariyên din jî hene. Mînak:

Zazakî

Cenî

Kêna

Awa hênîyî serdin a

Vîyarnayene

Wurze

bi nameyê Homayê rehman û rehîmî

Hewramî

Jenî

Kina

Awew haney serde ne

Wîyernay

Wurze/Horze/Wirze

be namêw Xiway řehman û řehîmî

Kurmancî

Jin

Keç

Ava kaniyê sar e

Buhurandin

Rabe

bi navê Xwedayê rehman û rehîm

Ev wekhevî ji wê yekê tê ku her du zarava xwedî kokek hevpar in û zayenda peyvan di her du zaravayan de bi awayê avakirina peyvê ve girêdayî ye:

- 1- Di Zazakî û Hewramî de peyvên qedandî bi bêdeng, nêr in.
- 2- Di Zazakî û Hewramî de dema ku peyvên nêr bi (e) diqedin, giranî dikeve ser kîte ya dawîn.
- 3- Di Zazakî û Hewramî de dema ku peyvên mê bi (e) diqedin, giranî dikeve ser kîte ya pêşîn an navîn.
- 4- Hevbeşîyeke din a wan, awayê bilêvkirina peyvan û dengê axêverên wan e. Bi awayekî ku heke hûn guh bidin dengê her du axêveran, hûn ê vê wekheviya zimanî û dengî fam bikin.

Digel van hemû hevşibiyên zimanî, hema haya hemî gelên van her du zaravayan ji hebûna hev û ji nêzîkbûna nijadî û zimanî ya bi hev re tune û ev xemgîniyek pir bi êş e. Nizanim gelê kurd çima ewqasî israr dike ku kor be û rastiyê nebîne? Nizanim çima ewqasî ji hev nefret dikin? Ma hûn bi rastî nabînin? Ma hûn bi rastî nizanin ku dijminên we ne kurd in? Yê ku zirar dane we û dê zirarê bidin we ne kurd in. Dijminên we ew in ku ketine nava me û perdeyeke stûr ji xemsarî û nezaniyê kişandine ser çavên me û me dişînin ku bira û xuşkên xwe bikujin.

Bila ez tiştekî ji we re bêjim. Divê hûn bizanibin ku êdî du rê li pêşîya me kurdan mane û ji xeynî wan herduyan tu çareserîyeke me nemaye. Rêya yekem ew e ku dijmin û xwefiroşên me dixwazin. Bêdengî û nezanî, wêrankirina ziman, hatin xapandin, komkujî û birakujî.

Bi rastî we hizir kiriye ku heya du kurd li ber hev rabiwestin û çekan bi ser hev de bixşînin û her yek ji wan doza mafê me kurdan bike, em ê nêzî azadiyê bibin?

Heke hûn difikirin ku em ê bi van tiştan bigihin cihekî, divê ku ez sersaxiyê ji we û xwe re bixwazim, ji ber ku ev rêya herî baş e ji bo tune kirina Kurdan.

Heke em bixwazin du qelsiya herî mezin a kurdan binin ziman, divê bêjin ku nebûna yekitiya wan e ku koka wê ji nexwendewarî ye. Xwendewarî nayê wateya çareser kirina çar pirsgerêkên matematîkî û kîmyayê. Mebest xwendewarîya sîyasî û civakî ye.

Ev serdem, serdemek e ku kurd çarenûsa xwe heta hetayê diyar dikin. An dê li ser ola kevn bimînin û di demek kin de bîn tune kirin, an jî dê bibin yek û dîrokê çêbikin ...

Zazakî	Hewramî	Kurmancî
amayene	amay	hatin
ardene	ardey	anîn
awe	awe	av
ber	bere	derî
berdene	berdey	birin
berz	berz	bilind
bimbarek bo	mibarek bo	pîroz be
bira	bira	bira
bîyene	bîyey	bûyîn
bize	bize	bizin
çale	çale	çal
çî	çîw	tişt
çim	çem	çav
dayene	day	dan/dayîn
dest	des	dest
didan	diđan	diran
dinya	dinya	dinya
dîyene	dîyey	dîtin
do	do	dew
engure	hengûre	tirî
estare	hesare	stêrk
bîya	bîya	bûm
firayene	fîray	firrîn
ga	ga	ga
gonî	wînî	xwîn
goş	goş	guh
goşdarî	goşdarî	guhdarî
hênî	hane	kanî
her	her	ker
herre	heře	herr
heş	heşe	hirç
hewr	hewr	ewr
hewte	hefte	hefte
kardî	kardî	kêr
kêna	kinaçê	keç
keno	kero	dike
kerdene	kerdey	kirin
kerge	kerge	mirîşk
kewtene	kewtey	ketin
kewtî	kewtî	ketî
key	key	kengê
ko	ko	çiya
mange	mange	heyv/meh

Zazakî	Hewramî	Kurmancî
musayene	misay	fêrbûn
name	namê	nav
nan	nan	nan
nêkero	nekero	(ew) neke
nimaj	nima	nimêj
nîmenîm	nîmenîme	nîvenîv
nizm	nizm	nizm
řemayene	řemay	revîn
řemnayene	řemnay	revandin
saye	sawî	sêv
senî	çenî	çawa
şewe	şewe	şev
şima	şime	hûn
şiyene	şiyey	çûn
sole	soł	bixwê/şor
sûr	sûr	sor
va	va	ba
vaje	vaçe	bêje
vam	vamî	behîv
vatene	vatey	gotin
veyve	weywe	bûk
vînayene	vînay	dîtin
vîst	vîs	bîst
waye	waîê	xwişk
welat	welat	wilat
wendene	wenay	xwendin
werdene	wardey	xwarin
werg	werg	gur
weş	weş	xweş
yew	yo	yek
zama	zema	zava
zano	zano	dizane
zerd	zerd	zer
ziwan	ziwan	ziman

Zazakî

Zanko kurdî musa

Hewramî

Zanko kurdî misa

Kurmancî

Zanko fêrî kurdî bû

*Di! maço to rê, ce to hes kenan
Sey awan ne ser gelay gořalan
Bijnewem azîz, ez to ra vana
Lê weşikêrê ce gird nazara!
Nêweş a tim çira ez
Seba maçêk to ra ez
Ti nîya ke bivîna
Ke bom û xînt bîya ez*

دل ماچۆ تۆرئ؛ جه تۆ ههس که نان
سهی ئاوان نه سه رگه لای گۆرالان
بژنه وهم ئازیز؛ ئەز تۆ را قانا
لئ وه شکێرئ جه گرد نازارا!
نیوه شاتم چرا ئەز
سه با ماچیک تۆ را ئەز
ت نییا که بقینا
که بۆم و خینت بییا ئەز

**Dil dibêje te, ji te hez dikim
Mîna avên ser pelan hez dikim
Min bibihîse, dibêjim te ra
Lê xweşiktirê ji giş nazdara!
Nexweş im tim çima ez
Bo maçek ji te va ez
Tu nîn î ku bibînî
Dîn û şet bûm te ra ez**

Beşa nehan

(Ferhengok)

Beşa nehan: Ferhengok

_ Di vê beşê de em bêtir peyvên ku niha di Hewramî de bi gelemperî ne dixwînin. Elbet hin peyv jî hene ku kevn û resen in lê mixabin hatine jibîrkin. Eger gelê min bixwazin, ez ê rojekê pirtûkek li ser peyv û lêkerên resen ên Hewramî binivîsim û ez ê pir kêfxweş bibim. Lê di vê beşê de, wekî ku hate gotin, piraniya peyvên ku herî zêde têne bikaranîn hatine nivîsandin.

_ Ferhenga vê beşê hem Hewramî-Kurmancî ye û hem jî Kurmancî-Hewramî ye. Lêbelê ferhenga Hewramî-Kurmancî bêtir e.

_ Her weha, di van ferhengan de rola peyvan û zayenda wan nehatiye nivîsandin. Ev yek ji bo ku rûpel tijî nebin, hatiye kirin. Lêbelê hewl tê dayîn ku ferhengek nû di zûtirîn dem de were weşandin ku tê de rola peyvan were diyarkirin.

_ Dibe ku hin peyv li gorî rêza alfabetîk nebin, ji ber vê yekê heke hûn hin car tevlihev bibin, ji kerema xwe min biborin ji ber ku ev pirtûk, hemû tiştê ku ez dikarim bikim bû û her weha ji ber ku ez mirovekî temam nîn im, min nekarî pirtûkî temam binivîsim û ji we re biweşînim.

_ Jî di Hewramî an Kurmancî de gelek peyv û lêker hene ku dibe hevwatera wan di zimanên din de tune be. Loma min bo hin peyvan hevwatera nêzîka wan nivîsandine.

• Ferhenga Hewramî-Kurmancî

_ Aa

A ba: Nîşanî min bide, Here

Aa: Belê

Abađ: Bapîr, Bav û kal

Abađne: Di kalan de

Abađwe/Abado: Ji kalan ve

Abûrî: Aborî

Abûrîzan, -e: Aborîzan

Abûrîzanî: Aborîzanî

Abûrîzanîne: Di aborîzanîyê de

Abûrîzanîyene: Di aborîzanîyê de

Ađ: Ew(n)

Ađab: Adab, Torre, Ferheng

Ađe: Ew(m)

Ađê: Ew(pj)

Ađem: Mirov

Ađemîzad: Ademîzad

Aferim: Aferîn

Afrete: Afret

Aftawê: Misîn

Agadar, -ê: Agahdar

Ahenge: Stran

Ajawlê: Finte

